# LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK

NRLS

NAVENDA ROJAVA YA LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK

KOVAREKE DEMSALÎ JI NAVENDA ROJAVA YA LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK TÊ DERXISTIN - HEJMAR 5-6 Bihar -Havîn 2022



- HOVÎTÎ WEKE STRATEJIYEKÊ JI BO BICIHKIRINA DAGÎRÎ Û ZALÎTÎYÊ
- BÎRDOZIYA ŞER LI CEM KURDAN -B3
- KOMARA ISLAMÎ YA ÎRANÎ

Edîtorê nivîserê: **Rakan Şêxî**

Desteya nivîser:

**Hejar Şakir – Alî Alî**

Nexşedan: **Ehmed Mela**

Hemû danstan bi navê sernivîser li ser navnîşana jêrîn tên kirin:

nrls@nrlsrojava.com

Ji bo serdana sîteyê:

www.nrls.net

**Weşanên Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk (NRLS)**

**Mafên çapkirin û weşanê parastiye**

**Hejmara (5-6) Buhar - Havîn – 2022**

# NAVEROK

**Hovîtî Weke Stratejiyekê ji bo Bicihkirina Dagîrî û Zalîtîyê ....................... 5**

**Bîrdoziya Şer Li Cem Kurdan ................................................................ 40**

**Komara islamî ya Îranî........................................................................... 65**

## Gotina hejmarê

Di vê jimar 5`an a ku em pêşkêşî xwendevanên xwe dikin de, du lêkolîn berdewamiya lêkolînên  jimara çûyî de ne û yek lêkolîn jî nû tê weşandin.

Di beşa duyem a "Bîrdoziya Şer Li Cem Kurdan" de, riyên baweriya şer a kurdên Rojava, hem jî nimûneyên li ser şervanên kurd weke Pêşmerge û Gîrîla têne desgtnîşankirin.

Jixwe weke berdewamiya lêkolîna "Komara Islamî Ya Îranî" mijarên sereke yên weke stratejiya Îranê, hişmendiya leşkerî ya Îranî û saloxgeriya Îranê têne pêşkêşkirin.

Lêkolîna nû ya ku di vê jimarê de tê weşandin " Hovîtî Weke Stratejiyekê ji bo Bicihkirina Dagirkerî û Zalîtiyê"  ye. di vê lêkolînê de mijarên çanada "bawerî, kuştin û xenîmeyê" di navbera terxandin û bixwegirtinê de, binpêkirinên pêkhatî, armanceke ji ajendeyên daigirkerî û zalîtiyê re û bijardeyên nêzîkatiya bi ninpêkirinên pêkhatî re; têne şirovekirin.

**Sernivîser**

.

# Hovîtî Weke Stratejiyekê ji bo Bicihkirina Dagîrî û Zalîtîyê

**Pêşgotin:**

Bijardeyên nêzîkatîya bi kirîzên navneteweyî re cihêreng in û piştî bibinkevtina bijardeyên deplomasî û aborzanîyê, herî dawî hêza leşkerî tê bikarînan. Lê di her heyşt salên dawîn de bijaredeya bitenê ya hin pergalên stemkar bûye şerkirin, herweha weke mafekî yasayî ji xwe re dibînin. Heta asta kêfxweşbûna bi kuştinê li gel nebûna hestên dilovanîyê ew jî dema ku kesinan yan neteweyinan ji bo berjewendîyên xwe yên siyasî dikujin; rijandina xwînê bi şûr û kuştina bi pênûsê weke ku el-Kewakibî1 dibêje. Di 9.10.2019 de artêşa Tirk bi alîkarîya hin mîlîsên radîkal yên çete û bi fermana rêjîma Erdogan, êrîşeke tund li dijî niştecîyên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê pêk anî. Ew jî di çarçoveya pêkînana pilana paqijkirina nijadî û guhertina demogirafîk li bakurê Sûrîyê ku li herêma Efrînê dabû destpêkirin.

Bi rêya çavdêrîkirina raman û demagojîya Erdogan, tê xuyakirin ku gelekî bi Împeretorîya Osmanî ya ku li cem gelên deverê xwedîya dîrokeke reş e, bandor bûye. Xwe jê re wekî mîratgirekî dibîne û hewl dide dîsan wê bi pîvanên modern nûjen bike; ku li mezinahîya kesayetîya xwe û dewlemendî û desthilateke bêsînor digere. Ji xwe re palpiştîyeke baş li cem hin rêxistinên radîkal û jirêderketî dît, ew jî bi rêya terxandina olê ji bo kişandina wan ber bi xwe ve. Erdogan hewl dide siyaseta kalên xwe yên stemkar di desthilatê de berdewam bike ya ku paqijkirina nijadî der heqê niştecîyên deverê bingeh digire. Çimkî piştî komkujîyên li dijî Tirkmenan û tunekirina dewleta Selcûqî û komkujîyên li dijî Ereban û tunekirina Xîlafeta Ebasî, piştre kuştina gelên Xiristîyan di nav de Yûnanistanî, Ermenî, Suryanî û Asûrî û kuştina bawermendên ola Êzdî û

[1] Ebdilrehman el-Kewakibî, Tebai el-Istibdad we Mesari el-Istibad, Kelîmat Erebiye ji bo werger û weşanê- Qahîre; r70

bawermendên ayînzaya (mezhebê) Elewî, Sma'îlî û Dirzî. Tenê amaje bi şoreş û raperînên ku li hember deshelatdarîya Padîşahîya Osmanîyan çêbûn têra wê dike ji bo danasîna çiqasîya nehêşt û bobelata ku ev zordar bûn sedema rûdana wan. Bi têkçûna vê Padîşahîyê re 1923 bi destê zebanîyên wê, nevîyên Padîşahîyê dane ser şopa bapîrên xwe û dest bi operasîyonên paqijkirina nijadî di bin serenavê "Pilana Vesazkirina Rojhilatê" de sala 1925an li dijî kurdan kirin. Ev pilan ji hêla demê ve bêsînor e û dixuye ku Erdogan kurdên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê tev li vê pilanê kirine. Mijarên hatîne vagotin, yek stratejiyê amaje dikin, stratejîka hovîtîyê ji bo bicihkirina desthilat û zalîtîyê ye, bi rêya amadekirina derûnîyê ji bo pejirandina kuştina kesên bêsûc bi bikarînana handena olî, bi rêya amadekirina nifşekî radîkal û li ser kuştin û xirabkirinê di çarçoveya kirîza Sûrîyê de hatîbe perwerdekirin; ew jî bi sûdwergirtina ji nezanî û xizanîyê ya ku li cem gel peyda dibe, çimkî cewhera hizira radîkal di lipêşdîtina nivîsê li hember aqil e.

Di vê lêkolînê de bi rêya lêgerîna li hûrgilîyên binpêkirinên ku bi giştî derbarê niştecîyên bakur û rojhilatê Sûrîyê û bi taybet derbarê kurdan de bi serperiştîyeke yekser ji hêla rêjîma Erdogan ve ji 9.10.2019 ve pêk hatîne, em dê hewl bidin vê mijarê ronî bikin. Bê gûman ev binpêkirin, binpêkirineke aşkere ji zagona mirovî ya navneteweyî û peymanên navneteweyî re ye û karine li dijî nirxên mirovahîyê ne. Lewre baştir e ku çanada kuştin, xenîme û bawê ya ku dixuye rêjîma Erdogan wê belav dike, were nasîn û binpêkirinên vê rêjîmê werin destnîşankirin û li gorî zagona mirovî ya navneteweyî, peymanên navnetweyî û nirxên sincî werin nirxandin, herweha hewldana dana bijaredeyan ji bo nêzîkatîya li hember vê stratejiyê.



*Wêneyek, koçkirina kotekî ya Ermenan ya bi destê Osmanîyan dide diyarkirin. Ew jî di dema komkujîyên derbarê Ermenan de di dema Şerê Cîhanê yê Yekem 1915-1919 li rojhilatê Anadolê û bakurê Kurdistanê2.*



*Ev wêne, koçkirina kotekî ya kurdan li bakurê Kurdistanê (rojhilatê Anadolê) diyar dike. Ew jî di çarçoveya operasiyonên paqijkirina nijadî û guhertina deomgrafîk ya ku dewleta tirk der heqê gelê kurd de piştî sala 1925an pêk anî ku navê "Pilana Vesazkirina Rojhilatê" (Şark Islahat Planı)3 lê dike.*



*Ev wêne, koçkirina kotekî ya Kurdan ji herêma Efrîn bi destê rêjîma Erdogan diyar dike. Rêjîma ku xwe bi mîrasê bapîrên xwe girtîye û ya ku operasîyonên paqijkirina nijadî û guhertina demografîk li dijî kurdan pêk tîne. Ew jî piştî dagirkirina herêmê ji hêla rêjîma Erdogan û mîlîsên çete û terorîst yên girêdayî bi wê ve di destpêka sala 2018an de.*

---

[2] Malpera Captain Tarek Dream ya parastina mafê mirovan. Bîranîna sedem ya komkujiya ermenan, govana xwînmijiya "bapîrên Erdogan" e; dîroka weşanê 28 nîsana 2014an, wêneya 141ê, lînk: http://captaintarekdreams.blogspot.com/2014/04/anniversary-of-pass-century-on_27.html

[3] ŞARK İSLAHAT PLANININ BİR KAÇ MADDESİ VE KÜLTÜREL SOYKIRIM, Kasım ENGİN, 18 Haziran 2013 https://www.komunar.net/tr/index.php?sys=nuce&dw=nivis&id=1127



*Wêneyek4, koçkirina kotekî ya niştecîyên Serê Kanîyê diyar dike. Piştî êrîşa artêşa Tirk û çeteyên wê li dij bakurê rojhilatê Sûrîyê di 9.10.2019 de; ji bo berdewamkirina pilana paqijkirina nijadî û guhertina demogirafîk li dij kurdan ji hêla dewleta Tirk bi rêberîya rêjîma Erdogan*

*Ev wêne, stratejîka desthilatên Tirkîyê ya hov li dijî niştecîyên resen yên li deverên xwe diyar dikin. Ku paqijkirina nijadî û guhertina demgrafîk weke bijardeyeke stratejîk ji desthilatên Tirkîyê re tê dîtin. Siyaseta Tirkîyê ya nihayî, heman siyaseta Tirkîyê di dema desthilata Etaturk de ye, herweha heman siyaseta Padîşahîya Osmanî ye. Ev siyaset bi bikarînana olê ji bo kuştina kesên bêsûc tê nimandin.*

Çanda "Baw, kuştin û xenîmeyê" di navbera terxandin û bawerî pê anînê de.

Rojhilata Navîn li ser asta navneteweyî weke navenda nearamîyê tê dîtin. Ev yek jî bi sedema hin pirojeyên îdeolojî û olî ye ku ji bilî çanada kîndarîyê û nepejirandina danpêdana bi taybetîyên etnîkî û çandî yên hin gelan, tiştekî din bi xwe re neanîne. Çimkî kombûnên leşkerî di rewşa amadebaşîyê de li ser sînorên hevbeş yên hin dewletan hene û operasîyonên pevçûnê yên ku heta astekê berdewam in li hin dewletine din li vê deverê hene. Komkirinên leşkerî yên mezin di navbera Sûrîyê û Îsraîlê, Sûrîyê û Tirkîyê û di navbera Komara Îslamî ya Îranî û hin dewletên Kendava Erbî de hene. Li gel çalakîya banglêkirina dozî û şerî ya balkêş ji bo dehan rêxistinên radîkal û nijadperest hene. Serbarî wê jî gendelî û tunebûna pirinsîbên demokiratî û dadmendîyê û tunabûna azadîyê di çarçoveya nirxên sincî de li cem gelek statûyên deshilatdar li vê deverê hene.

[4] MSF WEBSITES, Northeast Syria: Turkish military operation results in displacement and hospital closure, 11 October 2019, https://www.msf.org/turkish-military-operation-results-displacement-and-hospital-closure-northeast-syria

Bi destpêka sedsala nihakat re îslama siyasî ya xwedî arazûya nijadperest li ser hesabê şepêla neteweyî li pêş ket. Û ev dever guhertinên dramatîk li ser astên xwe yên xwecihî dibîne, vêca dixuye kesayetên serkirdeyî xwedan derûnîyeke nesazkar berz bûne, li mezinahî û xewninan digerin ku ji gelên deverê re mîna xewneke tirsnak in. Ev qonaxa nû bû sedema jan û kaoseke gelekî xirab bi rêya terxandina ol û diravan û şiyarkirina dilbijînên kuştin û sêksê yên di gîyanê kesayetên jirêderketî, psîkopat û braneweyî de û ya ku amaje bi hejmar û astên wê bi çi qasîya qewarê dabezandina wan binpêkirinan kir. Zihnîyeta siyasî ya gelek dogmatîk li ser sêqaneya bawerî, kuştin û xenîmeyê kereste bûye. Çimkî bawerîya wan bihaneyan ji kuştinê dibîne û kuştin xenîmeyan di nav de kolegirtina sêksî û laşî peyda dike. Ev tiştê ku mirov dikare di hemû deverên ku van hêzan dagîrkirîye de çavdêrî bike. Bi rêya serjimarîya hejmara zêde ya kenalên TVyê, malperên elektronîk, weşanên nivîsarî û dengî, peristgeh û rêbazên olî yên siyaysî, paşeroja reş ya ku ev kesên dogmatîk amade dikin ji me re diyar dike.

Dixuye ku rêjîma Erdogan û peyrewên wê ji koma El-Ixwanil-Mislimîn, Da'iş û Cebhetul-Nusre birêveberên vê zihnîyetê û pilanrêsê stratejîka wê ne. Çimkî ew bixwe xetekê saz dikin û bi rêya pevguhertina rolan û pêşkêşkirina rajeyan ji hev re bi awayekî yekser yan ne yekser kar bi hev re dikin; di dema ku bineya Şî'î di rewşa xweparastinê de xuya dibe, lê rewta (şepêla) neteweyî yan li hember tîreyiyê windabû, yan di îslama siyasî de bişivî yan jî xwe veder kir. Dibe ku bibinkevtina îdelojiya neteweyî di raberkirina çareserîyan ji arîşeyên deverê re û têkçûna Ereban li hember statûya Îsraîlî di şerê Hezîranê de sala 1967an roleke sereke di wê yekê de lîstîbe. Çarenûsa rewta (şepêla) çep jî ji çarenûsa rewta (şepêla) neteweyî ne baştir bû, lê wê rewet (şepêlê) li hin cihan ramanên xwe li pêş xistin û piştî lêvegereke rexneyî ji xwe re çêkir, bi awayekî modern ew raman derxistin, herweha dikarî şoka kirîza ku bineya rêjîma Erdogan bû sedema wê vehewîne, bineya ku em dikarin navê "Rêbaza Xîlafeta Sinî" lê bikin. Dixuye ku ramanên "Hesen El-Bena" yek ji serokên koma El-Ixwanil-Mislimîn bi xwe girtine, yê ku îslam wekî "... ol û dewlet,

Quran û şûr..."5 dibîne anku bîrûbawerîya wan ya siyasî desthilat û stemkarî û tirsandin û zalîtî ye.

Dewletên emperyalîzmê hewl dan ji vê têkderîyê û çandê ji bo bernamic û berjewendîyên xwe sûdê bigirin ya egera sereke di pêkanîna wê de zalîtî ye. Û weke doxeke xweristî her dewletek li bineyekê cihê xwe girt û her bineyekê hewl da hêzeke xwecihî li Rojhilata Navîn vehewîne ew jî bi rêya raberkirina palpiştîyê ji wê hêzê re û lawazkirina dijminên wê. Ev hêz li deverê nebûne egerên aramî û ewlehiyê, lê belê welat veguhezand qadeke hevrikîyê û nêvenga taqîkirinan ji bo çekên xwe. Dixuye ku zagon û peymanên navneteweyî û mirovî weke desmaleke spî ne ji bo ku kiryarên gemar ên ku têkderî (kaos) û kirîzên mirovî pêk tînin paqij bike; ew jî piştî lihevkirina li ser parvekirina berjewendîyên e. Çimkî heta ku berjewendîyên dewletên mezin û di pey re berjewendîyên kompanîyên mezin nekevin bin metirsîyê de, Encumena Ewlehîyê destwerdanê bi awayekî yekser nake; çimkî tenê dema ku bi sedema êşekê kirîzeke xwezayî yan mirovî dirust bibe yan şerekî tevgir yan jî rêxistinên terorîst ji bin kontrolê derkevin, wê demê destwerdanê dike.

Bineya rêbaza Xîlafeta Sinî, yek ji girîngtirîn lîzerên li ser erdê tê dîtin. Çimkî dikarî xwe berde nava gelek civakên Ereb, Kurd û Tirk. Weha xuya dike ku hevbendiya hêza leşkerî ya Tirkîyê û hêza diravên Qeterî alîkarîyeke baş di pêşxistina vê bineyê de kir heta asta biserkevtineke sînordar – biserkevtina ku demkî xuya dike – di gihaştina desthilatê de li hin dewletan yan avakirina hin statûyên xwecihî yên jirêderketî (di çarçoveya nerît û peymanên navneteweyî û mirovî de jirêderketî ne). Tiştên ku vê yekê amaje dikin ev in çalakîyên wan li Misrê (hikûmeta Mûrsî), El-Nehde li Tûnsê, hikumeta El-Wîfaq li Lîbiyayê, hevbendiya bi rêjîma Umer Hesen El-Beşîr re li Sûdanê û hikûmeta Sûrîyê ya demkî (rikberîya Ixwanî), Dewleta Islamî li Îraq û Şamê ya ku bi kurtenava Daişê tê naskirin li rojhilatî Sûrîyê û rojavayê Îraqê û Cebhetul-Nusre li başûr û rojavayî Sûrîyê. Jimara qurbanîyên kirîzên ku li wan welatan çêbûyî bi milyonan e, di nav de binpêkrinên mafên mirovan weke kuştin, îşkence û

[5] Ixwan Post, nameya banglêkirinê ji ciwanan re ya Îmamê şehîd Hesen el-Bena, dîroka weşanê 30.3.2019; lînk:
https://ikhwanpost.com

kiryarên destdirêjîya sêksî, koçkirina bi darê zorê, dagîrkirin û kolegirtin, berpirsyarîya wan ya zagonî û sincî bi awayekî yekser berpirsyarîya rêjîma Erdogan û şêxên Qeterê ne. Herweha hewldanên wan li gelek deveran bi bin ketin, bobelatine dijwar û têkderîyeke (kaoseke) mezin li paş xwe hêlan û bûne sedema birînine kûr ji civakan re dibe ku bi salan dirêj bike heta ku sarêj bibin.

Bi şêweyekî rêbazî ji hêla vê bineyê ve Kurd tên tekfîrkrin, ji ber ku kîndarîyeke mezin li hember gelê kurd diyar dikin. Vêca helwest di ser bijardeyên siyasî derbas dibe heta ku digihêje armacgirtina tevahiya gelê kurd. Herweha ev bine di milê siyasî, leşkerî û çandî de her ku derfetek didît zormilî li kurdan dikir. Peyrewên wê bineyê jî kurdan bi peyvên gemar bi nav dikin ku ev yek hesteke hindirîn a hovane derdibirîne ku kuştina wan, û talankirina mal û mewdayên wan, desthavtina namûsa wan û windakirina dîroka rewa dike; û ev jî niha li ser erdê çê dibe.


Syrian Arab Republic
Interm Syrian Governmenf
Minis of Defense

الجمهورية العربية السورية
الحكومة السورية المؤقتة
وزارة الدفاع – هيئة الأركان العامة
الفيلق الثاني
الرقم : 4
التاريخ : 01/11/2019

صُدق
وزير الدفاع

تصريح من قيادة الفيلق الثاني في الجيش الوطني

إلى أبناء شعبنا العظيم - شعب البطولات والملاحم - الذي لايبيت على ضيم، ونستلهم من ثباته عزيمتنا في معارك التحرير،
لقد منَّ الله علينا بمنازلة جنود النظام المجرم في الأيام الأخيرة ضمن عملية "نبع السلام" وأوقعنا العديد من جنوده بين قتيل وأسير.
ولأنّ ظروف المعركة تفرض علينا بعض التكتيكات المرحلية، التي تُسهّلُ من طرفٍ آخر مَضاءَ المعركة، وإنْ بدت بصورة مؤلمة حالَ وقوعها اللحظي، وتعليقاً على حدث تسليم جنود النظام الأسرى البالغ عددهم 18مجرماً، الذين أسِروا في تاريخ 2019/10/28م ثم أعيدَ تسليمهم إلى الشرطة الروسية في تاريخ 31/ 10 /2019م ضمن تفاهمات الحلفاء الأتراك مع الجانب الروسي؛ فإنّنا نعقّب على هذا الحدث موضّحين لشعبنا العظيم مايلي:
1- إنّ هؤلاء الأسرى المجرمين هم حصيلة معركة عنيفة خاضتها قواتنا مدعومةً بالقوات التركية الحليفة ضد قوات النظام وميلشيات "pyd"، وقد نكّلَ مقاتلونا الأبطال بميليشيات النظام، وأوقعوا عدداً من القتلى في محور الأمرية في منطقة أبو الراسين.
2- سُلّم الأسرى إلى الأخوة الأتراك وفق آلية عمل متفاهم عليها في معركة "نبع السلام" مع الجيش التركي، الذي لايخفى على أحدٍ دورُه المركزي في إدارة المعركة التي تتعدى طاقة السوريين؛ بسبب مشاركة ودعم دول عظمى لنظام الأسد المجرم وميلشيات"pyd"
3- إنّ شراكتنا الإستراتيجية - بصفتنا جيشاً وطنيّاً - مع الجيش التركي الحليف، الذي يشاركنا الهمّ والدم في قتال الإرهاب بمختلف صنوفه، بعد أنْ خذلتنا غالب الدول في العالم، تقتضي منّا المرونة في إدارة المعركة، وإنّنا على تواصلٍ مستمر ووعدٍ صريح بأنّ هذا الحدث لن يكون دون مقابل يَجبُر مشاعر شعبنا المصابر.
فالمأمول من شعبنا العظيم مراعاة ظروف المعركة، والثقة بجيشه الذي يبذل مع حلفائه المُهَج الغالية من الأنفس الزاكية، في سبيل الله، وعزة الوطن، وتحريرالأرض والإنسان، مع وعدِه شعبَه بمتابعة الطريق المُرّ، وعدم التفريط بثوابت الثورة، وعلى رأسها إسقاط النظام المجرم، وتحرير معتقلينا من مسالخه البشرية.
وتحيا سوريا حرّة أبيّة!
الناطق الرسمي باسم الجيش الوطني
الفيلق الثاني

Daxuyanîya mîlîsa Artêşa Niştimanî derbarê radestkirina dîlên artêşa Sûrîyê ji saloxgirên Tirkîyê[6] re weke tekezîyekê li ser girêdana xurt di navbera Dewleta Tirk û mîlîsên radîkal de yên çete ku navê rikberîya sûrîyê li xwe dikin.

**Binpêkirinên pêkhatî, armanca ajendeyên dagîrkirî û zalîtîyê ne.**

Di 9.10.2019 de artêşa dagîrker a Tirk û çeteyên wê êrîşek bi ser niştecîyên bakurê rojhilatê Sûrîyê di bin navê operasîyona "Kanîya Aştîyê"

[6] Malpera rojnameya "Hibir". Daxuyaniya fermandariya Artêşa Niştimanî ku radestkirina 18 dîlê hêzên Rêjîmê bi bihane dike "qonax hestyar e". Dîroka weşanê 2.11.2019, lînk: https://hibrpress.com

pêk anî ya ku piştre weke "Kanîya Şer" hate xuyakirin; ew jî piştî rêxwşkirinekê ku bi dagîrkerîya herêma Efrînê û lidarxistina şerekî derûnî yê gemar li dijî niştecîyên deverê dihat nimandin. Herweha berî êrîşê dexlûdanên welatîyan li devera nêzî xeta sînorî şewitanidin, li gel standina erêkirinê ji hin hêzên navneteweyî yên mezin. Bi rêya vê êrîşê diyar bû ku rêjîma Erdogan hewl dide operasîyonên paqijkirina nijadî û guhertina demogirafîk ku niştecîyên deverê û bi taybet kurd tev digire pêk bîne. Herweha ji bo vê yekê rêzekarên hovane pêk anîn ku ziyaneke mezin gihandine niştecîyên deverê û mafên wan binpê kirin. Lerwe kiryarên ku bi destê artêşa Tirk a dagîrker û çeteyên wê di êrîşa wan bi ser bakurê Sûrîyê de pêk hatin dikevin çarçoveya sûcên ku Sîstema Romayê ya Bingehîn ya Dadgeha Sûcên Navneteweyî, ya ku piranîya madeyên xwe ji Rêkevtina Cînêvê ya bi dîroka 12ê tebaxa 1949an û rêkevtin û protokolên girêdayî wê yên weke sûcê komkujîyê, sûcên li dijî mirovahîyê, sûcên şer û sûcê êrîşê wan kiryaran pênase dikin. Em van kiryaran vebêjin:

- **Koçkirin û penaberkirina niçtecîyan bi darê zorê.**

Bi rêya bikarînana zêde ya hêzê û hin caran çekên giran, topbarandina bêserûber, belavkirina vîdyoyan li gel qîrkirina bi gotina "Elahûekber" ku pîskirin û biçûkkirin û îşkencekirina kesên dîl û revandî diyar dikin, talankirina mewdanên mirovan û kuştina meydanî ya sivîl û leşkerên dîl, eynî weke kiryarên rêxistina Daişê ya terorîst. Agir û guleyên çekên êrîşê, rêya penaberbûna sivîlan ber bi başûr ve destnîşan kir, tiştê ku zemîna pêwîst ji bo dagîrkirina Dewleta Tirk ji beşekî ji erdên Sûrîyê re amade dike. Encama bitenê ya van kiryaran tekez paqijkirina nijadî ye.

- **Handan û neçarkirina koçberan li ser bicihbûna li deverên dagîrkirî.**

Ew jî bi rêya dana mal û mewdanên niştecîyan weke xenîmeyên şer ji malbatên çeteyan re, fişara li ser koçberên li bajarên Tirkîyê û şandina ber bi rêyeke bitenê ve ew jî bicihbûna li deverên dagîrkirî li bakurê Sûrîyê. Herweha Erdogan hewl da bi rêya şantajkirina dewletên Ewropayî bi pêlên koçberan yên xwedî ramanên radîkal, devê wan bigire. Dibe ku dewletên Ewropayî vê şantajê weke bihaneyekê bibînin da ku çavên xwe ji sûcên ku artêşa Tirk ya dagîrker û çeteyên wê li deverê pêk tînin, bigirin. Encama bitenê ya van kiryaran tekez guhertina demogirafîk e.

•**Handana li ser çanda kîndarîyê.**

Bi rêya wesifkirina kurdan bi kesên gawir û hin gotinên din yên nemirovî, diyarkirina mijarê weke ku "cîhad"a di ber Xweda de ye bi rêya handana li ser xwendina hin sûretan ji Qûranê û fetweya bi pêdivîya kuştina niştecîyên bakur û rojhilatê Sûrîyê, ew jî piştî ku berpirsyarîya têkçûna pirojeya "rêbaza xîlafeta islamî" û têkçûna rikberîya Sûrîyê li hember desthilata navendî li Şamê avêtin li ser milên wan, tevî ku tu rêkevtinên fermî di navbera Rêveberîya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûrîyê û vê desthilatê de nînin. Revîna hin çekdarên rêxistina Daişê û malbatên wan di bin parastina hêzên êrîşker de nîşaneyek bû ku baş rajeya vê hewldanê kir. Ev rikberî li çetebûna li cem rêjîma Erdohan hate veguhestin ku tevahîya baldan û parastinê jê dibîne, li gel piştgirîya leşkerî û siyasî, di ber wê piştgirîyê de divê Erdogan vîna wê kontrol bike. Ev yek bi zelalî xuya dike bi rêya hilbijartina Erdogan di civînên navneteweyî û danûstandina bi rêjîma Sûrîyê û hevbendên wê de weke garantorekî ji wan re. Encama tekez ji vê kiryarê re berdewambûna bobelata mirovî ye ya ku ji ber alozîya Sûrîyê çê bû ku ev yek dikare asta radîkalîyê zêde bike û di encamê de ewlehî û aştîya navneteweyî li pêş gef û metirsiyine mezin dihêle.



*LI SER ŞOPA MIZGEFTÊN DIN YÊ GIRÊDAYÎ KOMA ERDOGAN, HIN RADÎLKAL LI MIZGEFTEK BAJARÊ EDIRNEYA TIRKÎYÊ, ÊRÎŞA LI DIJÎ BAKURÊ ROJHILATÊ SÛRÎYÊ DI BIN NAVÊ "CÎHADÊ" DE REWA DIKIN7.*

[7] Kenala Ajansa Anadolê li ser Youtube; li mizgeftên Tirkiyeyê û hin welatên din nimêjker dûa û Quranê ji bo hêzên "Kaniya Aştiyê" dixwînin- Edirne, dîroka weşanê 10.10.2019 lînk: https://www.youtube.com/watch?v=R7Ej_Gn9GIo




*BERPIRSYARÊN DEWLETA TIRK, ÇETEYÊN XWE (ARTÊŞA NIŞTIMANÎ) BI AYETÊN QURANÊ BERÎ ÊRÎŞA LI DIJÎ NIŞTECÎYÊN BAKURÊ ROJHILATÊ SÛRÎYÊ8 DIDIN XWENDIN, DA KU HESTÊN CÎHADÎ LI CEM WAN GUR BIKIN.*



*VÎDYOYEK, ENDAMÊN ARTÊŞA TIRK DIYAR DIKE KU SÛRET EL-FETIH DI BIN NAVÊ "CÎHAD"Ê DE DIXWÎNIN JI BO TIRSANDINA SIVÎLAN LI BAKUR Û ROJHILATÊ SÛRIYEYÊ9.*

Li jêrê dê hin binpêkirinên ku lidar in werin pêşkêşkirin:

- **Di çarçoveya operasîyonên paqijkirina nijadî de.**

Rêjîma Erdogan komek tektîk û navgîn ji vê yekê re terxandin bi armanca kuştin, gihştina ziyana herî mezin li laş an giyanê niştecîyan û pêkanîna mercên jiyanê yên zehmet ji bo ku wan tune bike10 bi rêya dûrxistina niştecîyan bi kotekî ji deverên wan ber bi deverine din ve û rewakirina vê yekê bi rêya ragihandina "cîhadê" û handana li ser kuştina kurdan li pêş çavên berpirsên rêjîma Erogan û bi piştgirî û palpiştîya wan, li gel pêkanîna şaneyên veşartî yên girêdayî rêxistina Daişê ya terorîst ji çalakiyên kuştin û teqînan re di heman dema êrîşên artêşa Tirk ya dagîrker û çeteyên wê de. Malpereke ewlehî yê Israîlî – hevbendên Dewleta Tirk – amaje bi zêdebûna çalakîyên rêxistina Daişê ji destpêka êrîşa Tirkîyê11 ve kir û encama tekez dê qirbûna ber bi ber ji komeke etnîk a destnîşankirî be. Dixuye ku gelê Kurd di vê operasîyonê de armanca

[8] Kenala TRT Erebî; Quran berî Kaniya Aştiyê, dîroka weşanê 9.10.2019, lînk: https://www.youtube.com/watch?v=TgSd8X7W-0E

[9] Kenala Muxterb Niyûz li ser Youtube, endamên artişa tirk a Mihemedîli sûret el-Fetih guhdar dikin, dîroka weşanê 9.10.2019 lînk: https://www.youtube.com/watch?v=_v0YdKslA9c

[10] Sîstema Roma ya Bingehîn ya Dadgeha Sûcên Navdewletî; made 6, 7, 8.

[11] Navenda el-Melûmat der barê saloxgir û terorê de, nêrînek li ser cîhada navneteweyî (7-23.10. 2019), dîroka weşanê 28.10.2019 lînk: https://www.terrorism-info.org.il/ar

sereke ye; çimkî vîdyoyek ji artêşa Tirk ya dagîrker û çeteyên wê re ku tê de Kurdan tekfîr dikin, kuştinên meydanî yên ku li rêya navdewletî M4 pêk hatin ku Kurdên sivîl armanc girtin û bombebarandina tund ya bêserûber bi taybet bi ser bajrok û gundên Kurdî bû, vê aramncgirtinê destnîşan dikin. Li gel rijdîya rêjîma Erdogan li ser armancgirtina Kurdan di Hêzên Sûrîya Demokratîk de. Ev yek di daxuyanîyên Erdogan û hevkarên wî de xweş xuya dike çimkî gelek caran êrîşa xwe li dijî "Hêzên Kurdî" li gorî ku ew dibêjin didîtin anku barkirina rangê Kurdî li Yekîneyên Parastina Gel YPG yên ku Kurd beşekî ji şervanên wê pêk tînin; herweha ev yek di dagîrkirina wan ji herêma Efrînê re jî xweş xuya kir.

Tektîk û navgînên ku rêjîma Erdogan ji bo ajendeyên xwe yên girêdayî operasîyonên paqijkirina nijadî terxandin:

**1-Bombebarandina bêserûber û bikaranîna zêde ya hêzê.**

Gelek rêxistin, girûp û saziyên hiqûqî û çapemenî, hejmareke mezin ji qurbanîyên sivîl bi belge kirin, herweha bi dehan rapor û belgeyên ku vê yekê tekez dikin hene. Çimkî gereke bitenê li nexweşxaneyên Tiltemir, Heseke û Qamişlo û pêgehên nojdarîyê yên ku Heyva Sor a Kurdî amade kiribûn û lêpirsîna rewşa penaberan li bajar, bajarok û kampan, têrê dike da ku rastîya wan rapor û belgeyan piştrast bibe. Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk NRLS rewşa hin sivîlan şopand, qurbanîyên bombebarandina bêserûber û bikarînana zêde ya hêzê û hejmarek ji pêçekan (fayilan) di vê derbarê de hatin amadekirin û hin ji wan li ser malpera navendê hatin weşandin12.





[12] http://www.nrls.net



*Vîdyoyeke belgekirî bombebarandina bêserûber bi ser malên bajarê Serê Kanîyê û gundewarên wê de diyar dike13.*







*VÎDYOYEK, RÛXANDINA MAL Û MEWDANÊN SIVÎLAN PIŞTÎ BOBEBARANDINA WAN JI HÊLA ARTÊŞA TIRK A DAGÎRKER DIYAR DIKE14.*







*HEVDÎTINEK BI HIN XWEBEXŞÊN BIYANÎ RE YÊN TÎMÊN RIZGARKIRINÊ YÊN KU HEWL DAN ALÎKARÎYA QURBANÎYÊN ÊRÎŞA ARTÊŞA DAGÎRKERÎYA TIRK Û ÇETEYÊN WÊ, BIKIN; MEZNAHÎYA BOBELATA KU ÊRÎŞA ÇÊKIR, WESF DIKIN15.*

---

[13] Kenala Ronahî li ser Youtube, êrîşa Tirkiyeyê li dij bakurê Sûriyeyê. Dagirkeriya tirk di binpêkirina agirbestê de berdewam e û Serê Kaniyê armanc digire. Dîroka weşanê 19.10.2019 lînk: https://www.youtube.com/watch?v=5GuhV1qGBEs

[14] Kenala Hewar News li ser Youtube, bi wêne û vîdyoyan... rûxandin li Serê Kaniyê, dîroka weşanê 11.10.2019 lînk: https://www.youtube.com/watch?v=HsYdxi2-VNQ

Kenala el-Yewm, beşek ji rûxandina ku êrîşa Tirkiyeyê li dij Serê Kaniyê çêkir, dîroka weşanê 17.10.2019 lînk: https://www.youtube.com/watch?v=yIDqAZH1EmU

**2-Bikarînana çekên herî giran.**

Çekên rûxandina tevgir yên nûkler, çekên biyolojî û çekên kîmyawî di nav çekên kujer de cih digirin û bikarînan van çekan bi rêya hin rêkevtin û peymanên navneteweyî hatîne sînorkirin. Di çarçoveya alozîya Sûrîyê de û li hin deveran, gelek çek ku bi yên kîmyawî tên wesfkirin yên weke gaza kilorê, napalm û fosfora spî hatîne bikarînan. Birînên hin birîndarên sivîl, bikarînana fosfora spî ji hêla artêşa Tirk ya dagîrker ve di bombebarandina deverên bakurê rojhilatê Sûrîyê didin xuyakirin. Herweha hin birînên din, bikarînana çekên şewatker ku jêdera wan nayê nasîn didin xuyakirin. Riwangeha Sûrîyê ya Mafên Mirovan SOHR16 ji hêla xwe ve tekez kir ku agahîne belgekirî li gel hene ku bikarînana çekên qedexekirî li bakurê rojhilatê Sûrîyê ji hêla hêzên Tirk û komikên girêdayî wê ve piştrast dike. Herweha rêxistina Lêbrîna Giştî ya Navneteweyî17 ragihand ku biyangine xurt li gel hene ku pêkanîna artêşa Tirk û komikên Sûrîyê yên girêdayî wê ji binpêkirinên metirsîdar û sûcên şer re di êrîşa xwe de ya li dijî bakur û rojhilatê Sûrîyê piştrast dike û amaje bi wê yekê kir ku hêzên Tirk û hevbendên wan bi çavekî sivik li giyanên sivîlan dinêrin û êrîşine tund û nezagonî li dijî deverên niştecîyan pêk anîn û gelek sivîl kuştin û birîndar kirin. Herweha kuştina kesên bêçek bi xwîneke cemidî kiryareke hêjayî şermezarkirinê û sûcê şer dît. Rêxistinê doza rawestandina tundîyê û rêdana gihaştina rêxistinên hewarîyê li cem penaber û birîndaran kir.

[15]Aso Network govanên hin xwebexşan û tîmên rizgarkirinê li gundewarên Serê Kaniyê derbarê êrîşa Tirkiyeyê de, dîroka weşanê 19.10.2019 lînk: https://www.youtube.com/watch?v=t4cJiC4Z0bw

[16]Riwangeha Sûriyeyî ya Mafê Mirovan, "Riwangeh" raporine nojdarî ku bikarînana Tirkiyeyê ji çekên qedexekirî re li bakurê Sûriyeyê aşkere dike... û doza lêpirsîn û darizandina berpirsiyaran li civaka navdewletî dike, dîroka weşanê 26.10.2019, lînk: http://www.syriahr.com/?p=344051

[17] Amnesty International; Syria: Damning evidence of war crimes and other violations by Turkish forces and their allies; 18 October 2019; https://www.amnesty.org/en/latest/news/2019/10/syria-damning-evidence-of-war-crimes-and-other-violations-by-turkish-forces-and-their-allies/

*Vîdyoyek, kêliya bombebarandina malên bajarê Serê Kanîyê bi bombeyên fosforî diyar dike18.*



Bombeyên fosfora spî weke çekên şewatker tên dîtin û di laşê mirov de dibin sedema şewatên giran. Herweha bikarînana wan jî li ser asta navdewletî qedexekirî ye ji ber ku yek ji wan çekan e ku ziyaneke mezin digihînin laşê mironvan. Fosfora spî heybereke kîmyawî ya jehrî (mûmeyî û zelal) ye, bêhina wê weke bêhina sîran e, karliyekirina (rîakisyona) wê bi oksîcînê re ewrine tîr ji dûyên spî û gazine şewatker xwedî pileyine germahiyê ya bilind hildiberîne ku molekûlên wê şewatine kûr di tevnên zindî de çêdike û rengê wan bi ser zere ve diçe ji ber ku bi lez bi bezê laş re karliyekirinê (rîaksiyonê) dike. Ziyaneke mezin digihîne pergala helmijînê (bêhndanê) û bandorên wê yên neyînî li ser laşê mirov bi tevahî hene. Bombeyên fosforî ji çekên metirsîdar tê dîtin, bi piranî di salên Şerên Cîhanî yê Yekem û Duyem de hatin bikarînan19.

Rêya bitenê ya rawestandina bandora fosfora spî, cudakirina wê ji hewayê ye û rahiştina molekûlên wê yên bi laş ve ew jî bi rêya herêyê yan paçikekî şil û ji bo gazên wê bi rêya devpoşên guncaw e. Bombeya fosfora spî ji çekên şewatker yên qedexekirî tê dîtin ew jî li gor pênasekirina wan çekan ya ku protokola sêyem a rêkevtina Neteweyên Yekbûyî 1980 ya derbarê hin çekên asayî yên destnîşankirî de -madeya yekem20, raber

[18] Kenala Ehmed Sim`êla li ser Youtube, vîdyoya herî zelala ku bikarînana çekên fosforî li Serê Kaniyê diyar dike, dîroka weşanê 20.10.2019 lînk: https://www.youtube.com/watch?v=CKPyeCqcbxY

[19] Hin agahî derbarê fosfora spî de, Zanistnameya Weziwezi, lînk: https://weziwezi.com

[20] Komîteya Navneteweyî ya Xaça Sor, çekên normal- prorokola derbarê qedexekirin yan bisînorkirina bikarînana çekên şewatker de, protokola sêyem 10.10.1980, dîroka weşanê 21.11.2017 lînk: https://www.icrc.org/ar/resources/documents/treaty/ccw-protocol-iii-prohibiting-incendiary-weapons

dike. Herweha madeya duyem ji vê protokolê armancgirtina sivîlan bi van çekan, heger xaleke leşkerî jî li rex wan hebe qedexe dike. Peymana Mafên Mirovan, rêkevtinên Cînêvê û rêkevtinên din amajeyê bi pêwîstîya peydakirina parastinê ji sivîlan di dema şer de dikin.

Bi sedema bombebarandina fosfora spî ya artêşa Tirk ya dagîrker bi ser Serê Kanîyê de hejmarek sivîl birînadr bû. Ev yek binpêkirinek e ji peymanên navdewletî re û derbarê bêsûcan de sûcekî pîs e. Raporên çapemenîyê yên navdewletî amaje bi bikarînana artêşa Tirk ji fosfora spî re di topbarana bi ser bakurê rojhilatê Sûrîyê21 de kir. Li aliyekî din yek ji bijîşkên Nexweşxaneya Gel li Hesekê "Dr. Ehmed Sîno" ji Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk NRLS tekez kir ku birîndarên birînên şewata bi giştî, rû, dest û sîngê hatin nexewşxaneyê, ew şewat weke qateke reş bû û zehmetîyeke zor di rakirin û dermankirina wan de hat dîtin. Hêj nehatîye naskirin ku ev şewat bi sedema topan yan bombeyên şewatker an yên bi çekên kîmyawî barkirî ye, herweha tekez kir ku pêwîstî bi taqîkirin û şîkirinin taybet û hûr heye, lê li nexweşxaneyê û cihên nojdarî yên din peyda nabin

[21] em dikarin li hinan ji wan binêrin bi riya van lînkan:
https://www.newsweek.com/turkey-accused-war-crimes-suspected-white-phosphorous-chemical-weapons-use-against-kurds-syria-1466248
https://www.independent.co.uk/news/world/middle-east/syria-turkey-ceasefire-war-crimes-middle-east-a9161586.html
https://www.theguardian.com/world/2019/oct/18/un-investigates-turkey-alleged-use-of-white-phosphorus-in-syria
https://www.thetimes.co.uk/article/uk-sells-white-phosphorus-to-turkey-as-evidence-grows-of-chemical-attacks-on-kurds-72zx9ss87
https://foreignpolicy.com/2019/10/17/turkish-proxies-chemical-weapons-syria-kurds/
https://www.thesun.co.uk/news/10158211/turkey-napalm-white-phosphorus-kurds-syria/
https://anfenglish.com/features/footage-proves-turkish-use-of-chemical-weapons-in-northern-syria-38557
https://gulfnews.com/world/mena/kurds-accuse-turkey-of-using-banned-incendiary-weapons-1.1571549342800



*Yek ji birînên giran bi çekên şewatker, ji birîndarên li Nexweşxaneya Tiltemirê. Jêdera her du wêneyan Heyva Sor ya Kurd û malpera rojnameya The Times in22.*



*Yek ji qurbanîyên sivîl yên bi sedema çekên kujer ku artêşa Tirk a dagîrker bi kar anî, jiyana xwe ji dest daye. Jêder yek ji hemwelatîyên ku alîkarî di derxistina tirmên qurbanîyan de dikir.*

[22] The Times, UK sells white phosphorus to Turkey as evidence grows of chemical attacks on Kurds, https://www.thetimes.co.uk/article/uk-sells-white-phosphorus-to-turkey-as-evidence-grows-of-chemical-attacks-on-kurds-72zx9ss87






*Qurbanîyên çekên şewatker yên ku artêşa Tirk a dagîrker di êrîşa xwe ya li dijî bakurê rojhilatê Sûrîyê de bikar anî23.*






*HIN WÊNE JI VÎDYOYEKÊ, BIRÎNÊN BI ÇEKÊN ŞEWATKER KU RÊJÎMA ERDOGAN LI DIJÎ SIVÎLAN LI BAKURÊ SÛRÎYÊ BIKAR ANÎ, DIYAR DIKE24.*

[23] Radio Welat, Sûriye: Tirkiye piştî ku di dagirkirina Serê Kaniyê de bi bin ket, çekên ku li ser asta navneteweyî qedexekirî ne bi kar anîn. Dîroka weşanê 16.10.2019 lînk: https://www.youtube.com/watch?v=7257iO68H8g

[24] Alawite Muslim Defence League, Evidence of Chemical Weapons Used by The Erdogan Regime against Syrian Civilians, 21 Oct 2019, link: https://www.youtube.com/watch?v=nEYLdjcSPM0



*WÊNEYEK JI VÎDYOYEKÊ, GOTARA ÎNÊ LI DIBISTANEKÊ JI GUNDEWARÊ ROJHILAT BI ZIMANÊ TIRKÎ Û EREBÎ LI BAJARÊ SERÊ KANÎYÊ YÊ DAGÎRKIRÎ25 DIYAR DIKE. GOTARBÊJ HANDANÊ LI SER CÎHADÊ DIKE Û PESNÊ HEVKARÎYA CÎHADÎYÊN ARTÊŞA TIRK BI ARTÊŞA ISLAMÊ RE DIDE, HERWEHA TEKEZ DIKE KU EW HATÎNE VÊ DEVERÊ DA KU ISALMÊ BELAV BIKIN Û DEWLETEKÊ AVA BIKIN KU DI EDBIYATÊN WAN DE BI DEWLETA XÎLAFETÊ TÊ NASÎN. TÊ ZANÎN KU NIŞTECÎYÊN DEVERÊ MISLMAN IN Û PABANDÎ HER PÊNC HÊMANÊN ISLAMÊ DIBIN, JIYANA XWE BI RENGEKÎ AŞTÎYANE DIJÎYAN Û TU METIRSÎYÊ NE LI SER DEWLETA TIRK Û NE JÎ LI SER ISLAMÊ ÇÊ DIKIN. EV ÇETE GOTINA "OLA EFIYONA GELAN E" BI GEWDE DIKIN.*

Ji aliyekî din ve artêşa Tirk a dagîrker bi şandina inxîmasiyan, bi alîkariya şaneyên veşartî yên girêdayî dewleta Tirk û rêxistinê û kuştina meydanî ya sivîlan xwe sparte tektîkên rêxistina Daişê. Ev yek di kuştina siyasetmedara kurd "Hevrîn Xelef" û kesên pê re û kuştina hin sivîlên din li ser rêya navdewletî û li gundên Serê Kanîyê û Girê Spî diyar dibe. Li gel pêkanîna rêzeteqînan ku di encama wan de gelek sivîlan jiyana xwe ji dest dan. Dibe ku teqîna herî mezin teqîna ku Xwaringeha Omerî ya li taxa Xerbî li bajarê Qamişlo armanc girt ku xwaringeh li deverke xwerû sivîl e, tu navendên ewlehîyê yan yên leşkerî û ne jî siyasî nêzî wê nînin. Herweha heman tişt ji bo teqînên ku Bazara Navendî û Dêra Kildanan li Qamişloyê di 11.11.2019 de aramanc girtin, ew teqîn di heman dema gurbûna êrîşên artêşa Tirk ya dagîrker û çeteyên wê bi ser gundewarên Tiltemrê de rû da.

[25] Hemza Bîreqdar, xitbe û nimêja înê 15.11.2019 li gundewarê rojhilatê yê Serê Kaniyê, dîroka weşanê 15.11.2019 lînk:
https://www.youtube.com/watch?v=11uXCwScRZc







*Teqîna ku şaneyên veşartî yên girêdayî Daişê li pêş xwaringeheke gelêrî li Qamişloyê pêk anîn. Di heman dema ku artêşa Tirk êrîşî bajar û tevahiya bakur û rojhilatê Sûrîyê dikir26.*

*Teqîna ku şaneyên veşartî yên girêdayî Daişê li nêz zindana Xiwêran a ku hejmarek ji çeteyên rêxistinê tê de ne, pêk anî. Ew jî di heman dema êrîşa Tirkîyê bi ser bakurê rojhilatê Sûrîyê de27.*



*YEK JI TEQÎNÊN KU BAZARA NAVENDÎ YA TIJE SIVÎL LI QAMIŞLOYÊ DI 11.11.2019 DE ARMANC GIRT28.*

Di heman dema êrîşê de bi dehan vîdyoyên ku biçûkkirina kurdan û geflêxwarina bi kuştina wan û dîmenên lîstina bi termên wan diyar dikin hatin derxistin, bi armanca tirsandina sivîlan û koçkirina wan ber bi

[26] Kenala El-Xed, bibîne.. kuştina 3 kesan di encama teqîna siwareyeke bombebarkirî de li Qamişloyê, dîroka weşanê 11.10.2019 lînk: https://www.youtube.com/watch?v=C5isiNw7NRY

[27] Hawar News, teqîn li pêş zindaneke Daişê li bajarê Hesekê, dîroka weşanê 11.10.2019 lînk: https://www.youtube.com/watch?v=SV3UHper6rs

[28] Ajansa Nûçeyan ya Hawarê, hûrgiliyên teqîna Qamişloyê îro, dîroka weşanê 11.11.2019 lînk: https://hawarnews.com/ar/haber/

windabûnê ve da ku di civakên din de werin bişaftin û bi vê yekê faktorekî alîkar ji operasîyonên paqijkirina nijadî de peyda dibe. Lewre di hefteya yekem ya êrîşê de 300 hezar sivîl ji bakurê rojhilatê Sûrîyê29 penaber bûn. Operasîyonên paqijkirina nijadî zemîneke guncav e ji operasîyonên guhertina demgirafîk re amade dike û di encamê de çêbûna sûcê komkujîyê ku komeke niştecîyên ku li ser xaka xwe jiyan dikin aramnc digire welatîyên dewleteke din (Sûrîyê) ku hêj di peymana Neteweyên Yekbûyî de beşdar e û li ser imze kirîye û ev yek binpêkirin û derbaskirina peymanên navdewletî ye.

**Di warê pêvajoyên guhertina demokrafî de:**

Em dikarin hejmara kesên ku Tirkîyê ji destpêka êrîşên rêxistinên Daiş û Cebhetinisre û mîlîsîyên Ixwanî yên ku Tirkîyê û rêjîma Erdogan piştgirîya wan dikin û heya dagîrkerîya Efrînê û heya roja me ya îro ku hewildanên dagirkirina parçene bakur û rojhilatê Sûrîyê hene, ew koçber kirine bi du melyon mirov ku piranîya wan kurd in texmîn bikin. Her wiha bi hezaran jiyana xwe ji dest dan û bi hezaran bi birîn û astengîyên domdar birîbdar bûn. Jixwe tê zanîn ku valakirina herêmekê ji niştecihên wê yên resen –li gorî sîstema roma ya sereke ji bo dadgeha sûcên navdewlet – weke sûcekî li dijî mirovahîyê tê hesibandin û kiryarên ku di deverên dagîrkirî de tên meşandin dikevin di bin sîwana "sûcên cudakirina nijadperestî" de.

Her wiha bi van kiryaran re, samanên welatîyan ji xwe re dikirin xenîmeyên şer, rê li ber vegera sivîlan digirtin û dest bi guhertina nîşaneyên niştimanî yên herêmên dagîrkirî kirin, ew jî bi van rêyan: navê dezgeh û herêman kirin bi zimanê Tirkî û Erebî û encumeneke xwechî ku girêdayî Tirkîyê ye û di bin rêveberîya çeteyan de ye hat damezirandin. Erdogan di daxuyanîyek xwe de eşkere kir ku ew dê du melyon penaberên ku bi rêya levkirinên di navbera wî û rûsan de ji herêmên xwe (Deria, Xûta, Himis, Hema, Îdlib û Heleb) hatibûn qewtandin, di herêmê de bi cih bike. Jixwe tê zanîn ku ev herêma ku Erdogan armanc girtîye, berî niha di bin navê "Kembera Erebî" de ji hêla hikûmeta Sûrîyê ya faşîzm ve rastî

[29] Riwangeha Sûriyeyî ya Mafên Mirovan, penaberbûna zêdeyî 300 hezar kesî li bakurê rojhilatê Sûriyeyê ji destpêka êrîşa Tirkiyeyê ve, dîroka weşanê 20.10.2019 lînk: http://www.syriahr.com/?p=343023

guhertinên demografî hatîye. Wisa xuya ye ku pilanên rêjîma Erdogan jî bi wê pilana qirêj re, hemaheng in.





| | |
|---|---|
| *ERDOGAN DI CIVÎNEK NY DE NEXŞEYEKÊ JI BO AVAKIRINA HERÊMA BIEWLEH LI BAKURÊ SÛRÎYÊ PÊŞKÊŞ DIKE Û TEKEZ DIKE KU EW DÊ DU MELYON PENABERÊN BIYANÎ LI WIR BI CIH BIKE. 30* | *Kampa Serdem li Şehbayê, yek ji kampên taybet bi koçberên Efrînê yên ku ji hêla Tirkîyê û çeteyên wê ve ji malên xwe hatîbûn qewitandin û rê li ber vegera wan hatîbû girtin.31* |




*Piştî dagîrkirina Tirkîyê û çeteyên wê ji Serê Kanîyê re û pêngava yekem di warê guhertina nîşaneyên herêmê de, dadgehke leşkerî ya taybet bi çeteyan hat avakirin. Di wêneyê de diyar e ku navê dadgehê bi zimanê Erebî û Tirkî hatîye nivisîn.32*

Ji alîyekî din ve, Tirkîyê welatîyên xwe yên Tirk li dijî koçberên Sûrî yên ku li bajarên Tirkîyê bi cih bûne, gur kirin; di encamê de hinan ji wan jiyana xwe ji dest dan. Armanc ji vê yekê ew bû ku wan neçar bike da ku

[30] kenala RT arabic li ser Yûtyobê. Erdogan di Encumana Giştî de, pilanekê der barê herêma biewleh de li bakurê Sûriyeyê pêşkêş dike.
https://www.youtube.com/watch?v=EGYRxw0bTTY
[31] malpera ANHA: Rêveberiya Xweser alîkariya welatiyan dike da ku bandora dorpêçkirina rêjîma Sûriyeyê li ser Şehbayê sivik bike. Dîroka weşandinê, 14ê îlona 2019an e.
https://www.hawarnews.com/ar/
[3232] malpera Tirkiya ya bierebî. Desteya Berevaniyê ya Sûriyeya demkî, dadgeheke leşkerî li Serê Kaniyê ava dike. Dîroka weşandinê: 5. 11. 2019.
https://arab-turkey.com/2019/11/05

berê xwe bidin deverên ku rêjîma Erdogan dixwaze. Tevî ku ev zêdeyî salekê li ser dagîrkirina wê ji Efrînê re derbas bûye jî lê heya roja îro tu welatîyekî nikarîbû vegere mala xwe û samanên xwe vegerîne. Niha zêdeyî 600 hezar welatîyên ku koçber bûne di rewşine pir zehmet de ne. Ji bo herêmên rojhilatê Firatê yên ku ji nû ve hatîne dagîrkirin, tu hêvîyên niştecihên wan herêman yên kurd, Ereb û Ermen bi vegerê nînin.



*DESTWERDANA ALÎGIRÊN TIRKÎYÊ LI SER PENABERÊN SÛRÎYÊ Û SAMANÊN WAN, LI BAJARÊN TIRKÎYÊ.33*

Armanca rêjîma Erdogan ji pêşwazîkirina penaberên ku ew bi xwe sedema penaberbûna wan bû, bikaranîna enerjî û diravên wan û bikaranîna hinan ji wan weke çeteyên zanyar û çekdar bû û paşê jî pêngavinin bi armanca guhastina wan ber bi herêmine dûrî herêmên wan ên resen ve bû. Ev yek gotina Ebdirehmanê Kewakibî di yekê ji berhemên wî de tîne bîra me, ku wisa gotiye: "... Çewsandina bedbîn ne tenê weke hovên pêşîn yên ku mirov dikuştin û xwîna wan vedixwarin kir, lê belê sitemkarîyên cûr bi cûr kirin. Kesê çewsîner û zordar, girûpa xwe bi rêya zordarîyê dikuje û bi rêya desteserkirina saman û diravên wan, xwîna wan vedixwin û bi rêya bikaranîna wê girûpê weke karker di karê xwe de yan jî bi rêya destdanîna li ser berhema keda wan, temenê wan kin dikin. Bi vî

[33] kenala Tehtîm Elexbar li ser Yûtyobê. Xezeba tirkan li Eyûbiyê û qewitandina 639 sûriyan ji Orfayê. Dîroka weşandinê 1. 10. 2018.
https://www.youtube.com/watch?v=arLsN8-i7Vk
kenala Erebiyê ya li ser Yûtyobê. Dilgiranî û nerazîbûna şeqama Tirkiyeyê dijî penaberên sûrî. Dîroka weşandinê 9ê tîrmeha 2019.
https://www.youtube.com/watch?v=0OlG4eYllg0

awayî cudahî di navbera pêşî û paşîyan de ji alîyê şelandina temenan û wêrankirina giyanan, tune ye…" 34

**Bijardeyên serederîyê di gel binpêkirinên tawankirî re:**

Herêm bi giştî û Sûrîyê bi taybet di rewşine pir zehmet re derbas dibe; tê de kaxez li nav hev ketin û bi pêşveçûna helwest û têkeliyan re, nexşeya siyasî û leşkerî hat guhertin. Jixwe astengî û terajediya sivîlan her ew e (ewarebûn, jidestdayîna tiştên giranbuha yên mîna beden û saman û berdewamiya mirinê di xaka ku bi xêr û aşitîyê dihat naskirin). Van tiştan bi hev re encamek da, ew jî bobelat e. Ev rewşa han li ber çav û bêdengîya peyman û rêdanên navdewletî yên girêdayî mafê mirovan û aştî û ewlehiya navdewletî, pêk tê.

Desteserkirina herêmê ji hêla hejmarek hêzên navdewletî û herêmî ve tê parvekirin; hin ji van hêzan di bin sîwanên siyasî, leşkerî û aborî de ne. Rewşa navdewletî ne weke berê ye (berî 2010an). Ya ku vê rastîyê tekez dike ev sedem in: karîna Rûsîyê ku hebûna xwe ya leşkerî li Rojhilata Navîn bi cih bike; daxuyanîyên serokê Ferensî der barê mirina NATO ya di nav cihan de; serkêşîya Tirkîyê li hemberî nirxên adîyolojîya cîhanî û sozên xwe yên bi hevpeymanên xwe yên ewrûpî re; karîna hin rêxistinên tundrew û paşverû ku ew statûne xwebirêvebirinê yên xwecihî damezirînin û ji bilî van amaje û nîşaneyan. Di encamê de em li hemberî çend tewereyên nû yên xwedî bandor di siyaseta herêmî û navdewletî de ne, em dikarin van xetan wisa dabeş bikin:

-Xeta rêbazê xilafeta Islamî ya Sinî (Tirkiye vê xetê bi rê ve dibe).

-Xeta rêbazê xilafeta Islamî ya Şî'î (Îran vê xetê bi rê ve dibe).

-Xeta Hevpeymana Navdewletî ya li dijî terorê (Emerîka vê xetê bi rê ve dibe).

-Xeta kilasîkî (Rûsîya û Çîn) ku rûbirûyên aborî û gefên hevbeş ji hêla dewletên rojava û rêxistinên radîkal ve, wan digehîne hev.

Di germûgurîya rakêşan û dijhevîyên di navbera nav xetan de, zemîneke guncav ji bo destwerdana hin dewletan di kirîza Sûrîyê de,

[34] Ebdirehmanê Kewakibî " Tebai Elistibdad û Mesari Elistibad" hin peyvên erebî yên werger û weşandinê. Qahire, rûpel 54.

peyda bû. Ya ku van alîyan ji der ve digehîne hev şerê rêxistinên radîkal û parastina ewlehîya xwe ya neteweyî ye, lê di rastîyê de ew komployan li dijî hev ji bo parastina berjewendîyên xwe û misogerkirina desteserîya xwe, dirêsin.

Ji alîyekî din ve gelên herêmê hene; ev gel bi hemû rêbazan hewil didin ku xwe, nasnameya xwe û samanên xwe yên madî û çandî biparêzin. Di heman demê de çeteyên ku armanca wan xenîme û kuştin e, hene.

Danûstandinên van hêzan bi rêya dijberî û têkelîyan, bandor bi awayekî ayînde li ser guhertina nexşeya siyasî û leşkerî ya herêmê kir. Jixwe yê ku baca vê yekê dide welatî ne ku niha di rewşeke pir zehmet û bobelateke rasteqîn de dijîn. Herêmên bakur û rojhilatê Sûrîyê beşeke jîndetî ji vê herêmê ne ku cihekî girîng di hisabên van xet û hêzan de girt. Her yekê ji van hêzan ew li gorî ejindeyên xwe çi yên aborî bin çi jî yên bawermendî bin, girîng didît. Lê xeta ku herî bêhtir girîngî da vê herêmê (bakur û rojhilatê Sûrîyê), xeta rêbaza xilafeta Islamî ya sinî bû. Vê tewereyê hemû hêza xwe li dijî niştecihên herêmê bi kar anî û ji 2011an ve êrîşên xwe bi ser herêmê de ranewestandine. Vê xetê di êrîşên xwe de xwe dispart ejindeyên bawermendî û aborî. Bawermendîya wan ew e ku herêmê dagîr bikin û paqijkirina nijadî û guhertina demografîk pêk bînin; armanc ji vê yekê ew e ku peymana Milî ya Osmanî pêk bînin û li gorî hişmendîya xwe xilafeteke Islamî damezirînin. Tecrubeyeke wan di statûya Daişê de hebû ku ev statû piştî çend salan rastî têkçûn û hilweşînê hat. Tirkîyê jî – weke bersivekê ji vê hilweşînê re – însyatîv girte xwe û dest bi pêvajoyên leşkerî yên hovane li dijî niştecihên herêmê û bi alîkarîya hêzên di bin xeta xwe de, kir. Ev operasyon bi dagîrkirina Efrînê û qewitandina niştecihên resen û avakirina mêtingehan ji bo girûpên girêdayî xwe, dest pê kir.

Piştî ku Tirkîyê piştrast bû ku operasîyonên paqijkirina nijadî û guhertina demografîk li wir baş bi rê ve diçe, di 9. 10. 2019an de, dest bi operasîyoneke berfereh li bakur û rojhilatê Sûrîyê kir. Xwe di vê operasîyonê de sipart çekên xwe yên pêşketî û bi alîkarîya Qeter, girûpên Ixwan Elmislimîn, Cebhetnesre û Daişê. Di encamê de bajarên Serê Kanîyê û Girê Spî û beşeke berfereh ji gundewarên wan desteser kirin, rûxandin û xirabî bi ser herêmê de anî û bi sedên hezaran koçber kirin û gelek kuştin. Erdogan bi awayekî fermî ragehand ku ew dê du melyon penaberên Sûrî li

wir bi cih bike; jixwe tê zanîn ku ev kesên ku tên li herêmê bi cih bibin, xanî û samanên wan li deverine din ji xaknîgarîya Sûrîyê berê hene û ew dixwazin vegerin malên xwe. Dagîrkirina Tirkîyê ji herêmên ewleh yên bakurê Sûrîyê re, bû sedema bobelateke mirovahî ya rasteqîn; vê bobelatê gelek kuştin, revandin, koçberkirin û şelandina samanan bi xwe re anî. Ev yek jî çanda nehezkirinê gur dike; lewma dibe ku ev yek weke hewildanekê be da ku tovê nehezkirinê li herêmê biçîne û vê yekê di paşerojê de ji bo ejindene din bi kar bîne ku tê de xwe bispêre tolhildana nevîyan ji kujerên bapîran. Bi vî awayî jî bihêle tundî û dijberîya li beramberî hev misoger bimîne û rêxistina ewlekarîya mirovahî di rewşeke tevlîhev de bimîne û bi vî awayî mayîna tundî, nezanî û xizanîyê misoger bibe. Di encamê de faktorên mayîna desthilatdarî û kolekirinê misoger bibin. Ji lew re çi ramanên ku xwe ji vê çandê dûr nexin, dê bibin ardû û agirê vê bobelatê gurtir bikin û temenê wê jî zêdetir bikin.



محور نهج الخلافة الإسلامية السُنية.
- الدولة التركية؛ كزعيمة المحور.
- مشيخة قطر.
- تنظيم داعش.
- جبهة النصرة والميليشيات التابعة لها.
- جماعة الإخوان المسلمين.
- تنظيم القاعدة.



محور نهج الخلافة الإسلامية الشيعية
- الجمهورية الإسلامية الإيرانية؛ كزعيمة لهذا المحور.
- حزب الله اللبناني.
- الحشد الشعبي العراقي.
- تنظيم أنصار الله الحوثي.
- الجماعات السياسية والعسكرية الشيعية المنتشرة حول العالم



محور التحالف الدولي لمحاربة الإرهاب.
- وتضم الولايات المتحدة الأمريكية، كزعيمة لهذا المحور؛ ومجموعة من الدول الإسلامية والغربية والقوى المحلية التي تجمعها مصالح وتهديدات مشتركة.

**Xeta rêbazê xilafeta islamî ya sinî:**

-Dewleta Tirkîyê (weke serkêş).

-Şêxên Qeterê.

-Daiş.

-Cebhetilnesre û mîlîsiyên girêdayî wê.

-Koma Ixwan Elmislimîn.

-Rêxistina Elqaide

**Xeta rêbazê xilafa Islamî ya şî'î:**

-Îran (weke serkêş).

-Hizbulaha libnanî.

-Heşda Şabî ya Îraqî.

-Rêxistina Ensarulah ya Hûsî.

-Girûpên siyasî û leşkerî yên şî'î yên ku li cîhanê belav in.

**Xeta Hevpeymana Navneteweyî ya li dijî terorê:**

-Emerîka (serkêş).

-Hejmarek dewletên Islamî û rojavayî û hêzên xwecihî yên ku berjewendî û gefên hevbeş wan digehîne hev.

Pêwîstîya berxwedana li dijî ejindeyên xeta ku Erdogan serkêşîya wê dike, bi zêdekirina çalakîyan li ser asta diplomasî, mafî, ragehandinî, xizmetguzarî û berevanîyê, heye; lê belê pêwîstî bi pêşxistina van çalakîyan jî heye; mînak li ser vê yekê alîyê diplomasî ye; di alîyê diplomasî de berpirsyarên bakur û rojhilatê Sûrîyê ji bo ku sivîlan biparêzin, xwe gehandin kongirês û rêveberîya Emerîkî û gehaştin levkirineke lewaz bi sponserîya Emerîkî ji bo rawestandina şer; her wiha bi rêveberîya Rûsî re jî gehîştin levkirinrkê derbarê agirbestê û vekirina rê li pêşîya artêşa Sûrî da ku li ser sînor belav bibin. Di heman demê de gelek helwestên navdewletî yên ku destwerdana Tirkîyê û çeteyên wê di herêmê de napejirînin, derketin holê. Tevî ku van çalakîyan karîbû pêla êrîşên Tirkîyê û çeteyên wê kêm bike jî lê wan nikarîbû dagîrkirina wan ji Serê Kanîyê û Girê Spî re rawestînin û nikarîbûn bandorê li biryara NY bikin da ku Tirkîyê neçar bike ku êrîşên xwe û binpêkirinên peymanên navdewletî, rawestîne. Ji ber ku xeta Erdogan jî –weke Daişê – êrîşa xwe bi binpêkirina sînorên navdewletî

û ziyangehandina sivîl û artêşa dewletek cîran, dest pêk kir. Xuya ye piştî ku Erdoga li ser rêveçûna pêvajoyên paqijkirina nijadî û guhertina demografîk piştrast bibe û bargehan ji artêşa xwe re û mêtingehan ji çeteyên xwe re li herêmê ava bike, dê dest bi qonaxeke nû ya ejindeyên xwe bike.

Diplomasçîya bakur û rojhilatê Sûrîyê bi awayekî giştî xwe spart sê tiştan; pirêza paqij ya QSDê di şerê teror û ramanên tundrew de, rewşa ewlehî û aştîyê ya ku herêm tê de dijîya û rewşa bexşana olî û aştîya xwecihî di navbera regezên neteweyî yên cihêreng yên ku li herêmê dijîn. Lê dixuye ku ev yek têrê nake da ku pilanên rêjîma Erdogan rawestînin! Ji ber vê jî dibe ku pêwîstî bi bijardene nû hebe, dibe ku ya herî girîng di nav van bijardeyan de diplomasîya rêdanan û girêbestan be; pêwîstîya vê yekê jî bi naskirina ejindeyên dewletên bibandor di herêmê de heye û sûdwergirtina ji nakokî û dijberîyên ku li hemberî wan derdikevin; nemaze ji ber ku gelek samanên xwezayî û herêmine stratejîk di bin serwerîya Rêveberîya Xweser de ne; her wiha hêzeke wê ya leşkerî ya rêxistinkirî ku pabendî nasnameya niştimanî ya sûrî ye, heye. Eger levkirineke dadmend bi desthilata navendî ya Şamê re were pêkanîn û karînên diplomasî pê re li sazî û rêxistinên navdewletî werin hevrêzkirin – ji ber ku Sûrîyê hêj endama NY ye – dê bandoreke wê ya berbiçav hebe.

Bi giştî eger karînên diplomasî ji bo rawestandina zincîra binpêkirinên ku der heqê niştecihên herêmê de tên kirin, kar bikin û hêzên dagîrker neçar bikin da ku xwe ji herêmê vekêşin, dê baş be. Ew jî bi rêya komkirina mezintirîn fişara navdewletî, herêmî û xwecihî li ser rêjîma Erdogan.

**Bûyerên dawî yên ku bi êrîşa Tirkîyê bi ser bakur û rojhilatê Sûrîyê de hatin gelek mijar bi xwe re derxistin holê, ji wan jî ev in:**

- Gelek armanc ji nîvvekişandina hêzên Amerîka û koalisyonê ji bakur û rojhilatê Sûrîyê û bicihbûna wan li herêmên petrolê hene, yên herî berçav jî rakirina metirsîyên dewleta Tirk û angaştên wê ku dewletên rojava komplo li ser kirine, di heman demê de guhdana herêmên petrolê û nehiştina komeleyên radîkal jê re, her wiha rêgirtina li ber berfirehbûna Îran û Rûsîya li wan herêman. Li kêleka wê jî da ku ji xwe re

bike mîna fişarekê ku destkevtîyên aborî di dema jinûavakirina Sûrîyê de bi dest bixe. Her wiha anîna hêzên Rûsîyayê ji wê herêmê re da ku bibin veqetandinek di navbera hêzên dewleta Tirk û çeteyên wê û hêzên koalisyonê de. Û bi awayekî neyekser nehiştina rêjîma Erdogan ku xêzên sor ê li gorî bernamicê karên Amerîkî û Rojavayî.

- Wargirtina milîsên çete di herêmên dagîrkirî de û belavbûna artêşa Sûrîyê li herêmên ber xetên şer dê hevkêşeyên leşkerî nû derîne holê, ya herî berçav jî ew e belavkirina hêzan li herêmine berfireh û piştre jî jihevketina wê û nekarîna wê li ser parastinê, her wiha veguherandina wê ji armancine ku têkbirina wan hêsan be. Di heman demê de dê rewşa hêzên êrîşker baştir be di êrîşa bi ser Idlibê de û parastina wê lewaz be. Ji alîyekî din ve bijardeyeke mezin heye ku QSDê li enîne din li dijî hêzên komên çeteyan yên dewleta Tirk li herêmine din veke ku balafirên Tirk nikaribe alîkariyê bide wan çeteyan.
- Hebûna Rûsî di rojhilatê Firatê de tê de hevrêziyek bi QSDê re heye, ew jî ji ber hin sedeman e, ya girîng jî ew e ku Rûsîya nikare herêmê ji alîyê ewlekarî û siyasî ve mîna QSDê û Hêzên Ewlekarîya Hundirîn (Asayîş) bi rê ve bibe, taybet di alîyê xebatên ji bo şaneyên veşartî yên komên radîkal de ku wan tune bike û rê nede wan ku careke din derkevin. Di heman demê dibe ku mîna hêzên bejahî li ser xakê pê were piştrastkirin ku piştre artêşa Sûrîyê dest ji hêzên bi Komara Islamî ya Îranê re heval in berde. Li kêleka wê jî ji nû ve vejîna artêşa Sûrîyê di dema ku QSDê tevlî nava wê bibe, çimkî hemû şervanên wê hemwelatîyên Sûrî ne. Ji alîyekî din ve gelek herêmên petrolê di bin kontrola QSDê de ne ku dibe ku piştgirîyê bide ji nû ve avakirina welat ku beşgehên Rûsî çavên xwe berdane pareke mezin jê. Û gengaz e ku Rûsîya herêmên mîna kaxiza fişarê yan jî şantajkirinê bi dewleta Tirk û Îranê re bi kar bîne û hêlîna gelêrî ya bi demokratîya rojavayî re lewaz bike.
- Dewleta Tirk, Komara Islamî ya Îranê û rêjîma Be'es ji alîyê rêgez ve ji bo qirkirina Kurdan lihevkirî ne, lê belê ew ji alîyê bawerîyê ve pilanan li hevûdin girêdidin û nakok in, ango ramana qirkirina kurdan wan dike yek û hişmendîya wan ya paşverû û radîkal wan ji hev dûr dixîne. Têkelîyên ewlekarî di navbera dewleta Tirk û ya Sûrî de der barê doza Kurdî de hene, hevpeymana Adenê (1988) weke tewereya van têkelîyan tê dîtin.

Û wiha tê diyarkirin ku pilanên Tirkîyê di herêma dagîrkirî de ji alîyekî ve xizmeta projeya "Kembera Erebî" li dijî Kurdan dike, her wiha dûrxistina komên çete û malbatên wan ji herêmên stratejîk yên ji rêjîmê re girîng in û rojavayê welat (Sûrî sûdgirtî ye).

Lê belê metirsîyên rêjîmê ew e ku samanên welêt ji dest wî herin. Ango alîyên nijadperest di nav rêjîma Sûrîyê de guhartina demografîk û qirkirina nijadî erê dikin û di heman demê de dagîrkerîyê jî red dikin, di destpêkê de dibe ku ev karê Rûsîya be. Her wiha têkbirina Rêveberîya Xweser li bakur û rojhilatê Sûrîyê armancekî hevpar yê her du dewletan û rêxistinên din e, li vê zêde jî xwesteka tunekirina çete û tundrewan bi şerên bi QSDê re heye, ev yek di dema girtina artêşa Tirk ji sînor re li pêşîya çeteyan di dema êrîşa dewleta Tirk li ser bakur û rojhilatê Sûrîyê de hat diyarkirin. Gelek ji wan bi xenîme û horîyên piştî mirinê hatin serdebirin, ew hemû bûn mertalên mirovî ji artêşên dagîrkerîyê û êrîşkeran li dijî welat û civakên wan re, nirxandina herî nêzî vê yekê jî xiyaneta bi nasnameya niştimanî re ye.

Ji alîyekî din ve jî artêşa Sûrî hîn jî cebilxaneya xwe ya moşekan parastîye, dikare ku artêşa Tirk neçar bike ku êrîşa xwe li ser niştecihên herêmê rawestîne û ji herêmên dagîrkirî vekişîne, li kêleka wê jî dikare ku çekên tektîkî bide QSDê û şerekî mezin li dijî artêşa Tirk u çeteyên wê dest pê bike; çimkî rewşa hundirîn a Tirkîyê nikare şerekî derveyî û berfireh an jî gelek ziyanên mirovî û madî xwe li ber ragire.

Erdogan nehametê ji ber pirsgirêkên hundirîn dikişîne, gelek veqetandin di nava partîya wî de hene û pevçûnekê bi hêzên Îdyoloja Cîhanî re dike, û nerazîbûna ji hewldanên wî ku deshelatîya bi tenê li welat bixe destê xwe, li kêleka wê jî alozîya aborî ku Tirkîyê kevtîyê û bibinketina di hilbijartinên şaredarîyê li Stenbolê, pirêza reş derbarê mafên mirovan de yê desthilatê û geşedana alîyên tundrew ku nema kontrol li ser tê kirin. Her wiha ketina di şerên derve de û dagîrkirina parçeyan ji xaka welatekî din, bilindbûna nearamîyê bi Misir, Yûnan, Qubris û Erebistana Siûdî û destwerdana neyînî di şerê navxweyî yê Lîbiyayê de û windakirina gelek hevalbendan, li kêleka wê jî neerêkirina dewletên Ewropî û Rojavayî ji gelek siyasetên wî yên hundir û derve de;

Her wiha serkevtinên wê di hin şeran de nayê wateya tunebûna şer, wan aştî nanîn herêmê û di wir de bû beşekî mezin ji pirsgirêkê. Diyar e ku siyaseta lihevxistina kaxezan û beza berev pêş bijardeya yekane ye li pêşîya Erdogan, bi awayekî diyar dibe ku çarenûsa tewereya rêbaza xilafeta Sinî girêdayî hebûna Erdoganê ku Tirkîyê veguherandîye dewleteke radîkal û bi çanda nefretê ye. Windabûna Erdogan tê wateya hilweşîna vê rêbazê û derketina pevçûneke zor û gelemşeyekê di Tirkîyê de di navbera alîgirên wî yên tundrew û rikberên wî yên cîhangîrî û xwedî idyolojîya cîhanî de. Parçebûneke Idolojî di navbera hêzên siyasî yên sereke di Tirkîyê de heye û her yek ji wan projeyeke wê ya taybet ji dewleta Tirkîyê re heye;

Partîya Gelan a Demokratîk HDP ya rikber û xwedî ramanên çepgir e projeya Tirkîyeke cîhangîr û demokratîk pêşniyar dike niha serokê wê yê berê "Seaheddîn Demirtaş" bi fermana Erdogan di zindanê de ye. Her wiha partîya Delan a Komarî CHP ya rikber ku demeke dirêj hegemonîya xwe bi serokatîya damezirînerê wê Mustefa Kemal Ataturk li ser Tirkîyê bi rê ve bir, projeya Tirkîyeke cîhangîr (zanistperwer) bi rengekî neteweperestîya Tirk pêşniyar dike. Lê belê Partîya Tevgera Neteweyî MHP a faşist û hevkarê Erdogan di hukûmetê de projeya Tirkîyekê ji Tirkan tenê re pêsniyar dike, her wiha Partîya Edalet û Geşepêdanê AKP ya serdest ku Erdogan serokatîya wê dike projeya Tirkîyeke Islamî ya radîkal pêşniyar dike. Ev yek e ku rê li pêşîya şerekî navxweyî li Tirkîyê vedike. Tê zanîn ku Erdogan xwedî artêşek ji çeteyên tundrew e (Cêş El-Wetenî – Cebhet El-Nusra ya berê – endamên rêxistina Daiş'ê û koma Ixwan El-Mislimîn).

Ev yek dibe ku tu kilîtên kontrolkirina wê di destê Rêveberîya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûrîyê de nebe, lê belê dikare bandorê lê bike ku hemû pilanên Erdogan yên derve li dijî herêmê bi çi awayî be têkbibe, û heger jî jiberdanên mezin bêtin xwestin, ji xwe ev yek li gel Rêveberîya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûrîyê heye.

Yek ji sedemên sînorbirîn û destdirêjîya Tirkîyê di êrîşa xwe ya li ser bakur û rojhilatê Sûrîyê nepêkanîna QSDê ji stratejîyên zordar li ser artêşa dagîrkerîya Tirkîyê û avakirina hevsengîyeke tirsê pê re bû, bi rêya lêxistina dijmin di nava wî de û pêkanîna heman tiştî pê re û wergirtina

çekên kujer, her wiha bikaranîna hevkêşeyên leşkerî ku ne di hesabên dijmin de ye bi rêya danîna pilanên saloxgêrî û pêşxistina têkelîyên leşkerî berîya wê bi hêzeke din ku pirsgirêkên wê bi dewleta Tirk re hene. Ev yek dibe ku vedigere rêzgirtina QSDê ji yasa û hevpeymanên şer yên navdewletî û yên mirovî û hewldana ku nehêle Kurd careke din veguherin qurbanên şerê di navbera Sine – Şî'a de û başdîtina bijardeya siyasî ji ya leşkerî bêhtir. Dibe ku ev yek ya herî li pêş be ku rê li pêşîya bicihbûna hêzên Rûsî û Sûrî li seranserî sînorê bakurê Sûrîyê veke û piştgirîya gotûbêjê bi desthelata navendî ya Şamê re bike û nîvegera hêzên Amerîkî yên ku xwe vekişnadibûn û di cihên jiyanî de bi cih bibin. Li kêleka wê jî amadekirina dosyayên ku binpêkirina artêşa Tirk û çeteyên wê ji yasa û hevpeymanên navdewletî û yên mirovî re û pêşkêşkirina wan ji desteyên yasayî yên navdewletî re. Parastina rewa mîna stratejîya leşkerî li dijî êrîşê ji xwe bingeh girt.

Êdî raya giştî ya cîhanî nas dike ku rêjîma Erdogan sûcên dijî mirovahîyê û sûcên şer di êrîşa xwe ya li ser bakurê Sûrîyê de kirine û armanca wî dagîrkirina herêmê û guhdana rêxistinên tundrew û nehiştina tunebûna wan e. Û gelek hevpeyman û rêkevtinên navdewletî hene ku dikarin hesab ji rêjîma Erdogan bixwazin, lê belê diyar e ku vîna navdewletî niha jê re neamade ye, sedem jî dibe ku di têkelîyên navdewletî de ye, yan jî rê li pêşîya pêkanîna gelek binpêkirinan vedikin ku rêjîma Erdogan di nava xirabîya kiryarên wê de noq bikin.

Bi tevî ku bi dehan bûyerên ku van binpêkirinan bi belge dikin hene, lê belê bêdengîya navdewletî û nexwestina destwerdanê gelek pirsan li ser rehendên navdewletî derdixe pêş, ev yek komkujî û binpêkirinên di dema şerê cihanî yê yekem ku di encama wê de herêm tûşî parçekirina bi ser gelek statûyan vebû tîne bîra me, wiha hat diyarkirin ku ew li gorî daxwaza gelên herêmê bi jiyankirina di hundirê dewleta ku dixwaze pêk hatîye. Û tevî koçberkirina Kurdan berev başûr û avakirina wargehan di herêmên vala de xizmeta projeya nijadperest a kembera Erebî dike.

Lê belê Erdogan bi kêfxweşîyê hest dike, ji ber ku hevpeymana Milî bi temamî pêk tê û diyar e ku çarenûsa herêmê li ser vîna dewletên mezin sekinîye. Di vê çarçoveyê de diyar e ku paradîgmaya Neteweya Demokratîk ya ku dijî dogmatîzim, nijadperestî û faşistê ye û banga

biratîya gelan, rêgezên demokrasîyê û jiyana komînal di navbera civakên cuda de dike, bijardeyeke stratejîk e ji hewandina van hemû nakokîyên demdirêj, xurtkirina aştîyê û çareserkirina bandorîyên pilanên komloger re. Û mîna rewşeke aramî, ewlehî û berevçûneke azadîyê di çarçoveya nirxên sincî ku gelek herêmên bakur û rojhilatê Sûrîyê jiyan kirîye mîna piratîka vê bijardeyê.

Di sedsala bûrî de Islama Siyasî di bin navê Kembera Kesk de li dijî berfirhbûna Komunîstê û şerê li dijî Yekîtîya Soviyetê hat bikaranîn. Û diyar bû ku pêwîstî bi hewandina Islama siyasî hebû piştî ku ji bin kontrolê derket, her wiha xwesteka veberhênana wê ji bo desthilatdarîya li ser herêmên nû û lawazkirina dijberan hebû. Diyar e ku rêgezên demokrasî û cîhangîrîyê (zanistperweriyê) bijardeyên baş ji bo tunekirina tundrewîyê ne, taybet ku niştecihên herêmê di bin sîya hukûmetên sitemkar de jiyane ku siyaseta wan bû sedema berdewamkirina hejarî, paşverûtî û kêmbûna rajeguzarî û guhdanê.

Pê re jî û bi rêya şopandina têkelîyên nearam di navbera komên radîkal yên cihêwaz de em dibînin ku pevçûneke bawermendî di navbera alî û ayînzayên (mezhebên) Islamî yên cihêwaz de heye û ne xerîb e ku xeta neteweperestî bi tevî ku di nava xeta olê de winda bûye jî careke din ku derfetê bibîne derkeve. Taybet ku dagîrkirina Tirkîyê ji bakurê Sûrîyê re gefê li ewlekarîya neteweyî ya gelek statûyan dixwe, mîna ewlekarîya neteweyî ya Erebî, ev yek me di şermezarkirina Kombûna dewletên Erebî ji êrîşa Tirkîyê li ser bakurê Sûrîyê re dît, her wiha gefxwarina ji ewlekarîya neteweyî ya civakên resen di herêmê de ku xwe li olên Islam û xiristîyanîyê girtine yan jî ayînzayên (mezhebên) Elewî, Isma'îlî, Dirzî û Şî'î.

Dibe ku ev yek sedemek be ji bo tevlîbûna zarokên van pêkhateyan di nava QSDê de û dayîna qurbanîyan li hemberî êrîşa dewleta Tirk û çeteyên wê, taybet ku ev pêkhate berê tecrubeyeke wan a nexweş bi sultanên Osmanî bav û kalên rêjîma Erdogan re heye. Ji alîyekî din ve jî berjewendîyên stratejîk yên dewletên mezin mîna Rûsîya, Fransa, Mîrnişîna Yekbûyî, Almaniya, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, Komara Islamî ya Îranê û Çînê û diyar e ku ew desthilatdarîya dewleta Tirk ji herêmên jiyanî re ku berjewendîyên wê diparêze nepejirînin. Li gorî ku me anî zimên, QSDê serê şûr e di çi hevkarîyekê li ser asta herêmî yan jî

navdewletî de ku desthilatdarîya Tirkîyê di herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê de taybet û di Sûrîyê de bi giştî de bêbandor bike. Tê zanîn ku lihevkirina dewleta Tirk bi Rêvebrîya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûrîyê re dê gelek destkevtîyên girîng ji dewleta Tirk re anîbûya û dê piştgirîyeke rast bidaya ewlekarîya neteweyî ya ku tê gotin, her wiha dê aştî û aramî di herêmê de xurt bikirana û dê jiyana bi milyonan niştecih rizgar bikira û çanda nefretê tune bikira.

Di destê Rêveberîya Xweser de ne kaxizên fişarê, lê belê kilîd hene, ew dikare – û ev yek tekez kir jî – ji nû ve nexşeya siyasî û leşkerî di herêmên bakur û rojhilatê Sûrîyê de çêbike û bi temamî insiyatîfê di çalakîyên diplomasî de li ser asta leşkerî bigire dest. Û hewl dide ku destkevtîyên siyasî bigire dest ku hevsengîyê bi binkevtîyan re di dema dirêj de pêk bîne. Her wiha tunekirina Rêveberîya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûrîyê bi temamî salên dirêj jê re divê; çimkî bingehekî wê yê gelêrî û sazîyên wê yên çalak li ser xakê hene.

Hevpeymana wê ya civakî bawerîya hemû pêkhateyên herêmê stand û wek baştirîn bijadre ye ji wan re li beramberî ku dewleta Tirk, komên tundrew û rêjîma Be'es ji stemkarî û binpêkirina pêşkêş dikin û wan ew hemû bi kar anîne. Û ev yek binkevtina mezin a desthilatîyên Tirk, Sûrîyê, Îranê û Rûsîya ji bo arandina pêhkateyên herêmê li dijî Rêveberîya Xweser a bakur û rojhilatê Sûrîyê bi rêya şerê taybet û çalakîyên terorîst ku şaneyên wan ên razayî pêk tanîn dide diyarkirin; lewre tu rêbaz ji bilî destwerdana leşkerî bi awayekî yekser di herêmê de ma û ev yek em di êrîşa dewleta Tirk û çeteyên wê li dijî bakur û rojhilatê Sûrîyê dibînin.

Madem ku hîn artêşa dagîrkerîya Tirkîyê li ser êrîşkirina niştecihên bakurê Sûrîyê û li ser proseyên qirkirina nijadî û guhartina demografîk rijd e, ya bi sûd ew e, ku komîteyên huqûqî, alîkarî û ragehandinê ku di karên xwe de pispor in werin avakirin da ku hemû binpêkirinan bi belge bikin û gilîyan amade bikin û pêşkêşî desteyên dadmendî û komeleyên mafên mirovan yên navdewletî bikin, li kêleka wê jî kiryarên artêşa dagîrker ya Tirkîyê û çeteyên wê di hemû torên medyaya civakî û dezgehên ragehandinê de bihetikînin û niştecihan li ser metirsîyên rêjîma Erdogan perwerde bikin û rastîya wan eşkere bikin, ev yek dihêle ku şaneyên veşartî yên girêdayî hêzên êrîşker eşkere bibin û li dijî şerê taybet yê ku bi

rê ve dibe, li ber xwe bide. Taybet ji ber ku dewleta Tirk artêşeke elektronîkî xistîye xizmetê de ku êrîşa xwe li ser niştecihên herêmê spî bike, her wiha gelek vîdyoyên ku li ser torên medyaya civakî bibûn binpêkirinên ku endamên wê li dijî niştecihên herêmê bi belge bikin.

Ji alîyekî din ve gerek e ku sivîl di dema êrîşê de werin parastin; çimkî êrîş ji bo amadekirina zemînekê ji pêkanîna qirkirina nijadî û guhartina demografîk pêk hatîye, lewre pêwîst e, ku amadekarîyên pêwîst ji bo êrîşeke pêşbînîkirî din di herêmên din de werin kirin, ew jî bi rêya peydakirina herêmên biewle û peydakirina amûrên lojîstîk û alîkarîyê ku dikare guhdana kesên koçber bikin, ev yek dihêle ku fişar li ser hêzên berxwedêr kêm bibe û nermahîyê dide pêkanîna çalakîyên wê. Her wiha jî mitmane bi bîrûbawerîya leşkerî di ser mezindeyên şer yên newekhev ji sûdwergirtinê ye tevî bikaranîna xaknîgarîyê û kûrhîya stratejîk û amadebûna giştî ji bo pejirnadina têkçûnan û wergerandina wan têkçûnan weke "Têkoşîna pîroz" bi nav bikin, ew jî ji bo şerê li dijî dijminên ku di alîyê teknolojîya de pêşketîtir in. Alîyê olî mîna ayînzaya (mezheba) sereke di bawerîya şer ya rêbaza xilafetê tê dîtin, ev yek bawerîyeke têr geşbûna tundrew e. Yek ji rêyên sekinandina vê mijarê bilindkirina berxwedanê û bêhtir bidin hêzên êrîşker e.

Bi tevî pêşketina teknolojî ya hêzên êrîşker, hêzên parêzvanên niştecihên bakur û rojhilatê Sûrîyê  karîna xwe bi guncandina li gorî operasîyonên leşkerî yên dijber û danîna stratejîyên leşkerî yên guncav tekez kir, ev yek zelal diyar bû di danîna stratejîyên ku di parastina li hemberî êrîşên dagîrkerîya Tirk û çeteyên wê û dûrketina ji şerê singûsing bi dijmin re ji bo nirxandina karînên dijmin, stratejîyên wî yên leşkerî û berfirehkirina herêma ku tê de belav bibe da ku tektîkên segvanîyê û armancgirtina xalên bicihbûna wî da ku wan bikişînin dafan (kemîn), ew jî bi armanca westandina hêzên êrîşkar û bihêle ku di tirseke demdirêj de bijîn ta derketina hevkêşeyên din yên leşkerî û siyasî ku dibe artêşa dagîrkerîya Tirkîyê û çeteyên wê xwe ji herêmê vekişînin. Tê zanîn ku ji vê tewereyê re binkevtinên wê di Sûrîyê yên din li rojava û başûrê welêt hebûn û xwe vekişandin da ku di parçeyeke teng di bakur rojavayê welat de bi cih bikin.

A baş ew e, li mijarên ku rêjîma Erdogan ditirsîne were gerandin, mînak; îro ew Ewropa bi pêlên penaberan şantajê dike, di lênêrîna pêkanînên dewleta Tirk de mîna avakirina sûrekî ji çemento li seranserî sînor û armancgirtina sivîlan li ser sînor da ku derbas nekin, ev yek Tirkîyê ditirsîne ku Kurd bi pêlan koçberî nava xaka wê bibin; lewre jî xwepêşandan û meşên aştîyane yên sivîlan ber bi sînorê siyasî yê Sûrî – Tirkî mîna dîwarê Berlînê dê bibe amûrekî fişarê li ser rêjîma Erdogan. Her wiha herêma ewle bi rêveberîya navdewletî eger ne bi vîna gelê herêmê be dê xêrê ji wan re neyîne, dibe veguhere wargeheke penaberên ku Erdogan pê Ewropa şantajê dike, hemû jî alozîyên exlaqî û siyasî jiyan dikin û gelek ji wan jî bawerîyê bi ramanên tundrew tînin.

**Dawî:**

Pêwîst e, hemû şiyanên leşkerî, siyasî, aborî û gelêrî seferber bibin û bi çalakbûneke mezintir werin birêxistinkirin da ku li dijî êrîşa rêjîma Erdogan derkevin, yê ku hîn rijd e, tevahiya bakurê Sûrîyê êrîş bike, piştre pêkanîna binpêkirinan der heqê niştecihên herêmê de berdewam bike. Mîna wê jî pevçûneke etnîkî û neteweyî di navbera pêkhateyên herêmê de bi rêya arandina wan li dijî hev di çarçoveya qirkirina nijadî û guhartin demografîk de ji bo têkbirina paradîgmaya Neteweya Demokratîk ku şoreşeke ramanî li bakur û rojhilatê Sûrîyê ava kir, pêk bîne. Her wiha rijdbûna li ser dariznadina endamên Daişê li ser binpêkirinên ku li bakur û rojhilatê Sûrîyê pêk anîne bijardeyeke stratejîk ji Rêveberîya Xweser li bakur û rojhilatê Sûrîyê ye û dê bibe alîgirê sezakirina tewankarên ku binpêkirin derbarê niştecihên herêmê de pêk anîn; çimkî binpêkirinên wan jî xelekek e, ji binpêkirinên ku Daişê pêk anîne.

# Bîrdoziya Şer Li Cem Kurdan

**(B 3)**

## Bîrûbawerîya Kurdî ya şerkirinê gelek nisko dît, semedê bobelatên ku bi ser civakên kurdistanî de

Hatin piştî têkçûna şoreşên wan tûşî gelek şikestinan hat. Her wekî têkçûna şoreşa Ubeydelah el-Nehrî, şoreşa Şêx Seîd 1925, şoreşa Qazî Mihemed 1948 û Şoreşa Îlonê li başûrê Kurdistanê sala 1961ê û piştî rêkevtina Cezairê sala 1975an ku rastî karesatê hat. Bi vî rengî hesteke giştî ya lawazîyê li hember rêjîmên teokratîk û faşist peyda bû. Lê piştî ku ramanên sosyalîst di heyama Şerê Sar de belav bûn û karker û cotkarên ku piranî ne li Kurdistanê bi wan ramanan bandor bûn, tevgerên karkaran, tevgerên li dijî nijadperistîyê û tevgerên ku doza demkratîyê dikin derketin holê. Her wiha ajoyeke wireyî jî peyda bû ku perwerdeya zarokan li ser dijminatîya dijminan ku bûne sedema jana bav û kalan bête kirin, bandoreke mezin ya van xalan hebû ku bîrûbawerîyeke nû ya şer li cem Kurdan di gel damezrandina Partîya Karkerên Kurdistanê “PKK” re saz bibe ku ev tevger di edebîyata şoreşgerî ya Kurdan de bi “Tevgera Azadîya Kurdistanê” bête wesifkirin.

Piştî ku alîgirên Tevgera Azadîya Kurdistanê di nav gel de piştî sala 1980yî zêde bûn û tevgerê berê xwe da têkoşîna çekdar; ev yek jî li gorî bîrûbawerîyeke şer ya nû ku bi taybet xwe dispêre dersên ku ji şoreşên Kurd û şoreşên rizgarîyê yên cîhanî hatin wergirtin. Şerê Alîgiran (şerê gerîla) li jêr navê Hêzên Rizgarîya Kurdistanê “HRK” sala 1984an û piştre li jêr navê Artêşa Rizgarîya Gelê Kurdistanê “ARGK” sala 1986an, weke stratejîyeke leşkerî şopand, ji bo bidestxistina mafê Kurdan û berevanîya li hember çalakîyên qirkirina komî yên ku li dijî Kurdan pêk tên û yên ku piştî çewisandina şoreşa Şêx Seîd û Seyd Riza û şikestina Şoreşa Îlonê li başûrê Kurdistanê, piştî îmzekirina Rêkevtina Cezairê sala 1975an zêde bûn. Her wiha arezûya olî û êlî ji bîrûbawerîya nû ya şer hatin dûrxistin û guh da bîrûbawerîya xweparastina civakî li akedemîyên xwe yên leşkerî. Vê gavê

kir ku bend ji nav leşkerên wê yên Kurd rabin; leşkerên Misilman, Elewî, Êzdî, Markisî û netewperistên Idyolojîk. Displîna wan ya razber gehîşte wê radeyê ku gelek leşkerên ne Kurd jî tev li vê şoreşê bibin. Li kêleka vê yekê jî jina Kurd jî bi xurtî beşdarî şer bû. Di heman demê de toreyek ji alîkarîyên lojistîk hat dabînkirin û diplumasîya leşkerî hat bipêşxistin. Van xalan ji nû ve giyanê razber yê Kurdan geş kir; bi taybet piştî ku Tevgera Rizgarîyê gehîşte derveyî sînorên bakurê Kurdistanê. Dixuye ku roleke stratejîk ya vê mijarê di xweragirtina şoreşê de hebû ku 40 salan xwe li hember duyemîn artêş di Natoyê de û li hember êrîşên artêşa Îranê li rojhilatê Kurdistanê girt. Her wiha saya herî mezin ya wê bû di berevanîya di ber niştecihên Rojavayê de li hember êrîşên Daiş, Cebhet el-Nesre û mîlîsên Ixwan el-Muslimîn û rizgarkirina bi dehên hezaran ji Kurdên Êzdî ji komkujîyan li Şengalê. Li kêleka vê yekê jî piştî sala 2014an piştgirîya hêzên Pêşmergayan li başûrê Kurdistanê kir ku li hember êrîşên Daişê bisekinin. Lê ev nayê wê wateyê ku ev bîrûbawerîya şer têra misogerkirina ewlekarîya neteweyî ya Kurdan dike; ji ber ku ev bîrûbawerî di bin merc û hikmên cih û demê yên rêjeyî de ye û heger rewşeke din ya sîyasî ne li gorî wê derkeve dibe ku dev jê bê berdan. Lê tevî vê yekê jî xweparastina civakî hêmaneke çalak e, ji hêmanên bîrûbawerîya şer ya Kurdî.

Heger em xwe bispêrin xalên navbihûrî, em dikarin bibêjin ku bîrûbawerîya şer ya Kurdî li ser parastina hebûnê û xweparastinê ava bûye û li gorî çar ajoyên sereke ku ji mêj ve û heta roja îro bi wan re bûn, tê sazkirin. Her çar ajo ev in:

Ajoya olî, ajoya neteweyî, ajoya hozperistî û ajoya xweparastina civakî ku hemû bi hev re xwe dûr diparêzin ji komployên dagîrkerîyê û bandora kesên din. Li kêleka wan ajoyan, ajoya aborîyê jî hebû lê bi rêjeyeke kêm. Ev ajo bi derkevtina komeke leşkerî Kurd ya nû xuya bû. Ev komên han xwedî bîrûbawerîkê bûn ku rêkevtina bi dagîrkerên Kurdistanê re weke bijardeyekê ji bo parastina milk û mewdanên xwe yên demkî didîtin. Lewma di edebîyata sîyasî û leşkerî ya Kurd de têgehên weke Cehşik, Qirûçî, Çete û Sofîk derkevtin ku carekê bi bihaneya olî û carekê di çarçoveya dijminatîya kesayetî hêncet ji reftarên xwe re didîtin.

- **Rêyên bîrûbawerîya şer ya Kurd li Rojavayê**

Lêkolîner Basîl Nîktîn dibîne ku xuyên Kurdên Rojavayê ji sedsala 19an û bi şûn de, nimûneya resen ya gelê Kurd e. Ku şer û pevçûneke mayinde di navbera êlên Kurd de li ser çêrgehên dewlemend û parastina sewalan hebû. Di werzê zivistanê de jî şerê êlên Ereb dikirin ji ber ku wan êlan êrîşî çêrgeh û sewalên wan dikirin ku ew çêrgeh cihê gehîştina du gelên cuda bû; Kurd niştecihên çîya û deştan û Ereb niştecihên çolistanê. Lewre xuya tundîyê li nik vê beşê ji Kurdan di asta herî jor de bû. Du statûyên Kurd li Rojavayê hebûn; li rojhilat û rojavayê wê. Li rojhilatê wê fedraliya êlên Milî hebû ku devera Mêrdînê ji xwe re kirîbû navendeke sereke û gelekî hewl da ku serbixwebûna xwe ji desthilata Osmanîyan qezenc bike. Serkirdeyê wê "Brahîm Paşa" gehîşte payeyeke sîyasî û leşkerî ya bilind, heta wê astê ku gerokekî rojavayî ew bi "Kiralê Kurdistanê yê Netackirî" wesif kir. Li rojavayê Rojavayê piştî sala 1861ê û ji ber derketina pêwendîyên nû yên civakî ku di destê hin malbatên derbegî bûn yên ku desthilata Osmanîyan piştgirîya wan dikir, têkelîyên êlan berev tunebûnê diçûn. Di wê demê de nasnavê "Axa" derkete pêş ku cotyar li cem xwe kirin kole. Vê yekê jîngeheke hejar û guncav ji bo zêdebûna çalakîya tevgerên sofîk peyda kir bi taybet piştî ku serederîya hişk ya dagîrkerîya Fransî bi cotyaran re zêde bû.

Peywendîyên civakî û çandî yên xurt û pêdar di navbera Kurdên Rojava û Kurdên Başûr û Bakurê Kurdistanê de hene, çimkî Rojava berdewamîya dirêjahîya sirûştî ya her du beşan e. Lê sînorên siyasî yên ku rêkevtina Saykspîkoyê di sala 1916an ew sepand, bû sedem ku jevqutbûneke rêjeyî di navbera wan de çê bibe. Lewre rûdan û bûyerên ku li wan beşan çêdibûn, bandor li Kurdên Rojavayê jî dikir. Bi giştî hişmendîya hozî, faktoreke vebir bû ku bîrûbawerîya şer li nik Kurdên Rojavayê darêje; ji bo berevanîyê di ber çêrgehan û berfirehkirina wan û bergirîya li êrîşên êlên din. Gelek caran êlên Kurd û Ereb dibûne yek ji bo ku li hember êlên din yên Kurd û Ereb rawestin. Her wekî şer û pevçûnên di navbera Yekîtîya Milî ji alîyekî ve û Êla Şemer, Kîkan, Begare, Tey û hwd ji alîyekî din ve. Bandora paledera olî ya dogmatîk heta radeyekê kêm bû, nîşana wê yekê jî ew bû ku şerên xwînî di navbera Êzdî û Xiristîyanan de çênebûne. Her wiha paledera neteweyî jî gehîşte asteke pêşketî, nîşana wê gavê jî ew bû

ku hejmareke baş ji Kurdan piştgirîya şoreşa El-Şerîf Hisên li Hîcazê kirin, şerê dagîrkerîya Firansî kirin û roleke mezin di serxwebûna dewleta Sûrîyê de lîstin.

Di sedsala bîstan de Rojava di sê qonaxên sîyasî yên sereke re derbas bû; qonax jî ev in: Qonaxa salên dawîn ji dagîrkerîya Osmanîyan, qonaxa dagîrkerîya Firansî û qonaxa ji serxwebûna welat heta roja me ya îro. Her qonaxek xwedî rewşên cuda bû û faktorên wê bandor li bîrûbawerîya şer û li tevgera sîyasî û çandî ya Kurdî li vî beşê Kurdistanê dikir. bîrûbawerîya şer ya Kurdî di navbera cîhadê, têkoşîna neteweyî û xweparastinê de bûn û di gel jinavçûna berebere ji bîrûbawerîya ku bi heşmendîya êlî handerkirî ji holê radibû.

Ji bo bîrûbawerîya şer ya Kurdî ya hemdem li Rojavayê bê fêmkirin, hin bûyer hene em dikarin bibêjin ew bûyer dastanî ne û bandora wan ya mezin di sazbûna vê bîrûbawerîyê de hebû. Yek ji wan jî dastana Derwêşê Evdî ye sala 1791ê ya ku derbirînek bû ji paledera neteweyî ku ev paleder handerke sereke bû ji bo şerê desthilata Osmanî û êlên hevbendên wê. Çimkî bandoreke sergehîştî li ser dilovanîya neteweyî ya kurdan hebû. Di heyama şoreşa Yekîtîya Milî de derket ya bi serkirdeya Temir Paşa li dijî desthilata Osmanî ku dixwest mîrnişîneke Kurdî ya serbixwe ava bike ku tevahîya Rojavayê Kurdistanê li xwe bigire û ji bacên giran û leşkerîya neçar reha bibe. Ku kurdên Misilman û yên Êzdî û hin hevalbendên wan yên Ereb bi hev re û di bin serdarîya Derwêşê Evdî yê Êzdî de şerê Osmanîyan kir. dastan amajeyê bi hestên neteweyî yên dûrî olperistîyê di navbera Kurdan de dike. Piştî têkçûna şoreşa Temir Paşa, Kurd tûşî îşkencekirinê hatin, lê dîsa jî ev dastan di bîrdanka gelê Kurd de ma. Kurdan şoreş li dijî dagîrkerîya Firansî jî pêxistin ku paledera olî handera sereke bû di wan şoreşan de. Dibe ku bîrûbawerîya şer bi guherînên ku bi ser bîrûbawerîya cîhadê di heyama Şerê Cîhanê yê Yekem de hat, bandor bûbe, çimkî bîrûbawerîya şer ya Islamî di navbera Osmanî û Ereban de rastî parçebûnê hat ku her alîyekî cîhad ragehand. Dixuye ku kurd ber bi şoreşa El-Şerîf Hisên ve çûn; çimkî tu hestên niştimanî yên Osmanî li nik Kurdên Rojavayê xuya nedibûn. Dibe ku sedema wê yekê serkutkirina hovane ji şoreşên Kurdî li bakur û başûrê Kurdistanê ku tûşî wê hatin.

Paledera cîhadê bû handera sereke ya şer bi taybet di heyama dagîrkerîya Firansî (1920) de anku di heman dema pêşktina hişmendîya neteweyî ya ku bi bandora Tevgera Xweyîbûnê ya xwedî arezûya neteweyî ya kurdî ev hişmendî pêş ket. Piştî dagîrkerîya Firansî bi çend salan, du şepêlên sîyasî yên sereke di nav Kurdan de derketin. Şepêlekê doza rêveberîyeke xweser ji bo Kurdan li cihê ku lê rûdinin, kir û şepêlekê doza pêkvejîyana li jêr sîwana dewleteke Islamî Erebî destkarî li gorî dabeşandina rêkevtina Saykispîkoyê ku hatîye destnîşankirin. Di wê heyamê de û heta dema serxwebûnê, du alîyên leşkerî yên Kurd derketin. Alîyê yekem bi têkoşerên Islamî (mucahidînan) hatin navandin û têkoşîn (cîhad) û şerê dagîrkerîya Firansî weke bîrûbawerîyeke şer ya sereke bi xwe girt. Ev şepêl ya herî birêxistî û çalak bû û du şepêl tê de derketine pêş: Şepêla Sofî ya bi navê Tevgera Mirîdan (1939) hat naskirin, li devera çîyayî ya herêma Efrînê çalak bû. Bi sedan cotyar; ew cotyarên ku bi destê melakên mezin ku dagîrkerîya Firansî û desthilata Sûrî piştgirîya wan dikir dihatin tepeserkirin, bûn alîgirên vê şepêlê. Dibe ku armancên sereke yên vê tevgerê ev bin: Belavkirina amojgarîyên (prespektîfên) olî yên li gora rêbaza (terîqeya) Neqşebendî û têkoşîna li dijî zilm û stemkarîya dagîrkerîya Firansî û axayan. Şepêla din bi serkêşîya Birahîm Henano bû. Hin çavkanî amajeyê bi wê yekê dikin ku hêzên bi “Çete”yan dihatin naskirin û yên olperistên ku Ataturk piştgîrîya wan dikir ew bi rê ve dibirin, ev hêz bûne hîmê bingehîn yê şepêla cîhadî di wê demê de ji bo şerê Firansîyan. Lê piştî îmzekirina rêkevtina Franklîn – Boyon (rêkeftina Enqereyê) sala 1921ê ku bi wê rêkevtinê Firansayê Lîwa Iskenderon da Tirkîyê, dewleta Tirk li wan hêzan zivirî û xîyanet li wan kir. Alîyê duyem ji hêla leşkerî ve kêm birêxistin bû û doza birêveberîyeke xweser dûr ji desthilata Hicaz û Osmanîyan ji bo niştecihên deverê kir. Her du şepêlan jî nekarî bû mafên Kurdan li Rojavayê bi dest bixin. Çimkî ji jîyana sîyasî ya Sûrî hatin dûrxistin û di bin sîwana qanûna bi navê çakkirina çandinîyê, destê xwe danîne li ser erdên wan û bi hezaran xelk ji regeznamya Sûrî bêpar kirin û sîyaseta hejarkirinê li ser wan bi rê ve birin.

Bi giştî rengê neteweyî li bîrûbawerîya şer ya Kurdî li rojhilatê Rojavayê bar bibû. Lê li rojavayê Rojavayê rengê olî li bîrûbawerîya wan ya şer bar bibû. Piştî Kongireya Topizê, tîrmeha 1937 an, pevçûn di navbera her du alîyan de li herêma Cizîrê derket. Kongireya Topizê ji alîyê birek ji rîspîyên

êlên herêma Cizîrê di nav de Kurd, Ereb û Xirstîyan hatibû lidarxistin û ji ber zordarîya ji destê karmendên desthilata Şamê didîtin, doza birêveberîyeke xweser ji bo xelkê deverê kirin. Raperîneke leşkerî pê ket û piranîya bajarok û gundewarê herêma Cizîrê kontrol kir. Lê şepêla olî ya girêdayî Kutleya Niştimanî (netewperist û olperist), bi şoreşeke dijber rabû û bû sedema şerekî xwînrij li Amûdê ya ku tûşî bombebarana firokeyên Firansî hat. Di encamê de gelek kesên bêsûc birîndar bûn û jîyana xwe ji dest dan. Xuya dike ku hevrikîya hozî û cudahîya îdîyolojî di navbera serkirdeyên Kurd de di şepêla olî û ya neteweyî de, bûye sedema parçebûna bîrûbawerîya şer ya Kurdî û derfeteke guncav ji dest wan çûye ku mafên xwe yên rewa li jêr sîwana statuyeke demokratîk bi dest bixin. Şepêla neteweyî heta astekê ji şepêla olî ya dogmatîk bîrewertir bû, lê nelihevîya di navbera wan de gehîşt wê radeyê ku kesên dîndar, kesên netewparêz bi gawirbûnê tawanbar bikin. Dibe ku sedema vê bîrewerîyê, bandorbûna wê bi serpêhatîyên şoreşên Kurdî li parçeyên din yên Kurdistanê be.

Di encama vê rakişandinê de, bîrûbawerîya şer li nik Kurdan hin bi hin têk çû. Piştî ku dewleta Sûrîyê sala 1946an hat ragehandin, piştî Şerê Cîhanê yê duyem ku şepêla netewperist ya Ereb ya şofînî hin bi hin welat kontrol kir, bîrûbawerîya şer ya Kurdî êdî nema karîbû li hember pilanên qirkirina komî yên ku li dijî kurdan pêk dihatin bi taybet kiryarên guherîna demografîk û hejarkirinê, wê bîrûbawerîyê nema karîbû xweparastinê pêk bîne. Bi rêya damezrandina Partî Demokratî Kurdistan – Sûrîye 1957, Kurdan hewl da ji nû ve xwe bi rê bixin, lê nikarîbûn bîrûbawerîyeke nû ya şer ku bikare mafên Kurdan biparêze dirust bikin. Loma Kurd dev ji şer berdan û ketin destê desthilata dewleta Sûrîyê. Her wiha li gora sîstema leşkerîya neçar, bûne leşker di artêşê de ku bi zanebûn ew ji paye û fermandarîya leşkerî bêpar hiştin.

Dixuye ku avanebûna bîrûbawerîyeke nû ya şer ya Kurdî ku berevanîyê li hemeber hemû êrîşan bike, bû sedema parçebûna tevgera sîyasî ya Kurdî li Rojavayê, her wiha bû sedema bipêşketina rêbazên (terîqeyên) sofî. Ji alîyekî din ve dibe ku sedemên bipêşneketina milê leşkerî li Rojavayê ev bin: Erdnîgarîya Rojavayê ku xwedî erdnîgarîyeke deştî ye, çekên navendî yên pêşketî, rêbazên (terîqeyên) sofî û karê wan yê

bangewazî (deiweyê), bipêşketina tevgera komînîst li Rojavayê û hwd. Ev xalên navbihûrî sedema lawazîya bîrûbawerîya şer ya Kurdî li Rojavayê bûn. Vê rewşê xortên xwîngerm li pêş du bijardeyan hiştin; yan tev li tevgerên Kurdî yên çekdar li başûr û bakurê Kurdistanê bibin yan jî koçber bibin.

Piştî Serhildana Qamişloyê di 12 adara 2004an de Kurd, bi destê pergalên ewlekarîyê yên girêdayî desthilata navendî û piştgirîya mîlîsên şofînî yên Ereb yên alîgirên wan, tûşî çewisandinê hatin. Hin şerkerên Rojavayê yên di refên Partîya Karkerên Kurdistanê de vegerîyane Rojavayê û ji bo dirustkirina bîrûbawerîyeke Kurdî nû ya şer xebitîn. Ev bîrûbawerî xwe sparte stratejîya xweparastinê û yekîneyên şer yên biçûk bi awayekî veşartî û li jêr navê Komên Xweparastinê hatine damezrandin. Piştî kirîza Sûrîyê sala 2011an, ev yekîne bûne bingehên damezrandina birek ji hêzên leşkerî û ewlekarî (YPG, YPJ, HPC, Asayîş) li ser rêgezên xweparastina civakî di çarçoveya pradîgmaya neteweya demokratîk de. Bi vî awayî xweparastina civakî bû kakilê bîrûbawerîya şer ya Kurdî li Rojavayê û gelek şerker ber bi xwe kêşan di nav de xortên civaka Ereb, Xirstîyan û Êzdî. Bi saya vê bîrûbawerîyê gelê Rojavayê karîbû xwe li hember hemû êrîşan bigire; êrîşên dewleta Tirk û çeteyên wê her wekî Daiş, Cebhet El-Nesre, Ixwan El-Muslimîn û mîlîsên girêdayî Rêjîma Sûrîyê. Şîyaneke mezin ya xweparastina civakî di şikandina êrîşên ku paledera olî ew han didan hebû. Paledera olî ya bi cîhada ku tenê aramanca wê kuştina Kurdan, dizîya mal û mewdanên wan, bicêrîkirina jinên wan û kolegirtina zarokên wan dihat nimandin. Kurdan bi rêya vê bîrûbawerîyê karîbû şer û pevçûnan li deverên deştî jî bi rê ve bibin. Tevî vê yekê jî û weke dabûnerîtekê di dîroka Kurdan de, beşek ji Kurdan rêyeke din şopandin û bîrûbawerîyeke nû ya şer dirust kirin ku xwe dispêre cîhadê yan jî alîgirîya partîtî di bin sîwana neteweya Kurd û şoreşên klasîk yên kurdî de. Hin ji wan tev li refên rêxistinên Islamî yên radîkal bûn. Her wiha hin xortên koçeber li Başûrê Kurdistanê tev li rêxistineke leşkerî bûn ku Tirîyê piştgirîya wê dikir û da ku ji hêzên Pêşmergeyan bên veqetandin, bi navê “Leşkerê Roj” hatin naskirin. Heta niha tu karekî leşkerî di ber gelê Kurd de li Rojavayê nekirine. Van leşkeran nekarî ewlehî û ewlekarîyê ji civakên kurd re peyda bikin, lê belê dijimên gelê Kurd wan ji bo têkbirina

destkevtîyên Kurdan yên ku bi saya Rêveberîya Xweser pêk hatîne, bi kar tînin.

Bi gelemperî Kurdên Rojavayê di du rêxistinên leşkerî de ne: Rêxistina yekem mezintir û bihêztir e, rêxistina Yekîneyên Parastina Gel û Jinê ye ku kakila Hêzên Sûrîya Demokratîk in; ew hêzên ku Hevpeymana Navdewletî ji bo Şerê Terorê piştigirîya wan dike. Rêxistina duyem koma Leşkerê Roj e, ya ku dewleta Tirk piştgirîya wan dike û rêbaza Mistefa Barzanî bi xwe girtine. Lê weke tê zanîn ev rêxistin di şoreşa Rojavayê de pabendî rêbaza Şoreşa Barzanî (Şoreşa Îlonê 1961) nabe. Barzanîyê ku hêzên xwe ji bo rajeya Komara Mehabadê sala 1948an û parastina mafên Kurdan di heyama şoreşê de sala 1961ê terxan kir. Lewre hin kes dibêjin ku sedema damezrandina vê hêzê ew e, ku ji xelkê re nîşan bidin ku Yekîneyên Parastina Gel û Jinê nûnertîya hemû Kurdên Rojavayê nakin, û derfeta li ber hin partîkeran ji Kurdan veke û hin xortên xwîngerm vehewînin û nehêlin ku tev li wan hêzan bibin. Li kêleka vê yekê jî rê ji bo parçebûna refên sîyasî yên Kurdî xweş bibe; her wekî çawa refên sîyasî yên Kurdî parçebûyî ne. Li milekî din hindek kes Leşkerê Roj weke berdêleke sazîyên leşkerî yên Rojavayê didin pêş, lê heger bû û sazîyên leşkerî li Rojavayê ketin û valahî çêbû jî dixuye ku ev rêxistin nikare valahîyê dagire, çimkî hejamra wan ne zêde ye û bêtecrube ne, her wiha rêjeyek mezin ji Kurdên Rojavayê ne alîgirên wan in. Gelek leşker ji nav refên Leşkerên Roj derketin, hin ji wan vegerîyane Rojavayê û hinên din berê xwe dane Ewropa û Tirkîyê. Yên mayî jî di şerê dijî PKKê de ji hêla dewleta Tirk ve tên bikaranîn. Û li alîyê din, mîlîsên Kurd yên ku li deverên rikberîya “Ixwan”an ya Sûrî çalak in, mirov nikare wan weke nûnerên Kurdan bibîne, çimkî çete ne, û li beramber kuştina gelê xwe diravan distînin.

Bi giştî, sîyasetek bi zanebûn bi destê dewletên ku Kurdistan li xwe leva kirine û hin dewletên mezin yên ku her dem li dijî wê yekê bûn ku Kurd mafên xwe bi dest bixin, bi rê ve diçe da ku statûyeke leşkerî ya Kurdî ava nebe ku hemû Kurdên Rojavayê, bi cihêrengîya paşxaneyên xwe yên sîyasî tê de cih bigirin. Li gorî vê divê payebilindên niştimanî yên Kurd, bi taybet yên sîyasî û leşkerî, kedeke zêdetir bikin da ku rê li pêş avakirina statûyeke leşkerî Kurdî vekin ku nûnertîya hemû tevgera sîyasî ya Kurdî li Rojavayê

bike weke stratejîyekê ku beşekî ji ewlekarîya neteweyî ya Kurd misoger bike.

**Sêyem- bîrûbawerîya şer û nemûnekirina şervanê Kurd**

Bandoreke mezin ya civaka Kurd û dorhêla himbêzkirina wê li ser bîrûbawerîya şer û nimûnekirina şervanê kurd heye. Ev jî li gor bîrdoza fêrbûna civakî (bîrdoza fêrbûna bi têbînîkirin û lasayîkirinê) ya lêkolîner Bandora ya ku xwe dispêre rîyaksyona çarebebûn ya pevguhêra berdewam ya reftar, zanîn û kartêkerîyên jîngehîyê. Bi giştî tiştê girîng di bîrûbawerîya şer ya Kurdî de ew e, peywendîyeke peyt bi şoreş û şerên heye ku şervanên Kurd di ber azadî, maf û parastina statû û çanada xwe bi dest bixin, û piştguhkirina bîrûbawerîya şer ya pabend bi nakokî dijberîyên girêdayî bi dab û nerîtên civakî û bilindbînîyên siyasî.

Kurdistanê bi mêrxasan têr e, ji bilî wê, ew bi serkirdeyên stratejîk destkurt e, anku destkurta hêzeke ramanî, razber û afrîner e, û neşê bilîmeteke şerî ji nav rêzên xwe berz bike, vêca piranîya şoreşên Kurdan ji milê tektîkê ve lawaz bûn; wekî ku xwe dispartin rûbirûbûna yekser li ser hespan û hema hema bêhtir nêzîkî prosesên serpêçîyê yên gundîtî yan jî êrîşeke êlane bûn. Bi ketina konfedralîya Medan sala 551ê b.z, Kurdan gelek ji gîyanê şer yê resen ji dest dan. Dixuye ku desthilata Osmanî, bi taybet piştî sala 1840î, hewl daye ku dîsa bandorê li tiştê ji vî gîyanê mayî bike. Ev yek jî da ku deverên bi rêya sîyaseta bidûrxistina serdarên hozan ji jîyana sîyasî û leşkerî yan jî têkbirina wan piştevanîya Şêxên olê û peyrewên wan bike, û nemaze yên nêzîkî sazîya olî ya girêdayî Siltan. Ev xal bi nerîna lêkolîner Mînorskî re li hev dike; Mînorskî sê dîmenên girîng destnîşan dike ku xuyên Kurdan bador kirine û dikin, dîmen ev in: Jîyana sedsalên navîn ya Mîrnişînên Kurd yên biçûk, sîstemên hozî yên êla Kurd û bikaranîna Kurdan ji bo armancên sîyasî yên gemar ji hêla serkirdeyên Tirk ve. Bi ser ve zêdetir çîrok, dastanên lehengane û efsaneyên gelêrî yên Kurdî yên ku ji biçûkanîyê ve û berî ku bibe şerker, kesayeta şervanê Kurd dihûnin. Tiştên ku wê bi wizeyeke tund bar dikin ev in: Jan, jîyana belengazîyê û stemkerîya ku ji alîyê desthilatên zalim ve li ser wê pêk tê.

Piştî Şerê Cîhanê yê Duyem sala 1945an û bandorên wî yên neyînî li cîhanê bi giştî û Kurdistanê bi taybet û guherînên di pey re hatin her wekî

guherîna nexşeya sîyasî û leşkerî ya cîhanî, Kurd li bîrûbawerîyeke nû ya sîyasî û leşkerî veguhezîn ku wê bîrûbawerîyê pênc nimûneyên şervanê Kurd bi xwe re anîn. Her nimûneyek xwedî bîrûbawerîyeke şer ya taybet e, û her nimûne bû xwedî navekî taybet, nimûne jî ev in: Gerîla, Pêşmerge, têkoşerên (Mucahidên) Kurd, Çeteyên kurd û Şerkerên Rojavayê.

Ji bo têkoşerên (mucahidên) Kurd û çeteyên Kurd yên di rêxistinên Islama sîyasî de ku ev rêxistin alîgirên El-Qayde û Ixwan El-Mislimîn û mîlîsên bi ser dewleta Tirk ve ne, ev têkoşer (mucahid) û çete bîrûbawerîyeke şer bi xwe digirin ku xwe dispêre têkoşîna (cîhada) di ber avakirina dewleta xîlafeta Islamî de û ne nirxê mafên gelê Kurd ne jî nirxê demokratî li cem wan nîne, wekî nimûne tevgera Mirîdan li herêma Efrînê sala 1931ê û koma Ensar El-Islam bi serkirdayetîya Mele Kirêkar li başûrê Kurdistanê sala 2003yan. Lewre nabe ku ev wekî şervanên Kurd yên rasteqîn bên dîtin, lê belê ew ji bo çandekê şer dikin ku yekcarî bi Kurdan ne girêdayî ye û ji binî ne weke têkoşerên (cîhadîyên) şoreşên berê yên Kurdan in, her wekî şoreşa Şêx Ubeydelahê Nehrî sala 1880yî, şoreşa Şêx Mehmûdê Berzencî, şoreşa Şêx Seîd, şoreşa Îlonê sala 1961ê û hwd. Çimkî gîyanê şer û cengê yê Kurd yê resen li cem wan nîne, ji ber ku ew di ber hin rêxistinan de şer dikin ku dijminên gel û çanda Kurdan ya dêrîn in, her wiha bi çavekî biçûk li piranîya gelê Kurd dinerin û wan gawir dibînin. Ev kesên han bûn sedem û alîkar ku sûcên mezin li dijî civakên Kurdan pêk bên, rêxistinên weke: Ensar El-Îslam, Hizbelaha Tirk, Cehşik, Qirûçî, Sofîk û Çete. Çete destpêkê li herêma Efrînê piştî heyama dagîrkerîya Firansî derketin ku Ataturk, yê li dijî Islamê, mîlîsên çete ji hin dîndarên nezan yên Kurd ji bo şerê Firansîyan damezrandin. Ataturk karîbû wan weke belgeyek fişarê li dijî Firasayê bi kar bîne da ku Lîwa Îskenderon bide dewleta Tirk ya nû. Ev jî piştî ku rêkevtina Enqereyê sala 1921ê hat îmzekirin. Piştî rêkevtinê, êdî hew piştgirîya wan kir lewma Firansîyan karî bûn wê rêxistinê têk bibin, û bi dawî bikin. Halê hazir ev nav li mîlîsên Kurd yên çete tê kirin yên ku dewleta Tirk piştgirîya wan dike û operasyonên paqijkirina nijadî li dijî Kurdên Efrînê, Girê Spî û Serê Kanîyê pêk tîne û wan mîlîsan weke belgeyeke şantajê li dijî Rêveberîya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûrîyê bi kar tîne.

Ji alîyekî din ve dixuye ku dijminahîya di navbera êlan de, di navbera Barzanî, Zêbarî, Sirûcî û hwd de, û nakokî û hevrikîya ayînzayî (mezhebî) di navbera rêbazên (terîqeyên) sofî yên Qadirî û Neqşebendî de, her wiha hevrikîya di navbera rêbazên (terîqeyên) Neqşebendî bi xwe de her weke Sofîya Herkî, ya Biradostî, ya Barzanî û hwd, ev dijminahî û hevrikî bûne alîkar ku nimûneyeke nû ji şervanên Kurd re bi navê Cehşikan derkeve holê. Ev nimûne ji şervanên êlên başûrê Kurdistanê pêk hat; êlên ku nakokî û nelihevîyên wan yên êlî yan ayînzayî (mezhebî) bi yekîtîya êlên Barzanê re hebûn.

Gelek destkevtîyên razber û şênber ji desthilata zordar ya Bexdayê bi dest xistin. Ya ku şoreşa Îlonê (1961) lawaz kir û dixuye ku yek ji sedemên binkevtina wê bû, ku Mesûd Barazanî, Serokê Partî Dîmokratî Kurdistan, wê dike egera sereke ku hêzên Pêşmerge neşîyan artêşa Îraqê bipelixînin ya ku wê demê jihevkevtî bû û ji gendelî û arîşeyên îdîyolojîyê nehamet dikêşand.

Nimûneyên din jî her weke komên Ensar El-Islam, Hizbelaha Tirkî, Cehşik, Qirûçî, Sofîk û Çete û hwd jî dikivin di bin sîwana van her du mînakan de. Bi vî awayî sê nimûneyên şervanê Kurd di dîroka hevdem de li cem me dimînin.

**• Şervanê Pêşmerge**

Pêşmerge weke peyv tê wateya kesê canbexş (fîdayî). Ev zarave yan jî têgeh di nîvê yekem ji sedsala bîstan de bi awayekî berfireh, bi taybet li başûr û rojhilatê Kurdistanê derket û belav bû. Ev nav li şervanên êlên Kurd yên ku bi tenê karê wan şer bû hat kirin. Serdarên Yekîtîya Êlên Barzan karîbûn Pêşmerge li hêzeke leşkerî û birêxistî veguhêzin û gelek şervanan ji êlên din yên Kurd jî ber bi wê hêzê ve bikêşin. Pêşmergeyan roleke kartêker di berevanîya li hember stemkarî û zordarîya desthilata Îraqê ya alîgira Brîtanyayê û piştre ya Beisî lîst. Her wiha piştgirîya Komara Mihabadê sala 1948an kirin û lehengîyeke bêhempa di şoreşa Îlonê de nîşan dan. Ev rêxistin li hêzeke razber û bibandor veguhezî û di wê demê de moralên gelê Kurd hildan. Bi vî awayî şervanê pêşmerge bû sembola lehengîya neteweyî. Heta bi cotkaran jî tev li Pêşmergeyan bûn û gelek qurbanî raber kirin. Dixuye ku bûyîna endamekî Pêşmergeyan,

atmosfereke vîna azad û teşeyeke ji teşeyên xweparastinê ji wan cotkaran re peyda dikir. Lê ji ber ku ev hêz bi nakokîyên sîyasî yên tevgera sîyasî ya Kurdî li başûrê Kurdistanê bandor bû, hin bi hin lawaz bû; bi taybet nakokîyên li hundirê Partî Demokratî Kurdistan- Îraq piştî sala 1975an ku rêkevtina Cezairê hingê hat îmzekirin. Ji ber vê yekê hêzên Pêşmergeyan di milê sîyasî û leşkerî de bûne du hêzên cuda; hêzek girêdayî Yekîtî Niştimanî Kurdistan, bi serdayetîya Birahîm Ehmed û Celal Talbanî û hêzek girêdayî PDK bi serkirdayetîya Mele Mistefa Barzanî. Şerên xwînrêj di navbera her du alîyan de rûdan û şûneke xemgîn di bîrdanka sîyasî ya Kurdî de hêlan. Dixuye ku bandora vê parçebûnê gehîşte hêzên Pêşmergeyan yên li rojhilatê Kurdistanê jî û heta roja îro ew parçebûn berdewam e, û hemû hewldanên yekgirtinê têk diçin.

Pêşmergeyê resen werara şervanê Kurd yê kilasîk e. bîrûbawerîya şer li bal wî bi hestên neteweyî, lehengîya di şer de û amadebûna ji xwegorîkirinê re balkêş e. Di ber mafên xwe yên neteweyî de û ji bo parastina gelê xwe ji qirkirina komî şer dike. Li kêleka hestên neteweyî, têkoşîn (cîhad) wireyeke razber didîyê û bi vê yekê ew dişibe şervanên Kurd yên ku tev li şoreşên berê yên şêxên Kurdan bûn. Şêwazê wî yê şer xwe dispêre dav vedanan û di şeran de xwe dispêre êrîş û vekêşanê. Lê di parastinê de şerê enîyan dike ku di dema şer de di navbera dijmin û çîyê de cih digire. Her wiha karzanîya wan di şer de zêde bibû, ew jî bi rêya şoreşa Şêx Mehmûd El-Hefîd ya li dijî Birîtanîyan sala 1919an, şer û cengên li dijî deslthilatên zordar yên peyhatî yên Bexdayê û hin şerên ku li kêleka Pêşmergeyên Komara Mihabadê kirin. Her wiha bi rêya perwerdeyên leşkerî yên li Yekîtîya Sofyetê sala 1948an dîtin ku piştî ketina Komara Mihabadê beşeke mezin ji Pêşmergeyan koçî wir bûn. Dibe ku sedema herî sereke ya parçebûna hêzên Pêşmergeyan, dilsozîya (atîfeya) êlî yan ayînzayî (mezhebî) yan jî girêdana xurt bi malbat û mal û milk ve hebe.

Dixuye ku bi taybet vê dawîyê, veguhastina Pêşmergeyan li artêşeke birêxistî û di navbera du alîyên sîyasî yên sereke de parçebûyî, bîrûbawerîya şer li cem wan lawaz kiriye. Dibe ku sedema vê yekê ew be ku kesên niha di nav refên Pêşmergeyan de ne şervanên rasteqîn in, lê dibe ku ji bo palederên madî yan li gor sîstema leşkerîya neçar bê xwestek

yan ji bo palederên partîtî tev li vê hêzê bûbin. Li milekî din her hêzeke leşkerî heke demeke dirêj şer neke, bi taybet di serdemekê de ku teknîka leşkerî pir bi pêşketî ye, bîrûbawerîya şer li bal bivê nevê li kêm dibe. Çimkî bo nimûne, dema ku hejmara wan di şoreşa Îlonê de zêdeyî 5000 şervanî bû, Pêşmergeyan biserkevtinên mezin bi dest xwe ve dianîn. Bi ser ve zêdetir alîkarîya leşkerî didane tevgera sîyasî ya Kurd li rojhilatê Kurdistanê jî. Lê niha hejmara wan ji sed hezar şervanî zêdetir e, û çekên wan li gor dema şêstîyan pir pêşketîtir in, lê tevî vê hejmara gelek jî Êzdî tûşî komkujî û binpêkirinên mezin li ser destê rêxistina Daişê ya terorîst hatin, gelek deverên Kurdî ji dest çûn û piştî tiştê bi navê refrandoma cudakirina Kurdistana Îraqê sala 2017an, Kerkûk jî ji destê Kurdan derket. Dixuye ku pêdivîya mijarê bi nirxandineke ji xweber û objektîv û kûr ji hêla fermandarên Pêşmergeyan ve tê xwestin, her wiha pêdivî bi geşepêdana gîyanê şer yê resen di sazîya Pêşmergeyan de heye.

Li gor xalên navbihûrî, Pêşmerge ew şervanê Kurd e, ku şerê dijminê Kurdan dike û parastina her Kurdekî dike û dûr ji nelihevîyên hozî û bîrûbawerîyê, cih û qedrekî wî yê bilind li nêv Kurdan heye. Ev yek di van babetan de xweş xuya kir: Piştgirîya Pêşmergeyên başûrê Kurdistanê ji Komara Mihabadê re, hemû Pêşmergeyên başûrê Kurdistanê li hember deshilatên zordar yên Îraqî û dagîrkerîya Îngilîzî sekinîn û bi dehan şervanên Pêşmerge di şerên Kobanî de li kêleka Gerîlayan piştgirîya şervanên Rojavayê kir. Çi teştê ne di vê çarçoveyê de be weke Pêşmerge nayê dîtin, bi taybet hin mîlîsên çete yên ku vê dawîyê derketin û dewleta Tirk piştgirîya wan dike û angaşt dikin ku nûnertîya bîrûbawerîya Pêşmergeyan dikin, ev kes ne Pêşmerge ne, lê tersî wê li gor pilana dijminên gelê Kurd, vê bîrûbawerîyê reş dikin.

**• Şervanê Gerîla**

Peyva Gerîla ji gotina “Guerrilla” ya Ispanî hatîye û wateya wê ev e: Gerîla ew şervanê ku şerê koman (gerîla) li dijî dijminên zordar dike. Ev zarave yekem car di dema berevanîya gelê Ispanî li hember artêşa Napilyon di salê 1808 – 1813 de ji bo parastina mewdan, malbat û welatê xwe derket; lewre binkeyeke gelêrî ya pir mezin jê re heye. Yek ji efserên ku şer li dijî Gerîla kiriye, wê wiha şîrove dike: “Şerên Biçûk” yên bi qasî “Şerên Mezin” yên ku “artêşên birêxistî” pêk tînin. Pênaseya herî girîng ya

bîrûbawerîya şer ya Gerîla ji hêla şoreşvanê cîhanî Gîvara ve hetîye pêşkêşkirin ku Gerîla wiha dadinasîne: “Çakkerê civakî ye, ji bo cemawerên ku ji zordarîya zoradarkerên xwe bêzar bûne, çek hilgirtîye û ji bo guhartina pergala civakî şer dike. Li hember mercên pergalên desthildar radiweste û xwe ji bo parçekirin û tunekirina wan terxan dike … ew serokê xwe ye, amade ye ku canê xwe bibexşîne (fida bike) ne ji bo ku nirxekî bilind biparêze, lê ji bo ku wî nirxê bilind bîne çarçoveya ketwarê…”

Peyva “Gerîla” ji bo nimûneyeke nû ji şervanên Kurd tê bikarnîn, şervanên ku wekî nûnerên kedkaran li civakên Kurdistanî tên dîtin. Şervanê Gerîla pêşketineke bi degmen e di kesayeta şervanê Kurd û di bîrûbawerîya wî ya şer de ku ji şervanên din yên Gerîla di civakên din yên mirovî de cuda ye. Çimkî li rex hebûna gîyanê şer yê resen ku li nik Pêşmergeyan heye, şervanê Gerîla tektîkên xwe yên şer li gor ezmûnên (tecrubeyên) berevanîya gelên Çîn, Vêtnam, Kûba, Spanîya, Filstîn û hwd bi pêş xistine. Tiştê ku xweşik şervanê Gerîla yê kurd balkêş dike ew e, beşdarbûna jinê bi çalakîyeke mezintir li rex mêr û wekî wî di şer de û cudabûna ji jîyana dinyayî ye. Tu dibê qey rengek ji rengên olperestîyê (tesewifê) ye ku hemû şîyanên xwe yên laşî, derûnî û ramanê ji bo rizgarkirina civakên Kurdistanî ji riswayî û zordarîyê bi kar tîne di çarçoveya nirxên sincî yên çanda Kurd ya dêrîn de û dûr ji dogmatîk û çanda kîndarîyê. Bîrûbawerîya şer li cem wî xwe dispêre xweparastina rewa, çimkî ew dibîne ku welatê wî ji alîyê dewletên zordar ve hatîye dagîrkirin û gelê wî tûşî qirkirina çandî û komî tê, lewma erk e li ser milê wî ku parastina xwe, çanda xwe û gelê xwe bike. Her wiha ew amade ye ku alîkarîyê civakên din bike; civakên ku ji kîndarîyê dûr in û janê ji zordarîyê dikêşin û ji bo bidestxitina azadîya xwe di çarçoveya prdaîgmaya neteweya demokratîk de têkoşînê dikin. Wekî çawa alîkarî dane berevanîya Filstînî, gelê Rojavayê, rojhilat û başûrê Kurdistanê, Êzdî û hwd. Radeya birêxistinî li cem wan gehîşte wê astê ku artêşeke tayebet bi jina Gerîla sala 1993yan li Botan û Badînanê damezrandin û li gor wê ezmûnê (tecrubeyê) Yekîneyên Parastina Jinê YPJ li Rojavayê sala 2013an hatin damezrandin. Berevanîya şervanên Kurd li Rojavayê di çarçoveya kirîza Sûrî de ji sala 2011an ve, dikeve çarçoveya bîrûbawerîya şer ya Gerîla de. Çimkî piranîya fermandarên şer û cengan, bi xwe ji Gerîlayên ku

vegerîyabûn Rojavayê bûn. Piştî ku Rojava tûşî êrîşên Cebhet El-Nesre û Daiş (şaxên El-Qayde), mîlîsên Ixwan El-Muslimîn yên dewleta Tirk piştgirîya wan dike û êrîşên rêjîma Sûrî hat, ew şervanên Gerîla vegerîyan û li gor ezmûna (tecrubeya) Tegera Azadîya Kurdistanê, ku temenê wê ji 30 salî zêdetir e, hêzên leşkerî yên birêxistî damezrandin. Bi saya alîkarîya wan ku destê alîkarîyê dan civakên Ereb, Xirstyan û Kurdên Êzdî ku bergîrîya êrîşên Daişê bikin û dewleta wê ya zordarî têkbibin. Ev ku şîyan wê şirove dike, şîyana bervanîyê û birêvebirina şer bi hostayî bikin, êrîşî zirîpoşan bikin û di dûrahîya 20 metreyan de şer bikin. Ne li dibistanên leşkerî yên dijminên gelê Kurd fêrî vê ezmûnê (tecrubeyê) bûne, lê belê li gora bîrdozîya fêrbûna civakî.

Stratejîya şervanên Gerîla dakok e, li ser amadekirin û xweşkirina zemîneke guncav ji bo avakirina artêşeke Kurdistanî bikin ku ev artêş bikare parastina hemû civakên Kurdistanî bike. Ji bo vê jî dixuye ku ew xwe dispêre wê tektîka parçekirina şerê giştî bi dijmin re li rêzbendên hevkar ji eşerên heta radeyekê biçûk li gor rêzika “lêxistin û veşartina” ya berdewam û hevkar. Ev yek dihêle ku jidestçûnên şoreşgeran kêm bin û di heman demê de jidestûnên dijmin zêde bin û hevkarîyeke rêjeyî di cudahîyan de çêdike; cudahîyên girêdayî cureyê çekan û hêza lojistî. Dixuye ku dijmin rastîya vê stratejîyê nas kirîye, lewma ji bo ku jidestçûnên xwe qerebû bike, zîyeneke herî mezin digihîne gundên Kurdan da ku li pêş raya giştî jidestçûnan bike weke hev. Dixuye ku ev yek hewldanên dijmin yên vegirtina civakên Kurdistanî têk dibe. Tu parçebûn di nav refên Gerîlayan de çênebûn. Dibe ku sedema vê parçenebûnê jî nermbûna Partîya Karkerên Kurdistanê be, her wiha li nerîna wî ya dîyalektîk di serederîya bi kesên vînlawaz re vedigere ku rê ji wan re vedike li malbata xwe vegerin û tolê ji kesên ku ji wan vediqetin nahilînin. Dixuye ku ev babet heta rêjeyekê dikeve çarçoveya bîrdozîya bijartina sirûştî de û sînorên şoreşgerane yên hişk ku li gor wan tev digerin. Ne tenê parçe nebûn, lê li derveyî bakurê Kurdistanê jî belav bûn û şervanên Gerîla yên her perçeyekî ji Kurdistanê çêbûn; bi yek bîrûbawerîya şer in lê hejmara wan bi dehên hezaran e.

Tevî vê yekê jî hêzên Gerîla ji ezmûna (tecrubeya) tehl reha nebûne ya ku hêzên Pêşmerge bi Cehşikan re dît. Çimkî desthilatên Tirk yên peyhatî,

mîlîsine leşkerî yên çete di bin navê “Parêzvanên Gundan” de ava kirin. “Pazrêzvanên Gundan” bi navê “Qirûçîyan” dihatin naskirin û erkê wan mîlîsan ew bû ku çalakîyên kuştinê û kiryarên istxbaratî yên qirêj li jêr sîwana partîya bi navê Hizbelaha Tirk bikin ku ev partî li nêv kurdan bi navê “Sofîkan” dihat nasîn; sedema vî navî jî hem biçûkxistin bû hem jî da ku ji Sofîya Kurdî bên cudakirin. Sofîya Kurdî ku serokê Kurd Ocalan wê weke beşekê ji Islama civakî û cureyekê ji xweparastina li dijî zordarî û desthilatdarîyê dibîne. Ji dêl ku dewleta Tirk pirsa Kurdî li gora pîvanên demokratîk û niştimanî çareser bike, berê xwe da pilana Qirûçîyan ya qirêj. Dixuye ku Gerîla karîbû tirsnakîya van milîsan vehewîne û tektîkên xwe bi pêş bixin, bi rêya bîrûbawerîyeke nû ya şer li jêr navê Şerê Gelêrî yê Şoreşgerane. Vî şerî xwe bi tenê nedisparte tundîya çekdarî, lê belê xwe sparte serpêçî, xwepêşandan, raperîn û hwd jî bi awayekî ku rê ji kesên neçekdar re jî vebe ku tev li kiryarên bêçek li dijî dijmin bibin. Dibe ku ev xal yek ji sedemên sereke be yên xweragirtina şervanên Gerîla, zêdeyî 30 salî, li hember hêza leşkerî ya mezin ya Tirkîyê û Îranê; tevî dîlgirtina serokê Kurd Ebdula Ocelan û jidestçûna gelek fermandaran, dixuye ku hêza Gerîla pirtir dibe. Dibe ku raza vî babetî ew be ku fermandarên Tevgera Azadîya Kurdistanê, stratejîyekê dişopînin ku hemû leşkerên Gerîla bibin fermandar anku her şervanekî Gerîla dikare di her kêlîyê de bibe fermandar, ew jî li gor hin waneyên leşkerî yên tevgerê, piştî ku me ew wane pelandin.

Şervanê Pêşmerge û şervanê Gerîla her du amade ne ku bi hev re parastina civakên Kurdistanî bikin; her wekî çawa mil bi mil di van cengan de şer kirin: Şerê Bervanîya Kobanîyê, şerên başûrê Kurdistanê li dijî êrîşên hovane yên rêxistina Daişê yên li dijî niştecîyên bajêr û herêma Kurdistana Îraqê. Hevkarîya Gerîla û Pêşmergeyan (bi her du beşên xwe ve) kir ku wizeyeke razber li cem Kurdan peyda bibe û gur bibe, her wiha bi saya wê hevkarîyê, têkçûn û şkestinên mezin bi serê Daişê de anîn. Li milekî din em dibînin her ku nakokî li hundirê tevgera sîyasî ya Kurdistanî gur dibin, wizeya razber ya piranîya Kurdan dadikeve û dixuye ku baş haya dijminên Kurdan ji vê xalê heye.

**• Şervanê Rojavayê**

Ezmûna (Tecrubeya) Yekîneyên Parastina Gel û Jinê yên ku hîmê Hêzên Sûrîya Demokratîk in, Hêzên Parastina Civakê HPC, Hêzên Dijterorê, ezmûnekî (tecrubeyeke) kêmpeyda di dîroka leşkerîya Kurdî ya hevdem de ye. Çimkî avabûna wê di nav kirîza sûrî de di demeke heta astekê kurt de û lehengîya di şer de nîşan dan û biserkevtinên wê yên mezin bi dahat û derfetên kêm, dikin ku alîyên derdorê jixweber rêzê jê re bigirin û di hin şaşîtîyên wê de biborin. Gotina "YPG" bû navekî bijare ji bo şervanê Kurd li Rojavayê.

Şervanê Rojavayê nimûneyeke kêmpeyda ye, çimkî ew têkelek ji şervanê Pêşmerge û şervanê Gerîla ye, her wiha leşkerek e, ku serederîyê bi rêxistinên leşkerî yên nîvbirêxistî re dike. Dibe ku mirov ji vê bîrdozîyê seyr bimîne, lê rastî wiha xuya dibe. Çimkî di destpêka kirîza Sûrîyê de û dema ku mîlîsên bi ser rikberîya Sûrî ve, alîgirên rêjîma Erdogan êrîşî deverên Kurdan kirin, gîyanê cengê yê Kurd yê kilasîk derket ku şervanê Pêşmerge yê resen wî dinimîne. Ev yek baş di bezîna şervanên Kurd bi ciwan û pîrên xwe ve ber bi anîyên şer ve xuya bû da ku parastina deverên xwe bikin, tevî ku gelekan ji wan perwerdeyên leşkerî nedîtibûn û tu ezmûna (tecrubeya) wan di şer de nebû; wekî ku cureyekî nû ji şervanên Pêşmerge bin yên ku parastina hoz û deverên xwe dikirin.

Lê ev gîyanê cengê ji alîyê komeke fermandarên Gerîla ve ji zarên Rojavayê geş dibû û bi rê ve diçû. Ev fermandarên han di refên Hêzên Parastina Gel de bûn û li gor bawerîya şer ya van hêzan, ji bo parastina xaka xwe vegerîyan. Fermandar ji bo bipêşxistina şîyanên cengê yên şervanên Rojavayê xebitîn; bi rêya wê gavê ku ji çarçoveya şerê Gerîla derketin û berê xwe dane şerê enîyan ku tê de xwe dispartin çekên giran her wekî zirîpoş, tank û topan di çarçoveya rêxistinên leşkerî yên hema hema birêxistî de, ku vê dawîyê li Hêzên Sûrîya Demokratîk veguhezîn. Dibe roleke ezmûna (tecrubeya) berê ya hin şervanên ku berê di leşkerîya Sûrî de bûn û pişkdarîya hindekan ji wan di şerên desthelata navendî de li Colanê û li Libnanê de. Şîyan û karîna leşkerî gehîşt wê astê ku têkelîyên duplomasî di milê leşkerî de bi hin hêzên navdewletî û herêmî ve girê dan û fermandarekî vê hêzê nasnava "General" wergirt.

Pradîgmaya neteweya demokratîk ya ku serokê Kurd Ebdula Ocelan weke çareserîyekê ji pirsa Kurdî re pêşkêş kir, wizaya vê bîrûbawerîya şer li cem şervanên Rojavayê ku xwe dispêrin bîrûbawerîya xweparastinê; bîrûbawerîya ku girêdayî bi beşeke mezin ji bav û kalên Kurdan, her wekî Kardoxan û hêzên Kara li cem Medan bi rêya Hêzên Parastina Civakê HPC. Anku her dem amade ne ku şerê her hêzeke hewl bide zîyanê bigehîne civakên Rojavayê bikin. Rastî jî van hêzan heta radeyeke mezin dikarî bi sed hezaran ji sivîlan ji kuştin, kolekirin, bicêrîkirin, dizî û şêlandinê biparêze. Dixuye ku bi saya vê stratejîyê xwe ragirtin û zora van hêzan tevan birine: Daişa terorîst, Cebhet El-Nesere û mîlîsên Ixwan El-Mislimîn yên ku bi navê Artêşa Sûrîyê ya Azad dihatin naskirin. Her wiha ji bo ku dewleta Tirk vê dawîyê hin deverên Rojavayê dagir bike, van hêzan ew neçar kir ku baştirîn hêz û çekên xwe bi kar bîne.

Li gor xalên bihûrî, em dikarin şervanê Kurd yê Rojavayê wekî nimûneyeke biyekbûna Pêşmerge û Gerîla bibînin, her wiha nimûneyeke nû ji şervanê Kurd e yê ku dikare di heman demê de şerê Gerîla û şerê nîzamî bike. Dixuye sedem ev e, ku dijminên gelê Kurd, Tirkîye, Îran, Beisî, Rûsya û rêxistinên bi ser wan ve, nikarin bîrûbawerîya şer li cem şervanên Rojavayê bişkînin. Bîyanga vê yekê jî ew e, ku hêzeke pir mezin di êrîşên bi ser Rojavayê de bi taybet li Ênîsa û Şehbayê bi kar tînin, lê piranîya êrîşan hatin têkbirin.

Dixuye ku şervanên Rojavayê jî ji ezmûna (tecrubeya) Pêşmergan bi Cihşikan re û ezmûna (tecrubeya) Gerîla bi Qiroçî û Sofîkan nehatine parastin û ne dûrkevtî ne, çimkî çend mîlîsên çete da ku şerê gelê Kurd li Rojavayê bikin ji alîyê dewleta Tirk ve hatin damezrandin, her wekî mîlîsên Azadî, Selahedîn, Yûsif El-Ezme û hwd. Bi pereyan şerê gelê xwe dikin, lewma Kurdan navê “Çete”yan li wan kir. Tevî ku gelek şer li dijî Yekîneyên Parastina Gel û Jinê pêk anîn, lê nikarîbûn carekê tenê jî bi ser bikevin. Di dagîrkirina Efrîn, Girê Spî û Serê Kanîyê de jî alîkar bûn ku piştgirîya istixbaratî û leşkerî ji dagîrkerîya Tirk re dikirin. Di encama vê alîkarîyê de komkujîyên kambax bi serê Kurdên Rojavayê de anîn û gelek deverên wê hatin dagîrkirin. Niha jî bi rêya sîyaseta tirkkirinê li deverên dagîrkirî, prosesên guhartina demografî û qirkirina çandî li dijî kurdan pêk tên.

Fermandarên leşkerî li Rojavayê, karîn û şîyana beşeke mezin ji şervanan li pêş xistin. Ew jî bi rêya sazkirina hêzên nû ku xwe dispêrin gîyanê cangê yê Gerîla û di heman demê de li ser bingehên şer yên nû û li ser destê hin karzanên Hevpeymana Navdewletî ya Şerê Terorê, hatine perwerdekirin. Bi vî awayî Hêzên Asayîşê yên Taybet HAT û Yekîneyên Antî Terorê YAT hatin damezrandin. Hêzên Bijarde ne û her dem ji bo şer di amadebaşîyê de ne, wekî xwegorîkerên refên pêşîn yên şer tên dîtin da ku civakên Rojavayê biparêzin. Di heman demê de ji bo ku bîrûbawerîya şer li nik şervanên Rojavayê li kêmê neçe, ji ber rawestina şer piştî şikandina Daişê û gefên dewleta Tirk xwedîya çekên pêşkevtî û hewldanên rêjîma Sûrîyê yên têkbirina aramî û ewlehîya deverên bakur û rojhilatê Sûrîyê, hêzên taybet yên navbihûrî bijardeyeke baş in.

Li deverên ku ji alîyê dewleta tirk ve hatine dagîrkirin, bi taybet herêma Efrînê, şervanên Kurd bi rêya bikaranîna tektîkên Gerîla yên êrîşê di çarçoveya birêxistineke leşkerî de ya bi navê Hêzên Rizgarîya Efrînê, şerê dagîrkerîya Tirkîyê dikin. Ev tektîk weke gaveke pêşîn e, ji bo ku rewş û mercên leşkerî yên guncav amade bikin da ku di paşerojê de ji alîyê statûyeke leşkerî ya Kurdî pêşkevtî ji Yekîneyên Parastina Gel û Jinê, wan deveran rizgar bike.

**• Dawî**

Piştî yekgirtina bîrûbawerîya şer, ya ku hêmaneke sereke ye ji bo damezrandina statûyeke leşkerî hevgirtî û bihêz. Çimkî şer pîşeyek e, ku pêdivîya wê bi karîn û şîyanên ramanî, derûnî û laşî yên mezin heye, her wiha bi sînorên sincî û wijdanî yên hevseng heye. Lewre divê di çarçoveya van karîn û rêkarîyan de kesên guncav ji bo şer bên hilbijartin. Perwerde faktora sereke di bicihkirin û pêşxistina van pîvanan de ye. Li alîyê din, bîrûbawerîya şer wizeya xwe ji civakê digire, lewma çiqasî hêz mezin û pêşkevtî be, heger civak wê bi şervanên ku ji xwegorîkirinê amade bar neke, berevanî û xweragirtin dom nakin.

Tevî ku Kurd xwedîyên bîrûbawerîyeke şer ya bijarde ne û li seranserê dîrokê bi gelê şervan dihatin naskirin, lê biserkeftinên wan kêm in û nekarîne statûyeke sîyasî ava bikin ku neteweya Kurd vehewîne. Dixuye ku gelek sedem ji vê yekê re hene û sedemên herî dîyar ev in:

Fermandarên stratejîk li Kurdistanê nînin; ku gotarek helbestvanê Kurd yên mezin, Ehmedê Xanî, heye dibêje: “Heke fermandarekî me heba, em dê li dor bicivîyana û dê dewlet û welatekî me jî ava bibûya.” Serdar û Şêxên hozan nekarî bûn kesayeta fermandar ya weke kesayeta Kawayê Hesinkar û Keyxisro biafirînin. Her wiha bawerîyeke niştimanî ku Kurdan bigehîne hev nîne; çimkî Kurd olê yan êlîtîyê yan jî partîtîyê ji neteweyê girîngtir dibînin. Tersî xizmên xwe yên Faris ku ayînazaya (mezheba) Şî'î weke bawerîyek berhevkar bi xwe girtine û bi vê yekê karîbûn sabarekî bihêz ava bikin ku li pêş bihêztirîn dewletên dinyayê rûbirû û berhengarîyê bike, û karîbûn çand û erdnîgarîya xwe biparêze, û heman karûbar heta astekê ji bo cîranê wan yên Ereb.

Levakirina erdnîgarîya Kurdistanê di navbera çar dewletan de, bû sedem ku Kurd ji hev veder bibin û bi vî awayî qutbûneke çandî di navbera wan de çêbû. Çimkî kurdê li bakurê Kurdistanê bi zanebûn tûşî sîyaseta tirkkirinê tê û sîyasetên fariskirin û erebkirinê li ser Kurdên li Îran, Îraq û Sûrîyê tên ajotin. Şervanê Kurd li bakurê Kurdistanê bû xwedî xuyên taybet; çimkî şervanek şerê zordarîya dewleta Tirk dike û şervanekî din di nav refên artêşa Tirk de ye. bîrûbawerîyeke şer ya teybet ji bo her şervanekî ji wan heye. Heman tişt li Îran, Îraq û Sûrîyê jî pêk tê. Lewre ji bo ku Kurd di van rewşên têkalandî (komplêks) de bibin yek, pêdivî bi serkirdeyên stratejîk yên nenormal heye. Û çi nîşandera yekîtî bi kartêkirineke derveyî pêk were, dê weke ezmûna (tecrubeya) herêma Kurdistana Îraqê bêsûd û ne çalak be. Lewma heger nifşên Kurdan yên nû dûr ji nakokî û devjenîyên partîtî û îdyolojîya partîtî ya bêber xwedî bibin û bîrewerîya sîyasî û zanyarî zêde bibe, dibe ku di paşerojê de fermandarên payeberz peyda bibin; bi taybet ku qirkirinên bi komelî li dijî Kurdan dixuye dê berdewam be û bi şêwazekî bilindtir ji hêla rêjeyê ve. Derbiderkirina Kurdan ji Efrîn, Serê Kanîyê û Girê Spî û Şengalê dê rê ji domkirina ramana tolhildanê re xweş bike. Li vir ev peywira payebilindên bîrdozî yên Kurd dest pê dike ku nifşekî fermandar ava bikin; her wekî ezmûna (tecrubeya) Medan di 612an b.z.

Faktoreke din jî heye, zêde girîngîyê bi çanda Kurdî û berzkirina rola lehengên Kurd di dastan û mîtolojîya Kurdî de li cem civakên Kurdistanî nayê dan. Her weha qewîtî û şîretên fermandar û şervanên Kurd jî berî ku

bi destê dijminan bên şehîdxistin ew qewîtî nayên belavkirin. Ji ber ku dişê dibe rêbaz û rênimayên hizrî û wireyî ji bo perwazkirina bîrûbawerîya şer ya kurdî ya yekgirtî. Tevî zanîna ku edebîyata siyasetkirî zora berhemên çandî û ramanî yên kurdî dibe û bi ser dikeve. Çimkî wekî mînak, bi dehan belavokên bîrdozî yên bi sosyolojîya Kurdî barkirî yên Serokê Tevgera Azadîya Kurdistanê Ebdula Ocelan hene, lê ji alîyê çend şepêlên sîyasî yên Kurd ve tên paştguhkirin.

Ji bilî vê, xuya ye ku serkirdeyên Kurd ji bo têkbirin, bêhêzkirin yan falinckirina bîrûbawerîya şer ya dijberan, ne xwediyê dîtineke stratejîk in, dibe ku sedema vê yekê jî dubendî, cudahî û hevrikîya di nav mala Kurdan de be, û lawazbûna biçekkirina tektîkî û stratejî be; li gor erdnîgarîya leşkerî di qadên rûbirûbûnê de. Ji alîyê din ve, bandorbûna bi globalbûnê û berfirehbûna lîberalîzmê li nik gelek Kurdan, weke bertekekê li hember nakokîyên di nav tevgera siyasî ya kurdî de, li pêşiya pêşxistina bîrûbawerîya şer ya vê komê dibin asteng ku tê de xweperestî, mandelêkirina nasnameyê û kûrbûna gîyanê bi binkevtinê li hember metirsîyên li ser neteweyê zêde dibe û ev xwepersetî, mandelêkirin û hwd bandoreke neyînî li berxwedanê dike li hember her êrîşeke pêkan yan jî pêkanîna operasyonên leşkerî ji bo rizgarkirina herêmên dagîrkirî radiweste. Ji ber vê yekê jî ji bo metirsîyên ku li ser hebûna Kurdan û ajandayên ku li dijî wan têne hûnan, pêwîstî bi pêşxistina hişmendîya siyasî û zanyarî heye û ev gav berpirsyarîya pêkhateyên çandî û siyasî ye. Li kêleka wê jî akademîyên leşkerî li ser bingeha xweparastinê û navendên lêkolînê yên leşkerî werin avakirin, da ku dastanên leşkerî yên dîroka Kurdan bi bîr bînin, rêzgirtina ji gelên ku rêzê li vîna gelê Kurd digirin, lêkolîna dijwar û metirsîyên li ser ewlekarîya neteweyî ya Kurdî, bi pêşxistina behreyên bikaranîna çekên cûrbicûr, perwerdehîya li ser serederîya bi şerên cûrbicûr yên nuklerî, biyolojîkî, kilasîk, terorîstî û hwd û bi pêşxistina hişmendîya leşkerî di civakê de.

Ji ber vê yekê, berî hizirkirin û lêkolîna biyekkirina leşkerî ya Kurdan li Rojavayê, pêwîst e van tiştan li ber çavan bigirin; her pêşniyazek divê li ser bingehê pêşxistina hêzên heyî bê avakirin, ne ku taybetmendîyên wan yên bîrdozî ji holê bên rakirin û formasyonên din yên ji wan cuda bên afirandin. Hizra encûmenên leşkerî yên herêmên Rojavayê li gor rastîya

siyasî ya niha ya herêmê guncav xuya dike û heger rewşa siyasî ber bi başbûnê ve pêş bikeve, dikare ji nû ve li ber çavan bê derbaskirin. Lewre, heger hêzên sîyasî yên Kurd li Rojava vê hizr û bijardeyê ji bo yekgirtina hêzên xwe yên şer bişopînin ku ev hêz tev li van encûmenan bibin, dê ji alîyê qezenckirina demê û kêmkirina lêçûnan ve ji bo wan baş be. Bi vî awayî dê bîrûbawerîya şer ji bo parastina sînorên Rojavayê jî bi yek bibe, ew jî bo nimûne, bi rêya avakirina hêzeke leşkerî ya nû bi navê “Parêzvanên Herêman” ku şervanên bijarede yên encûmenên leşkerî di vê hêzê de cih bigirin û girêdayî fermandarîya leşkerî ya giştî ya Rojavayê be. Ku fermandarîya leşkerî ya giştî jî ji encûmeneke leşkerî pêk were û nûnerên hemû encûmenên leşkerî yên hemû deverên Rojavayê di vê encûmenê de cih bigirin û fermandarê giştî bi awayekî demokratîk bê hilbijartin. Ev yek dê bibe hêzeke mezin ya wireyî (manewî) û madî û dê hestên ewlekarîya neteweyî li cem Kurdan geş bike û ya ku piştgirîya wê bike, endezyarîya baldar û lêkolînkirî ya erdnîgariya leşkerî li Rojavayê ye.

---

## Çavkanî û jêder


**• Çavkanî û jêderên bi Kurdan ve girêdayî ne.**

*1. Mihemed Emîn Zekî Beg; Kurteya dîroka Kurd û Kurdistanê / ji serdemên dîrokî yên herî kevn heta niha; Werger: Mihemed Elî Ewnî; Çapa 2yemîn - 2005; Weşanxane: Mala Giştî ya Rewşenbîrîyê - Bexda.*

*2. Dr. Xelîl Ebdilrehman; Avesta / Pirtûka Pîroz a Zerdeştî; çapa duyemîn 2008; Weşanxane: Rewafed bo çand û huner - Şam.*

*3. Dr. Ehmed Mehmûd El-Xelîl; Padîşahiya Medyayê; Çapa Yekem - 2011; Weşanger: Sazîya Lêkolîn û Weşanê ya Mokryani; Hewlêr;*

*4. Dr. Ferest Marei; Kurdistan di sedsala heftemîn a zayînê de; Weşanger: Navenda Kurdistan ya Lêkolînên Stratejîk; Silêmanî 2006; Hejmara çapê tune.*

*5. Dr. Kemal Mezhar Ehmed; Kurdistan di salên Şerê Cîhanê yê Yekem de; Werger: Mihemed El Mela Ebdilkerîm; Çapa 3. - 2013; Weşanxane: Dar El-Farabî - Beyrût / Dar Aras bo Çap û Weşanê - Hewlêr.*

*6. Abdullah Ocalan; Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk (Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Neteweya Demokratîk; Ji bo Parastina Kurdên Di Çenên Qirkirina Çandî de) / Bergê Pêncemîn; Werger: Zaxo Şiyar; Çapa 2. 2014; Bê weşanxane.*

*7. Mesûd Barzanî; Barzanî û Tevgera Rizgarîxwaz a Kurd / Beşa Sêyem (Şoreşa Îlona 1961-1975); Hewlêr 2002; Bê weşanxane û hejmara çapê.*

*8. Rachid Hammo, Şoreşa Çiyayê Kurdan "Tevgera Morîden" (Lêkolînek li ser berxwedana çiya û tevgera şopdarên li dijî dagirkerîya Fransî 1941-1921 CE), çapa yekem 2001; Bê weşanxane.*
*9. Mario Fomerton-Vladimir Felgenburg; Pirsgirêka yekgirtina hêzên Pêşmerge; Weşanger: Malcolm Kerr-Carnegie Navenda Rojhilata Navîn / Analîzên Herêmî; Dîroka Weşandinê: 16.12.2015; lînk: https://carnegie-mec.org/2015/12/16/ar-pub-61931*
*10. Rafîda Ebdillah Ebdilsemed el-Qeredaxî; Kurdistana Iraqê di dîroka kevnar de li ber ronahiya jêderên mîxî ji hezarsala sêyem berî zayînê heta sala 612 berî zayînê; Teza ji bo wergirtina doktora di dîroka kevnar de li zanîngeha Silêmaniyê - Koleja zanistên mirovî sala 2008.*
*11. F. Dyakov / S. Kovalev; Şaristaniyên Kevnar (Beşa Yekem); Werger: Nesîm Wakim Yazigî; çapa yekem 2000; Weşanxane: Dar Eladîn / Şam.*
*12. Keltuma Cemîl Abdilwahed; Kurdistan di Serdema Sasaniyan de (630-224 PZ) / Lêkolînek li ser jiyana olî, civakî û aborî; çapa yekem 2007; Çapemeniya Wezareta Perwerdeyê - Hewlêr.*
*13. Lêkolîna heftemîn ji beşa yekem a pirtûka Cebel El-Kurd (Efrîn) / lêkolîneke dîrokî, civakî ya belgeyî; Ji hêla Dr. Mihemed Ebdo Elî; daneya erebî - Efrîn 2003; Bê weşanxane û hejmara çapê.*
*14. Vladimir Minorsky; Kurd / Çavdêrî û Çavdêrî - Kurd Neviyên Medan; Werger: Dr. Meirûf Xeznedar; çapa yekem 1987; Weşanxane: Komela Kawa ya Çanda Kurdî (Swêd) û Dar El-Kateb (Beyrût).*
*15. Slowat Kulyamov; Arya kevnar û Kurdistana Ebedî (Kurd ji gelên herî kevn in); Wergera Dr. Îsmaîl El-Hesaf; çapa yekem 2011; weşanger: Sazîya Lêkolîn û Weşanê ya Mokryani; Hewlêr;*
*16. M.S. Lazarev û yên din; Dîroka Kurdistanê; Werger: Dr. Ebdê Hecî; çapa duyem 2011; Weşanxane: Sazîya Spîrêz bo Çap û Weşanê - Duhok.*
*17. Arshak Safristian; Kurd û Kurdistan; Werger: Dr. Ehmed Mehmûd El-Xelîl; çapa duyemîn 2008; Weşanxane: Dar Serdam - Silêmanî / Herêma Kurdistanê.*
*18. Basil Niktin; Kurd/ eslê wan, dîrok, welatê wan, .../; serrastkirin, lêveger û pêşkêşkirin: Selah Berwarî; Weşanger: Kovara Çandî ya ASO; Hejmara çapê û dîroka weşanê tune.*
*19. P. Lêrx; Lêkolînên li ser kurdan û bav û kalên wan ên bakur ên Xalidî; Werger: Dr. Ebdê Hecî; çapa yekem 1994; Weşanxane: Pirtûkxaneya Xanî - Heleb.*
*20. Gernot Wilhelm; Hûrî/ dîrok û şaristaniya wan; Werger: Dr. Farûq Îsmaîl; çapa yekem 2000; Weşanxane: Dar Jadal - Heleb.*
*21. Thomas Bois; Kurd; Werger: Salah Îrfan; hejmara çapê tune; Weşanxane: Navenda Lêkolînên Kurdî (Kurdolojî) - Silêmanî.*
*22. W.E. Wikram- Edkar. T. E. Wikram; Dergûşa Mirovahiyê (Jiyana li Rojhilatê Kurdistanê); Werger: Cercîs Fethallah; Weşanxane: Dar Aras ya Çap û Weşanê - Hewlêr / Kurdistana Iraqê; Çapa çaremîn 2010.*

*23. Robert Olson; Dîroka Têkoşîna Neteweyî ya Kurd (1925-1880); Werger: Ehmed Mehmûd El-Xelîl; çapa yekem 2013; Weşanxane: Dar El-Farabî - Beyrût.*

- **Çavkanî û jêderên erebkirî.**

*1. General Carl von Clausewitz; El-Wecîz di Şer de; Wergerandin: Ekrem Dêrî / El-Heythem El-Eyûbî; Çapa duyem - 1988; Weşanxane: Enstîtuya Erebî ya Lêkolîn û Weşanê / Beyrût.*
*2. Mao Tsî Tong; şerê gerîlla (şerê gerîllayan); Werger: Pirtûkxaneya Ereban a Mao Tsî Tong; Weşanxane: Dar Sûriye / Jarkas û Tanbekji.*
*3. Orgeneral Moshe Dayan; dersên li ser şerê gerîlla/êrîş û parastinê; Pirtûkxaneya Aleskendriya; Bê dîrok, hejmara çapê û wergêr.*
*4. Ernesto Gîvara; Şerê Gerîlla; Wergera Nahed Munir Al Rayes; Weşanger: Yekîtiya Giştî ya Xwendekarên Filistînî; Bê dîrok û hejmara çapê.*

- **Çavkanî û jêderên rojavayî**

*1.NATO STANDARDIZATION OFFICE (NSO); ALLIED JOINT DOCTRINE (AJP-01)/ NATO STANDARD; ALLIED JOINT PUBLICATION; Edition E Version 1(FEBRUARY 2017); Link:*
*https://www.gov.uk/government/publications/ajp-01-d-allied-joint-doctrine*
*2.NATO UNCLASSIFIED publication; ALLIED JOINT DOCTRINE/ AJP-01(D); 21 December 2010;*
*CMDR Centre of Excellence; Link:*
*https://www.cmdrcoe.org/download.cgf.php?id=13*
*3.MG (ret) Kees Homan; Doctrine; CLINGENDAEL INSTITUTE (INDEPENDENT THINK TANK & DIPLOMATIC ACADEMY); Link:*

*https://www.clingendael.org/sites/default/files/pdfs/20080700_cscp_chapter_homan_doctrine.pdf*

- **Çavkanî û jêderên Erebî.**

*1. Îmam Muhemmed bin Omer El-Waqidî; Dîroka fethên Cezîrê, Xabûr, Diyarbekir û Iraqê; Lêpirsîn: Abdel Aziz Feyadh Harfûş; Weşanger: Dar El-Beşaer bo çapkirin, çapkirin û belavkirinê - Şam / 1996; Hejmara çapê tune.*
*2. Serfermandarê Giştî Pîlot Abd al-Rahman Hesen El-Şehrî; pêşveçûna bawerî û stratejiyên leşkerî; çapa yekem 2003; Weşanger nivîskar - Riyad / Erebistana Siûdî.*
*3. Samir Diab Sbitan; erdnîgariya leşkerî; çapa yekem 2012; Weşanger: Elcenadriyah ji bo Weşan û Belavkirinê Uman/Urdun.*

*4. A. Elî Rageh Berekat; Teoriya Bandura ya fêrbûna civakî; Zanîngeha Umm Al-Qura / Beşa Psîkolojiyê; lînk:*
*https://webcache.googleusercontent.com/search?q=cache:wQSZh1TGqjoJ:https://faculty-old.psau.edu.sa/filedownload/doc-9-pdf-f0e6055aa7c6f509c6385327eb615820-original.pdf+&cd=2&hl=ar&ct=clnk&gl=iq*

**• Malperên elekitronî.**

*1. Nafeh Şebû; Aryosî û bandora wê li ser baweriya îslamê!! Weşanxane: Malpera El-Hiwar El-Mutemdin/ Hejmar 6190 - 3/4/2019; lînk:*
*https://www.ahewar.org/debat/show.art.asp?aid=633165*
*2. Xalid Îsa; Ji belgeyên pevçûnên li giravê yên 1937-29; Weşanxane: Malpera Gilgamêş 10/2/2010; lînk:*
*https://www.gilgamish.org/2010/02/10/23891.html*
*3. Faris Osman; Toşa Amûdê 1937; Weşan: Malpera Madarat Kurd; 5/8/2015; lînk:*
*https://www.medaratkurd.com/2015/08/%D8%A7%Dinter6%D8%AA%D8%A7%D8%B6%D8%A93%D8%B9%D8% A7%DvirginallyD8%AF%D8 %A7-amude-tosa-1937/*
*4. Huseyn Feqe; Xwarina bi navê Pêşmergeyên Rojava; Weşanxane: Malpera Xebar24; Dîroka Weşandinê: 01/13/2021; lînk:*
*https://xeber24.org/archives/321032*
*5. Ansîklopediya Zanînê (elektronîk)*
*6. Ansîklopediya azad - Wîkîpediya.*

# Komara islamî ya Îranî

**(B 2)**

## Stratejîya Îranê

## Bîrûbawerîya Leşkerî, Ewlehî û Hêza Zîrek

Ji berê de û hîna jî pêşbînîkirina metirsîyan û amadeyî jê re, û peyrewkirina şêwazên şer yên nimûnekirî bi êrîşkirin û bergîrîyê, bi her desthilatdarî yan sabarekî siyasî yan jî dewletekê re ji destpêkê ve pêbendkirî ye, û bibe ku ew ji nîşaneyên cudakar be yên ku mirovê zîrek cihê dikin. Ji ber serpêhatî û ezmûnên wî û bapîrên wî roleke mezin di vê yekê de lîst, ji ber ku tiştên bi serê wan hat ji astengiyên weke êrîşên lawirên kujer û bobelatên xwezayî weke lehî, birçîbûn û nexweşî, dihatin. Ev yek jî bi xwe re metirsiyên nû weke êrîşên komeleyan û sabarên mirovan li dijî hev, ji bo man û berdewamîya xwe ji hêlekê ve, yan jî ji bo têrkirina arazûya desthilatdarî û komkirina samanan ji hêleke din ve, derxistin holê. Her tim mirov tûşî du helwestan dihat, yan bibe êrşîker yan jî berevan. Ji bo vê yekê jî gelek behremendîyên xwe weke çêkirina çekan, tektîkên êrîş û berevanîyê û endezyarîya asêgehan ji avakirina kelh, bend, sûr, bîr, amadekirina embaran ji bo embarkirina heyber û xwardemenîyan, bi pêş dixistin. Piştî derketina olan û damezirandina dewletên olî, ol roleke pir mezin di pêşxistin û rajeya vê yekê de lîst û bandoreke pir mezin li ser derxistina têgeha bîrûbawerîya leşkerî kir. Her wekî ku Markis dibêje: "**Heger ol bê berhênan û sûdwergirtin hingê hişbira gelan e …**". Girêdaneke mezin di navbera desthilatdarî û hêza leşkerî de heye. Ji bo ku desthilatdarî berdewam bike pêdivîya wê bi bîrûbaweriyeke leşkerî heye. Ji bo ku bikaribe di rêya wê re pirsgirêkên ku rastî desthilatdarîyê tên, li gorî dîtina desthilatdarîyê çareser bike.

Bi derbasbûna felsefeyê bo vê meydanê, binemayên zanistên leşkerî û ewlehîyê kereste girt, ya ku vê paşê werar pê ket û bi navê "Stratejîyên Şer" hatin naskirin ku ne tenê girîngî didan şerên demkurt, lê belê girîngî didan çareserkirin û pêşbînîkirina guherînên paşerojîyê yên di vî warî de û

pêşniyarkirina çareserî û devêlên guncav dikirin, ji bo bergirtin û rûbirûbûna metirsîyên gumanbar. Gelek nav di vî warî de hatin naskirin wek fîlozof û rêberê Çînî Sun Tzo û fîlozofê Îtalî Mîkiyavêlî. Piştire jî hin ekademî, peymangehên leşkerî û navendên lêkolîn û lêgerînên pispor di vî warî de, derketin. Li gorî wan lêkolînan bîrûbaweriya artêşa wan ya leşkerî tê destnîşankirin.

Lêkolîn li ser Îranê yên ku dest avête alîyên ramyarî, leşkerî, civakî, dîrokî, aborî û hwd pir bûn. Lê ji bilî ku pêşveçûna bûyeran li ser qada navdewletî û rewşa pêşketin û paşveçûna têkeliyên navdewletî li Rohilata Navîn, hişt ku bûyerên germ li herêmê bêne şopnadin.  Ji bo ku wêne li gorî bûyeran pirtir bê zelalkirin û di gel bûyeran biçe, hingê ya baştir ew bû ku lêkolînkirin û şirovekirina wê bi awayekî baş bêne çêkirin. Ew jî ji ber ku Îran xwedî erdnîgariyeke pir berfireh e ku ji Firensa mezintir e. Dîroka wê jî kevnar e, her wiha roleke wê ya bibandor di siyaseta navdewletî de ji sedên salan ve heye. Li kêleka vê yekê jî samanên xaka wê pir in, her wiha cihêrengîyeke olî, tîreyî, îdyolojî û şênî lê heye, rehendeke wê ya herêmî bi dewletên herêmî re heye û hwd. Her wiha stratejîya Îran û artêşa wê li destpêka damezrandina şahinşahîya Farisî ya ku bi sedên salan serwerîya vê erdnîgarîyê kirîye, vedigerin.

### Têgeha Ewlehîya Neteweyî[1] ya Îranî

Bi şopandina siyaseta Îarnê ya derveyî û hundirîn, Îran bi rêberîya pergala “Wilayetûlfeqîh”[2] dibîne ku pergala navdewletî tevlîhev e, û tenê

[1] Ewlehiya neteweyî wisa tê pênasekirin "bi ingilîzî  National Security”: Ewlehiya neteweyî ew e ku dewlet bikaribe berdewambûna bingeha hêza xwe ya hundirîn, derveyî, leşkerî û aborî di hemû warên jiyanê de misoger bike; ji bo ku li hemberî metirsiyên hundir û derve yên ku gefan lê dixwin hem di rewşa şer hem jî di rewşa aştiyê de, raweste. . http://mawdoo3. com
Têkiliyên Tirkî-Îranî di Rojhilata Navîn tên guhertin- F. Stephen Larrabee, Alireza Nader, peymangeha lêkolînan RAND ya berevaniya niştimanî (ji bo encûmena niştimanî ya saloxgeriyê hatiye amadekirin).
Stratejiya Îranê li hemberî dewletên Kendava Erebî- Dr. Tacedîn Caifer El-Ta'î.

[2] Wilayet El-Feqîh: têgîneke fiqhî kevn e di olnasiya Şî'î ya dozdehîn de ye, ji destpêka veşariya mezin a imamê dozdemîn li nik şî'ayên dozdehîn El-Mehdî… Weliyê Feqîh cihê imamê windayî di rêbertiya welêt û birêvebirina karûbarên wê de, her wiha hilgirtina erkên hikûmeta Islamî li ser milê xwe û belavkirina hukmê Xwedan li ser rûyê erdê, digire. Wekîpêdiya.

yek serî serwerîya wê dike û navê “Şeytanê Mezin”[3] lê dike. Her wiha ew xwe neçar dibîne ku her tim di derdoreke dijminatîyê de bijî, lewre jî neçar e ku xwe bispêre hêza xwe ya leşkerî û wê bi pêş bixe. Rehendeke Îranê ya stratejîk û tixûbên wê yên ku berevanîyê di ber de bike, hene. Ew bi şaristanîyeke bêhempa, nijadîyeke serkevtî û cîgeheke mirovî û stratejîk ya cihêkar xwe balkêş dibîne, û xwe berpirs di ber avakirina Pergala Islamî ya Cîhanî dibîne û çarenebûna hinartina Şoreşa Islamî ji bo derve xwe berpirsyar dibîne. Ji bo pêkanîna vê armancê, divê hêmanên ramyarî, aborî, îdyolojî, ewlehî û leşkerî yên pêwîst ji pêkanîna vê armancê re misoger bike û li hemberî desthilatdarîya dijminên xwe rû bi rû bimîne. Di destpêka destûra Îranî de ev yek hatîye: “ Ji ber cewhera Islamî ya Şoreşa Islamî ya Îranê ku armanca wê serkevtina hemû bindestan li dijî serdestan e, lewre jî destûr ji bo berdewambûna vê şoreşê di hundir û derveyî welêt de dê mercan biafrîne, nemaze der barê berfirehkirina peywendiyên navdewletî de. Ji bo vê yekê jî hewl dide ku bi hemû tevgerên Islamî û yên gelêrî re yekneteweyê li cîhanê ava bike (neteweya Islamî), her wiha ji bo serkeftina gelên bindest û bêpar di cîhanê de, hewl dide ku cîhadê berdewam bike”.

Lewre jî Pergala Wilayetûlfeqîh pêwîst dibîne ku pergala Îranê ya ku li ser pêyan e, biparêze, li gorî nirx û rêgezên Şoreşa Islamî misoger bike, di bin dirûşmeya piştgirîya bindestan de wê belav bike, li dijî serdestan tê bikoşe, cihê xwe ji hêla herêmî ve bi hêz bike, beşdarî birêvebirina karûbarên cîhanî bibe; pêdivîyên xwe yên pêşveçûn, teknolojî, aborî û mirovî peyda bike, geşedana aborî pêk bîne, pêşveçûna domdar ji bo nifşên paşerojê misoger bike, hewl bide ku hevgirtina civakê xurtir bike û nasnameya ayînzayî (mezhebî) ya Şî'î biparêze. Her wiha li ser bidestxistina derfetên parastina dewletê di hemû waran de rijd be. Di dawîyê de pergala ciyosiyasî ya herêmî serûbin bike.

**Taybetmendîya Stratejîya Îranê**:

Hêza leşkerî ya ku Îran dixwaze misoger bike, amûra herî girîng e. Her wiha hêz, cure û meznahîya wê zêde bike. Ji ber vê yekê jî pareke mezin ji budceya xwe ji bo ku rajeya stratejîya xwe di warên leşkerî, ewlehî û

[3] Şeytanê Mezin (bi farisî شیطان بزرگ), ew têgîneke siyasî ye ku alîgirên Xumeynî di dema Şoreşa Islamî de li Îranê di sala 1979'an de bi kar anîn, mebesta wan ji Şeytanê Mezin Emerîka, paşê jî Ingilstan bû. Wekîpêdiya

piştgirîya ajanên xwe di herêmê de[4] bike, veqetandîye. Bi vî awayî dikare li hemberî dijminên navxweyî, herêmî û navdewletî rû bi rû bimîne û Prgala Wîlayetûlfeqîh ya ku "Imamê Xumeyînî[5]" di sala 1979'an de ava kirîye, biparêze.

Îranî bi Farisîtîyê pir şanaz in, lewre jî tiştekî asa ye ku serokên Îranê şahinşahiya Farisî weke lêveger û mînakê ji xwe re dibînin. Ji bo vê yekê jî, Kendava Lor (Erebî) weke Kendaveke Farisî dibîne[6]. Tevî ku piranîya niştecihên derdora wê Ereb in (Nîvgirava Erebî û Ewhwaz ). Her wiha tevî ku Faris %30 – 40 ji tevahîya gelê Îranê [7] dinimînin, zimanê Farisî zimanekî fermî ye û Newroz ne cejneke Islamî ye jî, lê li gorî dîtina xwe ya Farisî pîroz dikin. Mehên Farisî bi kar tînin û bi awayekî fermî danpêdanê bi ola Zerdeştî[8] dikin. Xala 13'an a destûra Îranî vê yekê biryar dide, ew ji dema

[4] Bilindbûna Îranê weke hêzêke herêmî: Bihêzkirina Şî'a û sînorên vê diyardeyê – Kovara NATO (NATO Review Magazine).

[5] Xumeynî: navê wî Ayetulah Ruhullah Mûsewî El-Xumeynî ye, di sala 1902'yan de li gundê “Xumeyn” yê ku dikeve başurê rojavayê bajarê “Qumê” ji dayîk bûye. Ew ji malbateke oldar e, bavê wî li ser destê mezintirîn sermiyan hat kuştin, piştî çend salan dayîka wî jî jiyana xwe ji dest da, lewre bi birayê xwe yê mezin "Pasendyedah Mûsewî" re yê oldar, jiyan kir. Ew tevlî hewza "Ayetulah Ebdulkerîm Elhaîrî" li bajarê "Arak" bû. Di sala 1922'yan de çû hewza bajarê Qumê. Xumeynî bi keça mêrekî oldar re ku navê wî "Muhemed Elseqefî Eltehranî" ye, zewcî û sê kur jê re çêbûn her sê jî mirin û sê keç jî du ji wan mirin. Di sala 1989'an de jiyana xwe ji dest da.
Stratejiya Îranê ya li hemberî dewletên Kendava Erebî. Dr. Tacedîn Caifer El-Taî
Xumeynî wekî rêberekî siyasî bêhtir ji feqîhekî olî navdar bû, ew olnasekî normal bû, gelek olnas hebûn ku wek lêvegerên olî dihatin naskiirn û asta wan ji ya wî bilintir bû.

[6] Pir nav li vê kendavê hatine kirin; navê Kendava Farisê, Kendavê Erebî, Deryaya Jêr, Deryaya Tahil, Erdê Xweda, Erdê Deryayê, Kendava Besra, Kendava Qetîf, Kendava Behrên û Kendava Uman. Lê navlêkirina Kendava Farisî ji hêla Yunaniyan ve hate danîn (yên ku dijminê empratoriya Farisî bûn). Navlêkirina Kendava Erebî ji hêla Ereban ve di destpêka salên şêstî de hate danîn. Neteweyên Yekbûyî di belgeyên xwe yên fermî de navê Kendava Farisî bi kar tînin. Stratejiya Îranê beranberî dewletên kendava Erebî- Dr. Tacedîn Caifer El-Taî.

[7] Siyaseta ayînî li herêma Kendavê, raporeke kurt- Navenda Lêkolînên Navneteweyî û Herêmî, Zagona Karûbarên Navneteweyî di zanîngeha Georgtaron li Qeterê
Demografiya Îranê. https://www. marefa. org
Şerê Farisan bi nijadên din re li ser qada Îranî
http://archive. arabic. cnn. com/2009/iran. 2009/6/8/iran. ethnic. groups/index. html

[8] Hejmara Zerdeştiyan dighêje 22 hezar kes, ew ol bi awayekî fermî hatiye pejirandin. Piraniya wan koçberî Emerîka bûn, hebûna wan li Îranê wek kêmol li bajarên Yezd û Karmanê dim'nin- Niştecihên Îranê- Wekîpêdiya.

dewleta Behlewî ve weke hêmayeke neteweyî ya Farisî tê pejrandin û cihên wan di perleman de heye, lewma jî stratejîya Îranê ji stratejîya Şahinşahîya Farisî bi awayekî rasterast yan jî nerasterast, bandor dibe.

Bawerîya Farisî her tim di jiyana Farisî ya giştî de amade ye û wê weke lêvegereke bingehîn ji xwe re dibînin. Her wekî ku Farisan ji bo ku serwerîya xwe bi cih bikin û li hemberî hevrikan rawestin, rehenda olî (Zerdeştî) di bîrûbawerîya xwe ya leşkerî de ji bo jêrdestkirinê û berhengarîya dijminên xwe bi kar anîn; û Îranîyan jî ji bo ku serwerîya xwe bi cih û berfirehtir bikin û jêrdestkirina xwe biçespînin; dûrbînxwazîya olî di rêya ayînzaya (mezheba) Şîî re bi kar anîn. Bi wateyeke din, bi îdyolojîya olî xwe pirçek kirin.

**Stratejîya[9] Şahinşahîya Farisî:**

Ji şaristanîya Somerî ve, dike ku hemû gelên kevnar hema bêje li ser bîrûbawerîyeke leşkerî rê dikevtin. Bi êrîşkirina gelên hevtixub û destdanîna ser samanên wan yan jî tolvekirin ji wan û wêrankirina şarestanîya wan nimûnende dike, ji taybetmendîyên vê bîrûbawerîyê bûn. Her wiha desteserkirina li ser rêyên bazirganiyê. Ji hêleke din ve jî bi pîrozkirina şer û serkevtinên padîşahan li ser peyker û bircan; mezinkirin û pîrozkirina kesayetîya padîşahan. Faris ne dûrî vê yekê bûn, padîşahên Farisan bi rêya nexşekirina bûyeran li ser kevirekî mezin li çiyayê Bihîston[10], serkevtinên xwe yên mezin nexş dikirin û dijminên xwe bê rûmet dikirin.

Pergalên desthiltdar yên ku li ser erdnîgarîya ku niha bi navê Îranê tê naskirin rabûne; di bîrûbawerîya xwe ya leşkerî de xwe spartine


---


[9] **Pênaseya Stratejiyê**: Ew yek ji hunerên leşkerî ye, mebest jê ew e ku plankirin û nîşankirina alavên ku divê di lutke û bingehê de bên bikaranîn ji bo pêkanîna armancên dûr bin. Her wiha di axaftina siyasî de tê bikaranîn.
Pênasekirin û wateya stratejiyê di ferhenga El-Meanî ya komker de- ferhngeke Erebî Erebî ye https://www. almaany. com
Têgîna stratejiyê: Ew bi inglîzî bi "strategy" tê naskirin. Ew têgîn nîşaneyeke xwe ya leşkerî heye. Di şerên kevn de ji bo plankirineke guncav wekî amadekarî ji şer re berî ku dest pê bike, dihatin danîn; yan ji bo parastina leşkergeh û dewletê jî êrîşeke ku heye çêbe dihat, bikaranîn. Lewre stratejî wek hunerek ji hunerên leşkerî hate pejirandin, her wiha bi hemû rewşên ku amadekariya şer dikin re dibe alîkar.

[10] **Neqşa Bihîston**: Ew neqşeke pirzimanî ye. Li Çiyayê Bihîstonê li parêzgeha Kermanşahê ye, li nêzî bajarê Kermanşahê yê rojavayê Îranê ye.

bîrûbawerîya leşkerî ya Farisî. Ev bîrûbawerîya jî li ser sê dûrbînxwazîyên sereke ku pragmatîka Farîsî nîşan dike, hatîye rawestandin, ew dûrbînxwazî jî ev in: dûrbînxwazîya olî, dûrbînxwazîya desthilatdarî û dûrbînxwazîya berfirehkirina ne. Ev yek di bûyerên ku çêbûne de tê xuyakirin, her wiha hişt ku statûyeke Farisî ava bibe, jixwe hebûna xwe ji 550 BZ û heta roja me ya îro wek hêzeke herêmî ya bibandor berdewam dike.

Ji “Korşê Duyem kurê Qembîzê Yekem” dest pê dike. Ew jî ji malbata Exmînî[11]bû. Li dijî bapîrê xwe yê ji alîyê diya wî ve Padîşahê Medan “Estiyak” rabû û bi ser ket, ji ber ku pilanek bikar anî. Naveroka vê pilanê ew bû ku Korş enîya hundirîn ya Farisî amade kir û ew li dijî pismamên wan yên Medî hêvotin û ji nakokîyên Medî – Medî sûd girt, ew jî di rêya girêdana hevpeymanan bi hin serokên wan yên ji qiral ne razî bûn weke “Erbak” û “Mezarîs”, her wiha bi padîşahîyên hawîrdorê re jî hevpeyman girê dan. Êdî hevpeyman bi padîşahê Kildanî re “Nabonîd” yê ku li ser destê Medan hate bêrûmetkirin û bi serokê Ermîniya “Dîgranê Yekem kurê Yerawent” re yê ku di bin serwerîya Medan de bû, girê da. Paşê jî Farisan her du têk birin. Korş di lêdana xwe de bi ser ket û di sala 550'î BZ serwerî bi dest xist û xwe weke padîşahê “Medîya û Faris” nav li xwe kir.




“Korş” nas kir ku ji bo statûya xwe ya nû biparêze, bidestxistina serwerîyê têrê nake. Ji ber gelek metirsî li derdora wî hene. Hin metirsîyên

[11] Wekîpîdiya dîroka Îranê ya siyasî (Ji dîroka efsanewî heta dawiya dewleta Tahirî)- pirtûka yekemîn- Dr. Hesen Kerîm El-Caf.
Padîşahiya Mediya- Dr. Ehmed Xelîl.
Sipay Pasdaran ya Îranê…. Damezrandin, avakirin û rola wê- Katizman Kenneth- Navenda Îmaratê ya Lêkolîn û Lêgerînan.

hundirîn hebûn weke daxwaza Medan ku xanedana xwe vegerînin û xwesteka hin malmezinên Farisan ku serwerîyê bi dest bixin. Li kêleka wê jî hin metirsîyên derveyî jî hebûn. Weke daxwaza mîrnişînên cîran ku mîrnişîna nû bi dest bixin. Ji bo vê yekê, Korş stratejîyek li ser berfirekirin, êrîşkirina li derve û dagîrkirina erdine nû ji xwe re bingeh girt û xwe spart bîrûbawerîya leşkerî ya nû ku bingehên wê ev in; artêşeke bihêz, lawazmayîna dijmin, pêwîstîya bidestxistina cihên stratejîk, komkirina mal û mewdanan û mijûlkirina rêber û mezinên Faris û Medan bi şerên derveyî re. Êdî rêyên bazirganîyê, samana binerd û keştîgehên deryayî li Deryaya Îgê û rojhilatî Deryaya Spî bi dest xist. Her wiha baceyên giran jî spandin. Der barê artêşa bihêz de, sûd ji pisporiya Medan girt, di vî warî de artêş birêxistin û disiplîn kir, çekê siwaran xurtir kir û çekên bibandor bi dest xist, weke Erebeyên cengê yên dasî [12] û piştre jî bikaranîna fîlên hindî. Her wiha leşkerkirina kaselîsên ji neteweyên din û sûdgirtina ji serpêhatîyên wan yên leşkerî weke dorpêçkirin, şer, lojîstîk, misogerkirina xetên dawî û alayên siwaran. Êdî alayek ji siwarên hilbijartî bi navê “Alaya Herdemî”[13] hate avakirin ku ji deh hezar siwaran pêk dihat, her wiha alayek bi navê “Fedekaran” hate avakirin. Ew jî alayeke din ji siwarên wêrek û fedekarîya heta mirinê, pêk tê. Ev alay yekîneyên taybet in ku nêzî padîşah in û parastina wî dikin. Ji hêlekê din ve, ji ber ku civaka wan civakeke cengewarî ye, pêwîstîya wan bi pirbûna zarokan heye, lewra zagona pirkirina jinan hate sazkirin. ji ber xort ji hêla aborîyê alîkarîya bavên xwe dikin û padîşah sûdeke leşkerî ji wan digirin. Jixwe bi rêya êrîşkirin, sepandina baceyan û bi tundî çewsandina tevgerên berxwedêr, dijmin dihat lawaz kirin.

Di encama vê stratejîyê de Faris karîbûn bigehîjin Misirê û ku ne ji şoreşa Medî bûya ya ku bi serkirdetîya yek ji kahinên Medan “Bîrtzîtîs”û birayê wî “Semîrdîsê Medî” ku bi navê “Komata” jî dihat naskirin; dê Faris bigehaştana başûrê Çemê Nîlê û “Ityobiya”yê. Şoreşa Medî di destpêka xwe de bi ser ket û hema hema serwerîya Farisî têk çûbû, lê qewîtîya padîşahê Farisî “Qembîzê Duyem” rê li pêşîya vê yekê girt. Dema ku “Qembîzê

---

[12] Erebeyên yekhucre: Erebeyeke teng e ku cihê ajoker û avêjkerekî tê de heye, ji textan hatiye çêkirin û hespekî beza yan jî bêtirî hespekî wê dikşîne.

[13] Siwarên Herdemî: Ji Yunanî Ἀθάνατοι, her wiha navê “Dehhezarên herdemî yan jî Siwarên herdemî” li wan tê kirin. Hîrodît ev nav li hêzeke taybet ji leşkerên ku ji bo empratoriya Exmînî şer dikirin, kir.

Duyem” ji Misirê vedigerîya ji bo ku şoreşa Medî têk bibe; di rê de nexweş ket. Hin çavkanî jî dibêjin ku ew ji hêla hin kesên ku çavên xwe berdabûn serwerîyê, hate kuştin û “Darayê Yekem”[14] jî yek ji wan bû. Qembîz nikarîbû ji ber nexweşîya xwe bi rê ve biçe, lewre jî siwar û fermandarên artêşa xwe kom kirin û qewîtîya xwe ji wan re got. Hîrodît ew qewîtî wiha anî ziman [15]**“Divê ez ji we re bidim xuyakirin –dema ku ez hinaseyên xwe yên dawî dikêşim - tişta ku ez dixwazim hûn pêk bînin, bi navê xwedawendên ku malbata me ya padîşahî diparêze; ez fermanê didim we nemaze ji kesên Exmînî yên ku li vir amade ne, hûn nehêlin Medî serwerîyê bi dest bixin, heger bi xiyanetê bi dest bixin hûn jî bi heman rêbazî vegerînin, lê heger bi hêzê bi dest bixin, hûn jî wêrek bin û bi hêzê vegerînin. Heger we tişta ku min ji we re gotî pêk anî, ez ê lavan bikim ku erd bi berhem û pîrozkirina xwe li we belav bike, zarok ji we re çêbibin, pezên we pir bibin û hûn her tim azad bijîn. Lê heger hûn ji bo vegerandina serwerîyê bi bin ketin û we hewl neda ku vegerînin, laneta min li we be û jiyana we berûvajî tişta min got bibe, tevî wilo jî dawîya her mirovekî Farisî wek dawîya min bi xemgînî be”.** Ev qewîtî bû weke îdyolojiyekê ku hemû rêber û fermandar nemaze mîrê Farisî “Darayê Yekem” kurê “Heşt Esp” serwerê kantona Farisê yê zerdeştî ku piştar serwerîya Farisî kir, xwe bi wê qewîtîyê girt. Tê zanîn ku ola Zerdeştî li deverên Medî li herêma “Gola Urmiyê”[16], dest pê kir. Zerdeşt di rêya guhertina her sê xwedawendên Arî “ Indra, Mîtra û Varona” ber bi Xwedawendê qencêyê “Ehûramezda” ve, olên "Mîtrayî û Mezdahî" kirin yek. Ola zerdeştî piştî demeke dirêj belav bû û gehaşte herêmên li Zozanên Îarnê û di nav de herêmên Farisan jî. Pabendîbûna bi pêkanîna qewîtîya Qembîz de roleke mezin di parastina desthilatdarîya Farisî de lîst û rê li pêşîya hilweşandina wê girt, ew jî di rêya têkbirina şoreşa Medî û ola wan ya “Mîtrayî – Mezdeyî” de, piranîya kahinên wê hatin kuştin û ola dewletê bi ola zedeştî ya ku li gorî berjewendîyên dewletê hatibû sererastkirin, hate guhartin û bû ola fermî ya dewletê; kahinên Zerdeştî yên Medî û xwedîyên bîrûbawerîya “Mîtrayî û

[14] Dîroka Îranê ya siyasî- Hassan El-Caf
[63] Qiraliyeta Mediya- Dr. Ehmed Mahmoud Xelîl
[64] Ji dewleta rahibên Somer ber bi şarestaniya demokratîk ve- Ebdelah Ocelan
Med û Kurd- Hesen kakaî

Mezdehî” yên kevn û navê "Mezdî/Mezdayî jî li wan dihat kirin, hatin kuştin. Bi rabûna vê olê û ola Zerdeştî ya resen re Med ji holê rabûn. Paşê jî Darayê Yekem êrîşî welatên “Skêt/Sketh anko Skodl skoth” li Qefaqaziyayê li perava Deryaya Reş [17]kir. Kurê Dara “Ehşwêriş” êrîşî Yûnanistanê kir û “Ekrepola” ku cihê Yûnanî yê olî û pîroz bû, şewitand.

Farisan bi serkirdayetîya serokên xwe “Korş”, “Qembîzê Duyem” û “Darayê Yekem” karîbûn şahinşahîyekê mezin ava bikin û gelek mîrnişînan têk bibin. Bi vê yekê stratejîya Farisan zelal bû û bermahîya bandora wê heta roja me ya îro bi navê Komara Îranî ya Islamî û bi serkirdeya Wîlayetûlfeqîh berdewam dike. Ev stratejî xwe dispêre ol, hêza leşkerî, berfirehkirin, desthilatdarî û nijadperestîya Farisî.

Bîrûbawerîya leşkerî ya Farisî li ser du bingehan ava bûye, bingeha yekem li ser îdyolojîya ku xwe spartîbû ola Zerdeştî, qewîtîya “Qembîz” û hizirên “Korş”, ava bibû. Farisan ola Zerdeştî li gorî berjewendîyên xwe bi kar tanîn. Êdî xwe weke leşkerên Xwedawendê qencîyê “Ehuramazde” didîtin û gelên cîhanê yên din jî weke leşkerên xwedawendê xerabîyê “Ehrêman” didîtin. Di encamê de tu sînor ji vê nakokîyê re tune bû. Di qewîtîya Qembîz de jî nefreta (laneta) Xwedan li ser Farisan heye, ew jî heger dest ji desthilatdarîya ku Korş misoger kirbû, berdin. Jixwe "Korşe" ew ji miletekî koçber, kirin dewleteke xwedî hêz û li gelên ku ketin bin destên wan de serwerî kirin. Bingeha duyem ya ku stratejîya Îranî xwe dispêrê; berfirehkirin û bidestxistina herêm, bajar û cihên stratejî ye, her wiha êrîşkirina dijmin di welatî wî de.

Stratejîya Farisan ji ya Medan cudatir bû, tevî ku Faris sûd ji pisporîya Medan di rêxistinkirina artêş, alayên leşkerî û birêvebirina şeran de, girtîbû. Damezrînerê dewleta Med “Diyago” mêrekî zane bû, berûvajî “Korş” damezrînerê empratorîya Farisî. “Diyago”[18] yekîtiya êlên Medan çêkir û paşhateyên wî jî mîrnişîneke bihêz ava kir û karîbûn şahinşahîya Asûrî têk

[17] Sekodî: ew êlên şervan in ku ji Mexol û Ewropiyan pêk tên, pir bi hêz in, hov û xwedî rî ne, di Erebeyan de jiyan dikirin û jinên xwe di tenatiyekê de dihi]tin, tazî li hespên kovî siwar dibûn. Wan jiyan dikir ji bo ku şer bikin û xwîna dijminên xwe vedixwarin. Dîroka şarestaniyê- Will Durant

[18] Qiraltiya Mediya- Dr. Ehmed Mehmûd El-Xelîl
Wikipediya dîroka Îranê ya siyasî (Ji dîroka efsanewî heta dawiya dewleta Tahirî) – pirtûka yekem- dr. Hesen Kerîm el—Caf.

bibin, ew jî bi serkirdayetîya qiralê Medî “Keyxisro” yê ku serkirdeya êlên Arî kir, êlên ku ji hêla kalikê wî “Diyago” ve hatibûn yekkirin, her wiha bi gelên cîran re hevbendî çê kir. Ev stratejî Korş jî di destpêkê de pêk anîbû, lê paşê jî ew hevbendî bin pê kir. Daxwaza Farisan di asta yekem de têkbirina dijminê derve bû weke Yûnanî, Misirî, Babilî û ji bilî wan jî. Her wiha dixwestin tola xwe ji gelên din hilînin, wan bitirsînin û bin dest bikin, li kêleka wê jî rûmet û serkevtiyên xwe li ser kevirê “Bihîston” binexşînin, samanan kom bikin, bajaran bidizin û baceyan bisepînin. Tevî ku ev yek gelek caran bi ser ket, lê gelên din bîrûbawerîyeke wan ya leşkerî taybet hebû ku karîbûn rêbaza şer ya Farisî nas bikin û karîbûn wan têk bibin û şahinşahîya wan hilweşînin, her wekî ku Yûnanî, Meqdûnî û piştire jî Erebên Misilman ev yek jî pêk anîn.



*Kevirê Bihîston[19] û nexşên ku serkeftinên keyê Farisî Dariyos li ser gelên din mezin dike.*

[19] **Bihîston:** Bajarekî li rojavayê Îranê li rojavayê bajarê Kermanşahê ye, ku bi peykerên di keviran de nexşekirî tê naskirin, ji serdema Exmînî û Sasanî ve ev peyker weke baştirîn berhemên hunera farisî ye. Qiralê Exmînî Dariyosê Yekem (522 B. Z) di nexşên li ser kevirê Bihîstonê de neteweyên ku serwerya wan dikir rêz dike: Med, Îlam, Hîratî, Belxî, Ermen, Segîtî, Babilî, Sûrî, Skîtî. Ew nexş bi zimanên Ekadî, Îlamî, û Farisî hatine nivîsandin.

[68] 1501-1524. z: Dewleta Sefewiyan 1501-1722 vedigere Sefiyuldîn El-Erdebilî ku ji şêxên sofiyên kevneşop bû, ew şafiî bû. Lê damezrînê wê Ismaîl Mîrza ango Şah Ismaîlê Yekem e, yê ku çû Tebrîzê û êlên tê de têk birin û ji xwe re kir paytext. Her wiha mezheba Şîî ya Dozdehî bû mezhebekî fermî yê dewletê.

**[20]Stratejî û rêbaza leşkerî ya Komara Îranî ya Islamî:**

Piştî ku Islam bû detshilatdarî û bû weke amûrekê di destê xelîfeyan de, ji bo ku serwerîyê bisepînin û desthilatdarîya xwe berfireh bikin, nakokîyên ramyarî di navbera du beşên Misilmanan de derketin, di navbera Emewî û Alilbêt de. Di encama vê nakokîyê  li ser desthilatdarîyê de, du ayînzayên Islamî yên sereke derketin ku bûne sedem ji gelek êş, xerabî û bela ji gelên herêmê û pêşketina rewşa ramyarî di cîhana Islamî de. Di sedsala 15'an de "Şahnişahiya Sefewî" derket holê û ayînzaya Şî'î ji xwe re kir bingeh, her wiha Sultanîya Osmanî ayînzaya (mezheba) Sunî ji xwe re kir bingeh. Dewleta Sefewî heman stratejîya Farisî bi kar tanî, hem ayînzaya Şî'î ji xwe re kir bingeh û hem jî siyasetya berfirehkirinê ji xwe re kir armanc.

Piştî têkçûna dewleta Sefewî[21], gelên Îranê ji sala 1779`an ta 1925`an ketin bin serwerîya Turkmenan ku malbata "Qacarî"[22] wan nimûnede dikir, di serdema wan de aramî tune bû, li ser serwerîyê welat bû qadeke pevçûnên di navbera Berîtanîya û Rûsîya Qeyserî de, li kêleka wê jî dijberîya hundirîn, ji ber ku rola artêşa Îranî hatibû piştguhkirin. Di destpêka sedsala 20'an de, sê hêzên leşkerî serwerîya erdnîgarîya Îranê dikir[23]; "Hêzên Asayîşê" ku girêdayî serwerîya Siwêdî bû, ew jî di 1911'an de hatibû damezrandin, alaya "Segvanên Leşkerên Faris" yê ku başûrê Îranê xist bin serwerîya xwe û ji sala 1912'an ve girêdayî Berîtanîyê bû, "Alaya Qozaq" ya Farisî ku Rûsîya di 1879'an de di dema qiralê Qecarî "Nesredîn Şah" de, damezrand. Lê Berîtanî di rêya kiryarên  malgirtinê re karîbûn aborîya dewletê bixin bin destê xwe, wek malgirtina bazirganîya tûtinê û avakirina rêyên hesinî yên tirênê. Li kêleka wê jî di destpêka sedsala bîstan de tevlîhevîyên hudirîn pir bûn, her wiha piştî lidarketina Şerê Cîhanê yê Yekem di sala 1914'an de û Şoreşa Belşefî li Rûsîya di sala 1917'an de, Rûsîya bi pirsgirêkên xwe ve mijûle bû û rê ji Berîtanîya re vekir ku serwerîya xwe bi giştî di sala 1919'an de li ser Îranê bisepîne. Ev yek jî hişt

---

[22] Qecarî: Ev malbat ji qebîleyên Qizlbaşên koçber ji Tirkmanan e. Desteseriya Aster Abad (li bakurê rojhilatî Îranê) di sala 1750'î de. Serokê qebîleyê Axa Mihemed Xan di 1779'an de karîbû serweriya  welatê Farisan bike.

[23] Sipay Pasdaran ya Îranê…. Damezrandin, avakirin û rola wê- Katizman Kenneth- Navenda Îmaratê ya Lêkolîn û Lêgerînan.

ku tevgerên gelerî daxwaza serxwebûn û çakkirinan bikin û serwerîya Berîtanî nepejirînin. Di sala 1925'an de, serokê encûmena wezîran yê Îranî “Rida Xan Behlewî” şahê herî dawî ji “Qecaran” şah “Ehmed Mîrza” ji ser serwerîyê rakir. Piştre nasnava Şah li xwe kir û navê welatê Farisî guhert û bû “Îran”[24]. Piştî wê jî dewleta Behlewî derket holê, lê dirêj nekir, ji ber dijbertîya wê ji çîna oldarên Şî'î re[25] (lêvegerên Şî'e), daxwaza rizgarbûnê ji hemû qeydên olî û civakî, anîna çanda Rojavayî her wekî ku damezrînerê dewleta Tirkî “Mustafa Kemal Etatork” ev yek pêk anî, pirbûna serwerîya Berîtanî, Soviyetî û Emerîkî û belavbûna gendelîyê. Ev yek jî bû sedem ku serokê encûmena wezîran “Mihemed Musedeq” di 1953'yan de derbeyek dijî şah pêk bîne û kangeha petrolê bineteweyî bike[26]. Hêzên rojavayî ev kiryarên han nepejirandin û bi lêdaneke dijber Mihemed Musedeq ji serwerîyê hate dûrxistin û careke din Şah vegerandin ser serwerîyê. Êdî serwerîya “Mihemd Rida Behlewî” yê ku bi şaristanîya Farisî serbilind bû, dest pê kir. Mihemed Rida pir bi şaristanîya Farisî ve girêdayî bû û gelek reng ji qirkirina ramyarî û civakî bi kar tanî, nemaze ji bo hêzên dijber yên bi rengê Islamî û komînîs bi kar tanî, li kêleka wê jî di şahîyan de pir xerç dikir. Ji karên wî yên herî balkêş guhertina salnameya Îranî ji sala koçberî ber bi sala Farisî ve û kuştina glek rêberên ramyarî û ramangeran bi destê Asayîşên Nehînî “Safak” [27] ve, wek ramanger “Elî Şerîetî Medarî”. Ev rêjîma nû piştgirîyeke rasterast ji Emerîka û Berîtanîyayê werdigirt, yên ku Îran veguhertin weke asayîşeke parêzvan ji Kendavê re û alaveke ji bo qirkirina şermezarkirin û raperînan û çewsandina gelên Îranê. Di sala 1979'an de xwepêşandên gelêrî gehaşte asta herî jor, Xumeyînî sûd ji vê rewşê girt û ji sergûnê “Firensa” vegerîya û desthilatdarî xist bin destê xwe, û dest bi serwerîya Islamî ya Şî'î kir ku heta roja îro li Îranê didome.


---

[24] Îran: Rêya Dîrokî - http://www. aljazeera. net
Îran: Ew navê ku xwediyên wê lê kirine û wateya wê erdê Ariyan e. Sasanî yekem xelk bûn ku navê empratoriya faris kir “Îranşeher”, ew peyveke farisî ye wateya wê erda Îraniyan e. Îran- wekîpîdiya.

[25] Rida Behlewî.... . Etaturk Îran- Nêvîn Emara. http://www. ahram. org. eg/NewsPrint/346819. aspx

[26] Netewekirin: Veguhestina milkiyeta aliyekî taybet ji bo milkiyeta dewletê, yanî veguhestina wê ji bo sektora (alî) giştî.

[27] Safak: kurtenivîsa Rêxistina Saloxgêr û Ewlehiya Neteweyî "سازمان امنيت واطلاعات كشور"



*Şah Rida Mihemed Behlewî*

Yekem şerê Îranê yê derve di sala 1981'î de bi Iraqê re derket holê, sdema wê jî nelihevkirina li ser tixûban bû. Ew şer bi navê Şerê Kendavê yê yekem dihate naskirin ku 8 salan dirêj kir. Hêzên navdewletî bi çekên ku didane her du alîyan ew şer gurtir dikir, Çîn û Kurîya Bakur çek didan Îranê; Emerîka û beşgeh Firensî, Elmanî û Soviyetî çek didane Iraqê.

Piştî ku di sala 1979'an de çîna oldarên Şî'î Îran desteser kir û dezgeha olî bû biryarsaza dewletê, Îran ji rêya ku serwerên navdewletî (Emerîka, Berîtanîya û Yekîtiya Soviyet) di kesayeta serwerîya Behlewî de jê re danîbûn, derket û kete rêyeke dijberî Rojavayan, nemaze Emerîka, Îsraîl û Erebên Sune. Şî'î navê "Newasib" li ayînzaya Sunî dikin ango dizek, ji ber ku wan li gorî dîtina Şî'iyan bi dizî û dekûdolaban xîlafeta Islamî desteser kirin.

Bûyerên ku Îranê jiyan dikir roleke mezin di diyarkirna Bîrûbawerîya leşkerî ya Îranê de di serdema serwerîya "Wîlayetûlfeqîh" lîst. Serkirde û fermandarên leşkerî yên Îranî bîrûbawerîya xwe ya leşkerî bi rengê "Netewe – olî " dirustkirin her wekî Farisên pêşîn piştî 550 BZ kirin. Êdî Îran bû xwedan îdyolojî, rêjîm, alî û stratejîyeke nû ku ji ya berê cudatir e. ji ber samanên binerda Îranê, pirbûna şênîyên wê û firehbûna rûbera wê, Îran hêza xwe vegerîne. Ew jî piştî têkbirina rêjîma Şah Mihemed Rida Behlewî û Şerê Kendavê yê Yekem. Her wiha gavên mezin di warê pîşesazî û pêşkevtina zanistî de avêtin û piştî serwerîya pêşbazî ya wê û dijmina wê ya

berê “Komara Erebî ya Iraqî ” di 2003'yan de hate helwşandina, bû hêzeke herêmî ya bibandor[28]. Jixwe Iraq rola bergîrîya herêmî li hemberî Îranê dilisît û di herêmê de hevsengîya hêzê pê re dirust dikir.

Desthilatdarîya Îranê ya nû stratejîya nû û kevn girt ser xwe ku cewhera wê desteserkirin, berfirehbûn û veguherîna berev hêzeke herêmî û navdewletî ya bibandor e. Lê ev boçûn jî li beranberî hêzeke navdewletî ya serwer tê, ew jî Emerîka ye, ya ku bi nerênî nêzî Îranê dibe.

**Têgeha Bîrûbawerîya Leşkerî:**

Stratejîya dewletan ji bîrûbawerîya wan ya leşkerî ne cuda ye, bîrûbawerîya şer roleke mezin di damezrandina artêş û hêzên çekdarî de dilîze. Ew alîyê wireyî dinimîne ya ku behaneyê dide leşker di şer de bi bawerî şer bike yan bimire yan astengdar bibin û fermanên leşkerî bi sernermî û bêgotûbêj bipejirîne. Bîrûbawerîya leşkerî ew stûna artêş û hêzên leşkerî ye. Ev bîrûbawerî bi bîrûbawerîya olî, idyolojî, rêbaz û prensîpên ku siyasetmedar datînin bandor dibe, li kêleka wê jî bi dîroka leşkerî, waneyên ku ji dîrokê hatîne girtin, pêşkevtina teknîkî, taybetmendîya erdnîgarîya dewletê û gef û guhertinên rêjîma cîhanî yên berdewam, bandor dibe. Bo nimûne; dema ku Yekîtiya Soviyetê di sala 1991'ê de helweşîya, hin rêbazên Bîrûbawerîya leşkerî ya Emerîka li ser asta dewletê hatin guhertin, heman tişt piştî helweşîna rêjîma Îraqî di 2003'yan de li Îranê jî çêbû. Ev guhertin li ser bîrûbawerîya leşkerî bandor kir û dijminê berê kete gumana hevalbendîyê.

Gelek karûbar hene bandorê li ser bîrûbawerîya leşkerî ya artêşan dike, hin ji wan ev in:

**Aştîya demdirêj**: Ev yek dihêle ku hêzên leşkerî lawaz bibin û jêhatîyên wan yên şer qels bibin, ev jî heger perwerde di rêya rahênanên leşkerî, ceberxaneyên rasteqîn û beşdarbûna di hin pevçûnan de di nav hevbendîyeke navdewletî ya rewa de, pêk neyê.

[28] Şerê Îraqî-Îranî berjewndiyeke Erebî kendavî di asta yekê de bû, ji ber ku ew her du dewletên bihêz lawaz dikir, ew her du dewlet jî li ser destesekirina kendav û herêmê hevrik bûn.

**Şerê demdirêj:** Encamê vê yekê jî aborîya neteweyî û bawerîya gel lawaz dike, êdî civak ne amade ye ku ji bo bîrûbawerîyeke şerxazî ya di bin durişmeyên derew de, şer bike.

**Kuştina sivîlên bêçek:** Leşker dibe kujer û alîyê mirovî tê de bê bandor dibe, ev yek bandorê li derûn û biryarên wî dike.

Di 2003'yan de lawazbûna bîrûbawerîya şer bû sedema helweşandian artêşa Iraqê, her wiha di pûşpera 1967'an de jî bû sedema têkçûna artêşa Misrî, ew sedema têkçûna hemû şoreşên Kurdî û sedema damezrandina rêxistina bi navê dewleta Islamî DAIŞ'ê ye. Hêzbûna bîrûbawerîya leşkerî bû sedema serkevtina artêşa Misrî di 1973'yan de û berxwedana PKK li dijî artêşa Tirkî hêza duyem di NATO'yê de[29], her wiha YPG û YPJ`ê herêmên berfireh li Sûrîyê ji destê DAIŞ'ê rizgar bikin, weke bajarê Reqayê paytexta DAIŞ'ê û hwd.

Gelek pênase ji bîrûbawerîya leşkerî[30] re hatine dayîn, lê tev di cewherê xwe de yek bûn, Pert Chaman dibêje: **“Ji tiştên herî balkêş di dîroka leşkerî de ragehandina Napoleon Bonapart ku “artêş bi zikê xwe dixuşin”, dibe ku ev gotin ji alîyê xwarin û lojîstîkê ve rast be, lê hêzên çekdar ji bo ku operasyonên xwe dest pê bikin û bidomînin, pêwîstîya wan ne tenê bi xwarinê heye; lê belê ji bo ku operasyonên xwe yên êrîşker dest pê bikin û piştevanîya wan bikin û bi dawî bikin, pêdivîya wan bi bingeheke hizirî ku ji xwarinê girîngtir be, heye. Ev bingeha hizirî ya ku ne li gorî wijdan û gewde, lê belê li gorî aqil diçe, ew " bîrûbawerîya leşkerî Doctrine Military " ye. "** yek ji nirxandinên bîrûbawerîya leşkerî wisa şîrove dike, karînên leşkerî yên stratejîk yên ku girîngîyê didin destnîşankirina armancên stratejîk û encamên dawî yên ku divê werin bidestxistin, her wiha hûrgilîyên xebata leşkerî yên ku tên xwestin saz dikin û pêdivîyan amade dikin, ew jî li gorî rêdarên rêveberîyên ramyarî ne "

---

29 NATO: Hevbendiya Bakurê Atlentîk li ser bingeha Hevpeymana Bakurê Atlantîk North Atlantic Treaty Organization di sala 1949'an hate damezrandin, li Waşintonê di 4'ê nîsana 1949'an de hate morkirin, cîhê wê li Brûkselê ye, du zimanên wê yên fermî hene frensî û ingilîzî.

30 Hişmendiya Leşkerî, Perte Champan,
Hişmendiya rûsî ya leşkerî ya nû https://www. lebarmy. gov. lb
Peywirên nihayî û yên pêşerojê- hişmendiiya leşkerî, http://www. hezenparastin. com

Rêxistina NATO`ê jî bîrûbawerîya leşkerî wesa pênase kirîye:

"Bîrûbawerîya leşkerî, hemû rêgezên serke yên ku hêzên leşkerî bi kar tînin ta ku erkên xwe pêk bînin. Her çiqas çeperên şer her kesî neçar dike ku li gorî rêzikên wê bi rê keve, lê di dawîyê de ew hin rêzikên pabendkirî ne". Her wiha desteya wanedayînê ya zanîngeha Emrîkî ya hêzên ezmanî de lêkolîneke derbarê vê yekê de di sala 1948'an de derxist û têgeha bîrûbawerîya leşkerî bi rengekî zanistî şîrove kir, wesa tê de hat: "Bîrûbawerîya leşkerî tevahîya van tiştan e; têgeh, rêgez, ramyarî, tektîk, teknîk, rahênan û rêbazên ku tên bikaranîn yan jî yên ku ji bo karînên rêxistinkirin, rahênankirin, çekdayîn, amadekirin û peywirkirina sazîya leşkerî ji bo yekîneyên xwe yên tektîkî û rajeyî misoger bikin, tên bikaranîn. " Pênaseyeke din li gorî Soviyêtan di ferhenga têgehên leşkerî ya bingehîn de wesa hatîye nivîsîn: "Bîrûbawerîya leşkerî ew pergala ku ji hêla dewletê ve ji bo tevahîya nêrînên zanistî yên derbarê şerê nûjen de hatîye rûniştandin, her wiha hêzên çekdar di rêya vê pergalê re tên bikaranîna. Ew jî ji du beşan pêk tê, yek civakî û ramyarî ye, ya din jî leşkerî û teknîkî ye".

Her wiha bîrûbawerîya leşkerî bi vî rengî jî tê pênasekirin: "Hin nirx û rêgezên hizirîn yên ku bicihanîna bîrdozîyên zanista leşkerî û zanistên hunera şer armanc digire, ji bo avakirin û bikaranîna hêzên çekdar di çaxê şer û aştîyê de li gorî armanc û berjewendîyên niştimanî, pêk bîne".

Bîrûbawerîya leşkerî karên şer yên rasterast û yên nerasterast "nehênî" vedihewîne, lê di cewherê xwe de ew peyrewa welêt, gel, pergala desthilatdar, îdyolojiyeke taybet an jî dewlet û zagonê ye.

Bîrûbawerîya şer ya Islamî têkoşînê (cîhadê) bingeh digire û li gorî rêgezên "Qurana Pîroz" û rêbaza pêxemertîyê, bîrdozîyên Islamî yên leşkerî di karûbarên cihêwaz yên şer û cengan de hatine tanîn. Weke; sedem û armancên şer, rêgezên şer, avakirina artêşê, amadekirina çekdar û serkirdeyan, perwerdekirina li ser şer, şerê derûnî, rêzkarî û leşkertî û rêgezên wê, avakirina hêvî û vîna şer û hwd. Bîrûbawerîya şer li nik tevahîya Misilmanan, têkoşîn (cîhad) û şerkirina bi Israîlê re, weke xalên destpêkê ne.

Xala 143'an ji destûra Îranê wiha dibêje: **"Artêşa komara Îranê di ber bervanîya serxwebûnê, yekîtîya xaka welêt û pegala komara Islamî de**

**berpirsyar e. "** Xala 144'an jî wiha dibêje: **"Divê artêşa komara Îranê ya Islamî artêşeke Islamî be. Ev yek jî pêwîst dike ku artêş xwedî bîrûbawerîyekê be û gelêrî be û tenê kesên hêja yên ku bi armancên Şoreşa Islamî bawer in û xwe ji bo pêkanîna wan armancan gorî dikin, vehewîne. "** Li gorî van xalan tê xuyakirin ku bîrûbawerîya leşkerî ya Îranê vê yekê dibîne: Ji mafê Îranê ye ku hêzên xwe yên çekdar li derveyî sînorê xwe bi kar bîne, ji bo ku li hemberî metirsîyên ku gefan li ewlehîya neteweya wê dixwin, rawestîne, Her wiha bîrûbawerîya leşkerî metirsîyên leşkerî yên ku gefan lê dixwin wiha destnîşan dike: Belavbûn û pirkirina hêzên biyanî li dewlet û li avên derdorê, fişarên ramyarî, leşkerî û aborî yên li ser wê, li gel bikaranîna hêza leşkerî li dewletên dorhêlê weke Efxanistan û Iraq û ji bilî wan, derketina deverên şer û gurbûna şerî li wan welatan, avabûna hin rêjîman li dewltên derdorê yên ku pilan û stratejîya wan li dijî berjewendîyên Îrnê ne, hebûna hin dewletên herêmî yên ku hevrikîya wê dikin hin ji wan weke Pakistan û Israîl çekên nûklerî li nik wan hene, helbet metirsîya bingehîn ya hundirîn e, weke çalakîya tundrewî û sawkarî, dijberîya çekdar, kiryarên ku dikarin aramîya welêt bihejînin û serwerîya dewlet û yekîtîya axa wê têk bibin, çalakîyên ku dixwazin rêjîma Wîlayetûlfeqîh helweşînin, hewldanên tên kirin ji bo ku aramîya ramyarî û civakî bihejînin, her wiha têkbirina karên desthilatîyên giştî, navendên dewletê yên girîng, dezgehên leşkerî, jêrxana zanyarîyan ya Îranê, çalakîyên dezgehên agehdarî, gefên tundrewîyê yên gur dibin û belavbûna çekên wêranbar û moşekên curbicur.

Îran ji ber dijkarîya Sunî – Şî'î dewletên Ereb yên li kêleka xwe weke dijminan dibîne û wan weke hembêzgeha mîtîngehên leşkerî yên dewletên Rojavayî yên ku dijminatîya wê dikin, digire dest. Li gorî stratejîya Farisî çawa Erebên berê yên weke Menazîre, Yemenî û niştecîyên herêma Kendavê di dema Şahinşahiya xwe de ji xwe re kiribûn peyrew, divê niha jî bibin peyrewên wê. Ji ber vê yekê jî hewl dide ku desthlatdarîya van dewletan helweşîne û hineke din ku alîgirê wê bin li şûna wan bi cî bike.

Derbarê têkelîyên Îranê bi Kurdan re, Îran avabûna dewleteke Kurdî weke metirsîyekê li ser hebûna xwe dibîne, lewre stratejîya Farisî ya ku bi bav û kalên Kurdan Medan re kirîbû, xal bi xal bi kar tîne. Jixwe ev yek di qewîtîya Qembîzê Duyem û di pilana Darayê Yekem de, her wiha di

tawanbarîya (tekfîra) rewşenbîrên Kurd ji hêla Xumeynî ve û tawanbarkirina wan bi kaselîsîyê (kurtêlxweriyê) çima ku doza mafê xwe dikin, xuya dike. Jixwe hêj ji  çend alîyan ve, ev tişt xuya dibe, weke mandelêkirina mafê Kurdan, berdewamkirina binpêkirina mafê Kurdan li rojhilatê Kurdistanê û kuştina serkirdeyên wan mîna "Ebdilrehman Qasimlo" û hin kesên din ji hêla rêjîma Xumeynî ve, piştî ku wî soza mafdayînê bi mercê ku Kurd di Şoreşa Islamî de beşdar bibin, da. Em dibînin ku giyanê qewîtîya Qembîz û pilana Darayê Yekem di serê hemû pilanên ku li hember Kurdan tên kirin de, digire. Her wiha tevahîya tevger û serhildanên Kurdan li rojhilatê Kurdistanê diçewisîne û li parçeyên din yên Kurdistanê jî şerê Kurdan dike, weke şerê li dijî PKK'ê, hiştina ku her du partîyên serke yên li başûrê Kurdistanê YNK'ê û PDK'ê pevkevin û piştevanîkirina partîyekê dijî ya din, destwerdana wê ya rasterast di lêdana referendûma serxwebûna Başûr Kurdistanê de, desteserkirina peyrewên wê yên weke Heşdûlşebî ya Iraqê li ser bajarê Kerkûkê yê tijî petrol û bikaranîna binpêkirinan derbarê  Kurdan de ku mafên mirovan metirsîdar dikin. Niha  jî dixwaze di rêya rêjîma Sûrîyê re û di rêya kaselîsên (kurtêlxurên) xwe û şaneyên razayî re Kurd, Suna û Elewîyan li Rojava – Bakurê Sûrîyê berde hev û demokrasîya li wir, bi dawî bike.

Derbarê Emerîkayê de, ji ber pirojeya wê ya bi navê "Rojhilata Navîn ya Mezin"[31] ya ku Îranê jî vdihewîne, Îran wê weke metirsîyeke stratejîk dibîne, ji ber vê yekê jî Îran hewl dide hevterazîya hêza xwe ya  paşvebirî û bergîrîyê bi hêza Emrîkî ya li herêmê hevseng bike. Îran bi moşekên balistîk yên dûravêj û çeteyên çekdar yên pîşekarên wan şerê komizan e, û  wizeya nûklerî û çekên kîmyawî û beyolojî weke bijardeyeke guncaw ji  bo ku li hemberî Emerîka rawestin, dibînin.

[31] Rojhilata Navîn a mezin, têgeheke ku rêveberiya serokê Emerîkî Corc Debilyo Boş ji bo herêmeke berfireh ku tevahiya welatên Erebî, Tirkiye, Israîl, Îran, Efxanistan û Pakistanê vedihewîne, bi nav kir. Rêveberiya Emerîkî di çarçoveya projeyeke gişgir de ku geşedana dirustkirina siyasî, aborî û civakî (li gorî wê) li herêmê bike, ev têgeh danî. Mijara projeyê di adara 2004' aîn a mezin.




*Li fakolteya leşkerî ya NATO`ê ya li paytexta Îtaliyayê Roma, nexşeya "Rojhilata Navîn a Mezin" ji hêla pêşleşker "Ralv Pîterz" ve hat pêşkêşkirin. Ta ku ev nexşe were pêşkêşkirin divê Akademiya Niştemanî ya şer li Emrîkayê wê bipejirîne. Ev nexşe di sala 2006'an de ji ber berteka hêrsbûyî ya Tirkiyê, ji hêla Tirkiyeyê ve hat eşkerekirin, ji ber ku di vê nexşeyê de Tirkî, Îran û hin dewletên din hatine parçekirin.*

Bîrûbawerîya leşkerî ji nû ve hate vejandin. bi rêya bercestekirina wê ya ku nav lê dikin Şoreşa Islamî ji ber ku dûrbînxwazîya olî di bîrûbawerîya leşkerî ya Farisî de xistin ber kar, bi rêya tawanbarîya Misilmanên ne Şî'î û di bin perdeya hinartina hizirê Xumeynî de ya ku navê Şoreşa Islamî lê dikin, û pirojeya kevana Şî'î[32] û êrîşbirina ser gelên din bi rêya kaselîsan, û hewldana çespandina desthelatîya xwe li ser dewletên herêmê. Tiştên ku li Libnan û Iraqê di sala 2017'an de çêbûn, van tiştan piştrast dikin, tevî van tiştan jî Îranê hêza Pasvanê Şoreşê yên Îranî li şûna alayên "Nemirî" û alayên "Cangorî"`an[33] yên ku giyanê xwe ji bo parastina desthilatdarîyê gorî dikirin, ava kir.

[32] Kevana Şîî, têgeheke siyasî ye, melikê Ordunê Ebdulahê duyem di Waşinton Bost de dema ku di destpêka berfanbara 2004'an de serdana Emerîkayê kir, bi kar anî. Metirsiya xwe der barê desteserkirina desthilatdariyê li Baxdayê ji hêla hikûmeteke Îraqî ve ku alîgira Îranê ye, tê de da diyarkirin. Ew hikûmet bi rêjîma Şoreşa Islamî ya li Tehranê û bi rêjîma Bais ya li Şamê alîkar e ji bo ku kevanekê çêkin ku heta Libnanê be û di bin destê şîiyan de be. Ji ber derketina Kevana Şîî Ebdulah pêwîst dike ku bi cidî li ser pêşeroja aramiya herêmî bê hizirandin. Dibe ku hin guherînên berbiçav di nexşeya berjewendiyên siyasî û aborî de ji hin dewletên herêmê re bi xwe re bîne. Wekîpîdiya-Kevana Şîî

[33] Atlas Elfitûhat ElIslamiye-Samî Bin Ebdulah Elmexlûs.

Û ji hêleke din ve polpolkirina dijminan di bîrûbawerîya leşkerî ya Îranê de her tim diguhere. Tevî ku Iraq dijiminê wê bû lê paşê bû hevalbendê wê, Ji ber vê yekê nehevsengîyek di rêzkirin û polkirina dijiminan û stratejîyên pêşberîn de, heye. Dibe ku ev yek bandorê li  ser çespandin û çalakbûna vê bîrûbawerîyê û aramîya ramyarî û ewlehî ya li herêmê, bike.

Ji bo ku stratejîya Îranê were xurtkirin, rêjîma desthilatdar ya Îranê wekî me berê diyar kiribû, ku Îran di derdoreke dijminahî de dijî, hewl dide ku wê jêrdest bike, xwe dibîne pabend bi parastina Şî'îyên li cîhanê weke erkekî heldigire ser milê xwe. Li gorî hizirê Şî'îtîyê divê rêjîma desthilatdar şerê dijiminên Islamê bike ta ku Imamê Duzdehemîn "Imamê Mehdî" derkeve, her wiha  ayînzaya (mezhebê) Şî'îtîyê jî belav bike. Xala 5'an a destûra Îranê wisa dibêje: " Di dema neamadebûna Imamê Mehdî de (xwedan fereca wî nêzîk bike), serkirdeyê umetê li komara Îranê ya Islamî di destê feqîyê dadmend û ji xwedêtirs de ye, ew jî yê ku ji bûyerên serdemê re hişyar e, yê mêrxas e ku dikare bergirî û rêveberîyê bike, yê ku piranîya umetê ew weke serwerekî pejirandîye. Dema ku tu feqîh vê piranîyê pêk neyînin, serkirde yan encûmena rêveber ya ku ji feqîyên ku li gorî mercên diyarkirî  hatine pejirandin vê berpirsyartîyê li gorî xala 107`an heldigirin ser milên xwe." Îran dibîne ku ew dikare bibe hêzeke herêmî û bandorê li ser Rojhilata Navîn û qada navdewletî bike. Ew dibîne pêwîst e, ku Şî'e li deverên cuda yên Rojhilata Navîn bibin hêzeke desthilatdar û  bibandor ku piştgirîya pirojeya Îranê bikin ya ku dixwaze statûyeke cihanî ku navenda wê Îran be ava bike, ev yek jî bi navê "Kevana Şî'î" hat têgehkirin.

Li gorî vê yekê em dikarin stratejîya Îranê bi van xalan diyar bikin:

Desteserkirina kendava Uman û Kendava Lor (Farsî) ku bi tevahî wan bike kendaveke Farisî.

Belavkirina hizirê "Xumeynî" ber bi derve ve û geşedana wê hizirê di bin navê "derkirina Şoreşa Islamî" de mîna derkirina "Şoreşa Firensî", ji bo ku statûyeke Şî'î ava bike.

Lêveger û serwerîya Şî'e di lêvegera "Qum" de bi cih bibe û "Qumê" wekî qublet ji tevahîya Şî'îyên cîhanê re dibîne ku lêvegera "Necef" ya Iraqê û "Çiyayê Amil" yê Libnanê derbas bike.

---

Têkiliyên Ereb û Sasanan di sedsalên pêncemîn û şeşemîn PZ de.

Berdanhev û peydakirina nakokîyan di navbera Kurd û Suneyan de, her wiha navê "Israîla Duyem" li dewleta "Kurdistan"ê dikin û wê weke metirsîyeke stratejî dibînin, ji ber ditirsin ku li beramberî wê bibe statûyeke herêmî.

Xurtkirina hêzên Şî'e li dewletên herêmê, ji bo ku ji wê re bibin mîna hespê Terwada û di şerên paşerojê de wan weke kaselîsan û fişareke ramyarî bi kar bîne, her wiha dixwaze pilana dar û gêzerê jî bi kar bîne.

Desteserkirina samanên herêmê.

Serkevtina xwe ya desteserkirina herêmê bi tunekirina Isrîlê ve ya ku metirsî û dilgiranîyeke mezin jê re çê dike, girê dide.

Li herêmê serûbinkirina pergala ciyosiyasî ya herêmî.

Zêdebarî wê jî dibe qewîtîya"Xumeynî" berî ku bimire, ji ber Piştevanên wî qewîtîyê weke dawiya ramanên wî dibînin û pêwîst e ku pê pabend bin. Ji ber ku ew bavê rewanî yê beşeke mezin ji Şî'iyê ye, bandoreke wê ya gelekî mezin li ser stratejîya Îranî heye. "Xumeynî" di qewîtîya xwe de Emrîka û sehiyûnîya cîhanî şermezar kir û ew weke lawirên dirinde û xwedî çilêsîyên genî dîtine û bi tundrewîyê bi nav kirine, her wiha dibîne ku dewleta Israîlê xewn û xeyalek e, ku tu carî pêk nayê, serokê rêjîma Iraqê ya berê "Sedam Hisên" bi Efleqî û weke xayîn ji gelê Iraqê re bi nav kir. Ji hêleke din ve jî daxwaza berdewamîya giyanê fedekarîya piştevanên xwe kir û dibîne ku komara Îranê ya Islamî berketeke veşartî ji cem xwedan e. Jixwe di qewîtîya wî de wisa jî hatîye[34]: **" Ez niha li gelên bindest û gelê Îranê yê hêja yên ku xwedan ev rêya rast ya xwedayî diyarî wan kirîye yên ku ne bi rojhilata xwedênenas û ne jî bi rojavaya stemkar û xwedênenas ve girêdayî ne, qewîtîyê dikim ku bi hişkatî, pakîtî, pabendî û xweragirî bi vê rêbazê re dilsoz bin, her dem spasîya vê xêrê bikin, rê nedin destên qirêj yên kurtêlxurên hêzên mezin çi kurtêlxurên derve çi jî yên hundir yên ku ji yên derve qirêjtir in ku hejandinekê di helwesta wan ya pak û vîna wan ya hesinî de..., çêkin. Ez jidil û bidilnizmî ji gelên mislmanan dixwazim ku li pê imamên xwe yên pak yên gewre û rêşanên cîhana mirovahîyê, herin. Bi zanîna wan ya ramyarî, civakî, aborî û leşkerî ji dil û**

[34] Qewîtîya Imamê Xumeynî xwedan razê wî pîroz bike. Toreya Zanistên Islamî http://www. almaaref. org

**giyan pabend bin, giyan û hêjayan gorî bikin.... nefret (lanet) tev li stemkarên xizmên mala pêxember were. Rexnelêkirina wan qêrîna gelan ya hetahetayî di rûyê desthilatdarên stemkar de ye û di seranserî dirêjahîya dîrokê de. Hûn dizanin ku nefretkirina Umewiyan – nefreta Xwedan li wan be – û şermezarkirina stemkariya wan -Tevî ku qir bûn û çûne dojehê – qêrînek e li dijî stemkarên li cîhanê ye û hiştina vê qêrînê ku stemkarîyê heldiweşîne û bi jiyanê vewejîne. Divê xwelêdan, zêmar û helbestên ku pesnê imamên rast didin – silavên Xwedan li wan bin – bi bêtar û zordarîya stemkaran di her serdem û warekî de bi tundî li xwe bigire. Di vê serdemê de, serdema stemkarîya li ser Misilmanan bi destên Emrîka, Rûsan û hemû kesên ku bi wan ve girêdayî ne – nefreta Xwedan, Ferîşte û Pêxemberên wî li wan be – pêwîst e, em bi bîr bînin û nefretê li wan werînin û dijminatîya wan bi tundî bikin. "**

**Hêza Îranê:**

Ji ber van tiştên ku hatin gotin, Îran dixebite ku hêza xwe ya zîrek mukum bike, ya nimînendekirî di hêza hişk û nerm de xurt bike. "Hêza Zîrek" li gorî "Cozêf Nay" wisa tê pênasekirin: Ew şîyana ku dikare her du hêzan ya hişk (aborî – leşkerî) û ya nerm di yek stratejîyê de, pêkve bike.

Weke me berê diyar kiribû jî, Îran li ser qada navdewletî ji dewletên bandorker e, di biwarê ramyarî, leşkerî û aborî de. Îran mîratgirê zencîreke ji çend dewletên bihêz e, Îrana îroyîn mîratgirê dewleta Behlewî ye, ya ku li ser kavilên çend dewletên weke "Sefewî…Qacarî" ava bû. Ya girîng em nas bikin ku raza hêza Îranê, îdyolojî û nebûna hêza herêmî ya rikber e.

**Hêza Hişk:**[35]

Hêza hişk dibe du beş hêza aborî û hêza leşkerî:

**Hêza Aborî:**

Îran saman û pêmayê dewleta Behlewî wergirt, ya ku piştî bilindbûna nirxê petrolê zêde bû. Îran di rêya gelek tiştan re aborîya xwe xurt dike, weke; piştgirêdana bi berhemên xwecehî, pêşxistina çandinî û pîşesaziya Îranî, piştgirêdana bi samanên hundirîn weke zevîyên wizeyê, av û hebûna

[35] Stratejiya Îranê li hemberî dewletên Kendava Erebî – D. Tacedîn Caifer El-Taî.

pir ya karkeran û kartêkirina çalakî li ser rêxsitina "Opêk"[36] û rêxistina "Deriyaya Xezerê" ji bo hevkarîyê"[37]. Jixwe petrol binemaya sereke yê aborîya Îranê ye, her wiha bazirganên Îranî û karsaz û sermiyanên mezin yên ku navê "bazarîyûn"[38] li wan tê kirin, roleke mezin di rêvebirina aborîya Îranê de dilîzin. Jixwe Îran sûdgirtin û veberanîna samanên hin dewletên din, dike û ji peyrewên xwe re piştgirtina darayî dike. Ew jî di rêya torên darayî û nehînî yên ku di beşgeh û girûpên olî yên Şî'î de tevgerên ramyarî yên alîgir, milîsên Şî'î yên çekdar û karsaz, rêvebirina wan dikin. Hizbulaha Libnanî û Heşdûşebî ya Iraqî beşeke mezin ji bodceya salane ya hikûmeta Iraq û Libnanê desteser kirine, her wiha Îran hewl dide ku veberanînên xwe li Sûrî, Yemen û Kendava Lor xurt bike.

**Hêza Leşkerî:**

Artêşa Îranê di cîhanê de ya 21'ê ye. Di salê de 1.4 melyon Îranî digehêjin temenê leşkerîyê. Li gorî malpera "Glopal Fêr Por" ya Emerîkî hejimara kesên ku di artêşê de kar dikin 534 hezar leşker in ji bilî ku 400 hezar leşker di hêza yedek de ne. Li nik artêşa Îranê 477 balafirên şerker, her wiha 1616 tank û 1315 zirîpoş hene. Piştî rêjîma Şah hate helweşandin, Îranê artêşeke xurt weke pêmayê ji xwe re girt. Ew artêş ji artêşên sereke yên Rojhilata Navîn bû, 450 balafirên şerker ji Koma Rojavayî kirîbûn, ji ber vê yekê navê "Asayîşa Kendavê", lê dihate kirin. Berî niha vejengeha biçûk

---

[36] Rêxistina "OPEC" rêxistineke cîhanî ye, dozdeh dewletên ku pişta xwe bi piranî bi derfirotinên petrolê ve girê didin ji bo ku dahatiyên xwe pêk bînin, vedihewîne. Navê xwe bi navê Rêxistina Opêk kurt dike, her wiha endamên wê hewl didin ku dahatiyên firotina petrolê di bazara cîhanî de zêde bikin. Ev rêxistin di sala 1960'î de li Bexdayê ji hêla Erebistana Siûdî, Îran, Îraq, Kiwêt û Venziwêlayê ve hate avakirin û a niha biryargeha wê li Viyênayê ye. Wekîpîdiya.

[37] Piştî avabûna Rêxistina Hevkariya Aborî Ya Dewletên Deryaya Reş, Îran ji dewletên weke Ezrebîcan, Tirkumanistan, Qazaxistan û Yekîtiya Rûsiya yên ku li ser deryaya Qezwênê cih digirin xwest ku rêxistineke hevkariyê di navbera dewletên deryaya Qezwênê de çêke ji bo ku hevkariyek di navbera wan de çêbe, dewlemendî û çavkaniyên deryayê di navbera xwe de bi kar bînin û karê deryageriyê rêxistinî bikin.

[38] Bazar, peyveke arî û kevnar e tê wateya sûk an jî sûka mezin, . Ew cihê kirîn û firotinê ye, Lê bazar bi derbasbûna sedsalan re bû dezgeheke aborî ku kelûpel û hilberînan di çarşoveyeke berfireh de belav dike û sermayedariya kilasîk a Îranê dinimîne. Dema ku em qala "bazara li Îranê" dikin, mebest jê ew dezgehên bazrê yên ku sûkên mezin li bajarên mezin vedihewênin. Divê neyê jibîrkirin ku "bazara Tehranê" para wê di aboriya Îranê de ya şêr e, ji ber vê yekê bandora wê ya siyasî ya herî mezin li ser asta welêt e. Yûsiv Ezîzî - Navenda Kendava Erebî ji bo Lêkolînên Îranî.

ya nûklerî ya lêkolînan di destê wê de hebû, "Şah" di sala 1967'an de ji Emerîkayê bi dest xistibû. Ji alîyê leşkerî ve Îran bi bîrûbawerîya leşkerîya Farisî kartêkirî ye. Bi çi rêbazê mabe weke me berê jî diyar kiribû, hewl dide lasaya wê bîrûbawerîyê bike û sûdê jê bigire. Pilansazkerên stratejîk yên Îranî pir li ser hêza leşkerî di baldar in. Di pêşgotina destûra Îranê de di benda "Artêşa bîrewerî " de wiha hatîye: **"Di dema avakirin û amadekirina hêzên çekdar yên ku welêt diparêzin de, pûtepêdanê didin ku bawerî û hişmendî bibe bingeha wê artêşê. Komara Islamî û hêza Pasvanê Şoreşê li gorî armanca ku me anî ziman, tê avakirin. Ev hêzên çekdar ne tenê bi berpirsyartîya parastin û pasvantîya sînor pabend in, lê belê barê nameya Xwedanî ya cîhanê hildigirin ser milê xwe (ji wan re amade bikin, çi tiştên ku hûn dikarin ji hêz û hespan ji bo ku dijminên Xwedan û yên we ji bilî wan bin jî bitersînin). "** Ji ber vê yekê Îran hewl dide ku moşekên balîstîk çêke û bi dest bixe û pirojeya xwe ya (nûklerî) navokî[39] û cebilxaneya xwe ya biyolojî û kîmiyawî bi pêş bixe, her wiha çekên cihêreng weke gemî û keştîyên leşkerî, zirîpoş û balafirên bêajokar li gorî pêwîstî û karîna xwe saz bike. Her wiha hewl dide ku sistemine nûjen ji bo hayedarên pêşdem, berevanîyên asîmanî û deryayî, amûrên ragehandinê û radarên ku di şerê elektronîk de tên bikaranîn, bi destbixe, û hewldana çapkirina nimûneyên moşekan û alavên leşkerî û tifaq û kelûpelên ku wan ji derve dikire û hin nav li gorî bîrûbawerîya xwe li wan bike, piştgermkirî bi Otarkiya aborî " Economic Antarcie"[40], anku bê ku xwe bispêre derve xwetêr dike. Derbarê alîkarîyên di biwarê alav, amûrên têkaloz û giran û pergalên eliktironîk ji bo arastekirina moşekan de, ew ji "Kûrîyaya Bakur, Çîn û Rûsîya" dikire û pûtepêdaneke mezin dide şerê nekilasîk ya ku şerê milîs û gerîlayan bi kar tîne.

Ji bo pirkirina çalakîya hêza xwe ya leşkerî daku berhingarîya çi gef û metirsîyên ku rastî rêjîma wê tên bike, Pasvanê Şoreşê yên Îranî weke

---

[39] Têkiliyên Tirkî û Îranî di Rojhilata navîn de tên guhartin - F. Stephen Larrabee, Alireza Nader- peymangeha lêkolînan RAND ya berevaniya niştimanî (ji bo meclîsa saloxgeriyê ya niştimanî hate amadekirin).

[40] Otarkî, ew besbûna hundirîn e. Siyasta otarkî hewl dide ku dewlet pêdiviyên xwe bê ku li derve vegere, hilberîne. Dibe ku daringekê di şûn yeke din de bîne, ji bo ku tevahiya pêdiviyên xwe bê ku ji derve bi pereyên buha bikire, peyda bike. Zanistnameya Têgînên Aborî û Civakî (Erebî-Ingilîzî) Ismaîl Ebdilfetah Ebdilkafî.

wêneyekê ji siwarên "Nemir û Cangorî" yên dema Şahinşahîya Farisî, damezirand û yên ku erkê wan parastin û berevanîya tac û textê Farisan li gel artêşa Farisî serdarî dikirin helgirtîbûn destê xwe. Ji ber ku pûtepêdaneke Îranî ya bilind hêzên Pasvanê Şoreşê heye, ji ber vê yekê bi awayekî taybet û cudatirî artêşa Îranê, ew bi çekkirina baş, û parepêdana mezin û takemafên çêtir pêda, Û ji girîngtirîn erkên Pasvanê Şoreşê rêvebirina kirdarên leşkerî û agehdarîyên derveyî sînorê Îranê ne. Ew jî di rêya "Feyleqê Qudisê" re yê ku "Qasim Suleymanî" li gel hevkarîya di navbera milîsên Şî'e û Sune[41] de yên ku bi Îranê re alîgir in, niha ku rêveberîya wê dike. Her wiha karê şaneyên razayî yên li herêmên ku Şî'î tê de belav in bi rêxistin dike, ji ber ku ew dever ji her çalakîyeke Îranî re hembêzgehine gelêrî ne. Îran bi hin êrîşên tundrewîyê yên ku sivîl li hin dewletan armanc girtibûn, hat tawankirin[42].Weke teqandina navenda çandî ya cihûyan li Biyûnês Ayrêsê ya Arcentînê[43], û armancgirtina komelgeheke nişteçêyî ku hin malbatên emerîkî lê dimînin li devera "Elxuber" ya Erebistana Si'ûdî, û armancgirtina ewlehîya Si'ûdî li parêzgeha Elqetîfê, komkujiyên ayînzayî li Iraq, Sûrîyê û hin deverên din jî çêbûn û bi hewldana teqandina hêlên sûtemenîyê yên li balafirgeha "Kênêdî" ya li Niyûyorkê. Îranê xwest ku desthilatdarîya Behrênê helweşîne û destê xwe deyne ser gelê Libnan û Sûrîyê, her wiha xwest ku balyozê Si'ûdî "Adil Elcibêr" yê li Waşintonê bikuje, jixwe "Elî Ebdela Salih" û hin alîkarên wî bi destê wê hatin kuştin. Gelek şaneyên sîxûrîyê li çend dewletên ku ji bo berjewendîyên agehdarên Îranê kar dikin, hatin binçavkirin û bi çend sûcan hatin tawankirrin paşê jî hatin dadkirin; hin ji wan sûcan ew bûn ku nakokîa ayînzayî di rêya geşedana ayînzaya Şî'îtîyê û pêşkêşkirina rapor û agahîyên

[41] Hêzên Sunî yên ku bi Îranê re alîgir in: Tevgera Hemas, Cîhada Islamî û hin êlên Erebî li Sûriye, Îraq û Yemenê ne.

[42]Belgeyên Elhura

[43] Li Arcentînê revenda herî mezin a koçberên Şîî ku pêwîstdarê mizgeftek û şêxekî bûn, heye. Ev yek bû derfet ji agehdarên Îranê re ji bo ku vîzayê ji kurtêlxwerê xwe yê bi navê (Muhsin Rebanî) re derxe û wî derbasî Arcentînê bike, bi hinceta ku ew mulheqekî çandî ji balyozxaneya Îranî re ye û divê hin navgînên rewanî ji revenda xwe re peyda bike. Ew kes di êrîşa terorist a herî mezin de ya li dijî navenda "Arîno" ya cihûyan a li Biyûnês Ayrêsê, cihê tê de lirtibû. Jixwe mizgînerên Şîî li Arcentîn û Şîlî heyanî Meksîkê jî belav bûne. Êrîşeke ku dê li dijî balafirgeha Con Kênîdî ya li Niyoyorkê bûya ku hêlên sûtemeniyê kiribûn armanc, hat pûçkirin, heger ev êrîş pêk bihata dê ji ya 11'ê Êlûnê mezintir bûya – BelgeyênElhura.

agehdarîyê yên der barê rewşên ewlehî, civakî, aborî de yên dewleteke, her wiha pêşkêşkirina hin raporên derbarê berelayî û xwepêşandanan, bidestxistina hejimarên telefonên hin kesayetên taybet bi mebesta ku sîxûrîyê di rêya pergeala ewlehîya agahîyan ya wê bike, belavkirina hin pirtûkên ku geşedana ayîzaya Şî'îtiyê dikin ku li hin dewletan qedexe ne, peywendî bi komên rikberîya rêjîmên dijminê wê dikin û belavkirina belevokên gurkirinê. Balyozxane û qunsuliyetên Îranî, navendên çand û bazirganiyê, mizgeftên Şî'î (Huseynîgeh) û deverên zanistî; ev tev ji bo komkirina agahîyan û derxistina rêdarîyan, navend in.

**Sazîya Pasvanê Şoreşê:**




*Saziya Pasvavê Şoreşêya Îranî "Pasdar"*

Piştî ku Şoreşa Islamî ya Şî'î bi serkirdayetîya "Xumeynî" bi ser kevt, hindek rêxistinên çalak pişkdarî di rûxandina rêjîma "Şah"ê Îranê de kirin, ew rêxistin jî ev bûn; Rêxistina Têkoşerên (Mucahidînên) Şoreşa Islamî, Komîteyên Şoreşgerî (komîte), Rêxistina Têkoşîna (Cîhada) Avakirinê, Rêxistina Têkoşerên (Mucahidînên) Xelq, Xwendekarên Şerîeta Îmam (Ên ku barimteyên (rehîne) Emerîkî di balyozxaneya Emerîka de giritn) û hinên din jî. "Xumeynî" di gulana 1979'an[44] de avakirina Pasvanê Şoreşê weke milîsên ewlehîya hundirîn û şoreşger di destpêkê de ragehand. Dema ku Iraq xwest parçeyekî ji axa Îranê di sala 1980'ê de dagir bike, weke artîşekê xwe bi rêxistinî kir, jixwe wezareteke taybet bi Pasvanê Şoreşê di sala

[44] Zêrevanên Şoreşgerî yên Îranî… sazkirin, çêkirin û rola wê – nivîsîn: Kênês Katizman – Belavker: Navanda Îmarat a lêkolîn û lêgerînê.

1982'yan de hat avakirin. "Rêxistina Mucahidînên Şoreşa Islamî" ya li dij Şah ya ku di sala 1977'an de hat avakirin, weke navka yekem a Pasvanê Şoreşê bû û di avakirina wê de alîkar bû. Radîkalên Islamî yên ku ji rêxistina "Mucahidînên Xelq" veqetiyan ev rêxistin ava kirin, ji ber ku piştgirîya Idiyolojîya Markisî dikir; Weke "Behzad Nebewî" wezîrê pîşesazên giran di sala 1981'ê heta 1989'an de, Muhsin Rîdayî serkirdeyê Pasvanê Şoreşê ji sala 1982'yan ve, "Muhemed Elî Rîcayî" serokê encûmena wezîran di sala 1980'î de, serokomarê Komara Islamî di sala 1988'an de, "Elî Şemxanî" û hwd. Piranîya endaman meşqa xwe li gel "Rêxistina Rizgarkirinê ya Filistînî" li Libnanê kirin û bi awayekî çalakbûyî di şerê li dijî "Şah" de beşdar bûn, piştî Şoreşa Islamî bi ser kevt "Xumeynî" ev rêxistin rakir û li şûna kavilên wê dezgeha Pasvanê Şoreşê hat avakirin. Jixwe berevanîya di ber Şoreşê de û derkirina wê bi şêweyekî fermî û li gor destûra Îranê xistin destê Pasvanê Şoreşê.

Pasvanê Şoreşê idiyolojîyeke bicoş û radîkal hildigire ser xwe û ew weke asayîş û darê şoreşê ye dema ku ji bin destê "Wîlayetûlfeqîh" derkeve, û ew dezgeheke serbixweyî ciyawaz bû ji wezareta berevanîyê û desteya serartêşê ya leşkerî ji hêla parepêdanê, çekkirinê, danîn û rakirina serkirdeyên wê û pêşekêtîya di çi biryarên leşkerî ve. Ew ji artêşa Sovyêtî û artêşa rizgarkirinê ya Çînî cuda ye, ji ber ku nakeve jêrdestîya partîtî yan jî ewlehîyekê, her wiha nakeve jêrdestîya êl yan jî malabatekê weke artêşên Xelîc, Sûrîyê û Iraqê berî sala 2003'yan, belê serkirdeyên wê ji "Xumeynî" pêşeng û lêvegerîyê ji xwe re distînin û yekser li jêr fermana raberê bilindtir diçin. Tevî ku Pasvanê Şoreşê ji rêxistinên pêşberîn ava bibûn yên ku ji "Xumeynî" û alîgirên wî yên oldar û şoreşger milkeçî nedikirin, lê belê tevan di gel hev û din kar dikirin. Ji ber ku Pasvanê Şoreşê ji artêşa sor ya Sovyêtî û artîşa şoreşgerî ya Firensî cuda dibe, ji ber ku ew ne ji wan serbaz û yekîniyên ku rajeya artêşa qiralî ya berî şoreşê dikir, hatîye sazkirin, lê belê piranîya endamên wê ji kesên şoreşger hatin komkirin. Sedema herî girîng ya ku hişt "Xumeynî" Pasvanê Şoreşê çêke ew bû ku bawerîya wî bi serbazên artêşa Îranî yên ku rajeya dewleta Behlewî dikirin nedihat. Hejmarek ji wan serbazan meşqa xwe li Emerîka û hin dewletên Ewrûpayê kiribûn, ji bilî vê yekê jî wî dixwest ku hêzeke bîrûbaweryane ku hevkêşî artêşê çêke, her wiha ev hêz baweriya xwe bi pergala Wîlayetûlfeqîh bîne û parastina pêwîst jê re pêşkêş bike û Şoreşa Islamî belav bike. Pasvanê

Şoreşê hin takemafên weke bidestxistina çekên asîmanî, bejahî û deryayî yên cihêreng, rêvebirina kargehên leşkerî, beşgehên veberanînê û torên ragehandinê yên taybet dike. Pasvanê Şoreşês erkdarîya pîşesazîya piranîya çekên stratejîk yê Îranê dike, her wiha pergaleke agehdarîyê taybet ku raberê bilindtir rasterast serperiştîya wê dike, heye. Jixwe di destûra Îranê di xala 150'î de wisa hatiye: **"Hêza Pasvanên Şoreşa Islamî ya ku di destpêka serkevtina Şoreşa Islamî de çêbû weke xwe dimîne, ji bo ku rola xwe di parastina şoreşê û parastina destkevtîyên wê de bilîze, zagon sînorê erkê vê hêzê û çarçoveya berpirsyarîya wê derbarê têkelîyên bi hêzên çekdar yên din re destnîşan dike, tevî vê yekî jî alîkarîya biratî û hemahengiya di navbera wan de tekez dike. "**

Li gel leşkerên ku di nav Pasvanê Şoreşê de ne, du hêzên din hene ku wê palpişt dikin, ew jî ev in:

**Hêzên Komkirina Gelêrî "Basîc[45]":** Rêxistineke nîvleşkerî ye, ji xwebexşên ku ji tevahîya gel bi taybet ji gênc û xwendekarên zanîngehan pêk tê. Serkirdayetîya Pasvanê Şoreşê serperiştîya wê dike û di dema pêdivîyê de tê gazîkirin, li gel çavdêrî û sîxûrîya wê li ser texên xotanîyê di civaka Îranî û zanîngehan de û ji bo ku raperînên sivîlan yên dijî pergala Wîlayetûlfeqîh biçewisîne, bi awayekî xwebexşî destwerdanê dike.

**Hêzên Parartêşa Qudsê**: Di sala 1990'î de hat avakirin, ceneral "Qasim Suleymanî ji sala 1998'an ve rêveberîya wê dike. Ew jî hemû kiryarên leşkerî yên li derveyî Îranê û kiryarên ewlehî yên "veşartî" di rêya "yekîneya 400'î"[46] re ya ku ji alîyê meşq û amadekarîyê ji baştirîn yekîneyên Îranê ve ye, dike. Ew yekîne bi erkên cuda cuda weke reşkujî, amadekirina şaneyên sîxûrkirî û hwd, radibe. Jixwe parartêşa Qudsê serperiştîya milîsên Şî'î yên çekdar yên li cîhanê bi awayekî rasterast dike û tevahîya pêdivîyên wan, peyda dike.

Îran dixebite ku hêza xwe ya leşkerî ji bo piştgirîya pilana xwe ya derveyî, bi kar bîne. Ev yek jî bi rêya beşdarbûna di kiryarên leşkerî yên derve de çê

[45] Nexşeya milîsên Îranî li Sûriyeyê [2/2] https://www. alaraby. co. uk
Artêşa Rizgarkirinê ya Şêî. Tabûra Îranê ya pêncemîn li welatê Ereban http://www. aljazeera. net

[46] Navenda agahiyên der barê agehdarîû terorê de li ser navê serleşker Meîr Emît li navenda paşmayên saloxgeriyê (M. T. S).

dibe; weke piştgirîya rêjîma Sûrî, Heşdûşebî li Iraqê, Tevgera Ansarûlah Elhosî, Hizbûlaha Libnanî û dijbera Behrênê. Jixwe Îran gefan dide ku dê wan hêzan li dijî dewletên Kendavê bi kar bîne û hewl dide ku dijminên wê xwe lawaz bibînin û tirsa têkçûnên mezin dixe dilên wan, dema ku li hemberî wê rawestin. Gefên domdar li hemberî mîtîngeh û berjewendîyên Emrîkî û Ewrûpî li Kendavê û herêmê dixwe. Her wiha gefan dide ku li dewleta Îsraîlê jî bide. Li hin deveran Îran bi ser ket, ji ber ku hêzên dijberî Îranê piştgirîya hevalbendên xwe – dijminên Îranê – nekir û hevkarîya di navbera wan de lawaz bû. Wekî mînak hêzên Pêşmerge neçar kirin ku ji Kerkûk û hindek deverên nakokin li ser di gel desthelatdarîya Iraqê de bê berxwedanî xwe vekişînin, piştî ku serkirdayetîya siyasî ya li Başûrê Kurdistanê sersarî kir. Her wiha desthelatdarîya "Saed Elherîrî" jî nikarîbû desteserkirina Hizbûlah li ser qada Libnanê kêm bike û li Yemenê jî wisa bû.

Tevî wê jî wezareta berevanîyê ya Emrîkî "Pentagon" bîrûbawerîya leşkerî ya Îranê wisa şîrove kir: Ev bîrûbawerî li ser bingehên berevanî û çavdêrkirina berjewendîyên aborî, siyasî û leşkerî yên dijminên wê li herêmê, ava bûye.

Yek ji armancên sereke ya stratejîya Îranê û hêza wê ya deryayî ew e ku hebûna xwe ya leşkerî li rojhelata Kendavê û kendava Umanê bi hêzkirin bike. Îran bi xurtî û bêrawestan li ser geşepêdana hêza xwe ya leşkerî ya deryayî kar dike û tiwanista xwe ya şer bilind bike, û bi tektîka li peyçûna şerê gerîla di çi ji şerên paşerojîyane de li dijî wê hêza xwe ya leşkerî pêş bixe. Ji lewre balê dide sazkirina qeyikên lezîner, noqdarokên biçûk, qeyikên bêajokar û moşek û mayînên dijberî keştiyan; weke moşeka "Kewser" a ku mînakeke ji moşeka "Kirûz" ya dijberî keştiyan e, û mayînên mexnetîzî û dengî yên ku jiber mayînên Sovyêtî yên dijberî keştiyan hatine çêkirin, û yên dibe ku bi çalakî li dijî keştiyên mezin yên tevgera wan heta radeyekê hêmin kar bikin. Her wiha gefan dide ku tengava "Hirmuzê" bigire û tevgera deryagerîyê di Kendava Lor de rawestîne. Jixwe hin çavkanî destnîşan dikin ku tenê 300 mayîn bes e ku tengav bê giritin. Tevî ku hosteyên leşkerî tekez dikin ku bikaranîna vê yekê asteng e, lê ev pirsgirêk bûye weke şereke derûnî di navbera Îran û hêzên navdewletî de. [47] Di vê tengavê de nêzî %80 ji petrola Kendavê bi 20 ta 30 navgînên veguhastina

[47] Stratejiya Îranê li hemberî dewletên kendava Erebî- Dr. Tacedîn Cafer Eltaî

petrolê tê re derbas dibin û ber bi alîyên cîhanê ve diçin. Jixwe heger ev tengav were girtin dê nirxê petrolê gelekî bilind bibe.

**Stratejîya êrîşkirina leşkerî ya Îranê:**

Stratejîya Îranê ya leşkerî weke ku serkirdarîya Îranî pilan dikin di paşerojê de,  ku pişta xwe pê girêdide ew tavîya xest ji moşekan bi barê xwe ji teqemenîyên asayî, biyolojî, kîmiyawî û nûklerî bavêje, bi şêweyekî ku sîstema bervanîya asîmanî yên pêşketî yên dewletên armancgirtî nikarbin tevan bixin erdê, di gel birina êrîşan di hundirê wan dewletan de di rêya tektîka şerê gerîla û lêdana berjewendîyên Ewrûpî bi destê kaselîsên xwe li herêmê, pêk tîne.

Îran rêzbendek ji baregehên leşkerî yên deryayî (nêzî 5 baregehan) li ser perava xwe ya li hemberî Kendav, Kendava Umanê û giravên Îranî[48], avakir. Îran dixwaze baregeheke deryayî li tengava Babelmendibê ava bike, her wiha  komkeştîya xwe xurt dike, çekên xwe nûjen dike û karîna şer di rêya çend rahênanên leşkerî de bilind dike, û baregeha "Xor Meşher" ya girêdayî bi Pasvanê Şoreşê, ji bo cengên deryayî ne. Serkirdeyên Îranê dibêjin ku moşekên Pasvanê Şoreşê ava Kendavê tevî digire û tu keştî nikare derbas bibe bê ku nebe armanc ji moşekan re. Ev yek jî bilinbêjîyeke mezin e, ji ber ku Îran hêj negehaştîye asta teknîka hûrbînî û nikare bi hûrbînî li armancan bide.

**Agehdarên Îranî[49]**


---

[48] Girîngtirîn baregeh ya "Bender Ebas" e, rêveberiya hêza deryayî tê de bi cî dibe. Baregeha "Ebadan" peyadeyên deryayî tê de bi cî dibin. Baregeha "Şah Bihar". Baregeha "Boşeher" qeyikên moşekên lezîner tê de bi cî dibin. Baregeha "Xerc" balafirên şerker tê de bi cî dibin. Baregeha "Bender Xumeynî" li hemberî  Îraq û li derbasgeha ŞetulEreb dikev. Heman jêdera pêşberîn e.

[49] Saloxger yan saloxgerî, dezgeheke ji dezgehên dewletê ye. Bi danheva agahî û çareserkirina wan pispor e. Lêpirsîna kesayet û dezgehên sivîlî, leşkerî û aborî yên hundirîn û derveyî bi awayekî razberî, dike.  Şerê sîxorî û karên din ên ku lawazkirina dewletê armanc digire, dike. Pêwîstiya wan bi karîn û kêrhatinên pir serkeftî û zîrek heye. Carê siyasta hikûmetê bi kar tîne. Dibe ku bibe çekeke dijwar, heger ji hêla desthilatdariyeke ku berjewendiyên gel û dewletê piştguh dike, bê bikaranîn. Hin dewlet her du têgehan bi kar tînin, peyva saloxger ji bo dezgehên ku şopandina gelê sivîl dikin tê bikaranîn û navê wê

Dirûşmeya agehdarên Îranê di çaxê Şah de, bi navê "SAVAK" hatibû kurtkirin.

Dirûşmeya wezareta agehdarîû ewlehiya neteweyî ya Komaea Islamî Ya Îranî



Wezîrê agehdarî û ewlehiya neteweyî ya Komara Islamî ya Îranî yê niha"Mehmûd Elewî"

Îranî, ji ber tun û tûjîya dezgeha agehdaran "Savak" ya girêdayî Şah, pir nehamet kişandin. Ya ku lipeyketina rikberên Şah, girtîkirina wan û bikaranîna êşkinceyên curbicur li dijî wan, hildigirt dest xwe. Serbarî wê kesayetên rikber yên binav dikuştin. Her wiha agahî û xizmetguzarîyên derbarê tevgerên çep, Filistînî û hêza leşkerî û ewlehî ya Sovyêtî, pêşkêşî

agehdarên giştî ye, lê peyva agehdarîbêhtirî xwe di şopandina artêş û ewlehiyê de tê bikaranîn ji ber vê yekê em navê agehdarîyên leşkerî dibihîzin.
http://mohmmadaldawere. wixsite. com/jordanianofmilitary
Cudahî di navbera saloxger û saloxgeriyê de çi ye? http://defense-arab. com/vb/threads/73681

dewletên rojava dikir, ew jî bi hekarîya li gel dezgehên wan yên agehdarîyê, weke dezgeha agehdarên Îngilîzî M16, ajansa agehdarên navendî ya Emerîkî CIA û dezgeha agehdarên Israîlî "MOSSAD", jixwe bi tevahî bibû alaveke terorê. Piştî serkevtina Şoreşa Islamî li Îranê û bidestxistina "Xumeynî" ji desthilatdarîya rebeq re, pûtepêdaneke mezin derket ji bo ku dezgeheke agehdarîyê bê pêşxistin û ji bo ku xizmeta desthilatdarîya nû bike, her wiha weke amûreke terorê bê bikaranîn û li pê dijmin û rikberên rêjîma Îranê ya nû bikeve û bi karên cihêreng yên ku xizmeta stratejîa wî di hundir û derveyî Îranê de dikin, rabe. Di destpêkê de dezgehên ewlehîyê wekî komîteyên şoreşgerîyê hatin piştgermîkirin, yên ku "Xumeynî" pişta xwe bi wan ve girê dabû ji bo ku agahîyan derbarê rêjîma Şah de bide hev û hin operasyonan pêk bîne. Bi awayekî çalak ji bo ku li pê jêmayên peyrewên Şah û endamên "Savakê" bikeve û ji bo ku wan bikuje, hat bikaranîn. Piştî "Xumeynî" dest danî ser desthilatdarîyê, piştî rikberên wî yên ku di hilweşîna rêjîma Şah de beşdar bûbûn zêde bûn û piştî ku mafên siyasî û çandî yên gelên din da mandelê; pêwîstî hebû ku dezgehên ewlehî û agehdarîyê yên ku bi awayekî xweser kar dikirin di wezareteke nû de yek bike. Jixwe di sala 1984'an de wezaretek bi navê " wezareta agehdarîû ewlehîya netewî ya Komara Islamî ya Îranî" hat avakirin, bi Farisî navê wê wisa ye: "وزارت اطلاعات جمهوري إسلامي ايران" , her wiha navê pergala "Fafak" jî lê dikin, daku bibe asayîşa nehînî rêjîma Wîlayetûlfeqîh û dezgeha agehdaran ya serke. Vê wezaretê pûtepêdan, parepêdaneke mezin û gelek takemaf standin. Ev wezaret tê hejmartin ji pêmaya dezgeha agehdarîya di dema Şahê Îranê de ye (Safak)[50] ya ku destheladarîyên bi biwarên berfireh girtibûn.

Wezareta agehdarîyê çend proseyên reşkujiyê ku tê de çend kesên siyasî, nivîskar, rewşenbîr û rikeberên di hundirê Îran û derveyî wê de ne,

[50] Di sala 1957'an de bi piştgiriyeke rasterast ji hêla dezgeha agehdarên navendî yên Emerîkî CIA û Mosad û agehdarên Îngilîzî M16 hat avakirin. Mebest jê ew bû ku rêjîma şah biparêze, çavdêriya çalakiyên Şiyoî yên ku li Îran û di nav miletên Rojhilata navîn de zêde dibûn, bike û piştgiriya dewleta Israîl bike. Hin jêder destnîşan dikin ku ev dezgeh a herî mezin bû li herêmê, hejimara peywirdarên wê gihaştibû 60 hezr kesî û hejimara kurtêlxweran gihaştibû nêzî melyon kesî di hundirê Îran û derveyî wê de. Karîbû hin serbazên Ereb yên payebilind bi kar bînin weke dezgeha agehdarên Lîbî di dema Qezafî de û agehdarên Îraqî di dema rêjîma baas de. Kurtedîrokek der barê dezgeha Safak de- Ewlehiya Niştmanî ya Erebî- http://nsaforum. com

pêk anî. Tevî vê yekê jî roleke wê ya mezin di çandina şaneyên sîxûrgerîyê li seranserî cîhanê de heye, çewsênkirî hêza xwe ya nerm û himbêzîya Şî'î û zora pareyan, û çi peyayên ji ayînzaya Şî'î peywira wezîrê vê wezaretê helgirt dest û niha jî "Mehmûd Elewî" karê wezaretê hildigire dest xwe. Wezareta agehdarîyê van dezgehan vedihewîne "Encûmena Hevkarîya Agehdarî , Rêxistina Parastina Agehdarên Artêşa Komara Islamî ya Îranî, Rêxistina Agehdarên Pasvanên Şoreşgera Islamî, Rêxistina Agehdarên Asayîşê, Pasvanên Welî Elemir, Asayîşa Ewlehiya Îranê, Navenda Lêkolîna Tawanên Pilankirî, Navenda Lêkolînên Stratejîk ya Ewlehîya Netewî, Pasvanên Alîgirên Mehdî yên Parastinê" Encûmena Bilind a Ewlehîya Netewî li gorî xala 176'an a makezagona Îranê serperiştîya wê dike û Serkarî û hevkarîyê bi dezgehên agehdarîyê yên din re yên ku girêdayî rêjîmê ne jî dike, her wiha hevkarîyê bi asayîşa Komara Islamî ya Îranî û hêzên komkirina gelêrî yên girêdayî wezareta berevanîyê re dike, her wiha hevkarîyê bi Hêzên Taybet yên şerkirina Terorê, Feyleqa Qudsê ya girêdayî Pasvanên Şoreşgerîyê, Yekîneyên Asayîşa Taybet, "Yekîneyên Kumondoz yên Sabrîn" yên girêdayî Pasvanên şoreşgerîyê re û bi hêzên asîmanî, deryayî û bejahî yên cuda re jî dike. Bandoreke mezin ya şêwirmendê bilind li ser biryar, bîrûbawerî, stratejî û pilansaziyên wê heye. Hin rapor destnîşan dikin ku nêzî 16 dezgehên agehdarîyê li Îranê hene, dezgehên agehdarîyê n Pasvanên Şoreşgerî, Agehdarên Artêşê û Agehdarên Asayîşê li destpêkê tên. "Encûmena Hevkarîkirina Agahîyan" desteya agehdarîya herî bilind li Komara Islamî ye, ji 9 endaman[51] pêk tê, hin ji wan ev in; wezîrê agehdarîyê , dadwerê giştî yê pergala dadwerîyê, wezîrê navxweyî yan cîgirê wê yan jî berpirsê agehdarîyên Pasvanên şoreşgerîyê û wezîrê derve yan cîgirê wî yan jî berpirsê agehdarîyê n asayîşê.

Yek ji peywirên Encûmena Hevkarîkirina Agahîyan ew e ku siyaseta ewlehî û saloxgerîya giştî, lêkolînkirin doz û erkên ewlehîyê û hevkarîya bi encûmena bilind ya ewlehîya netewî di rêya lêkolînkirina tiştên ku bi hêzên çekdar û çalakîyên wê yên agehdarîve girêdayî ne, destnîşan bike. Her wiha serperiştîya "Komîteya Rêvebirina Qeyranan" dike, alîkarîya dezgehên agehdarîyên girêdayî Pasvanê Şoreşêyên Îranî dike û karê "Nivîsgeha Tedlîl"

[51] http://www. vetogate. com/2220045
Vedîtina 16 dezgehên ewlehî û agehdarên Îranê- https://www. alarabiya. net

ya ku şerê derûnî li dijî dijminên rêjîma Wîlayetûlfeqîh pêk tîne. Wezîrê agehdarîyê serokatîya vê encûmenê dike û ew yekser ji hêla Şêwirmendê bilind ve tê erkdarkirin. Wezaret balê dide ku texên xortan yên xwende peywirdar bike piştî ku ezmûneke pejirîner ji bo ku derbasî zanîngeha taybet bi wezaretê bibin, derbas bikin yan jî bi rêya yekî ji karkerên di wezaretê de ( bi payeyeke destnîşankirî) wî rasparde bike.

Qewaregirtina wezareta Agehdarîû Ewlehîyê ya Îranî li ser 15 beşî yan jî rêveberîyê belav dibe û çend nivîsgehên pispor jê şax vedidin, ew jî ev in:

| | | |
|---|---|---|
| 1. Sekretarî (Razgira Giştî) | 2. Şerkirina sîxûrgerîyê | 3. Proseyên derveyî: Cîhanê li ser çend herêmên erdnîgarîyê, dabeş dike,her herêmeke ji wan di bin destê nivîsgeheke taybet de ye. Ew nivîsgeh serkarîya tevahîya agahî û tevgerên ku di wan herêman de çêdibin, dike. |
| 4. Lêpirsînên ewlehîyê | 5. Teknîka nûjen û sîxorgerîya teknîkî | 6. Siyaset |
| 7. Nirxandin û karûbarên stratejî | 8. Fêrkirin | 9. Lêkolîn |
| 10. Arşîv û belgename | 11. Hêza karker û karê xêrxwaziyê | 12. Karûbarên rêveberî û darayî |
| 13. Têkelîyên zagonî û parlemantoyî | 14. Aborî | 15. Çand û civak |

Di kurteraporeke ji 60 pelî de ku ji hêla Beşa Lêkolînan ya Federalî ve ya ku di nivîsgeha Kongirêsê de ye, ya ku li gorî girêbesteke hevbeş di navbera ajans û bernameya piştgirîya şerkirina terorê ya nefermî ya girêdayî nivîsgeha piştgirîya teknîkî ya şerkirina terorê de di berfanbara 2012'an[52] de

[52] IRAN'S MINISTRY OF INTELLIGENCE AND SECURITY: A PROFILE- A Report Prepared by the Federal Research Division, Library of Congress under an Interagency Agreement with the

bi serperiştîya wezareta bervanîya Emerîkî "Pentagon" hatibû amadekirin, wê raporê destnîşan kir ku wezareta saloxger û ewlehîyê ya Îranî yek ji mezintirîn dezgehên saloxgeran li Rojhilata Navîn e, û bi çalakîyeke pir bilind kar dike, çi kesê ku rêveberîya wê bike divê oldarekî Şî'î be û bi Idiyolojiya Xumeynî bawermend be. Li gorî rapora Emerîkî **"Wezaret di bin kontrola rasterast ya stemkarê tiyokratîk yê Îranî Ayetulah Elî Xameneî de ye"** ji ber vê yekê jî ew di ser zagonê re ye, her wiha 30 hezar peywirdarên ku di operasyon û çalakîyên nehênî yên derbarê sîxorgerî, dizîya têknolojîyê, teqandinên terorî, reşkujî, revandin û jantajkirinê pêk tînin, vedihewîne. Jixwe agehdarên Îranê li gelek deverên cîhanê yên weke Avganistan, Îraq, Kiwêt, Libnan, di nîvî Asiya û Afirîka de, Nemsa, Azerbêcan, Kurwatîya, Firensa, Corcîya, Almanîya, Turkiye, Ingilîstan û her du parzemînên Emerîkayê tevî Emerîka bi xwe jî;  ji bo ku Îran berjewendîyên xwe pêk bîne çalak in. Rapor stratejîya Îranê wisa şîrove kiriye: Îran hewl dide ku hebûneke ewlehî li deverên ku di bin desteserîya Emerîkî de ne çêke ji bo ku Idiyolojîya Xumeynî û ayînzaya Şî'î ya dozdehîn belav bike û toreyan ji bo sîxûrgerî û operasyonên nehênî ava bike û xwe amade dike da ku cengeke ne hevseng li dijî Emerîka pêk bîne. Wezaret rê dide ku kesên ji bawerî û nasnameyên din yên weke Ereb, Cihû û yên din jî, her wiha hemwelatîyên dewletên din yên weke Ingilîzî, Israîlî û hin kesên din yên ku xwedî du nasnameyan e, bên serbazkirin. Her wiha wezaret dihêle ku kesayetên Şî'î yên ku paşxana wan ji ayînzayên cuda ne bên erkdarkirin, weke erkdarkirina wezîrê navxweyî "Seîd Umamî" di cihekî girîng de tevî ku  koka wî ji Cihûyan e. Rapor tekez dike ku hevkarîyek di navbera Îran û rêxistina Elqaîde de heye tevî ku ayînza û idiyolojîya wan ne yek in, lê her du jî dijminatîya desteserîya Emerîka ya li ser herêmê bingeh digirin. Rapor ev hevkarî wisa şîrove kir: Îran dixwaze ku pûtepêdanên Emerîkî yên ewlehîyê dûrî xwe bibe, beranberî vê yekê rêxistina Elqaîde alîkariyên locîstîk ji Îranê digire û baregehên xwe li wir ava dike. Her wiha raporê, rola mezin ya pergala agehdarên Rûsî SVR ya ku paşmagira KGBê ye, di pêşkêşkirina alîkarî û rahênankirinê ji bo agehdarên Îranê ji salên notî

---

Combating Terrorism Technical Support Office's Irregular Warfare Support Program. December 2012.

Pentagon report: Iranian intelligence linked to spying, terror attacks- http://freebeacon.com/national-security/iran-spy-network-30000-strong/

ve tevî bîrûbawerîya cuda ya her du rêjîman, da xuyakirin, û bi sedan agehdarên Îranê rahênan dikir, her wiha Îran bi alavên guhdarkirina elektronîk û alavên nîşandan û sehkirinê bi serperiştîya derhûdeyên Rûsî dihat zêdekirin. Raporê ev hevkarî jî wisa şîrove kir: Ev keda ku tê dayîn ji bo ku desthilatdarîya Emerîkî li Asyaya navîn bi sînor bikin û ji bo ku hewldanên rizgarîyê yên miletên blindest binpê bikin. Agehdarên Îranê di stratejîya xwe de dewleta Israîl armanc digirin û aîkarîyeke domdar ji Hizbulaha Libnanî re pêkêş dike, her wiha Feyleqa Qudsê ya girêdayî Pasvanê Şoreşêyên Îranî pûtepêdaneke tewereyî ji wê wezaretê dibîne.

**Rapor, çalakîyên agehdarên Îranî yên herî girîng tîne ziman:**

Sîxûrgerî, dizîya teknolojîyê, teqandinên terorî û reşkujî; her wiha operasyonên xerakirinê, bombebarankirina devrên armancgirtî û kuştina kesên ku ji Komarê veqetiyane, ev tev li hundirê Îran û derveyî wê çêdibin.

Revandina kesan ji derve û vegerandina wan bo Îranê, paşê jî girtîkirin an jî kuştina wan.

Pêşkêşkirina xizmetguzarîyên daringî û teknolojî û ji bilî van xizmetguzarîyan weke yên ji Hemas, Hizbulah, Elqaîde li Îraqê û ji hin rêxistinên weke rêxistinên terrorist li gorî biryara cîbicîkirinê ya Emerîkî 13224[53] tên polpolkirin.

Yekîneyên agehdarîyên elektronî ji bo operasyonên sîbirî CYBER OPERATIONS ji bo ku operasyonên êrîşkirin û berevanîyê pêk werin hatin avakirin, piştî ku alavên wê yên elektronî yên bernameya nûklerî di pûşpera 2010'an de bi veyrûsa Stoksnêt SUXNET hat veyrisandin. Wê veyrûsê rê li pêşîya binesazîya dewlemendkirina nûklerî li Îranê girt. Rapor tekez dike ku serkevtina vê veyrûsê lawazîya pêşveçûna sîbiranî li Îranê nîşan dike.

Agehdarên Îranê dixwazin operasyonên xwe yên sîxûrgerîyê li Rojhilata Navîn û Deryaya Spî di rêya avakirina îstgehên elektronîk yên guhdarîkirinê re, berfireh bikin. Raporê, hebûna du îstgehên guhdarîkirin û sîxûrgerîyê yên elektronîk destnîşan kir, yek li Rojava – Bakurê Sûrîyê ya din jî li ser girên Colanê yên ku agehdarîyê n Sûrî alîkarîya wan dikir û Pasvanê Şoreşê parepêdan ji wan re pêkêş dikir, her wiha raporê destnîşan kir ku hin

[53] Executive Order 13224- https://www.state.gov/j/ct/rls/other/des/122570.htm

îstgehên din jî li bakurê Sûrîyê hatibûn pilankirin. Tevî ku her du îstgeh ji alîyê avahîya teknîkî ve lawaz bûn lê xizmetên baş di warê çavdêrî, lêpirsîn, berhevkirina agahîyên agehdarîli herêmê û zêdekirina Hizbulaha Libnanî bi agahîyan, pêşkêş dikirin. Îstgeheke sêyem jî ku Tirkîyê armanc digire ji nû ve li devera kenara deryayê li Sûrîyê piştî operasyona "Suleyman Şah" ava bû. Wezîrê agehdarîyê n Îranê "Mihemed Elewî" di nimêja înê de di 13ê pûşpera 2014an de çalakîyên wezareta xwe yên elektronîk destnîşan kir û wisa got[54]: **Ew dixwazin karê ku ji bo berjewendîyên biyanîyan kirine veşêrin, lê em bi tîşknameyên wan, îmêlê wan yê Gîmêl, axaftin û guftûgoyên wan re rûbirûmayîna wan dikin, wê demê ew nikarin tu tiştî li ser wezareta agehdarîyanveşêrin û tu bijarde ji bilî danpêdanê li pêşîya wan nîn e. "**

Têçûna bi nepenî nava civakên Îranî, Şî'î û Islamî li tevahîya cîhanê de. Dezgehên hawarhatinê û komeleyên xêrxwazîyê alavine girîng in ji bo ku vê yekê pêk bînin.

Avakirina yekîneyên şerkirina sîxûrgerîya dijber. Yekîneyeke taybet ji bo şerkirina sîxûrgerîyê da ku bernameya xwe ya nûklerî ji êrîşkirin û wêrankirinê biparêze û ji bo ku li hemberî operasyonên ku bi balafirên bêajokar weke Êgil (Eagle2)[55] û hinên din çêdibin, raweste.

Çend operasyonên serkevtî yên reşkujîyê yên li dijî dijberan, bi navê agehdarên Îranê tê tomarkirin, tevî vê yekê jî alîkarîya berdewam û cureyî ya ku pêşkêşî hêzên alîgirên xwe dike, ne tenê wisa lê belê gehaştîye astekê ku moşekên balîstîk di rêya qaçaxîyê re bigehîne destê tevgera Hûsî ya li Yemenê. Jixwe operasyonên reşkujîyê li dewletên din bê ku tu zirxek jê re hebe pêk tîne wek kuştina Ebdulrehman Qasimlo, Sadiq Şerf Kindî û hejimarek ji serkirdeyên rêxistina Mucahidî Xelq û hinên din. Her wiha di sala 2017'an de kuştina "Se'îd Kerîman" û hevkarê wî yê kiwêtî "Mihemed Miteb Elşelahî" ku nêzî koma Mucahidî Xelq ya dijber bû û xwediyê beşgeha GMC ya televîzyonî bû li taxeke Stenbolê, ket stûyê wan.

---

[54] Wezîrê Salogeriyên Îranî: Em dikarin nameyên we yên elektronîk bixwînin- Bi pênûsa Arş Kermî
https://www. al-monitor. com/pulse/ar/originals/2014/06/iran-intelligence-monitors-email. html

[55] balefirên bêajokar- amadekar: serheng Entiwan Necîm- https://www. lebarmy. gov. lb

**Jixwe dezgehên agehdarîyên Îranê bi hin karên di radibin:**

Rabûna bi raspêrîyên agehdarîû agehdarîyê n dij û asayîşa nihênî dike.

Alîkariya pêwîst ji bo karên mîna hinartina idiyolojîya Xumeynî û belavkirina Şî'itîyê Pêşkêş dike, her wiha alîkarîya komeleyên Şî'î yên alîgir dike û hewl dide ku çi tevegereke dijber be wê biçewisîne

Lêkolînên ewlehî derbarê berpirsyarên di Wîlayetûlfeqîh de çêdike.

Serperiştîya proseyên hêza nerm di rêya çavdêrîkirin û lêpirsîna li ser toreya internêntê û navgînên ragehandinê, û şerkirina êrîşên çandî dike.

Parastina rêjîma Wîlayetûlfeqîh di hundir û derve de dike, çavdêrîya tevgerên miletên Îranê dike û hêzên dijber yên siyasî û leşkerî dişopîne.

Berhevkirina agahîyan dike û wan çareser dike û karê agehdarîyên hundirîn û derveyî bi rêxistin dike.

Misogerkirina razberîya belge û agahîyên girêdayî hin dezgehên agehdarîyê dike, her wiha alîkarî û hevkarîyê bi dezgehên Pasvanê Şoreşê dike û çi pêdivîyên pêwîst hebein ji wan re pêşkêş dike.

Damezrandina dezgehên hawarhatinê, komeleyên xêrxwazîyê û navendên olî û çandî dirust dike, her wiha karên wan di rêya pêşkêşkirina xizmetguzarî, alîkarî û serbazkirina kaselîsan di rêya idiyolojî yan jî pareyan re, bi rêxistinî dike.

Piştevanîya Zêrevnên Şoreşgerî dike ji bo ku dezgehên agehdarîyê ku girêdayî hêz û tevgerên alîgirên Îranê ne, ava bike, weke dezgeha agehdarîyên Heşda Şe'ibî li Îraqê, dezgeha agehdarîyên Hizbulaha Libnanî, tevgera Elhûsî û hinên din. Li gorî hin navgînên ragehandina Îraqî[56], Pasvanê Şoreşêji dezgeha "Elridwan" xwest ku erka avakirina "dezgeha Heşda Şe'ibî ya agehdarî" cihbicih bike, ji bo ku proseyên "çavdêrî û berhevkirina agahîyan" li hemû parêzgehên Îraqê helgire destê xwe. Jixwe dezgeha Elaridwan sazîyeke Şî'î ye, ji hêla Îranê ve maldarîya xwe werdigire, biryargeha wê li Kerbelayê ye û ji çend komeleyên Şî'î pêk tê. Heşda Şe'ibî bi sedan kes ji parêzgeha Kerbelayê tenê serbaz kir, serkirdeyê Feyleqa

[56] Piştî avakirina dezgeha saloxgeran. . Îran avakirina Zêrevanên Şoreşgerî yên Îraqê bi dawî dike- http://www. Islamist-movements. com/37249

Qudisê ceneral "Qasim Suleymanî" bi awayekî rasterast di rêya cîgirê xwe yê ku li Kerbelayê dimîne re serperiştîya wê dike.

Malpereke[57] wê li ser internêtê di sala 2012an de hat avakirin û avakirirna wê wisa hat şîrovekirin: Malper hewldanek e, ji bo ku wêneyê agehdarîyê n xwe xweşik bike û daxwaza alîkarîyê ji Îraniyan bike daku agahîyan bidin ajansa agehdarîyan, ew jî bi şêweyekî ku piştevanîya hêza wê ya nerm bike. Hejimareke telefonê ji 3 jimaran peyda kir daku Îranî karîbin çi agahîyên ku sûdê didin agehdarîyanbigehînin dest û beşek ji bo belavkirina derew û propagandayan û pêkanîna cenga derûnî li dijî dijminên Komara Islamî ava kir, ew jî di rêya toreyên civakî û dezgehên ragehandin û rojnamegerîyê de.

**Agehdarîyên Pasvanê Şoreşê yên Îranî:**

Pasvanê Şoreşê ji destpêka avabûna wê ve dezgeheke idiyolojî û radîkal e, bi çalakî di çewisandina gelên din de yên ku ne ji Farisan û xwedî nêrînên cuda dike, belê hetanî di sepandibûn serûkê li ser jinên Îranî di salên heştêyî de. Pasvanê Şoreşê di dema şerê Îraqî – Îranî di salên 1980'î – 1988'an de şêweyê xwe girt, di wê demê de "Muhsin Rîzayî"serkirdeyê giştî yê hêzên Pasvanê Şoreşê bû. Ji ber ku Pasvanê Şoreşê gelek karînên daringî û mirovî di destê wê de hene û ji ber ku gelek pirojeyên pêşveçûyîn û pîşesazîyên leşkerî xistine destê xwe, bêhtirî xwe nêzî rêxistineke mafyawî dibe û ji ber ku çavdêrîya çalakîyên hin kesan di hundirê dezgeha Pasvanê Şoreşê bi xwe de dike, ev tişt dihêle ku nêzî dezgeheke ewlehî ya taybet bibe. Hin jêder[58] destnîşan dikin ku destê agehdarîyê n Pasvanê Şoreşêdi qaçaxiya hişbir û bazirganiya seksî de heye, her wiha beş, lêpirsîner û êşkincekarên wê di girtîgehên Îranê de hene. Jixwe ew xwediyê ajansa nûçeyên "Faris û Tesnîmê" ye û malweşanên wê yên pirtûk û rojnameyan hene û hebûna wan di her bajar, gund, dever, rêveberî û beşgehekê de li Îranê heye.

Proseyên agehdarîyê yên derveyî û serkirdayetîya leşkerî ya stratejîk, û aboriya niştimanî tev di bin kontrola Pasvanê Şoreşêde ne. Pergala

[57] Malpera Fermî ya Wezaretê http://www. vaja. ir/Portal/Home/

[58] Yûsiv Ezîzî-Zêrevanên Şoreşgerî yên îranî: Çênûn, pêkhate û rola wê- http://alarab. uk/?id=24553

agehdarîyê dezgeha Pasvanê Şoreşêya Îranî bêhtirîn dezgehên agehdarîyên Îranê yên ku li ser qada derveyî çalak in, a niha  jî ceneral "Hisên Taib"[59] serokatîya wê dike. Ew yek ji dezgehên ewlehîyê yên herî bihêz li welêt e, bi erkên hundir û derve radibe û wezareta agehdarîyên sivîlî ya ku wezîrê wê nûnertîyê di perleman de dike, derbas dike. Pîlanan amade dike ji bo ku hêzên girêdayî xwe bi alîkarîyên lojistîk, çekên cureyî û agahîyên ewlehîyê zêde bike, her wiha agahîyan ji berpirsyarên ewlehîyê yên Îranê re dihinêre û pêşwaz dike.  Dezgeha agehdarîyê Karîbû alîkarîya "Hûsiyan" bi çend moşekên balistîk bike, dixwest wan moşekan di rêya qeyikên noqker yên biçûk re ji baregeha Îranî ya li Êrîtêriyayê berev keştîgeha Elhudeydayê bibe û li wir di rêyên bejahî re ber bi Sa'de ve bibe. Ew aqilmendê ku operasyonên Feyleqa Qudisê bi rê ve dibe û destê Pasvanên Agehdarîyê yê derveyî li Îraq, Sûrîye û Libnanê ye. Wê karîbû çend kaselîsên dezgehên agehdarîyên Rojava nas bike û bigire, weke keça serokê desthilatdarîya dadwerîyê ya Îranî "Zehra Larîcanî" keça "Sadiq Larîcanî" ya ku hin agahî pêşkêşî balyozxaneya Îngilîstanê ya li Tehranê û dezgeha agehdarên Îngilîzî MI6 kir. Agehdarên Îranê ew agahî wekî ku zererekê bidin ewlehîya neteweya Îranê derbarê bernameya nûklerî de, şîrove kir. Roleke wê ya bibandor derbarê çewisandina tevgera  Elxedrai de ya ku encamên hilbijartinên serokatîyê di 2009'an de şermezar kir, hebû û bû hêzeke ku

[59] Hisên Taib di sala 1963'an de li paytexta Îran Tehranê ji dayîk bûye. Dema ku şoreş di sala 1979'an de dest pê kir, temenê wî gihaştibû 16 salan. Ew jî mîna gelek gundî, pîşesazker û xortên hejar yên gênc tevlî hêza seferberiya giştî ya gelêrî "Basîc" bû ya ku girêdyî dezgeha Zêrevanên Şoreşgerî ye, her wiha tevlî  hewza zanistî ya li Tehranê bû û li ser destê hejimarek ji ayetên xwedan li hewzên Qum, Tehran û Meşhed paytexta parêzgeha Xurasanê fêrî zanistên olî bû. Hin nasnavên weke Hesen Taib, Hisên Necat, Hisên Taib û Meytem  bi kar tanîn. Navê Hisên navê birayekî wî bû ku di şerê Îraqî-Îranî de di sala 1986'an di operasyonên "Kerbelaya 5" de jiyana xwe ji dest dabû. Tevî ku bi navê Hisên dihate naskirin lê navê wî yê rasteqîn "Hesen" bû. Wekî lêpirsîner di agehdarîyên Zêrevanên Şoreşgerî de kar dikir. Ji ber serkeftin û jêhatiyên wî di lêpirsînê de, payeya wî zû bilind bû û bû rêveberê nivîsgeha agehdarîyên Zêrevanên Şoreşgerî li parêzgeha Xurasanê, paşê bû şêwirmendê serokê beşê şerkirina Terorê di wezareta ewlehî û itîlaatê (saloxgeran) di çaxê Haşimî Refsincanî de. Wekî xelatekê jê re Şêwirmendê bilind Elî Xamîneî di 4ê kewçêra 2009an de biryar da ku wî weke serokê dezgeha agehdarên Zêrevanên Şoreşgerî tayîn bike. 12  agahî der barê kesê herî metirsîner li Îranê. . Ceneral Hisên Taib Serokê Agehdarîyên Zêrevanên Şoreşgerî. Endezyarê pilansazker yê ku Hosiyan bi moşekên balistî zêde dike, aqilmendê ku operasyonên Feyleqa Qudisê li Îraq, Sûriye û Libnanê bi rê ve dibe û dergehê Tehran yê ber bi Qeterê ve ye.  http://www. youm7. com

berpirsyartîya ewlehîya hundir bispêre xwe. Nûnertîyeke beşkirî ji agehdarîyên Pasvanên Şoreşgerî[60] re li balyozxaneyên Îranê heye, li gorî hin jêderan [61] cîgirê serokê komîteya siyaseta derveyî ya di Encûmena şêwirmendîyê ya Îranî de, balyozê reviyayî "Adil Elesedî" wisa eşkere kir: **"Karê balyozxaneyan karekî agehdarî ye bêhtir ku karekî diplomatic be, balyozxaneyên Îranê di bin destê agehdarîyan de ne, rola balyoz piştguhkirî ye. Agehdarî alîkarîyê ji qunsulgehan dixwazin ji ber ku qunsulgeh yekser bi hemwelatîyan ve girêdayî ye. Yek ji erkê Pasvanê Şoreşê di balyozxaneyan de, ew e ku peywendîyê bi kesên ku arezûyeke wan ji bo Komarîyê li welatên ku lê kar dikin heye û yên ku bi dirûşmeyên li dijî Emerîka û Israîlê bandor dibin, bikin û wan ji bo Îranê bi kar bînin. "**

Me çi qas tişt bi bîr anîbûn, lê tevî wan jî sîstema ewlehîyê ya Îranê tûşî hin şikestinan hat, weke revîna "Elî Rîza Ezxerî" ji ber hêzên çekdar yên Îranê yê ku li Tirkîyê di dîroka 7'ê reşmeha 2007'an de winda bû û ta niha jî çarenûsa wî ne xuya ye. Wî gelek agahîyên ewlehî yên hestdar yên derbarê Hizbulaha Libnanî de derxist û hin agahîyên derbarê vejengeha nûklerî ya li Sûrîyê ya ku balafirên Israîlî di sala 2007'an ew bombebaran kir, eşkere kir. Sîstema ewlehîyê Ji hêla gelek vayrûsên elektronîk ve hat êrîşkirin û malper û bernameyên elektironî yên hejimarî bi awayekî serkevtî ji hêla hin operasyonên derbasbûnê ve hatin êrîşkirin. Rapora ku berê em li ser axivîbûn destnîşan kir ku Emerîka karîbû di rêya radestkirina alav û pêdivîyên nekok û dirust û xwedî kêm çakîtî ji bo bazirganên bazara reş yên girêdayî Îranê di navbera salên 2000'î – 2003'yan de, zererê bigehîne bernameyên Îranê yên biriştanîna yûranyomê, her wiha karîbû hin zanyaran birevîne û bikuje, tevî van tiştan Îran nikarîbû dawîyê li dijberîya Wîlayetûlfeqîh ya siyasî û leşkerê bîne.

Pirsgirêka ku dê rastî dezgehên agehdarîyên Îranê were, ew e ku dezgeh û ajansên wê pir bûne. Jixwe dema ku dezgeh li cîhana sêyemîn pir dibin, derfetên lihevketina wan ya pîşeyî ji ber sedemên derûnî, dijberî, berjewendî û carinan jî ezezîtî zêde dibin. Pirbûna sazîyên ewlehîyê bawernebûn û nerastîyê di navbera gel û desthilatdarîyê de dide diyarkirin,

---

[60] Ajansa herî girîng. . Agehdarîyên Zêrevanên Şoreşgerî- Encûmena Niştimanî ya berxwedana Îranî- https://www. ncr-iran. org

[61] Zêrevanên Şoreşgerî yên Îranî. . Çîrok bi tevahî http://alkhaleejonline. net

her wiha ev yek tundîya zêde û gendelîya darayî û rêveberî nîşan dike. Di rewşa Îranê de ev yek valahîya di navbera dezgeha agehdarîyên Pasvanê Şoreşê û dezgehên agehdarîyên din de zêde dike. Dibe ku ev yek li jêderên dijberîyê yên sereke di hundirê sîstema ewlehîyê ya Îranê de vegere, weke guhdarîkirina berdewam ji hêla agehdarîyên Pasvanê Şoreşê li ser telefon û axaftinên serkirde û serbazên hêzên çekdar yên Îranî û li ser dezgehên ewlehîyê û parêzvanên rêxistinê yên cuda. Pirsgirêk ew e ku raberê bilindtir serkirdeyên dezgehên agehdarîyan destnîşan dike û raporan rasterast ji destê wan digire. Ji alîyekî din ve ew di danûstandinên bi şepêla dirustkar û dijberîya ku bi rêjîma Wîlayetûlfeqîh re alîgir e, hayedar e û rêbazên hişk bi wan re bi kar tîne, ji ber ku ew kes dijberîya hin siyasetên "Elî Xamêneyî" û şepêla parêzeran dike.

**Derbarê hêza nerm[62]:**

Hêza nerm rakêşana cîhana Islamî berev xwe nîşan digire û bandorê li cîhana Islamî bi hemî ayînzayên wê yên cuda bike, lewre berevanîyê di ber doza Filistînê[63] de dide xuyakirin  û propaganda bineya berxwedanê û berhingarîyê ya ku Îran, Hizbulah û Sûrîyê li xwe vedihewîne, di gel belavkirina hizirê "Xumeynî" li jêr navkirina "hinartina şoreşa Islamî" de ji derve dike, û bayexdan bi Emerîka û Israîl wekî dijminan daku hêzên çep û Islamî berev xwe bikişîne û hezkirina wan bi dest bixe, her wiha hewl dide ku Komara Islamî di rêya çend zanîngeh û pêşangehên çandî, zanistî, pîşesazî, bazirganî, leşkerî, hunerî û hwd de weke hêzeke zanistî, çandî û şaristanî bide xuyakirin.

**Girîngtirîn binemayên hêza nerm ya Îranî:**

1-**Nirxên çandî û fêrkirinê:** Di rêya belavkirina zimanê Farisî re. jixwe nûnergehên çandî yên Îranî karîbûn hin beşên fêrkirina zimanê Farisî li zanîngehên Sûrîyê, Libnan, Îraq û hinên din jî veke, her wiha karîbûn hin

---

[62] Hêza nerm (bi ingilîzî: soft power) ew têgeheke ku Cozêf Nay yê ji zanîngeha Harfard saz kiriye, ji bo ku karîna dilkêşî û hembêziyê bê ku hêz û zoriyê ji bo bawerkirinê bi kar bîne, şîrove bike. Hêza Nerm – Wîkîpîdiya, Zanistname

[63] Têkiliyên Tirkiye û Îranê li Rojhilata Navîn guherîne- F. Stîvan Larabî (F. Stephen Larrabee)-Elî Rîza Nadir (Alireza Nader)- Peymangeha lêkolînan (RAND) ya bervaniya niştimanî (Ji bo encûmena niştimanî ya agehdarîyanhat amadekirin).

zanîngehan li dewletên herêmê[64] vekin, weke zanîngeha "Azad a Islamî" li Beyrût û Dubey, zanîngeha "Şehîd Bihiştî", zanîngeha "Peyam Nûr", znîngeha "Şîraz" û ji bilî wan jî. Ev zanîngeh tev şaxên zanîngehên sereke li Îranê ne. Çalakîyên nûnergehên çandî yên Îranê li cîhanê belav bûne û navendên lêkolînî û serkevtinên xwe yên zanistî belav dikin, her wiha şaristanîya Farisan, pîşesazîyên Îranê yên kevnar û cejnên xwe yên netewî û olî jî belav dikin. Nûnergehên çandî xwe weke parêzvanê Şî'etîyê û navenda cîhana Şî'etîyê dibînin ew jî di rêya gotarên ku raçavî Şî'îyên cîhanê kirine.

2-**Diplomatîk û siyaseta derveyî**[65]: Diplomatîka Îranê hin serkevtinên di astên baş de pêk anîye, ew jî di rêya van tiştan re; ew di sazkirina "Rêxistina Deryaya Qezwînê ji bo Hevkarîyê" de beşdar bûye. Hewldana ku qeşaya di têkelîyên Îranî – Rojavayî de bi rêya wajokirina rêkevtina nûklerî re bihelîne, û pêgehîştina bi dewleta Qeterê re dike wekî pêngavekê ji bo simtina abloqeya diplomatîk ya ku ji hêla hin dewletin Erebî ve li ser hatiye sepandin. Û avakirina têkelîyên baş bi Afganistan, Kazaxistan, Rûsîya, Çîn, Tirkîyê, Cezayir û hwd re, û karkirina bi çalakî di rêxistina "Opêk" de, li gel belavkirina şerkirina li dijî tundrewîyê ji ber ku Îran weke alîyekî bivê nevê di nav hewldanên navdewletî de xwe dibîne, ya nimûnendekirî bi şerê cûrên Islamî yên radîkal û rêxistina Dayişê re, û nêzîkatîkirina bi Tirkîyê re û hevkarî pê re li ser binemayê şerkirina bi Kurdan re û berbestkirina wan ji bo bidestxistina mafên xwe, û bi helzanîna navkokîyên Tirkîyê û dewletên Ewrepî, tiştê ku hindek destkevtîyên siyasî bi xwe re peyda kir, bi rêya ku Tirkiye bi awayekî giştî dev ji piştevanîkirina rikberîya Sûrî ya girêdayî wê berdaye û ew neçar kirin ku hin daşikandinan ji bo hevalbendê Îranê anku rêjîma Sûrîyê pêşkêş bikin, û serbarî jêrdestîya hişmendîya doxmatî li ser biryarsazên Îranî, lê belê diplomatîka Îranî karîbû guncawtîyekê di navbera wê hişmendîyê û çend serkevtinên derveyî de çêke, weke nîşankirina rêkevtina nûklerî bi hêzên mezin re, bidestxistina hin daşikandinan ji rêjîma Sûrî û beşdarbûna di kongirên Cinêf û Asîtanayê de.

[64] Zanîngehên Îranî li Xelîc!- http://arb. majalla. com

[65] Siyaseta derveyî wisa tê pênasekirin: Rêbazê dewletê yê di warê navnetewî de ye. Xwediyê biryarê bi mebesta ku berjewendiyên dewletê pêk bîne pêsikaniya wê dike û ji bo ku wan pêk bîne xwe tavêje hin alavanan, weke alavên diplomatîk, aborî (terxîb û terhîb), ragihandinî û leşkerî.

3-**Nirxên demokratî:** Di rêya hilbijartinan re û hebûna du şepêlên siyasî li Îranê ew jî ev in; şepêla tundûtûj (rdîkalî) û ya çaksazî (rîformxwazî) "hevnavendî" (pragmatî) û pirbûna cihên dirustkirin biryarê weke:

Cihê şêwirmendê bilindtir.

Serokomarî.

Encûmena wezîran.

Encûmena ewlehîya neteweyî ya ku serokomar serokatîya wê dike. Ew jêdera siyaseta derve ye û çavdêrîya wê dike.

Encûmena şêwirmendîyê, û ew encûmena zagonsaz û çavdêrîya ye.

Encûmena dirustkirina destûrê.

Komelgeha nîşankirina berjewendîya rêjîmê.

Encûmena şarezayên serkirdayetîyê.

Wezareta derveyî.

Serbarê van tiştên ku me bibîr anîn, lê belê biryara îranî jêrdestkirîyê şêwirmendê bilindtir dimîne.

4-**Aborî, qebareyê veberhanînan, pirojeyên pêşveçûnê û pîşesazên xwemalî**: Îran gelek pêşketin di vî warî de li gorî dewletên herêmî yên din pêk anî. Hin hilberînên Îranî ku xwedî navdarîyeke cîhanî ne heye, weke xalîçeyên Îranî, hanek (zaferan), mewîj, gewher, fisteq û pisîkên şîrazî. Jixwe tevî van tiştan jî karên xêrxwazîyê weke dezgeha Xumeynî ya xêrxwazîyê û piştevanîkirina Şî'î ji alîyê veberhanînan ve.

**Alavên hêza nerm ya Îranî:**

**Hokarên ragehandinê:** Ajansa belavkirinê ya Komara Islamî ya Îranî IRIB, alaveke sereke ji bo hêza nerm ya Îranî ye. Barberê bilindtir serperiştîya wê dike. Siyaseta ragehandinê ya tevahîya kenalên ku bi rêjîma Îranê ve girêdayî ne destnîşan dike û çavdêrîya wê dike û wê siyasetê pêk tîne, her wiha hevkarîyê bi kenalên alîgirên Îranê yên ji derveyî sînor li gorî siyaseta giştî ya Îranê, dike. Nûçeyên ku navendên sazkirina biryaran yên li Îranê destnîşan dike, tekez dike yan jî derew derdixe, li gel van jî hetikbirina pîlanên ku li dijî rêjîma Îranî tên sazkirin dike, û rêjîma Îranî pûtepêdaneke

baş dide hokarên ragihandinê, ji ber ku makezagona Îranî amaje bi xala 175an dike **"Divê azadîya belavkirin û ragehandinê li gorî pîverên Islamî bên misogerkirin. Erkdarkirin û dûrxistina serokê dezgeha êzgeh û televizyonê li Komara Islamî ji hêla raberê bilindtir ve ye. Encûmeneke ku ji nûnerê serokê komarê, serokê desthilatdarîya dadwerî û encûmena şêwirmendiyê pêk tê (her yek du kes in) serperiştîya vê dezgehê dike. Zagon rêbaza dezgehê, cureyê rêveberîyê û çawanîya serperiştîya wê destnîşan dike.**

Hokarên ragehandinê li gel malperên nûçeyî, çandî û civakî belavkirina nêrîna Îranî di siyaseta derveyî de dikin, xizmeta diplomatîkiya wê ya giştî dikin, danasîna çand û şaristanîya Îranî dikin û wêneyekî erênî li ser Îran û rêjîma desthilatdar ya tê de dide xuyakirin.

Hewzên zanistî, huseynîgeh û "komelegeha cîhanî ji bo nêzîkirina ayînên Islamî[66]": ev her sê karê belavkirina ayînzaya Şî'î dikin û hewl didin ku wêneyekî erênî li ser vê ayînzayê bidin, her wiha zanistên şer'î yên Şî'î bi pêş dixin û rehendên Şî'e li dewletên cuda cuda bi rêxistin dikin, pirsgirêkên di navbera wan de çareser dikin, rola wan ya erênî û şaristanî diyar dikin. Vî tiştî bi rêbazekê ku nêzî stratejîya "Moskoyê" ya li hemeberî tevgerên komenîst yên li cîhana sêyemîn di dema cenga sar de, bi kar tînin.

Tevgerên siyasî yên Şî'î, milîsên çekdar û şaneyên razayî yên ku di rêya axaftina şoreşgerî re kar dikin, axaftina ku dijatiya Emerîka û Rojavayê dike û destdayîna baneya gelên herêmê yên Misilman, çeperest û netewperstên Ereb, Tirk û hwd dike.

Hêza nerm di heman dem de rola berxwedana nerm ya li dijî cenga nerm ya ku ji hêla dewletên din ve tê êrîşkirin, dilîze.

**Milîsên ku Îran li derdora cîhanê piştgirîya wan dike:**

Alîgirên Komara Islamî bi sê dirûşmeyên serke bang dikin, ew dirûşme jî ev in "Mirin ji Emerîka re, mirin ji Israîlê re û lanet li cihûyan be" rêjeyeke

66 Komelgeha Cîhanî ya Ehlulbeyt rêxistineke cîhanî şêî ye, ne fermî ye, balê dide nasên ehlulbeyt, yekîtiya Islamî tekez dike û hewl dide ku asta hizirî, çandî, fêrkirin û civakî ya peyrewên dibistana ehlulbeyt bilind bike. Serwerê Şoreşa Islamî li Îranê Ayetulah Elî Xamêneî di sala 1990'î de ava kir, a niha jî Şêx Mihemed Hesen Exterî balyozê berê yê Cemhûriyeta Islamî li Sûriyeyê serokatiya wê dike.

mezin ji Şî'eyan li çend dewletan belav dibin, ew Şî'e li hev kom dibûn û peywendî bi Şî'eyên din re ên ku li cîhanê bi taybet li Îranê belav in, dikirin. Ev yek di rêya van tiştan re pêk dihat; helkevtên olî yên Şî'î, serdankirina derazînkên pîroz, şêwirgehên olî, bajarên pêroz "Kerbela û Necef", pîrozgeh û meqamên pîroz. Piştî destpêbûna şoreşa "Xumeynî" ya li dijî Şah di sala 1979'an de û piştî ragehandina pirojeya "Hinardekirina Şoreşa Islamî" peyrewên Weliyê Feqîh têkelî bi Şî'iyên li welatên cihêwaz re kirin ji bo ku refên xwe bi rêxistin bikin û bibin hêzek ji welatê xwe re. Encama vê yekê derketina çend partî, tevger û milîsan[67] bû ku alîkarîya darayî, cek û perwerdehî ji rêjîma Wîlayetûlfeqîh werdigirtin. Zagona nasnameya Îranî hat guhertin, çi kesê ku alîkarî pêşkêşî Îranê dikir yan jî sûdek didayê û ji bo wê kar dikir, her wiha hevjîn û zarokên kesên ku ne Îranî bûn lê belê ji bo pêkanîna hin erkan ji Îranê re dihatin kuştin[68], karîbûn nasnameya Îranî werbigirin. Mebesta stratejîk ji vê yekê ew e ku "Pasvanê Şoreşê yên Îranî" kontrolkirina welatên ku ew kes lê ne bi hêz bike, her wiha cengeke biderhûde ji bedêla " Pasvanên Şoreşgerî" ve li deverên germ weke Sûrîyê, Yemen, Îraq, Xelîc û hwd pêk bînin.

Rojhelata Navîn bi giştî devera bineretî ji Îranê re ye, ji ber vê yekê jî pûtepêdana wê ya berevanîyê dikeve warê çavdêrîkirina tevgerên dijminên rêjîma wê, her wiha tektîka jantajê ya şerê gerîla bi kar tîne û şaneyên razayî berev dewletên ku gefan lê dixwin dilivîne. Siyaseta Îranê derbarê vê devera bineretî de ya ku miletên wê bi piranîya xwe Sune ne û dewleta Israîl lê ye, her wiha baregehên leşkerî û stratejî yên dewletên mezin lê hene, xerîb e. Ev tişt tev berî ku rêjîma Wîlayetûlfeqîh çê bibe, hebûn. Dirûşmeyên ku peyrewên Îranê yên milîsên çekdar pê bang dikin, stratejîya Îranê vedidin, dirûşm jî ev e"Mirin ji Emerîka re, mirin ji Israîlê re û lanet li cihûyan be. "

Îran dizane ku çi rûbirûmayîneke li hemberî van hêzan weke xwekujîyê ye, ji lewre jî stratejîya "Pasvanên Şoreşgerî" ew e ku derhûdeyan ji xwe re li cîhanê peyda bikin û ew derhûde kiryarên ku heger e, pirsgirêkên siyasî û

---

[67] Dirûşmeya destê ku bi tifingê girtiye bûye nîşaneyeke tomarkirî ya Îranî, rengekî şoreşgerî dide komên şêî yên radîkal yên derveyî Îranê.

[68] Bikaranîna alayekî pakistanî ku rêbazên îranî yên ayînperstiyê di şerê herêmî de eşkere kiriye- http://diyaruna. com/ar/articles/cnmi_di/features/2017/03/10/feature-03

zagonî ji rêjîma Wîlayetûlfeqîh re derxin dema ku Pasvanê Şoreşê bi xwe pê rabin, pêk tînin. ji ber vê yekê jî hin milîsên çekdar weke tevgerinan di hundirê sînorê siyasî yên dewletên xwe de tên rêxistinkirin, çekdayîn û daravgirtin û bi awayekî idiyolojî û li gorî hizirên rêjîma Wîlayetûlfeqîh tên raçavkirin, her wiha grûpeke nehênî ji kaselîsan ku wekî patexweran an jî wekî kurtêlxwerên alîgirên Îranê tên kirîn, peyda dikin. Ew grûp weke şaneyên wê yên razayî ne. tevî ku Îran piştevanîkirina wan ya leşkerî mandel dike, lê tektîkên ku ew bi kar tînin, her wiha idiyolojî û dirûşmeyên wan û alîyên ku li dijî wan kar dikin, van derewan piştrast dikin.

Biartêşxistina Şî'îyê ji hêla peyrewên "Xumeynî" ve ji bo Şî'îyên li cîhanê li destpêka rêxistina "Xumeynî" ji ber tevgera wî ya li dijî Şah, vedigere. Ji ber ku ew ji dezgeha asayîşa nehênî "Safak" ditirsîyan, hin baregeh ji bo rêxistinkirin, perwerdekirin û amadekirina hindek kadirên pêwîst li derveyî sînorê Îranê daku li hemberî rêjîma Şah û agehdarên Emerîkî û Ingilîzî ber xwe bidin, dihatin amadekirin. Piştî helweşîna rêjîma Şah "Xumeynî" û yên ku bi dû de hatin dev ji vê stratejîyê bernedan, di vê stratejîyê de berdewam kirin û ew baregeh bi pêş xistin û kirin weke qewareyên siyasî û leşkerî ji bo ku bandorê li welatên xwe bikin. Jixwe agehdarên Îranê li çend welatên ku li sê parzemînan belav dibin çalak in, ew welat jî ev in:

**Li Asyayê:**

**Pakistan[69]:**

Rêjeyeke bilind ji Şî'eyan li Pakistanê (%20) û Şî'îyên pakistanê li Îranê hene. Ji ber ku olnasên her du alîyan kîna ayînzayî (mezhebî) gur dikin, di navbera wan û Suna de nearamî û tûnd derdikeve pêş. Nîşana vê jî rewşa tûndîya ayînzayê (mezhebî) li Pakistanê ku di encama wê de gelek

---

[69] Heman çavkanî
Nşnerên Îranê yên Afxanistan û pakistanî li Sûrîyê û dervî wê – Ferzîn Nedîmî. ( وكلاء إيران الأفغان والباكستانيين في سوريا وخارجها- فرزين نديمي) http://www. washingtoninstitute. org
Çi rêxistinên Şîî giring yên ku Îran piştgiriya wan dike, hene?( ما هي أبرز الميليشيات الشيعية المدعومة من إيران؟) https://raseef22. com
Li Pakistanê çengên Îranê (أذرع إيران في باكستان) https://www. assakina. com/news/news1/83932. html
Bi nav. . . Îranê piştgiriya 12 rêxistinên Şîî li cîhanê dike( بالأسماء. . إيران تدعم 12 مليشيا شيعية مسلحة في العالم ) - http://www. elfagr. org/2583240
[2] Pakistan: Metirsiya nearamiyeke Sunî - Şîî (باكستان: مخاوف من توتر سني - شيعي)

diplomasîyên Îranî hatine kuştin[70]. Weke kuştina diplomasîyê Îranî "Sadiq Ganjî" ji bo tolhildana "Heq Newaz Jihangvî" damezrînerê "Leşkera Sehabiyan" ya Sunî; di sala 1994`an de li Lahorê hate kuştin.

Gelek sazîyên Şî'î li pakistanê saz bûn. "Huseyn Huseynî[71]" tevgera "Pêkanîna Fiqha Caferî" damezirand. Her wiha "Arif Huseyn Huseynî" – Xwendekarê Xumeynî – xebata parastina mafên Şî'îyan li Pakistanê dike, Partîya "Tevgera Islamî" damezirand. Her wiha derleşkerên (milîs) ku hatine damezrandin ev in:

**Artêşa Mihemed ya Şî'î (Sibah Mihemed):**

Di sala 1993`an de ji hêla olnasê bi navê "Murîd Ebas Yezdanî" li Herêma Lahor ya Pakistanê ya ku piranîya niştecihên wê Şî'î ne, hate damezrandin. Ew jî li hemberî qedexekirina "Partîya Tevgera Islamî" hate damezrandin. Bi tevgerên cîhadî yên Sunî weke "Esker Cehenkoyî" û "Leşkera Sehabiyan" kete şerekî çekdarî. "Xulam Rida Naqoyî" serkirdayetîya vê rêxistinê dikir. Di sala 1996`an de hate girtin û di sala 2014`an de serbest hate berdan û di Adara sala 2012`an de dema ku serdana gora Îmamê Reda li Bajarê Meşhedê kir, jiyana xwe ji dest da. Piştî kuştina serkirdeyê vê rêxistinê "Murîd Ebas Yezdanî" di sala 1996`an de ji ber nakokîyên hundirîn gelekî hate parçekirin. Ev rêxistin ji "Artêşa Mihemed ya Sunî" ya ku şerê Hêzên Hindistanê li Herêma Keşmîrê dike, cuda ye.

**Hizbûlaha Pakistanî:**

Pasvanê Şoreşê aloziyên Rojhlata Navîn bi kar anî û derleşkerên Şî'î yên çekdar ji sedan ciwanên pakistanî yên Şî'î li Iraq, Sûrî û Yemenê çêkirin. "Lîwaya Zeynebiyûn" ya ku li Sûq Elhemîdiyê û Seyîda Zeyneb, zalîtîya xwe mukum dike.

---

http://archive. aawsat. com/details. asp?section=45&article=489224&issueno=10902#. WhZjN0qWbIU

[71] Ew jî ji Bajarokê Paraçnar ê Pakistanê yê sînordaşê Çiayê Tora Borayê yê Evganistanê ye. Pir dilsozê Xumeynî bû. Li Qum xwendiye.




جيش حزب الله في باكستان



جيش محمد "سباه محمد" في باكستان




لواء "زينبيون" المقاومة الإسلامية في باكستان




ميليشيا "زينبيون" المقاومة الإسلامية في العالم

**Li Efxanistanê[72]:**

Rêjeya Şî'îyên Efxanistanê (%15) şênîya giştî ya Efxanistanê werdigire. Ew jî ji hêla Sunîyên ku r;jeya wan pirtir têne piştguhkirin. Ew jî di bin navê "Partîya Yelîtiya Islamîk" ya Şî'î û "Tehran – 8" ya ku Îranê piştgirîya wê dike, xwe bi rêxistin dikin. Ew jî weke bersivekê li hemberî Hevgirtina"Pîşawer – 7" a ku hêzên Sunî yên Efxanî tê de kom dibin, derket. "Tehran – 8" hevgirtineke siyasî ye û ji 8 tevgerên Şî'îyên ku şerê rêjîma komonîst a Efxanî dikirin, pêk tê. Tevgerên girîng yên "Sazman-Nesir" jê pêk tê ev in: Tevgera Islamîk, Pasvanên Cîhad, Hizbilaha Efxanî, Pêşverû, vejîn (ronesans), Tevgera Şêwir û Lihevkirinê û Yekîtîya Mucahidîyên Islamîk.

Hewza "Fatîmetûzehra" ya ku Îranê bi awayeke rasterast piştgirîya wê dike, yekem hewz e, ya ku li Bajarê Kabûlê Paytexta Efxanistanê, hat damezrandin û dibe ku bibe navenda herî mezin a Şî'îyên Efxanistanê. Ji lêvegerên Şî'î yên Efxanî Ayetûla "Mihemed Asif Mihsinî" lêvegerekî navdar e li Bajarê "Qum"ê rûniştîye ku fetwe bi divêtîya parastina goristanên Şî'îyan da, û lêvegerê olî " Sadiq Mihemed Şîrazî".

Ji hêla leşkerî ve Pasvanê Şoreşa Îranê rêxistina "Hizbûlaha Afxanistanê", dirust kir. Ew jî ji bo ku Şî'îyên Efxanî ji hêla leşkerî û siyasî ve li gorî pilana pergala Wîlayetêfeqîh, birêxistin bike. Ji bo pêkanîna vê armancê kêmnijada "Hezara"[73] Şî'î ya Afxanî û rewşa koçberên Afxanî li Îranê hatin

---

[72] Bi nav. . . Îranê piştgiriya 12 rêxistinên Şîî li cîhanê dike( بالأسماء. . إيران تدعم 12 مليشيا شيعية مسلحة في العالم ) - http://www. elfagr. org/2583240

[73] "Hezara" neteweke di nîvê Efxanistanê de dijîn, bi zimanê farisî diaxivin. Jimara wan digihêje 2 879 000 kes, li bilindahiyên navîn bi cih bûne, di çandinî û pîşesaziyê de kar dikin û bi Islama şîiya Dozdehîmamî bawer dikin (هزارة: Hezara - WIKIPEDIA).

bikaranîn û di bin diruşma "cîhad û piştgirîya Şî'îyên bindest" de û bi mehaneya 500 dolar, ew tevlî perwerdeyên Pasvanê  Şoreşê kirin. Beşeke ji wan çûn Sûrîyê ji bo parastina Rejîma Sûrîyê bikin û şerê rêxistinên Sunî bikin. Ew jî bi navê " Lîwaya Fatimiyûn" û bi behaneya ku gorên Şî'îyan yên li Sûrîyê, biparêzin. Rêveberê vê rêxitinê "Elî Rida Toslî" li ser destê dijbera Sûrîyê ya çekdar li "Tilqirên" a gundewarê Der'ayê ya başûrî Sûrîyê, hate kuştin[74] û li Bajarê Meşhedê ya Şî'î ya pîroz a bakurê rojhelatê Îranê, hate veşartin. Her wiha togaya "Xudamûl'eqîla" jî hene. Endamên vê rêxistinê dikarin nasnameya Sûrîyê bi dest bixin. Durşma li ser milên wan nîşana navên Sûrî û Afxanistanê dike[75].


Togaya "Xudamûleqîla" li Sûrîyê



Togaya "fatimiyûn" li Sûrîyê



Tevgera "Hizbûlah" a Afxanistanê

**Li Iraqê[76]:**

Têkelîyên Iraqê û Îranê bi giştî di nearamîyê re derbas bûne. Ji ber ku ji bo desteserkirina herêmê û xêzkirina sînoran her dem nakokî di nava wan de hebûn, ji mîrnişînên ku li ser Iraqê derbas bûn û şahinşahîya Farisî bigire ta dewletên Sefewî û Osmanî. Destwerdana Îranê di kar û barên Iraqê de bi piştgirîya tevgerên Şî'î zêde bûn. Her dem Îranê Iraq weke bendekî li pêşîya pêkanîna pirojeya xwe ya şahinşahî li Kendava Lorê (Farisî) didît. Ji ber vê

[74] ملف شامل |الميليشيات الشيعية المقاتلة في سوريا Perwendeyeke http://www. almuslimon. net/article_view. php?id=20766

[75] ميليشيات الأفغان الشيعة في سوريا. . من الألف إلى الياء https://www. alarabiya. net

[76] العلاقات التركية الإيرانية في شرق أوسط بات متغيراً- إف ستيفان لارابي F. Stephen Larrabee ، عاليرظا نادر Alireza Nader معهد أبحاث - RAND(تم تحضيرها للمجلس الوطني للاستخبارات) للدفاع الوطني .

yekê her dem hewl dida ku wê têxe bin pergala xwe. Piştî şoreşa Îranê ya Islamî (sala 2979), metirsîyên Iraqê ji desteserkirina Îranî ya Şî'î, pirtir bûn; her wiha berjewendî û pilanên her du alîyan (Iraq û Îranê) ji bo desteserkirina Kendava Lorê (Persî) li dijhev in. Lê tişta ku nakokî di navbera wan de, derxist holê; kombûna nakokîyên ayînî û siyasî, dema ku "Şoreşa Xumeynî" dirûşmên belavkirina şoreşa Îranê xist rojevê û hewl da ku dewleteke Şî'î ya cîhanî ku hemû welatîyên Islamê têkevin nav, çêke. Ji bo pêkanîna vê armancê piştgirîya tevgerên Islamî yên Şî'î bi taybet li Iraqê kir. Piştgirîya partiya"Eldawa" ya dijbirî rejîma Iraqê ya berê û hewldana kuştina Şareyarê (wezîr) Karê derve yê Iraqê yê berê Tariq Ezîz, Mînaka vê ye. Ev tişt hişt ku nearamî di navbera her du alîyan de pirtir bibe û şerê "Kendava Yekem" ya ku 8 salan (1980 – 1988 Z) domand, biqewime. Demeke dirêj bandora vî şerî domand û tê de her du alî derbasî xaka yê din bûn (şerên êrîşkirin û vekişandinê), barkerên petrolê yên hev armanc girtin ku navê "şerê barkeran" hate naskirin[77]û topbarankirina bajaran bi awayekî korane ku bi hezarên sivîlan jiyana xwe ji dest dan û ziyanên pir mezin di jêrxana her du welatan di hemû waran de, pêk hatin. Her wiha Rejîma Iraqî li dijî Hêzên Îranî çekên kîmyayî bi kar anîn û herêmên Kurdî yên derveyî zalîtîya desthelatîya rejîma Iraqî ya berê topbaran kirin. Lê bi destwerdana NY (Neteweyên Yekbûyî) agirbest li ser her du alîyan hate pêkanîn û bi erêkirina biryara Encumena Ewlekarîyê ya (596) ya ku biryara rawestandina şer û agirbestê da, şer hate rawestandin û ji hêla her du alîyan ve hate pejirandin û Xumeynî ew weke "piyala jehrê" bi nav kir. Lê Îranê destê xwe ji kar û barên Iraqê nekişand, bi taybet piştî ku Iraqê di sala 1990`î de Kiweyt dagir kir û "şerê Kendavê yê duyem" dest pê kir ku ev hevbendîyeke navdewletî bi serkirdayetîya YWE (Yekîtiya Welatîyên Emrîkayê), êrîşî Iraqê kir û ji Kiweytê derxist û Iraq pir lawaz kir. Vê jî derfetek da Îranê ku destwerdanê di Iraqê de bike û Iraq neçar kir ku pabendî rêkevtina 1976`an bibe ya ku bi Rejîma Şah re wajo kiribû.

Dagîrkirina Emrîkayê ji Iraqê re di sala 2003`an de û rûxandina Rejîma "Sedam Hisên", derfeteke dîrokî bi dest Îranê xist ku desthelatîya xwe li

[77] Ev jî armancgirtina barkerên petrol û bazirganî yên deryayî yên her du welatan ji hêla welatên ku piştgiriya her du aliyan digirtin. Ew jî ji bo piştgiriya leşkerî û aborî li ser her du artêşên şerker, bibirin.

Iraqê berfireh bike. Îranê pilana birêvebirina Şî'îyên Iraqê li gorî idyolojîya xwe û li ser kiryarên Emrîkayê li ser Suneyan çavgirtin û bi awayekî nerasterast piştgirîya wê kirin. Hêzên Şî'î yên bi Îranê ve girêdayî, li Iraqê dikarîbûn bigehêjin astên bilind, bi taybet piştî dirustkirina "Heşda Şe'bî" û ji bilî Başûrê Kurdistanê, Şî'îyan tevahîya Iraqê jêrdest kirin.

Weke berê jî me diyar kir, Iraqa ku dijmina Îranê bû, piştî helweşandina Rejîma Sedam Hisên di sala 2003`an de, bû herêma desthelata Îranê. Ji ber piranîya Şî'îyên li wir yên ku di jiyana giştî ya Iraqê de roleke sereke dilîzin, li başûrê Iraqê cihên Şî'î yên pîroz weke bajarên "Kerbela û Necef" yên ku bi sed hezarên Şî'îyên cîhanê pêşwazî dike, hene û lêvegerên giring weke "Elî Sîstanî", " Muqteda Mihemed Mihemed Sedir" û hwd, li Iraqê ne. Jixwe li başûr û rojavayê Iraqê ji serdema Emewîyan ve şerên dijwar di navbera Şî'î û Sunîyan de û şerê li dijî Allilbêt, rû dan.

Ji ber sedemên weke hevsoziya Şî'îyan bi Îran û şoreşa Islamî, bi artêşa Îranê re şerkirin, li Iraqê stemkarî û tunebûna demokratî û mfên mirovan; Rejîma Iraqê stemkarîyê li Şî'îyan dikir. Vê yekê hişt ku piranîya Şî'îyan li Sune weke dijminan dinêrin û naxwazin bi wan re têkeldar bin. Şî'îyên Îranê weke dewleteke parêzer û rêberîyekê lê dinêrin, ji ber ku Îran li herêmê dewleteke bi bandor e. Tişta ku vê yekê gurtir dike, belavbûna alîgirên Wîlayetûlfeqîh yê Îranê di nav Şî'îyên Iraqê ku di encama vê yekê de hin rêxistinên Şî'î yên siyasî û leşkerî weke Encumena Isalamî ya Bilind ya Iraqê û bi dehan derleşkerên (milîs) Şî'î, hatin damezrandin. Armanca van rêxistinan şerê Emerîka di durişma bimire Emrîka ya ku piştî serkevtina şoreşa Islamî tê gotin, şerê Sune bi durişma tolhildana Hisên û Alulbeyt û ya dawî şerê Kurdan bi durşma bimre Israîla duwem. Her wiha bi hemû derftan piştgirîya rêxistinên Şî'î ji bo şerê Israîl bi durişma bimre Israîl û nifir (lanet) li cihûyan, dike.

Van derleşkeran di bin rêxistina bi navê "Heşdê Şabî" xwe kom kirin[78] ku ji Raberê Bilindtir yê Îranê, Pasvanê Şoreşê yên Îranê û lêvegerên Şî'îyên Iraq û cîhanê, bi awayeke rasterast hate piştgirtin. Ev rêxistin ji 67 tevgerên

[78] Heşdê Şabî: Piştî destesrkirina DAÎŞ`ê li ser herêmên Sunî li Iraq û Sûriyê, hate damezrandin. Ew jî piştî ku Lêvegerê Şîî banga cîhada neneçarî kir ku ji hêla Iraq, Îran û Şîiyên cîhanê hate piştgirtin.

Şî'î[79] yên çekdar pêk tê û bû rêxistineke leşkerî ku ne kêmî Artêşa Iraqê ye û li tenişta wê bi awayekî xurt beşdarî şerê li dijî DAÎŞ`ê bû. Di vî şerî de gelek binpêkirinên mafên mirovan weke komkujî, kuştin, revandin, işkencekirin û şewitadina gund û camîyan, hatin kirin ku rêxistinên weke " Lêbûrîna Navneteweyî" û "Hiyûmin Rayt Watç" ji bo belgekirina van binpêkirinan gelek rapor weşandin. Van tevgeran ji bo pêkanîna pilana Îranê di Iraqê de roleke mezin lîst û ya ku handan da dewleta serok wezîrê Iraqê "Heyder Ebadî" piştî rapirsîya (raferandom) li başûrê Kurdistanê ku li ser cihêbûna Başûrê Kurdistanê li dijî Kurdên Başûr raweste, ku hêzên nerewa yên tevgerên"Heşdê Şa'bî" alîyê leşkerî ya ev handan pêk anî û gelek binpêkirin di derbarê sivîlên Kurd li "Kerkûk", "Tozxurmato" û deverên mayî yên anakok pêk anîn. Û van tevgeran ji bo piştgiriya Rejîma Sûrîyê, banga Pasvanê Şoreşê bicih kirin û bi hezaran çekdar şandin Sûrîyê û çek û parepêdanê ji tevgerên Şî'î re bi behaneya parastina cihên Şî'îyên pîroz û Şî'îyan li sûriyê, peyda dike. Her wiha gefa li berjewendîyên Emrîkî û Rojavayî li Iraqê, dixwin ku ji dêvla Îranê van gefan dike. Ji ber ku peyrewîya van tevgeran pêşî ji pergala  Wîlatyetûlfeqîh re ye û piştre ji Iraqê re ye; nakokî di nav Şî'îyên Iraqê de çêbû, bi taybet di navbera "Elî Sistanî" û "Muqteda Elsedir" de li alîyekî û peyrewên Wîlatyetilfeqîh li alîyekî din. Ya ku hişdarîyê bi herifînên dijware li ser demokratî û serbixweyî û hevgirtina dewleta Iraqê û hevjîyankirina netew û nejadan dide.

" Rêxistina Bedir", "Hizbûlahê Iraqê" yên ku li gorî Emrîka di lîsteya tundrewîyê (teror) de ne, " Esaib Ehlûlheq", "Seraya Elselam" û " Lîwa Ebûfedil Ebas" tevgerên Şî'î yên berz in ji Heşdê Şabî.

---

[79] الحشد الشعبي في العراق.. النشأة والمستقبل" دراسة استقصائية" - مركز الروابط للبحوث والدراسات الاستراتيجية: وحدة الدراسات العراقيةhttp://rawabetcenter. com/archives/31326

Seraya Elselam yên Muqteda Elsedir

Ketaib Hizbûlahê Iraqê

Heşdê Şabî yê Iraqê

Esaib Ehlûlheq ên ji Muqteda Elsedir perçebşne

Lîwa Ebûfedil Ebas

Feyleq Bedir ê Rêxistina Bedir

**Li Sûrîyê:**

Piranîya gelên Sûrîyê Sunî ne, di gel jêrdestkirina Elewiya ji biryara dewletê ya siyasî, leşkerî û aborî re. Ji sala 2000`î ve Îranê hewl dida ku helmetek Şî'îtîkirinê li Sûrîyê bi rê ve bibe, bi taybet li Herêma Cizîr û Dêrazorê û gundewarên wê. Her wiha jimareke hindik ji Şî'îyan li hindek bajarokên cuda hene. Weke bajarokên "Nibil û Zehra" li gundewarê Helebê, bajarokên "Kefriya û Foa" li Bakurê Idlibê û jimareke baş ji Bajarokê "Hetla" ya Dêrazorê û hin taxên  Şamê bûn Şî'î. Her wiha Tîreyên " Elewî û Ismayîlî" ku weke Şî'îtîyê "Alelbeyt" pîroz dibînin, hene.

Têkelî di navbera Rejîma Sûrî û Îranê de digehêja asta têkelîyên stratîcîk. Ji ber vê yekê piştî serkevtina serhildana Şî'î li Îranê û berpêbîna şerê "Iraq – Îranê";  Serokê Sûrîyê "Haviz Esed" piştgirîya Rejîma Îranê kir. Ew jî ji ber gelek sedeman ku em gelek şirovekirin jê re divê. Bi taybet sê sedemên serek têkelî di navbera "Sûrî û Îranê"  xurtkirine ew jî ev in; beşdarbûn di şerê jêrdestkirina Emrîkî û Rojavayî li herêmê, dijminatîya Israîlê û her du rejîm ji hêla bawerîyê ve nêzî hev in, ew jî Ayîna Şî'î û Ayînzaya Elewî.

Têkelîya her du welatan pêş ket, ta girseya bi navê "berxwedan yan dijberî" di navbera Îran, Sûrî, Hizbûlah û hin tevgerên Filestînî weke derbirînekê li dijî jêrdestîya Emerîka, hate sazkirin. Bi vî awayî Sûrî bû cihê piştgirî û rêgeheke ku alîkarîyên Pasvanê Şoreşê yên leşkerî, darayî û mirovî bigehêjin Hizbûlaha Libnanî û hin tevgerên Filestînî weke Elcîhad ElIslamî û Herekta Hemas yên ku bi şêweya şerê girêla şerê Hêzên Israîlê dikin.

Îran Sûrîyê weke kûrahiyeke stratecîk ya wê û Hizbûlahê Libnanî û derîyeke li ser rojhelata Deryaya Spî, digire dest. Nîşana kûrahîya têkelîyên di navbera pergala Wîlayetûlfeqîh û Rejîma Sûrîyê de, ew e ku Îranê piştgirîya Rejîma Sûrîyê kir û piştî alozîya di sala 2011`an de, nehişt rejîm helweşe. Ew jî bi şandina hezarên çekdarên Şî'î û pêwîstîyên aborî û leşkerî, jê re şandin.

Her wiha wargeha "Îmamulhuseyen" li Herêma "Şeybanî" li nêzî Balafirgeha Şamê ya Navdewletî, hate avakirin. Ji hêleke din ve Îranê di hevpeyvînên ku ji bo çareserîkê ji alozîya Sûrîyê bibînin de, piştgirîyê dide Rejîma Sûrîyê. Îranê şerê li Sûrîyê weke hewldaneke Rojavayî û hevbendîyên wê yên kendavê didît û bayex pê da, ji bo Sûrîyê desteser bikin, nehêlin çek bigehêjin Hizbûlah û Suneyên Libnanê xurt bikin ku karîbin hevsengîyekê bi Îranê re çêkin, anku desthelatdarîya Hizbûlah li Libnanê lawaz bikin. Ji ber vê yekê hemû derfetên xwe di şerê Sûrîyê de bi kar anî, ji bo nehêle Rejîma Sûrîyê Helweşe; efserên bilind yên Pasvanê Şoreşê şande Sûrîyê û bi hevkarîya Rûsîya hişt ku Rejîma Sûrîyê rûbereke baş ji xaka Sûrîyê, desteser bike.

Îranê xwest ku heman mînaka Heşdê Şabî ya Iraqê li Sûrîyê çêke. Ji bo pêkanîna vê armancê bi dehan rêxistinên Şî'î ji gelek neteweyan, şandin Sûrîyê. Her wiha ji Şî'îyên li hin bajarokên Sûrîyê tevgerên çekdar di bin çavdêrîya Pasvanên Şoreşgerî, bi rêxistin kirin û bi Artêşa Sûrîyê ya mayî hêzeke çekdarî ya xwedîyê kesayeteke Ayînzayî (mezhebî), saz kir. Hizbûlahê Libnanî, Lîwaya "Fatimîyan" a Şî'îyên Efganî, Lîwaya "Zeynebiyan" ya ji Şî'îyên Pakistanê û tabûrên "Ebûlfedil Ebas" ya ji Şî'îyên Iraqî; ji tevgerên giring yên li Sûrîyê hene. Her wiha tevgerên Şî'î yên Sûrî li bajarokên Şî'î weke hêzên "Komkirina gelêrî" hatine birêxistinkirin û biçekkirin. Gelek welatîyên van bajarokan bi tevgerên Şî'î yên derveyî

Sûrîyê şer nakin, ji bo li gorî Rejîma Sûrîyê demografîya herêmê bê parastin. Ji van tevgeran ev in[80]:

"**Hizbûlaha Sûrî":** Di bingeha xwe de ji van rêxistinan pêk tê: Şî'îyên bajarokên "Nubil, Zehra û Fûa", hin taxên Şamê yên ku Şî'î lê hene weke "Taxa Zeynûlabidîn", "Lîwa Elquds" yê ku "Şebîhîhên" Helebê cihê xwe tê de digirin û Filestîniyên Wargeha "Neyreb" ya Helebê. Tê gotin ku ev rêxistin di sala 2013`an de hatiye damezrandin, lê bi aweyeke fermî nehate ragehandin. Ji hêleke din ve hewldanek heye ku wî bigehînin asta hêza Hizbûlaha Libnanî. Li gorî hin çavkanîyan, rêveberê Hizbûlah yê bi navê "Semîr Qintar" yê Dirzî ku li cem Îsraîlê dîlgirtîbû û di sala 2008 de bi Îsraîlê re hate veguhertin; di damezrandina vê rêxistinê de roleke bingehîn lîst.

Tabûra "Qemer Benî Haşim", her wiha bi navê "Cewala" tê naskirin. Ev rêxistin ji çekdarên Şî'îyên Iraqê û hin welatîyên " Nubil û Zehra", pêk tê.

Tabûra "Elzehra": Ji welatîyên Bajarokê "Zehra", pêk tê.

Tabûra "Şehîdê Mihrabê" : Ji welatîyên Bajarokê "Nubil" pêk tê. Ew jî ji bo bajarokê xwe ji êrîşên Dijberîya Sûrîyê ya çekdar, biparêzin.

Tabûra "Elebas": Ji welatîyên Gundê "Kefrîya" ya Bajarokê "Fûa" ya gundewarê Idlibê, pêk tê.

Tabûrên "Fûa": Ji welatîyên Bajarokê "Fûa" ya gundewarê Bakurê Idlibê, pêk tê.

Baskartêşa "Elwedisadiq": Ji Şî'îyên Iraqê û Sûrîyên Bajarokên "Me'ert Misrîn, Fûa û Kifrîya" yên gundewarên Idlibê, pêk tê. Vê rêxistinê roleke giring di desthelatdarîya Rejîma Sûrîyê li ser Helebê e, lîst.

---

80 - حزب الله "السوري". . ما هو؟ ("Hizbûlahê Sûrî". . kî ye?) - http://www. orient-news. net/ar/news_show/78991

- حزب الله السوري. ذراع إيرانية بسوريا ما بعد الأسد ("Hizbûlahê Sûrî".. Piştî Esed şaxê Îranê li Sûrîyê ye. )

-http://www. aljazeera. net

من هو المسؤول عن تأسيس "حزب الله السوري"؟ ( kê "Hizbûlahê Sûrî" damezirandiye) - https://www. alsouria. net

- الفصائل الشيعية المسلحة التي تقاتل داخل سوريا (Tevgerên Şîî yên ku li Sûrîyê şer dikin) http://www. odabasham. net

Ji bilî van rêxistinan, Îranê dixwaze rêxistinên Sunî weke çete û alîgirên wê, saz bike. Ew jî ji êlên Erban û hin kesên alîgirên wê, weke "Newaf Raxib Elbeşîr" Şêxê beşek ji Êla "Begara", "Mihemed Elfaris" Şêxê beşek ji Êla "Tey" li Kantona Qamişloyê, "Fayiz Elnamis" Şêxê beşek ji Êla "Siyad Elne'îm" li Kantona Hesekê û hwd. Vê carê Îranê dixwaze nakokîya neteweyî din navbera Kurd û Ereban û nakokîyên idyolocî di navbera Be'sî, Selefî û Demokratîyan, bi kar bîne. Rejîma Sûrîyê bi pişrgirîya Îran û Rûsîyê, gelek serkevtin li dijî Dijberîya Sûrîyê û tevgerên rikber, bi dest xistin.

"Lîwa Zeynebiyûn"[81]ji hêzên Sunî yên alîgirên Îranê ne ku Pasvanê Şoreşê serperiştîya wê dike. Ew jî ji ayînzaya Sunî yên Parazgehên "Sîstan û Bilûcistan" yên başûrê rojavayê Îranê, pêk tê. Gelek caran weke hêzên komkirinê têne binavkirin.



*Goristana Zeyneb li Şamê. Ew jî ji bo serbazîkirina Şî'îyên Si'ûdîyê û yên ku serdana goristanê dikin û komikên partîyê li ser kuştin û teqînê tên perwerdekirin. Goristan ji bo çûn û hatina wan rewa bike tê bikaranîn.*

**Du kelem li pêşîya pirojeya Îranê li Sûrîyê hene:**

**Desthelatdarîya Îsraîlê:** Ji ber ku stratejîya Îsraîlê rijd dibe li ser redkirina hebûna Îranê li ser xaka Sûrîyê, li ser asta bingehên leşkerî heta bi cebilxaneyan. Lewma her demekê êrîşî hin herêmên Sûrîyê dike, dema guman dike ku bingehên leşkerî yên Îranê li wir hene û metirsîyekê li ser çê dikin.

[81] Nexşeya derartêşên Îranê li Sûrîyê [2\2] (خارطة المليشيات الإيرانية في سورية) - https://www. alaraby. co. uk

**Rêveberîya Xweser ya Rojava – Bakurê Sûrîyê**: Ev rêveberî felsefeya neteweya demokratîk ji xwe re bingeh digire. Ev felsefe ne li gorî felsefeya Xumeynî û pergala Wîlayetûlfeqîh e. Ev pergal dokmatîzma ayînî û nejadperistîya neteweyî, bingeh digire.

Sûrî bû weke meydanekê ku hemû Şî'îyên cîhanê bi rêveberîya Pasvanê Şoreşê yê Îranê, lê kom bibin. Ev jî bû derfetek e, ku Şî'î ji hemû neteweyan bi hev re li dijî dijminê dîrokî Suna, şer bikin. Vê yekê pêwîst kir ku sazkirina hêzeke leşkerî ku hemû Şî'îyên cîhanê tê de pişkdar bin,Êdî di sala 2016`an de sazkirina "Artêşa Rizgarkirinê ya Şî'î" bi rêvebertîya "Qasim Suleymanî" fermandarê "Feyleqûlquds", hate ragehandin.

Armanca sereke ya wê di 23 salan de Îsraîlê tune bike. Ew jî li gorî Serheng " Mihemed Elî Felekî" fermanderek e, di "Feyleq Seyîdûlşuheda" ya Pasvanê Şoreşê ku bi hevpeyvînekê ji Ajansa "Meşriq"[82] ya nêzî Pasvanê Şoreşê re, ragehand. Ev tevger wê hemû tevgerên Şî'î di bin komekê de, bi cilekî, alayekê û rêxistineke leşkerî, bê komkirin.  Li gorê hin çavkanîyan, ev artêş heye û li ser sê enîyan Iraq, Sûrî û Yemenê şer dike.




**Li Libnanê:**

Li Libnanê bandoreke ber bi çav ya Şî'î di warên siyasî, aborî û civakî, heye. Ji vê hêlê ve "Çiyayê Amil" yê Başûrê Libnanê nîşanek wê ya pîroz heye ku roleke xurt di amadekirina lêvegera ayînzaya Şî'î li Necef û Qum de, lîst. "Mûsa Elsedir" ji lêvegerên Şî'î yên Libnanê ye ku di sala 1978`an li

82 Piştî weşandina hevpeyvînê, Rojnameya Meşriqê hevpeyvîn ji malpera xwe hilanî – Hûrgiliyên sazkirina Îranê "Artêşa Rizgarkirinê ya Şîî" li Sûrîyê - https://www. alarabiya. net

Lîbyayê di dema deshelatdarîya "Muemer Elqezafî" de, bê agahî winda bû. Meclisa Islamî ya Şî'î ya ku di sala 1969`an de hate damezrandin, lêvegera fermî ya Şî'îyên Libnanê ye. " Mûsa Elsedir" ta dema windabûna wî, serokatîya vê meclisê dikir, lê niha ayînnasê Şî'î "Ebdilemîr Qebelan" serokatîya wê dike**.**

Bi destpêkirina şerê navxweyî yê Libnanê û destwerdana Sûrî û Israîlê di kar û barên wê yên navxweyî de; hin tevgerên siyasî û rêxistinên çekdarî, derketin holê ku weke her herêmên ku Şî'î lê peyda dibin, rolek Îranê hebû. Du tevgerên siyasî yên Şî'î li Libnanê derketin holê. Ew jî " Hizbûlahê Libnanî û Tevgera Emel" in. Hizbûlah bi serkirdayetîya "Hesen Nesrûlah" bû tevgereke çekdarî ku weke Pasvanê Şoreşê û ElheşdûŞî'î ya Iraqê, bû hêzeke bi qasî Artêşa Libinanî. Tevgera Emel jî bi serkirdayetîya serokê meclisa nûneran "Nebîh Berî" bû tevgereke siyasî. Li gorî dabeşkirina Ayînzayî (mezhebî) ya piştî Peymana "Taifê" ya ku şerê navxweyî bi dawî kir, serokatîya meclisa nûneran ya Libnanî dike. Her wiha hin komikên çekdar yên alîgirên wê jî hene.

Hizbûlah û Tevgera Emel piranîya rêjeya Şî'îyên Libnanê ne yên %25 şênîyê digirin. Hêza leşkerî ya Hizbûlah weke hêzeke berxwedêr li dijî dagîrkerîya Îsraîlê ji xaka Libnanê, bi awayekî balkêş û bilez pêşket. Her du tevger di warê siyasî ya Libnanê pişkdar dibin ku di deshelata Libnanî de, wezîr ji her du tevgeran hene.

Hizbûlah weke serkevtineka istratîcîya Îranê ye. Ji ber ku ev qeware di qada Libnanê de desthelatdar bibû, piştî ku bi Artêşa Îsraîlê re şer kir ku di encamê de Îsraîl di sala 2000`î de ji Başûrê Libnanê vekişiya. Êdî partî û alîgirên wî weke serkevtinekê li ser Îsraîlê bi hemû hêza xwe, girtin dest. Vê yekê hêvîya wan xurtir kir û bû sedem ku di şerê tîrmeha sala 2006´an de xwe bigire. Hizbûlah beşdarî şerê navxweyî yê Libnanê nekir û xebata xwe kir şerê Îsraîlê. Ji ber vê yekê li gorî Peymana "Taif" çek jê nehatin standin.

Endamên Hizbûlah, Raberê Şoreşa Islamê "Elî Xamineî" weke lêvegerê herî bilind ji xwe re dibînin û sekretêrê Hizbûlah "Hesen Nesrûlah" nûnerê rewa yê "Ayetûlah Xamineyî" bi nav dikin. Di herêmê de Hizbûlah bûye mîkuta Îranê û bûye zimanê Pasvanê Şoreşê ku ji dêvla Pasvanê Şoreşê ve gefan li gelek sabar û dewletên herêmî Weke, Seûdî, Behrên, Îsraîl û dijbira

Sûriyê dupat dike. Ji ber deng û serkevtinên Hizbûlah, gelek mînak jê li welatên ku Şî'î lê hene hatin sazkirin. Weke, Hizbûlahê Pakistanî, Hizbûlahê Efxanî, Hizbûlahê Iraqî û hwd.

Emerîka û hin welatên din di nav de Yekîtiya Welatên Ereban, Hizbûlah xistin lîsteya tundrewîyê (teror), ew bi sizayên darayî darizandin û ji bo girtina rêveberên wê xelatek diyar kirin. Hizbûlah bi teqandina avahîya hêzên Emerîkî "Marênz" û Firensî ya di sala 1983`an de çêbû, hate tewanbarkirin. Di encamê de 300 leşkerên Emerîkî û Firensî hatine kuştin. Hin ji rêveberên wê ji hêla hin nalîyên nenaskirî ve weke "Îmad Muxniya û Semîr Elqintar", hatin kuştin. Şerek di navbera wê û olnasê selefî "Ehmed Elesîr" çêbû û di encamê de Ehmed Elesîr dîl hate girtin. Bi kuştina serokê deshelata Libnanê yê berê Refîq Herîrî hate tewanbarkirin. Ew jî ji ber ku Herîrî bi piştgirîya Firensî û Se'ûdî, dixwest ku bibe hêzeke beramberî Hizbûlah, her wiha zêdebûna deshelata darayî ya Malbata Herîrî li Libnanê xurt bibû. Lê alîgirên Îranê ji bo ku şereke nû li Libnanê pêxin, "Mosad" tewanbar kirin.

Hizbûlah ji rêxistinên Şî'î yên herî birêxistin, çekkirin û perwerdekirî ye. Bi awayeke çalak di şerê Başûrê Libnanê li dijî Îsraîlê û bi rejîma Sûrîyê re li dijî dijberî û rêxistinên radîkal şer kir ku bi binpêkirina mafên mirovan tê tewanbarkirin. Ji ber desteserkirina Hizbûlah li ser biryar Libnanê, ji ber sedemên navxweyî gefxwarina li Se'ûdîyê û hin welatîyên Kendavê û destwerdana di şerê Sûrîyê de ya ku nêzî nîv melyonî jiyana xwe ji dest dane; nakokî di navbera wê û serokê desthelatê "Se'ed Elherîrî" pirtir bûn û ji Riyadê xwe ji kar kişand. Ew jî ji ber ku Îranê bi rêya Hizbûlahê desthelata Libnanê dike. Her wiha Se'ed Elherîrî ragehand ku kuştina wî hatibû pilankirin. Lê bi navberîya Serokê Firensî "Makron" û Serokê Libnanî "Mîşêl On", ji karkişandinê vegerîya.

Hizbûlah di sala 1983`an de hate damezrandin. "Sibhî Eltufeylî" di navbera 1989 – 1991`ê de rêvebertîya wê kir, lê ji ber nakokîyên navxweyî hate jikarberdan. Li şûna wî "Ebas Elmûsewî" hate bicihkirin, lê Îsraîlê ew kuşt û li şûna wî "Hesen Nesrûlah" ket şûnê ku heta niha rêveberîya Hizbûlahê dike. "Tufeylî" bûye baskekî dijber li dijî Hizbûlah kar dike.

تأسس حزب الله حوالي عام 1983م، وتولى قيادة الحزب "صبحي الطفيلي" بين عامي 1989-1991، وتم عزله لخلافات داخلية، وتم تعيين "عباس الموسوي" خلفاً له، ولكن الموساد تمكن من اغتياله، ليعين في مكانه "حسن نصر الله" والذي لا يزال محتفظاً بمنصبه حتى اليوم، ويشكل "الطفيلي" جناحاً معارضاً لحزب الله.

Ji alîyê têkelîyên Hizbûlah yên derve, gelek endamên xwe şandin hin herêmên germ. Ew jî bi rêdarîya Îranê ji bo piştgirî, şîret, perwedekirin û heta bi şer jî li kêlek rêxistinên Şî'î bikin. Weke ku bi piştgirîya Îranê, hin ji endamên xwe şandin Bosna ji bo li dijî hêzên Sirbî şer bikin. Her wiha hin kesên pê re têkeldar, bi hewldana kuştina balyozê Si'ûdî li Nîjîryayê ku koçberên Libnanî lê hene, hate tewanbarkirin[83].

"Tevgera Emel" ya Şî'î anku "Tabûrên Berxwedana Libnanê" di sala 1975`an weke baskekî leşkerî ya "Tevgera Bêparan" ji hêla olnasê Şî'î yê navdar "Mûsa Elsedir" yê ku li Îranê ji dayik bibû û alîkarê wî "Mustefa Çemran" yê ji Îranê, hate damezrandin. "Tevgera Emel" bixwe pirojeyeke ayînzayî bû, ji bo çalakkirin û bihêzkirina ayînzaya Şî'î ya Libnanî ya di warên siyasî û civakî pişt guh kirî bû. Her wiha alîgirên "Xumeynî" dixwestin ku bingehên leşkerî li derveyî Îranê çê bikin, ku perwerde û birêxistinkirina leşkerî û bîrdozîyê li derveyî Îranê peyda bikin, ji bo şerê Rejîma Şah bikin.

[83] Gelo Hizbûlah kuştina balyozê Siûdî li Nîjîryayê pilan dikir?( هل "حزب الله" كان يخطط لاغتيال السفير السعودي في نيجيريا؟) -https://www. annahar. com

"Tevgera Emel" di şerê navxweyî yê Libnanê de beşdar bû û şer di navbera wê û Dirzî û Xirsyanan de çêbû, her wiha ew û alîgirên "Partîya Be'sa Iraqî" li Libnanê, pev ketin. Li dijî Îsraîlê şerê kir dema ku êrîşî Libnanê kir û gelek şervanên wê jiyana xwe ji dest dan. Bi Hizbûlah re li dijî Îsraîlê beşdarî gelek şeran bû. Paşê jî di sala 1987`an de, şerê Hizbûlah kir, ew jî ji ber nelihevkirina helwesta beramberî wargehên Filestînî.

Îranê baldarîyê dide Hizbûlahê, ji ber ku serkirdeyê wê olnas e, û amade ye ji bo Pergala Wîlayetûlfeqîh, çalakîyan li derveyî Îranê pêk bîne, lê bervajî "Tevgera Emel"[84].



**Li Filistînê:**

Îranê pirsgirêka Filestînî weke pirsgirêkeke bineyî jê ye, û li ser wê binemayê Îran bi cîhana Islamî re daxive û hizra Şoreşa Islamîk (Şî'î) belav dike. Îranê rizgarkirina Bajarê "Qudsê" ji Îsraîlîyan û tunekirina desthelata Îsraîlê, weke armanceke stratecîk ji xwe re dibîne. Ji ber vê yekê "Feyleqûlquds" yê peyrewê pasvanê şoreşgerî yê Îranê, saz kir. Di encamê de, Îranê dikarîbû gelek Şî'îyên Ereb û Sunîyên wirya pê re têkeldar bin. Her wiha Fermandarê Feyleqûlquds "Qasim Silêmanî" dikarîbû li Iraq û Sûrîyê Şî'îyên Ereb heta Sunî jî beşdarî gelek şeran bike.

Tevger û rêxistinên Filestînî hema bêje tenê, bi taybet "Tevgera Elcîhadûlîslamî" û "Tevgera Hemas", têkeldarî Îranê ne. Ew jî ji ber dijminê wan yek e, ku Îranê piştgirîya wê ya locistîk ya pêwîst dike. Armanca Îranê jê ew e, ku hêzeke alîgirê wê di Filistînê de hebe ku wê di dema pêwîst de

[84] [84] Pasvanê Şoreşgerî yê Îranê. . çêbûn, sazkirin û rola wî – Daner: Kinis Katizman (Kenneth Katzman) – Çapker: Navenda Îmaratê ya Lêkolîn û lêgerînê. ( . .الحرس الثوري الإيراني
نشأته وتكوينه ودوره- تأليف: كينيث كاتزمان- الناشر: مركز الإمارات للدراسات والبحوث .)

wê li dijî Îsraîlê bikar bîne, hewr wiha ji bo li wir Şî'îtîyê di nav Ereban de belav bike.

Tevgera " ElcîhadûlIslamî " rêxistna Filestînî ya herî pir bi Pergala Wîlayetûlfeqîh bandor bûye, heta ku serkirdey û damezrînerê wê "Fethî Şîqaqî[85]" yê bi bîrûbawerîya xwe Ixwanî ye, bi ramanên "Xumeynî" bandor bû û pirtûka bi navê "Xumeynî: Çareseriya Islamî û berbijêrk", serbarî ku ev tevger hizra selefî û cîhadî ji xwe re bingeh digire, heta ku hinek serkirdeyên wê xwe kirin Şî'î. Her wiha di sala 2014´an de tevgereke nuh di Xeza de bi navê " Tevgera Elsabirîn" çêbû. Ew jî bû tevgera yekem ya Şî'î li Xeza û Filestînê. Serkirdeyê wê " Hîşam Salim"[86] e serkirdeyê berê yê Tevgera " ElcîhadûlIslamî ". Her wiha gelek nivîs derketin ku dibêjin mînakek Hizbûlaha Filestînê heye, lê ev tişt hê nehatîye tekezkirin[87].

**Li Welatên Kendava Lor yê Erebî[88]:**

Ji ber ku Îranê kar û barê welatên kendavên destwerdan dike û Îranê hin giravên ku welatên Kendavê yên Erebî wan weke giravine Îmaratî digirin dest dagîr kirine û ji alîyê welatên Kendavê yên Erebî piştgirîya Erebên Ehwaz û Sunîyên Îranê dike; têkelîyên di navbera Îran û welatên Kendavê de, ne aram e.

---

[85] Di sala 1995`an de Mosad ew kuşt.

[86] "Tevgera Sabirîn" a Şîî. . Çengê Îran li Xezayê ye - http://www. Islamist-movements. com/27906

[87] Axaftineke rojnameyî ya serkêşê Tevgera " ElcîhadûlIslamî ya Filestînê", tê de tekez dike ku nakokiyên kûr ên hundirîn ên Tevgerê hene.
http://www. palestine-studies. org/sites/default/files/mdf-articles/9312. pdf

[88] Rikberiya Olî – Behlûl Nesîm (التطرف الديني- بلهول نسيم)

Piştî ku şoreşa Islamî ya Şî'î di sala 1979`an de bi ser ket û durişma hinartina şoreşa Islamî ya Şî'î bo derveyî Îranê xiste rojevê û piştgirîya komikên Şî'î yên alîgirên wê li Rojhelata navîn û cîhanê; bêtir ji hev dûr ketin. Her wiha nearamî pirtir bû piştî ku helwestên Îran yên nûklerî eşkere bûn, serbarî ku Îranê dixwaze têkelîyên xwe yên aborî bi welatên Kendavê yên Erebî û bi taybet Îmaratê ya ku têkelîyeke bazirganî xurt pê re heye, pêş bixe; lê Îmarat û welaên Kendavê yên Ereban piştgirîya sizayên Emerîkî li ser Îranê kir.

Hêj Îranê li herêmê piştgirîya siyasî, çandî, leşkerî û darayî ya Şî'îyên alîgirên wê weke Komeleya Wîfaq, dike. Bi taybet piştî arîşeyên ku di sala 2011`an de li Behrênê çêbûn. Vê yekê hişt ku têkelîyên Îran û Meclisa Hevkar ya Kendavê, biheje. Helwesta Îranê ya dijhev bandorê li hêza wê ya nerm dike, ji ber ku ji alîyekî ve piştgirîya serhildanên gel yên Behrênê dike, lê ji alîyekî din ve piştgirîya Rejîma Sûrîyê dike ku mafên mirovan were bin pê kirin.

Rêjeyeke baş ya Şî'î li welatên Kendavê yên Erebî hene. Nêzî 2 milyon Şî'î li Welatên Meclisa Hevkar ya Kendavê yên şeşem peyda dibin[89]. Li Behrênê piranî ne (nêzî 75%), (30 – 40)% ji şêniya Kiwêtê û (30%) ji şênîyên Îmaratê ne. Her wiha rêjeyeke baş ji Şî'îyan li herêmên Qetîf û Ihsai yên Si'ûdîyê û rêjeyeke biçûk li welatiyên din, hene. Îranê dixwaze bi hemû rêbazan van Şî'îyan bi rêxistin bike û wan têxe bin baskê xwe. Ji perava rojhelatê bigire heta perava rojavayê yên kendavê, Îran weke kendaveke Farisî, digire dest û weke herêmeke çalak û stratecîk lê dinere, ji wesa dixwaze desteser bike. Ji ber ku weke enîya lawaz ya ewlekarîya neteweyî digire dest û li gorî Pergala Wîlayetûlfeqîh du dijminên sereke yên Îranê li wir hene, ew jî Emerîka û Sûna ne. Li alîyê Erebî yê Kendavê bingehên leşkerî yên Emerîkî û Rojavayî belav dibin. Ew jî bi çekên stratecîk yên herî nûjen hatine amadekirin ku dikarin di her demê de êrîşan li ser Îranê bikin. Ji hêlekê din ve jî welatîyên Kendavê yên Ereb hewl didin ku çekên stratîcîk yên herî nûjen yên ku li bazara cîhanê hene, peyda bikin ku metirsîyeke ber bi çav li ser Îranê çêdike. Ji ber ku idyolocîya Wehabî ya ku Si'ûdiyê belav dike,

[89] Pilana Ayînzayî li Herêma Kendavê, rapororeke kurt a koma xebatê - https://repository. library. georgetown. edu/bitstream/handle/10822/761415/CIRSArabicSummaryReport7Secta

wateyek wê ya tawanbarkirinê (tekfîrkirinê) heye; stratîcîya Îranê çalakîyên xwe yên agehdarîyê pir bikin û komikên Şî'î yên alîgirên wê ji hêla leşkerî û bîrdozî ve wan perwede dike, bi taybet jî li Si'ûdîyê, Behrên û Kiweytê, ji bo ku ev welatî bi arîşên xwe yên hundirîn dakevin. Her wiha komikeke çekdar yên ku ji dêvla Îranê ve şerê welatîyên Kendavê bike, amade bike. Êdî van komikan hin rêzeçalakî pêk anîn ku bersiveke xurt ji hêla rejîmên Kendavê hate dan û bi awayekî tund ew rawestandin, heta hinek serkirdeyên wan, weke olnasê Şî'î " Nimir Elnimir " hatin bidarvekirin[90].

**Li Si'ûdîyê:**

Olnasên alîgirên Rejîma Îranê têkelî bi xwendekarên Şî'î re kirin, dema ku zanistên olî yên Şî'î li cem lêvegera olî ya şîrazî li Bajarê "Qum" ya Îranê dixwendin û hin Şî'îyên Si'ûdî bi rêxistin kirin, van jî "Hewza Hîcazê" saz kirin ku wê jî "Kombûna Zanyarên Hîcazê" ji zanyarên Şî'î yên Si'ûdî, dirust kirin. Ji hêla zanistên olî ve û ji ber bandora ramanên "Xumeynî", Şî'îyên Si'ûdî di navbera dibistana "Şîrazîtî "[91] û ya "Xumeynî", perçe bûn.

Li Si'ûdîyê şî'îyan li gorî ramanên şoreşa Islamî ya Şî'î ya Îranê bi serkirdeya "Xumeynî" xwe bi rêxistin kirine û hin çalakî li dijî destheltdarîyên Si'ûdî û Sune pêk anîn.

Her wiha bi sorkirina peyrewên Pergala Wîlayetûlfeqîh, hin serheldan li herêmên ku Şî'î lê hene li "Qitêf, Ihsaa û Ewamle" li dar ketin. Weke serheldana herêma "Ihsaa-Qetîf" li dijî gefxwarinên Emerîkî li Îranê, piştî dagîrkerina balyozxaneya Emerîkî di sala 1981`ê de li Tehranê. Her wiha li

[90] Di 15`ê Cotmeha 2014`an li Siûdiyê, biryara kuştina Çalekvanên Şîî Şêx Nimir Baqir Emîn Elnimir hate dayîn. Ji ber ku Elnimir daxwaza "Wîlayetelfeqîh" li Behrênê û Siûdiyê kir, hin sehabî reş kirin û sixêf kirin berpirsyarên serweriyê. Ev jî bo nameyeke hişk ji Şîiyên Sûdiyê yên Parêzgehên Qetît û Ihsai yên rojhilatî wê. Wateya vê nameyê ku serwerî li hemberî çalakiyên li dijî wê, çi ji dest wê bê wê bike.
Biryara kuştina Elnimir ê ji 8`ê pûşbera 2012`an girtîbû ku di 2009`an de doz kir ku Qetîf û Ihsa li Behrênê vegerin. Hizbûlahê Hîcahê. . . Dibe ku komikên razayî şiyar bibin
http://www. alrased. net/main/articles. aspx?selected_article_no=6825

[91] Şîrazîtî, beşeke ji  tîreya Şîî ya Dozdehîmamî ye. Beşa herî xurt û çalak ya şîiyê ye. Li herêmên Kerbela ya Iraqê rola xwe di salên heftî de lîst, paşê derbasî Îran, Kiweyt, Siûdiyê, Libnan û Sûrîyê bû û li Behrênê bi riya lêvegera dibistanî ya dibistana şîrazîtiyê belav bû. Navê xwe "Şîrazîtî" ji ber xwe li gorî fiqhê Lêvegerê Şîî yê mezin ê mirî Mihemed Huseynî Şîrazî yê ku lêvegerîtî da birayê xwe yê biçûk Sadiq Huseynî Şîrazî. .
"Şîrazîtî". . aliyê şîiyê yê radîkal - http://www. Islamist-movements. com/2638

heca sala 1987`an de pevçûn di navbera peyrewên Xumeynî[92] û olnasên Si'ûdî derkevt. Ew jî ji ber cudahîya ayînzayî û Şî'îyan xwestin ku hin nerîtên ku Sunîyan nepejirandin, dîsa pêk bînin. ji ber Suna naxwazin ku hec bibe mihrecaneke siyasî û dunyewî. Ev jî bû sedem ku bi dehan hecî, leşker û welatîyên Si'ûdî li dema heca sala 1987`an jiyana xwe ji dest dan. Paşê "Hizbûlahê Hîcazê" baskê leşkerî yê Rêxistina "Şoreşa Islamî Li Cezîra Erebî", teqîn li heca 1989´an pêk anîn, lê paşê "Hizbûlahê Hîcazê" xwe ji Rêxistinê cuda kir, ji ber xwest ku bi desthilatdarên Si'ûdî re li hev werin.

"Hizbûlahê Hîcazê"[93] yan jî " Hizbûlahê Si'ûdî" çend çalakîyên leşkerî di salên heştêyî de li ser xaka Si'ûdîyê, weke li Cibêlê di sala 1988`an de avahîyên "Beşgeha Sedef ya Pitrokîmawîyê" hate teqandin. Her wiha êrîşên li dijî şandeyên dîplomasî yên Si'ûdîyê li derve pêk hatin. Weke, li Tirkîyê di sala 1988`an de sekretêrê duyem yê balyozxaneya Si'ûdîyê hate kuştin, li Paytexta Taylendê Bankokê di sala 1989´an de sekretêrê Sêyem yê balyozxaneya Si'ûdîyê " Ebdela Elmalikî" hate kuştin, di 1`ê Sibata 1999`an de her sê dîplomasîyên Si'ûdî "Ebdela Elbesrî, Fehed Elbahilî û Ehmed Elsêf" li dû hev (5 xulek di navbera wan de), hatin kuştin, lê kesek neht girtin. Her wiha li Si'ûdîyê di sala 1996`an de teqandina bircên "Elxeyr" ku 19 leşkerên Emerîkî û sivîl û bi sedan malbatên wan hatin kuştin, Rêxistina Elqa'îda ev teqîn pîroz kir û li Riyadê di sala 1995`an de avahîya pasvanên niştimanî hate teqandin.

Bersivdayîna Si'ûdîyê pir xurt û hişk bû û cudahî nexist navbera peyrewên Îranê û sivîlan. Êdî di sala 2017`an de desthilatdarên Si'ûdî li herêmê Şî'î "Qetîf, Ihsa û Ewamle " pêngaveke leşkerî pêk anî, tevî ku komikên razayî yên Şî'î li ber xwe dan jî, lê hatin çewisandin. Êdî li gelek welatên Rojhelata Navîn şerekî ajanî di navber Si'ûdîyê û Îranê de bi rêya ajanên xwecehî de heye ku her alîyek alîgirên xwe xurt dike.

---

[92] Pasvanê Şoreşgerî yê Îranê. . çêbûn, sazkirin û rola wî – Daner: Kinis Katizman (Kenneth Katzman) – Çapker: Navenda Îmaratê ya Lêkolîn û lêgerînê. ( الحرس الثوري الإيراني. . . نشأته وتكوينه ودوره- تأليف: كينيث كاتزمان- الناشر: مركز الإمارات للدراسات والبحوث)

[93] Endamên vê rêxistinê ne ji Hîcazê bûn a bi piraniya xwe Sunî ne, lê belê ji Herêma Qetîf û Ihsayê ne. Xumeynî navê Partiya Hizbûlah a Hîcazê lêkir, ji ber ku nedixwest hebûna Siûdî rewa bike, cihê Malbata Siûd a olî kêm bike û serweriya wan ji herêmê re nepejirîne. Partiya Hizbûlah a Hîcazê" Siûdî" (حزب الله الحجاز "السعودي") -http://www. Islamist-movements. com/2571




*Hinek ji wêrankirina ku, di encama pevçûnên di navbera Hûzûn Si'ûdî û çekdarên Şî'î li Ewamleyê di sala 2017`an de, rû dan[94].*

**Ji rêxistinên Şî'î yîn li Si'ûdîyê:**

"Rêxistina"Şoreşa Islamî li Siûdiyê"

**Rêxistian Şoreşa Islamî li Erebîstana Si'ûdî:**

Berê bi navê "Rêxistina Şoreşa Islamî ya Rizgarkirina Cezîra Erebî"[95], dihate naskirin. Ew jî tevgereke siyasî, Şî'î, Si'ûdî û dijberî ye, ji hêla Olnasê

94 Bûyerên Ewamle: Girtina devban an pêkanîna ewlehiyê?( أحداث #العوامية: كتم للأصوات أم بسط للأمن؟) -http://www. bbc. com/arabic/interactivity-40807092

95 Şêiyên Siûdiyê (الشيعة في السعودية) - http://alarab. co. uk/?id=47542

Şî'î "Hesen Elsefar"[96] û "Tewfîq Sêf" piştî serkevtina şoreşa Islamî ya Şî'î ya Îranî, hate damezrandin. Pêşî navenda wê li Tehranê bû, lê piştî nakokîyên bi serokê Îranê yê berê "Elî Xamineyî", çû Şamê[97] û du navend li Waşinton û Lundunê hatin vekirin.

Ji bo bidestxistina mafên Şî'îyên Si'ûdî û wan ji hêla siyasî û leşkerî ve bi rêxistin bikin. Lewra di sala 1987`an de bi navê "Hizbûlahê Hîcazê" baskekî leşkerî hate damezirandin, lê di sala 1990`î de jê veqetiya. Ew jî piştî ku şerê Kendavê yê duyem dest pê kir û rêxistinê bang li ciwanên Si'ûdî kir ku parastina Si'ûdîyê bikin û li hemberî Rejîma Sedam Hisên şer bikin. Piştî şerê Kendavê yê duyem bi dawî bû, navê xwe kir " Komîteya Navdewletî ya Mafên Mirovan ya Cezîra Erebî û Kendavê" û dev ji idyolocîya şoreşgerî berda ku bal kişand ser mafên mirovan. Êdî di sala 1993 de rêxistin bi desthilatdarên Si'ûdîyê re li hev hat.




**"Hizbûlaha Hîcazê":** Bûyerên heca sala 1987`an û bi piştgirîya Pasvanê Şoreşgerî yê Îranê, sedema sereke ya demezrandina wî bû. Banga xebata leşkerî li dijî stemkarîya desthelatîyên Si'ûdî li hemberî Şî'îyan, tekfîra Rejîma Si'ûdîyê, ji bo berdana Emerîkîyan ji Cezîra Ereban cîhad kirin û belavkirina ramanên şoreşa Islamî (Şî'î); ji armancên wê yên sereke ne. Weke me berê diyar kiribû li dijî berjewendîyên Si'ûdî û Rojavayî gelek çalakî pêk anîn. Vê partîyê di bin gelek navên rêxistinê derw weke

96 Hesen kurê Mûsa kurê Şêx Rida Elsefar (Di sala 1958`an de ji dayik bûye), olnasekî Şîî û nivîskarekî Siûdî ê nûjen. Hewil da ku gotûbêjekê di navbera selefî û Şîiyên Siûdiyê veke. Gelekî têkildarî lêvegerên Îranî weke Elî Xamineî ye - Hesen Elsefar - https://ar. wikipedia. org (حسن الصفار - ويكيبيديا، الموسوعة الحرة)

97 Dijkariyeke eşkere di navbera komika Muntezirî û Mihdî Haşimî ji hêlekê ve û alîgirên Xumeynî ji hêlekê din ve. Bi riya Şîraziyan, Mihdî Haşimî alîkariî da Ereban ji bo kêrêta Îranê were eşkerekirin – Kuntrola raihandinê. Tişta ku dijkarî kire xwînî, bidarvekirina Hihdî Haşimî yê ku bi sûcê belavkirina belgeyên di mijara kirîna Îranê di şerê bi Iraqê re, çek ji Îsraîlê kirîne, tewanbar kirin.

"Leşkerên Rastîyê" û "Rêxistina Şerê Pîroz", ew çalakî pêk anîn. Îranê ji hêla xwe ve, diyar kir ku tu têkelî di navbera van rêxistinan û "Hizbûlahê Hîcazê" de tune ye[98].

**Li Kiwêtê:**

Tevî ku têkelîya dostanîyê di navbera Kiwêt û Îranê de, lê çalakîyên Îranê yên agehdarîyê li Kiwêtê hene. Jixwe jimareke Şî'î li Kiwêtê heye û gelek ji wan amadene ku danûstandinê bi agehdarîyên Îranê re bikin. Êdî Îranê hinek komikine veşartî li wir çandin, ew jî bi armanca ku amade bin çalakîyên ewlehî û veşartî li gorî rêdarîyên (talîmat) agehdarîya Îranê, pêk bînin. Ji wan "Komika Elebdelî", navê xwe ji Herêma "Elebdelî" ya li ser sînorê Iraq û Kiwetê ye, stendîye. Agehdarîya Kiweytî ew derxist û 16 endamên wê girtin, ew jî welatîyên Kiweytê yên Şî'î ne, yek ji wan kesê bi navê "Ebdûrida Heyder Dehqan" ku xwedî nasnameya Îranê ye. Sûcên ku ew pê tewanbarkirina ev in; sîxûriya Îran û Hizbûlah, peydakirina komeke mezin ji çek û teqemenîyan li nik wî, amûrên guhdarîkirinê, ji bo çalakîyên dijminatîyê li dijî desthelatdarîya Kiweytê pêk bînin, û hindek ji wan revîyan Îranê, di gel rijdbûna Îran ku tu têkelîya wê bi wê şaneyê re nîne, û di demeke berê de tawankirina komek ji Şîîyên Kiwêtê araste kirin ku hewldana kuştina mîrê Kiwêtê Şêx Cabir El – Sebah kirin.



98 Hizbûlahê Hîcazê. . Gelo wê komikên razayî şiyar bibin?( حزب الله الحجاز.. هل تستيقظ الخلايا النائمة؟) -http://www. alrased. net/main/articles. aspx?selected_article_no=6825

## Li Behrênê:

Aniya Islamî ya Rizgarkirina Behrênê

Li Behrênê Şî'î piranî ne. (nêzî %75), lê hin çavkanîyên din diyar dikin ku ew nêzî (% 67)[99] in. Di sala 1973`an de hin olnasên Şî'î "Komeleya Bîrwerkirina Islamî" ava kirin, vê jî weke "Partîya Eldawa" ya Iraqê, " Partîya Eldawa" ya Behrênê damezirand, lê di sala 1983´an de hate qedexekirin. Her wekî herêmên ku Pasvanê Şoreşê yê Îranê li çalak e, Şî'î li gorî hizrên "Xumeynî", hatin rêxistinkirin. Di sala 1981"Enîya Islamî ya Rizgarkirina Behrênê" hate damezrandin, wê jî bi serperiştîya wezareta agehdarî û ewlekarîya niştimanî û pasvanê şoreşa Islamî "Komeleya Xebata Niştimanî ya Islamê" saz kir. Her wiha ji dêvla Partîya Eldawa ya hate jevxistin "Tevgera Serfirazên Behrênê" hate sazkirin, paşê wê jî "Komeleya Lihevhatina Niştimanî ya Islamî", ava kir[100]. Ji ber ku giringtirîn armanca wê rûxandina pergala desthelatdarîyê li Behrênê, û avakirina dewleteke Islamî bi şêweyê Komara Islamî ya Îranê bû, û derkirina hêzên Rojavayî ji wê derê û rabûna bi rîformxwazîyên bingehîn û ji bilî wan jî. Êdî di sala 1981`ê de hewl da ku lêdaneke leşkerî bi serkirdeya olnasê Şî'î "Hadî Muderisî" nûnerê kesayetîya Xumeynî yê Behrênê, pêk bîne. Lê ev çalakî têk çû, ji ber ku hêzên Rojavayî (Birîtanya û Emerîka) Behrênê desteser kirine û textê Behrênê ji "Al Xelîfa" re parast.

---

[99] Navenda Rojnameya Elweset, ji malpera Elhecir hatiye birin. ( مركز صحيفة الوسط منقول عن موقع الهجر. )

[100] Behrên: Di serhildana 14`ê sibatê de rola tevgera Islamî. ( البحرين: دور الحركة الإسلامية في انتفاضة14 فبراير ) - http://www. bcsl. org. uk/arabic/pdf/article/530/The%20Role%20of%20the%20Islamic%20Movement%20in%20Feb%2014. pdf

Vê rêxistinê li dijî hin navendên desthilatdarên Behrênê, teqîn pêk anîn. Serbarî ku di sala 2002`an de bi desthilatdarên Behrênê li hev hat, lê wê xebata gelan ya ku di salên 2011 – 2012`an de li Rojhilata Navî çêbû, bi kar anî û ji bo rejîma desthelatdar ya Behrênê biguhere serheldaneke din li dar xist. Lê bi destwerdana leşkerî ya dewletên Kendavê bi rêya "Hêzên Mertala Kendavê" û bi piştgirîya Emerîka û Berîtanîyayê; ev çalakî têk çê û ew serheldan bi awayeke tund hata çewisandin û hin ji serkirdeyên wê hatin bidarvekirin.

Her wiha Rêxistina "Seraya Eleşter" di sala 2012´an de hate damezirandin. Ev rêxistineke Şî'î û tûndrew e, ku li gorî idîyolojîya Şepêla " Şîrazî ya Îranê"[101] ya tûndraw tev digere. Armanca wê ew e, ku ji bo derketina " Îmamê Mehdî", şoreşeke Şî'î pê bixe. Ew jî weke baskê leşkerî yê "Komela Wefa ya Islamî ya Şî'î" ya ji Îranê tê piştgirîkirin. Vê rêxistinê li dijî hêzên ewlehîyê yên Behrênê hin teqîn, pêk anîn.




**Li Yemenê:**

Cihê Yemenê yê li goşeya başûrê rojavayê  Parzemîna Asyayê, ciheke stratîcîk e. Ji ber ku li ser Tengava "Babûlmendib" vedibe ya ku "Deryaya Sor" bi "Deryaya Erebî" girê dide, ew jî bi Zeryaya (okyanûs) Hindî girêdayî ye. Giringîya vê tengavê ne kêmî Coya Siwêsê ye, ji ber piştî ku keştî Coya

[101] Lêvegera bîrdozî ya Rêxistina "Seraya Eleşter", Lêvbegera Şîrazîtî ye. Ji ber ku li gorî nerînên fiqhî yên Lêvegerê Şîî Mihemed Huseynî Şîrazî. . . Şîrazîtî rêbazên seferberiyê û hilgirtina çekan bingeh digire ku weke rêbazeke tundraw û hişk li beramberî yê din, tê naskirin, tevlî dijkariya di navbera şîraziyan û xaminiyan jî, lê bi awayekî hevkarî di navbera "Seraya Ekeşter" û Pasvanê Şoreşê de hehe. Dergeha Tevgerên Islamî. (بوابة الحركات الإسلامية) - http://www. Islamist-movements. com/30568.

Siwêsê derbas dikin, nikarin ji Deryaya Spî bigehêjin rojava û başûrê Asyayê, ne ku tê re herin. Her wiha di gel samanên wê, bazara fireh û ji bilî wan, giringiyeke din bi dest xistîye. Civaka Yemenê weke welatên din yên Cezîra Erbî, civakeke êlperest e. Şî'î (25%) ji şênîya Yemenê digirin. Piranîya Şî'îyan peyrewên ayînzaya "Şî'îya Zeydî" ne ku navê xwe ji Îmamê "Zeyd Binûelî"[102] girtîye. Ew jî yek ji her sê ayînzayên Şî'î (Zeydî, Isnîeşerî, Ismaîlî) ne. Bêtirî xwe li Bakurê Yemenê li ser sînorê Si'ûdîyê, bi cih dibin. Her wekî hemû dewletên zordest (totarî) yên Ereb, demokratî li Yemenê nebû û gelek pêkhateyên civakê weke Şî'î, hatibûn piştguhkirin. Pergala Wîlayetûlfeqîh bala xwe da giringîya Yemenê, ji ber vê yekê dema ku olnasên Şî'î yên Yemenê serdana cihên pîroz yên Iraq û Îranê dikirin, têkelî bi wan re dikir û paşê hosteyên (pisporên) Pasvanê Şoreşê dişandin wir. Ji ber ku civaka Yemenî êlperist e, û li gorî kevneşopîyên wan, kesên wê çekên sivik, heldigirin; Şî'î di hêla leşkerî de bi hêsanî, hatin birêvebirin. Ew jî ji bo ku li herêmê li gorî stratîjîya Îranê werin bikaranîn. Xalên ku giringîya siyasî û stratîjî dide Yemenê Ev in:

Li ser Tengava "Babûlmendib" hindav e, ji ber wesa dema ku Pasvanê Şoreşê tengavê desteser bike, wê derfetê bide Îranê ku Tengava "Hirmiz" (Kendava Lor/Deryaya Uman) û Tengava Babûlmendib ( Deryaya Sor/Deryaya Erebî), desteser bike, anku rêya navdewletî ya çûn û hatinê ya Zeryaya Hindî, wê desteser bike.

Hebûna hembêzeke gelêrî ya Şî'î û çiyayên asê, lê peyda dibin, êdî ji bo piştgirîya komikên Şî'î yên Efrîka û Si'ûdîyê bike û rêgeheke belavkirina Şî'îtîyê, weke bargeheke lipêş tê girtin.

Zalkirina li ser Yemenê bi rêya rêxistineke Şî'î ya alîgirê Îranê dê rê pê de ku welatên Kendava Erebî dorpêç bike. Ji ber ku cihê Yemenê ya li Başûrê Si'ûdîyê derftê dide Îranê ku bêtir zexteke leşkerî li ser Si'ûdîyê xurtir bike û karîna ku gefan lê bixwe. Mînaka, Tevgera "Hûsî" rokêtên palistî avêtin Paytexta Si'ûdîyê Riyadê, ev jî nameyeke xurt ji Rejîma Si'ûdîyê re bû ku hayê wê hebe dema li dijî Pasvanê Şoreşêyê Îranê raweste.

---

[102] Pilana Ayînzayî ya li Herêma Kendavê, raporeke kurt a koma xebatê. (في الطائفية السياسة العمل لمجموعة موجز الخليج، تقرير منطقة) - https://repository. library. georgetown. edu/bitstream/handle/10822/761415/CIRSArabicSummaryReport7SectarianPoliticsInThe Gulf. pdf

Nêzîkatîya Yemenê ji baregehên leşkerî yên stratejîk yên Emerîkayê. Weke baregeha haydana zû ya Emerîkî li "Esmerayê" paytexta "Erîtîryayê" ku radareke mezin lê heye. Hêzên Emerîkî û CIA vê radarê ji bo çavdêrîya hewayî û sîxûrkirina elktronîk li ser Rojhilata Navîn, bi kar tîne[103].

Li nêzîkî Yemenê hin welatên biçûk weke Somal û Cîbûtî hene ku Îranê pêşbirkê bi Emerîkî, Firensî û Birîtanîyan re ji bo wê desteser bike, belavkirina ayînzaya Şî'î û bingehekê ji Pasvanê Şoreşê re çê bike.

Hebûna Israîlê li Atyûbya, Kînyayê û hin welatên din yên Efrîkî ku metirsîyeke mezin ji Îranê re çê dike.

Şî'îyên ku bi hizrên şoreşa Islamî (ya Şî'î) ya Îranê bandor bûn, bi navê Tevgera "Ensarûlahê" rêxistineke siyasî û leşkerî xurt li Yemenê, saz kirin. Ew jî tevgereke siyasî û ayînzayî ye, ji hêla "Hesen Bedrûdîn Elhûsî" di sala 1992`an de, hate ava kirin. Ev rêxistin ayînzaya "Zeydî" ji xwe re bingeh digire û li Çîyayên Se'adayê yên Bakurê Yemenê, bi cih dibe. Ev tevger weke berteyekê li dijî pişguhkirina alîgirên ayînzaya "Zeydî" li Yemena Bakur, piştî ku Yemena Bakur û ya Başûr bûn yek, hate saz kirin.

Tevgera "Ensarûlah ya Hûsî"[104] yan jî navê Rêxistina "Elşebab Elmûmin:[105] Ciwanên Bawermend" li xwe dikin, ji rêxistinên Şî'î li Cezîra Erebî ya herî birêxistinkirî û biçekkirî ye. Alîgirên vê tevgerê durişma li dijî Emerîka, Dewleta Israîl û Cihûyan, didin. Her wiha dijmnatîyeke xurt ji Suneya Wehabî dikin ta digehêje tawanbarkirina (tekfîra) wan. Îranê bi

---

[103] Baregeha Emrîkî ya li Esmerayê di sala 1945`an de hate avakirin. Her wiha "Hêla Sêlasî" destûr da Emrîka û hevkarên wê ku desteseriyê li ser ava herêmî yên Erîteryayê û tengavên deryayî bikin. Ji ber vê yekê ji zû ve (1953) hebûneke leşkerî li Erîteryayê heye. Erîterya (4000) hosteyên(pispor) leşkerî yên Emrîkî ji bo li baegeha saloxgeriyê (Kanyostêşin) bixebitin, derbasî wlêt kir. Di wê demê de ev baregeh weke baregeha herî mezin ji derveyî Emrîka bû ku piştgiriyeke mezin da oergala saloxgeriyê ya Emrîkî li cîhanê. Bi riya vê baregehê Emrîka çalakiyên di Zeryaya Hindî û ojhilata Navîn dişopand ku Yekîtiya Sovyêtê serweriya beşeke jê dikir. Kunikeke li ser Bûyeran (5): Têkiliyên Emrîkî û Erîteryayê. نافذة على الاحداث (5) : العلاقات الأمريكية الإرترية

[104] Hûsî navê "Ensarûlah"(alîgirên xwedê) li xwe dikin, ew jê ji ayeta Quanê(61/14): (Ey kesên bawermend alîgirên xwedê bin"Ensarûlah" weke ku Îsa ji hewariyan re got kî ji bo xwedê alîgirê min e, hewariyan gotin em alîgirê xwedê ne. Êdî beşeke ji Israîliyan bawer kir û beşeke din kufir bûn, êdî me piştgiriya bawermendan kir li dijî dijminên wan û bi ser ketin) - [https://ar. wikipedia. org](https://ar.wikipedia.org)(ويكيبيديا، الموسوعة الحرة)

[105] Hûsî kîne? (من هم الحوثيون؟) -http://alburhan. com

awayekî xurt piştgirîya wê dike heta gehaştî ye asta ku rokêtên palistî radestî wê kir. Ew jî bi armanca ku mînaka Hizbûlahê Libnanî û Hehdûşabî li Iraqê, dubara bike. Bi Rejîma "Elî Ebdela Salih" kete nava şer de û di şerekî de serkirdeyê wê "Hesen Bedrûdîn Elhûsî" di sala 2004`an de, hate kuştin. Her wiha bi Hêzên Si'ûdîyê di sala 2009`an de bi navê şerê Sa'eda, şer kir. Ev tevger bi serkirdeya "Ebdûlmelik Bedrûdîn Elhûsî" û piştî serheldana gelê Yemenê li dijî Rejîma "Elî ebdela Salih" û berzbûn û girjbûna nakokîyên ayînzayî li herêmê, bi awayekî bi lez û xurt li pêş ket. Piştî rûxîna Rejîma Salih, nakokî di navbera Yemnîyan de derketin holê, ew jî ji ber pevçûnên ku li ser destserkirina herêman derketin û ji nû ve şer pêket, êdî Hêzên Hûsîyan bi hevkarîya hêzên serokê Yemenê yê berê "Elî Ebdela Salih" yê ku wan bi xwe di kanûna 2017`an de ew kuştin, dikarîbûn herêmeke berfireh ji Yemenê, desteser bikin ku piştî vekişîna desthelata bi serkirdayetîya "Ebidrebo Hadî Mensûr" ya ji hêla navdewletî ve hatîye rewakirin, Paytexta Yemenê Sen'a di 2015`an de desteser kirin. Rjîmên Cezîreya Erebî ev desteserkirin weke deshelatdarîya Îran li ser Yemenê û girêdana Yemenê bi pirojeya kevana Şî'î ya Îranî ve, girtin dest. Ev kevan çar paytextên welatên Ereban desteser kirîye, ew jî ev in: "Bexdad, Şam, Beyrût û Sen'a" ne. Her wiha çalakbûna Tevgera Hûsî li Yemenê, dihêla ku serhildanên din ji hêla "Isamîlîyan" ve li parezgehên Si'ûdîyê weke "Cazan û Necran", çêbibin. Ji hêlekê din ve hin komikên ciwanên Yemenî yên Şî'î bi rêdarîya Pasvanê Şoreşê ji bo li kêleka Rejîma Sûrîyê şer bikin, hatin amadekirin. Pasvanê Şoreşê bang li hemû rêxistinên Şî'î yên çekdar kir ku berê xwe bidin Sûrîyê, li vir navê "Lîwa Seada" derket pêş, ev jî tevgereke Şî'î ya Yemenî ye, endamên wê ji Hûsîyan e, jimara wan bi sedan e, û bi dehan ji wan li "Milêha û Cober" yên gundewarên Şamê, hatin kuştin. Dibêjin ku di dema dawî de ji ber bûyerên dawî li Bakurê Yemenê, piranîya wan vegerîyan Yemenê û hinek ji wan tevlî Lîwa "Ebûelfedil Ebas" bûn. Bi gelemperî Pasvanê Şoreşê yê Îranî, Tevgera "Hûsî" ya Yemenî weke beşeke Artêşa Rizgarkirina Gelêrî yan jî beşeke Pasvanên Şoreşgerî, digrin dest ku ji bo avakirina hebûneke Şî'î li ser asta cîhanê, tê dikoşe.

Si'ûdîyê û welatên Kendavê ketin tirsê, ji ber nas kirin ku deshelatdarîya Îranê pir dibe û dixwaze wan dorpêç bike. Ji ber vê yekê hevpeymaneke Erebî ava kirin û êrîşî Tevgera Hûsî û hêzên Elî Ebdela Salih, kirin, ew jî piştî ku lihevkirina Xelîcî bin pê kirin û encamê wê sivîlan ziyan dîtin.




***Li Afrîka**[106] :


Parzemîna Afrîkayê ji hin hêzên navdewletî re dibe armanceke balkêş, ew jî ji ber dewlemendîya wê bi ” Petrol – gaz – Komir – Yoranyom – zêr û Masê”, her wiha pirbûnek ji nifûsên mezêxer ku digehêje milyarekî. Li milekî din jî Afrîka xwedî cihekî jeopolîtîk ya pir girîng e, ji ber wesa dewletên weke  Emerîka, Firensa, Birîtanîya, Çîn, Tirkîyê, Îsraîl û Îranê hwd, ji bo desteserkirina vê herêmê ketine nava pêşbirkekê.

Ji sedsala bîstan ve Şî'î li Bakurê Afrîkayê hene, ew jî di rêya dewleta” Fatimî” ya ku Misrê navenda bû û Qahîrayê paytexta wê bû ku 200 salî berdewam kir û ya ku dawîya wê li ser destê ” Selahedînê Eyobî” bû, yê ku li şûna wê dewleta Eyobî damezrand. Şerê Xaçperestan kir û Qudsê rizgar kir. Ayînzaya fermî ya dewleta Fatimî ayînzaya Şî'î ya Isma'îlî bû[107], ji ber wesa ayînzaya Sunî hat pişgukirin û dewleta Fatimî tekezî li ser belavkirina ayînzaya xwe kir.  Mizgefta Ezher ava kir û kir navendek olî Şî'î xwedî bandor, paşê Selahedîn ev mizgeft kir navendeke Sunî. Bi vî awayî gelê herêmê ji bo xwe nêzî desthilatê bikin, neçar man ku danûstandinê bi ayînzaya Şî'î ya isma'îlî re bikin. Her wiha Şî'î bi jimareke kêm li hin dewletên Afrîkî mîna, ( Nîgîria, Tanzania, Zenzibar û Kenya). . hwd.

---

[106] Anisikiopediya hemûgir a tîmên herdemî li cîhanê(4), kombûna şîeyan li weltên Erebî yên Afrîkayî. Usama el-Keswanî. Navenda Kendava Erebî ya lêkolînên Îranî https://arabiangcis. org

[2] Ismaîlî, girêdayî Ismaîl bin Cefer in, yek ji her sê tîmên mezin ên Şîiya ye, li kêleka Isnîeşerî û Zêdiyê




Serbarî serdestîya ayînzaya Sunî li ser jiyana olî û civakî ya civakên Afrîkî, lê hin kesine Şî'î karîbûn hebûna xwe biparêzin. Li wê deverê jimarek cih û mezarên ( EhlulBeyt) û hin tîmên Şî'î mîna ( Behayî – Bohra) hene.

Berî şoreşa ”Xumeynî”, têkelî di nav bera Şahê Îranê û hin wlelatên Afrîkî mîna, Misir ku di nav wan de gehişt asta zewacê pir baş bû. Li wê deverê civaka Sunî, heta Ixwanelmislimîn berovajî ”Selefîyên Wehabî” yên ku Şî'îyan tawanbar dikin (dikifirînin), şerê Şî'îyan nedikirin, tu astengî derbarê zewaca di nav bera Sune û Şî'îyan de tune bû, mîna zewaca” Muhemed Riza Behlewî ” ji ” Fewziya” keça padîşa” Fûad” ku dibe xuşka padîşah” Farûq” û zewaca serokê berê ” Cemal Ebdulnasir” bi ” Tehiya Kazim” ya Îranî re ya li ser ayînzaya Behayî bû ku dibe yek ji firqeyên Şî'î.



*Muhemed Riza Şah bi hevjîna xwe*

*Fewziyza û birayê wê padîşah Farûq re.*

Piştî serkevtina şoreşa Xumeynî têkelîya di navbera Misir û Îranê ne baş ket, ew jî bi sedema redkirina Misrê radestkirina Şahînşah bo Xumeynî û ji ber piştgirîya Îraqê di şerê Kendava yekem de kir, her wiha berdewamîya peymana aştîyê bi Îsraîlê re. Piştî sala 2010 an têkelî di nav Misir û Îranê de baş bû. Gelek rêz peyman hatin li darxistin, dirvgeha " Misir – Îran ya geşpêdanê "MIDB vebû, veguhêzkarîya hewayî ket tevgerê, veguherîna bazirganî pir bû, serbarî wê jî agehdarên Misrî peyketina komên Şî'e yên nepenî yên ku hewil didan jinûve xwe rêxistin bikin û çekan derbasî herêma Xeza yê bikin, neda bû rawetandin.

Weke di hunerê de tê gotin: Her çiqasî yek dûrî wêneyê bikeve, dê xuyabûna hûrkarîyên kirêt tê de kêm bibin, ji lewra, dûrbûna erdnîgarîya Afrîkayê ji Îranê alîkarî bi çalakbûna hêza nerm ya Îranê bi hêztir bibe. Kategorîyek berfireh ji olnas û rewşenbîrên Afrêkî hene ku bi ezmûna Îranî wek welatekî Islamî xwedî bandoreke leşkerî, siyasî, aborî û çandî, bandor bûye. Li nik helwestek erênî ji şoreşa Îranê bi serkirdayetîya Xumeynî ya li dijî Şah yê ku di nava civaka Îranê de bi sedema gendelî û nêzîkatîya wî ji Rojava re, bednav e. Îran, li Afrîkayê ji siyaseta xwe re di rêya bangeşeyekê ku ew li dijî Emperyalîzm û ziyonîzmê ye; giranî da li ser welatên Misilman û civakên Islamî yên hejar. Alîkarî da " Huzbullah" a Lubnanî, ji bo şerê Îsraîlê bike, her wiha beşdarî şerê li dijî terorê bû, ji ber ku alîkarîya Îsraîlê ji bo pirojeya bendava El-Nehda ya Etyopya û destwerdana Emerîkî û Rojavayî di herêmê de, civatên Islamî yên Afrîkî pir dilgiran dike, li milekî din jî, Îranê piştgirîya xwe ji bo hin tevgerê Filistînî mîna Hemas û Cihada Islamî eşkere kir. Her wiha di rêya komîta Raber Xumeynî û hin navendên Şî'î li herêmê de, alîkarî pêşkêşî hejaran kir, ne bes wesa tenê, gelek veberanîn, zanîngeh û peymanên fermî bi hin welatln Afrîkî girêda û hewil da ku ayînzaya Şî'î belav bike.

Ji ber pişguhkirina ku Şî'e û hemû pêkhateyên li welatên xwedî desthelatên zordar û dektatorî dijîyan û ji ber kêmbûna (hindikîya) ayînzaya Şî'e, tûşî çewisandinê hatin, ji ber wesa şoreşa Xumeynî; ji wan re bû jêdera sirûş û îlhamê. Di rêya têkelî û pêwendîyên Şî'îyan bi Îraqî, Behrênî, Lubnanî û Îranîyên ku li welatên Afrîkî neştecih bûne, hizrên Xumeynî bi awayekî baş hatin naskirin. Pergala Wilayetulfeqîh jî ev tişt baş nas kir û bi armanca

cîbicîkirina pirojeya ” Belavkirina Ayînzaya Şî'î ” û qezenckirna alîgiran, bi xebateke baş rabû.

Hin ji Faktorên ku bûn alîkar, di belavbûna ayînzaya Şî'î û hizrên şoreşa Islamî ya Şî'î li welatên Afrîkî:

Li herêmê, ji serdema Fatimîyan, hebûna himêzgeha gelêrî ya Şî'î, her wiha hebûna gelek revendên Lubnanî û Îraqîyên Şî'î.

Di rêya destek û navendên olî yên Şî'î, operasyonên şî'etkitrinê berî şoreşa Xumeynî hebûn

Veberanîna helwesta” Zanîngeha El-Ezher” ya ku li Afrîka dibe sembola Islamî ya yekem ku bi Şî'îyan re bexşbar bû. El- Ezher, ji bo nêzîkatîyê di navbera ayînzayên Islamî de çêke, pir hewildan kirin, her wiha ji bo danûstandina serdana kesayetên zanyar û olî di nav her du alîyan” Hewza olî li Necef û Zanîngha El-Ezher” li hev kirin.

Hebûna gelek terîqetên sofîtiyê. Têkelî di navbera tesewifê û şî'etîyê de heye, ji ber ku tişta wan digehêne hev jî, hezkirina ” Ahl el-Bayt ” e, her wiha hebûna jimarek baş ji gor û pîrozgehên ” Ahl el-Bayt ”.

Di rêya navendên çandî yên Îranî û Îraqî û pêşengehên Navdewletî ya pirtûkan, mîna pêşenga Qahîre û Xartûm, belavkirina pirtûk û hizrên Xumeynî.

Helwesta Suneyan” Ixwan el- Mislumîn bi serkirdeya Hesen el-Bene” ya ji bo yekîtîya Cîhana Islamî ku nermahîyekê bi Şî'eyan û şî'etkirinê re dike, berovajî Selefîyên Wehabî yên ku Şî'îyan tawanbar dikin (dikifirînin).

Hebûna ” Dar el – Teqrîb”, ya ku li Qahîreyê hizrên Şî'î dide perwerdekirin, ya ku ji hêla peyayê Şî'î ”Mihemed Teqî el- qemî” di sala 1947 an bi alîkarîya hin peyayên Şî'î û Sune, di nav wan de” el- qemî û Birocirdî” hatibû vekirin, armanca wê jî belavkirina şî'etîyê û qezenckirina hizkirina sunîyan.

Sûdgirtin ji dorpêçakirina Emerîkî û Rojavayî li ser Sûdanê, dema alîkarî ji hikûmeta Sûdanê re pêşkêşkir, Sûdanê jî ji alîyê xwe ve rêdanek siyasî û olî

da Îranê [108], li nik têkelîyeke baş bi enîya neteweyî ya Islamî, bi serkirdayetîya Hesen el- Turabî yê xwedî hizrên Ixwanelmislimîn û pergala Welîhelfeqîh.

*Avakirina kargehên Îranî li hin dewletên Afrîkî, mîna damezrandina sazgeha Erebeyan li Senîgalê sala 2007an ku dibe sazgeha yekem li ser asta vî welatî û ji wir Îran Erebeyan hinardeyî hemû Afrîkayê dike.

Serbarî wê jî, destwerdana Îranê di karûbarên hundirîn yên hin welatên Erebî, mîna Behrên, Yemen, Îraq û hwd, bû sedema lewazbûna ewlehî û aborî ku xetek hevbeş di navbera Mafya û hin bazirganên Îranî yên çekan ku difirotin pêkahateyên êlan, her wiha leşkerkirina çeteyan, revandina elmasê, metalên pîşesazîya nûjen, revandina mirovan, bazirganîya perçeyên laşê mirovan, hişbir û binerdkirina paşmayên nûklerî û hwd.

**Tevger û Kesayetên Şî'î yên Efrîkayê yên Giring:**

Ebdela Sambî: Ew jî bû serokê dewleta Comoros (Giravên Heyvê)[109]. Piştî dema serokatîyê wî bi dawî bû, bû zilamê Îranê yê yekem. Ji bo belavkirina hizr ramana ayînzaya Şî'î, bangeşakirina ramanên şoreşa Islamî ya Şî'î ya Îranê, bi bazirganên Şî'î yên Pakistanî, Hindî û Ereban ji bi destxistina berjewendîyên Şî'îyên li wir, dixebitî. Îranê jî "Huseynîgeh" û zanîngeha "Medîne" weke şaxeke ji zanîngeha "Qum" li wir vekir, her wiha xanûber û hwd dikirî.

108 Pasvanê Şoreşê yên Êranî. . . . damezrandin  û rola wê: Kînêth Katirman- weşanger: navenda Îmarat a lêkolîn û lêgerînê.

[109]Serokê berê yê Serweriya Comoros, di salên heşteyên de bû Şîî û di sala 2006`an li ser textê serûkatihê rûnişt. Di Peymangeha Şîî ya bi navê "Peymangeha Pêximberê Mezin" a Paytextê Nîrobî berî şoreşa Xumeynî, xwend. Piştî şoreşa Islmî di sala 1986`an de xwendina xwe li Îranê li ser desrê "Mihemed teqî Muderisî", domand. Navê "Aytûlah Sambî "hat lêkirin. Piştgirî ji bazirganên Pakietanî, hindiyên Şîî, Îranî, Ereb û efrîqiyan girt. Ew Jî ji bo serwerî di destên şîiyan de bimîne.



*Ehmedî Necat serdana Comoros kir û serokê wê yê berê "Ebdela Sambî" dît*

**Tevgera Islamî li Necîryayê:**[110]


"Ibrahîm Yaqûb Zikzakî" ev tevger damezirand. Ew jî tevgereke bi şêweyekî ayînzayî û siyasî ye. "Zikzakî" bawerî bi ayînzaya Şî'î kir û bi rêya bikaranîna xizanî û nexwendinê, Şî'îtî li welêt belav kir. Hin çavkanî diyar dikin ku jimara Şî'îyan li Necîryayê digehêje nêzî 3900 000 kes[111] in, her wiha jimareke baş ji koçerên Libnanî ku bazirganîyê dikin, hene. Xebata vê tevgerê piranî di hin gund û bajarên wîlayetên "Kadona û Kado" yên Bakurê Necîrya dikevin ku Şî'î lê pirin, bi cih dibin.

Piştî serdanekê li Îranê "Zikzakî" vê carê tevgera xwe bi perwerdeya leşkerî amade dikir. Ew jî tevlihevîya li Necîryayê, ji ber şerê di navbera Artîşa Neycîrî û Koma "Boko Heram" ya hevrik û tundrew de, weke derfetekê bi kar anî. " Zikzakî " piştgirîya leşkerî û diravî ji Pasvanê Şorşê ve, girt. Hin çavkanî dibêjin ku ji ber dilsozîya wî weke sekretêrê "Hizbûlahê Neycîrî" hate erkdarkirin, ew jî hewildanek e, ji bo tevgereke Şî'î bi bandoreke siyasî û leşkerî li Neycîriya ye, weke "Hizbûlahê Libnanî" ku peyrewê Pergala Wîlayetûlfeqîh be; bê saz kirin. Di sala 2013`an de sazîya agehdarîya Neycîrî ragehand ku wê komeke tundrewî girtin. Vê komikê

[110] Li Efrîkayê veberanîn, hêvî û astengî - https://www. qiraatafrican. com/media/magazine/8781-%D8%A7%D9%84%D8%B9%D8%AF%D8%AF%204. pdf Derbaskirina Îranê di parzemîna Efrîkayê de - https://arabiangcis. org

[111] Pirojeya dawî ya Îranê ber bi dawî diçe - http://falsharq. com

hewil dida ku êrîşî berjewendî û armancên Israîlî û Rojavayî li Neycîriyayê bikin fermandarê leşkerî yê Neycîrî "Ibrahîm Babancîda" û baloyazê Si'ûdîyê yê Neycîriyayê, bikujin. Her wiha desthelatdarîya Neycîrî ragehand ku wê pilanek vedît ku dixwestin serokerkanê Artêşa Neycîrî, bikujin û bareke çek ya ku ji bendera "Bevder Ebas" ya Îranê hatibû, girtin. Artêşê dest bi helmeteke leşkerî li dijî Koma "Zikzakî" kir, piştî ku ew tewanbar kir. Di pêkanîna vê helmetê de artêşê êrîşî Huseyngeha "Beqiyetûlah" kir û rûxand her wiha bi dehan alîgirên wî tevî endamine malbata wî kuştin û piştî "Zikzakî" bi aweyeke dijwar birîndar bû, hate gitin. Ev helmet berfirh bû ku êrîş çûne ser hemû navendên Şî'î yên Neycîriyayê. Ji alîyê xwe ve Îranê Artêşa Neycîrî bi komkujiyan li dijî Şî'îyan li wir bi sorkirina tevgera Wehabî û Sehyûnîyê, tewanbar kir. Ew jî bi piştgirîya raporine hiqûqî yên navdewletî. [112]



*Olnasê Şî'î "Ibrahîm Yaqûb Zikzakî" dema axavtinekê pêşkêş dike*

[112] Şîiyên Neycîryayê weke nîşan hatine girtin - http://www. alalam. ir

Bi giştî xebata Îranê li Efrîkayê li herêmên germ yên ku tevlihevî lê heye çalak e. Ew jî herêmên ku dijberîya, Ayînzayî û nijadî lê peyda dibe. Weke, "Koma Pêşbînîyan"[113] ya Şî'î ya alîgirê Îranê li Cîbotî ye, "Ebdirehman Eden Weresma" rêveberîya wê dike. Her wiha Îranê hewil dide ku bi Gelê Emazîxî têkelîyan çêke û ayînzaya Şî'î li nav wan belav bike û xwe nêzî Erîtêrya dike ku nakokîya di navbera wê û Etyûbiyayê, bi kar tîne.

**Li Ewrûpayê:**

Pergala Wîlayetûlfeqîh hewil dide ku hebûna xwe bi rêya hêza xwe ya nerm û komikên razayî li wrûpayê, xurt bike. Ew jî bi sûdgirtina ji demokratîya li Ewrûpayê û bikaranîna koçberên Şî'î yên ku li hin welatên Yekîtîya Ewrûpayê, bi cih bûne. Tevî ku ew nikare komên çekdar yan jî rêxistinên siyasî yên alîgirên wê amade bike jî, lê xebatên xwe yên agehdarîyê didomîne. Êdî hin dijberên xwe reş dikuje. Weke serkirdeyê "Partîya Demokratî ya Kurdistanê ya Îranê" yê dijber "Ebdirehman Qasmlo" di sala 1989`an li paytexta Nemsayê Viyenayê, "Şahbûr Bextyar" serok wezîrê Îranê di dema Şah "Mihemed Rida Behlewî" de di sala 1991`ê li Parîsê, "Sadiq Şerefkindî" sekretêrê "Partîya Demokratî ya Kurdistanê ya Îranê" û sê alîkarên wî li paytexta Elmanyayê Berlînê, "Kazim Cewad" serkirdeyê rêxistina "Mucahidî Xelq" di sala 1990`î de li Cinêvê û "Ehmed Mewla" serkirdeyê Tevgera Têkoşîna Erebî ya Rizgarkirina Ehwazê di sala 2017`an de, li pêşîya mala wî li bajarê "Lahay" ya Holendî; hatin kuştin. Her wiha di sala 1992`yan de piştgirîya leşkerî û locistî dide şervanên Bosnî li dijî Sirpyayê[114], Pasvanê Şoreşê xwest tevlihevîya li wir bi kar bîne û xwe li Belkanê bi cih bike. Lê destwerdana NATO`ê di şer de, derbasbûna Îranê rawestand. Tevî wesa jî helmetên Şî'îkirinê li Ewrûpa nehatin rawistandin ku bi dehan navendên olî û çandî yên Îranê yên Şî'î yên ku ji ayînzaya Şî'î û pergala Wîlayetûlfeqîhê bangeşê dikin, belav in[115]. "Encumena Zanyarên Şî'î yên Ewrûpayê" yek ji van e.

---

113 Belavbûna Îranê li Efrîkayê - http://www. umayya. org/studies-ar/11886

114 Dema ku Çûn Serayêvo: Şerê Hizbûlah yê Nenaskirî li Bosnayê - http://al-akhbar. com/node/251354

115 Navenda Lêgerînên Hişmend - http://www. aqaed. com/shia/institution/europe/




Her wiha Îranê pirojeyeke wê bi şêweyekî neteweyî û bi navê "Hewza Îranê ya Şehristanî" yan jî "Îrana Mezin", heye. Ev jî di Rojhilata Navîn de Farisan weke gelekî rêber ji gêlên arî re weke Şahinşahîya Farisî, digire dest ku sînorê wê ji rojhelat ji Çînê û Okyanûs Hindî ji başûr bigire heta Kendavê ji rojava ve û ji Qafqasyayê û Deryaya Spî ji bakur ve, dikişe. Îran dixwaze vejîne, ew jî bi bangeşa çandî ji gelên arî re vê pirojeyê daxive. Alayî "Muhsin Rîdaî"[116] fermandarê Pasvanê Şoreşê yê berê û sekretêrê "Komkara Nîşankirina Berjewendîya Rejîmê " yê ku li Îranê amûrên wî yên ragehandinê hene; ji kesên girîng yê ku ji vê pirojeyê re bangeşê dike ye.




[116] http://www. irane7000saale. com/IRAN7000. htmç
Hêza Îranê ya Nerm nas bike – Karîn û sînorên bandorê – Elî Hesen Bagîr. http://studies. aljazeera. net/ar/files/iranandstrengthfactors/2013/04/2013411102151266414. html